# DI ÇARÇOVEYA TÊGÎNÎ Û TEORÎKÎ DE

# JI NÛ VE HIZRANDINA LI SER ZANISTÊN CIVAKÎ

**Heqî Tekîn**

Weşanên Akademiya Zanistên Civakî ya Abdullah Ocalan

DI ÇARÇOVEYA TÊGÎNÎ Û TEORÎKÎ DE

JI NÛ VE HIZRANDINA LI SER ZANISTÊN CIVAKÎ

NIVÎSKAR: Heqî Tekîn

WERGER: Grûb Berf-Bedran Penaber

Edîtor: M. Elî Destan

Redeksiyon: M. S. Deniz

Rûpelsazî: Baz Demir

Bergsazî: Akademiya Zanistên Civakî ya Abdullah Ocalan

Weşanxane: Weşanên Akademiya Zanistên Civakî ya Abdullah Ocalan

Çapa Yekem: Adar 2025

# NAVEROK

**Destpêk** ........ 5
**BEŞA YEKEM ÇARÇOVEYA TÊGÎNÎ** ........ 17
**A-Danasîna Rast A Têgînan** ........ 18
**B-Têgînên Bingehîn Ên Paradîgmaya Şaristaniya Demokratîk** ........ 29
**1-Çand** ........ 29
**2-Ziman** ........ 58
**3-Şaristanî** ........ 69
**4-Desthilatdarî** ........ 79
**5-Rêveberî** ........ 96
**6-Polîtîka** ........ 105
**7-Exlaq** ........ 125
**8-Hiqûq** ........ 135
**9-Demokrasî** ........ 161
**10-Aborî-Ekonomî** ........ 195
**11-Asîmîlasyon** ........ 215
**12 .Qirkirin** ........ 229
**BEŞA DUYEM ÇARÇOVEYA TEORÎKÎ** ........ 239
**A- Li Ser Têgîna Teoriyê** ........ 240
**B-Nêzîkatiyên Teorîkî Yên Paradîgmaya Şaristaniya Demokratîk** . 245
**1-Desthilatdariya Hegemonîk A Navendî** ........ 245

**2-Desthilatdarî û Rêveberiya Demokratîk** .............................. 259
**3-Neteweya Demokratîk** ...................................................... 265
**4-Sosyalîzm û Kapîtalîzm** .................................................... 287
**5. Hevjiyana Azad** ............................................................. 306
**Gotina Dawî:** ..................................................................... 318
**ÇAVKANÎ** ............................................................................ 321

# Destpêk

Di dîroka civakîbûnê de, sextekariya destpêkê; bi danasîna şaş a têgînan hatiye destpêkirin. Manîpulekirina têgînan, valakirina wan ji cewherê wan û qutkirina wan ji heqîqeta wan, bi bajarvaniya li ser bingehê dewletê avabûyî destpê dike. Manîpule û berevajîkirina peyv û têgînan cara destpêkê li Ûrûka bajardewleta Sûmeran rastî mirov tê .

Têgîn jî wekî civakê diguherin û vediguherin. Di vî warî de danaheveke dîrokî ya têgînan jî heye. Têgîn jî di herikînekê de ne. Ev herikîn jî bi herikîna civakî re pêş dikeve. Ji hişmendiya hevpar û hevgirtina hestyarî ya civakê pêk tê û pêş dikeve. Têgîn; ew wate û manedanên ku bi daxwaz û rizamendiyek hevpar ji aliyê civakê ve tên erêkirin in. Lewra, wate û watedan an jî mane û manedan, bi têgînan bi gewde dibin û tên qebûlkirin. Ji ber vê yekê, têgîn wekî xezîneyên mirovan ên watedanê yên ku ji kirin û çalakiyên civakê hatîn afrandin in.

Heke em têgînê wekî hebûn û çêbûnê jî wekî dem bigirin dest, di pêvajoya herikîna civakî de bingehê guherîn û veguherîna têgînan wê bi zelalî were fêmkirin. Ji ber vê yekê, ji bo naskirin û têgihiştina maddeyekê yan jî giyandarekê, pêwîst e mirov maneyê bide hemû wan materyalên civakî û dîrokê yên ku ew pêk anîne. Bi gotinek din, divê mirov bandorên pêkhatin û çêbûna wê giyandarê jî fam bike. Wek nimûne, ji bo naskirina têgîna ‘neolîtîk’ê pêwîst e mirov bandorên ku ew pêk anîne, digel hemû pêkhate û materyalên wê derxîne holê. Bi heman awayî, ji

bo naskirina têgîna dewletê jî wek nimûne, divê mirov bi giştî materyalên pêvajoya çêbûna wê di warê manedanê de derxîne holê. Ji ber ku her hebûnekê, çîrokek xwe ya çêbûnê, pêvajoyek xwe û bandora çêbûna xwe heye. Lewra, heke çîroka çêbûnê digel bandorên wê bi hişmendiya wê pêvajoyê ve neyê girêdan, têgîn, teorî, gotin an jî paradîgma, wê ji wan heqîqetan qutbûyî bimînin.

Ji ber vê yekê, divê bi şik û guman li hemû watedana têgînên civaka modernîst û dewletperest were mêzekirin. Ji bo vê jî, pêwîst e mirov bi şik û guman li hemû navlêkirin û watedanan binêre û di rêbaza pirs û lêpirsînê re derbas bike.

Di vê derbarê de, wê bi sûd be ku mirov behsa çend fîlozofên ku bûyîn perwerdekarên fîlozofan bike, ku di warê felsefeyê û danasîna têgînan de mohra xwe li dîroka felsefeyê dane.

Platon, wateyên îdealîst li têgînan zêde dike. Li gorî wî, mirov hebin an jî tine bin, têgîn hene. Li gor Platon, ji ber ku mirov dihizire, têgîn pêş nakevin. Ji ber ku ew li dinyayek din jî hene, em bi wan dihizirin. Platon teza ku dibêje, çalakî û kirinên civakî ne danasînên mirov in, velivînek a dinyaya din in, bi kar tîne.

Arîstoteles, hebûna têgînan a li dinyayê bi hestyarî li qelemê dide. Yanî ne wekî Platon dihizire. Li gorî Arîstoteles, her tişta ku xuya dike rastî ye, ne kopiya yan jî dengvedanek e. Ji ber vê yekê, xwezayê wekî ku heyî, wekî hest pê tê kirin, wekî tê dîtin pênase dike. Beriya ku Arîstoteles li ser hebûnê/çêbûnê bihizire, bi metoda hizirîna li ser hebûnê li mijarê dinêre. Ango beriya hebûnê, pêwîst e mirov agahiyên di derbarê wê de zanibe. Yanî

dixwaze bi awayek metodolojîk nêzî rastiyê bibe. Ji vê re dibêje Epîstemolojî. Arîstoteles bi xebitîna li ser epîstemolojiyê xwe digihîne têgîna mantiq. Ji ber vê yekê heke mirov bibe xwedî hêza rasthizirînê, hingê hebûn wê rast were pênasekirin. Ji bo vê jî, rêbazek mantiq a hizirînê (formel mantiq) ya girêdayî prensîban pêş xist.

Fîlozofê Almanî Hegel jî di derbarê têgînan de wiha dibêje: "Ew bi hizirîn û hêza xeyalên mirov çênabin, ew di xwezayê de wekî hebûn giyandar in." Lewma ew dibêje, ji bo kifşkirina ruhê xwezayê û cîhana têgihiştinê ya mirovan, divê têgîn bên çêkirin

.

Wek tê zanîn, Rêber APO ji bo ku têgînan nêzî cewhera wan a civakî bike, di nav hewl û lêgerînek derasayî/awerte de ye. Rêber APO di her nirxandina xwe de teqez behsa zekaya analîtîk û zekaya hestyarî dike. Bi vê jî nasekine, ji bo hevgirtina zekaya analîtîk û zekaya hestyarî, dadikeve kûrahiya dîrokê û li wir aliyekî digire. Wekî ku li wir be, di hiş û giyanê wan de be, nêzî mijarê dibe. Nimûne, bi pênaseya dema me ya niha, ango bi pênaseya roja me ya îroyîn li têgîna jinê nanêre. Xistina jinê ya di nav pencên desthilatdariyê de (şkestina zayendî) qebûl nake, pêşketina dewletê wekî neçariyekê qebûl nake, hiyerarşiyê wekî mecbûriyetekê nagire dest, wekî ku li wir be aliyekî digire. Rêber APO bi vê hest û felsefeyê nêzî hemû têgînan dibe. Ew, bi xwegihandina çaxan, terefekî digire û aliyê xwe pêşan dide. Ew dizane heke aliyekî negire, nikare civaka dîrokî biguhere. Ji ber vê yekê, bi lêzêdekirina felsefe û hestan, bûyer û diyardeyan dinirxîne. Rêber APO dibêje: "Ez ew zeman im ku dûrî û

nêzîkahiya wî tine yî, mekanê ku pêşî û paşiya wî tineyî me.” Wekî ku di hiş û giyanê hemû zeman, mekan û hebûnê de be, ye.

Rêber APO tenê bi zekaya analîtîk nêzî bûyer û diyardeyan nabe. Divê were zanîn ku şervanek bi bandor ê hestan e. Ji ber vê yekê, zehmet e ku mirov Rêber APO tenê bi ramanan ve girêdayî fam bike. Di hemû şert û mercan de hîs û hestpêkirina mirov dide diyarkirin. Divê ev cudahî were dîtin û binê wê were xêzkirin. Kifşkirina vê cudahiyê ji bo famkirina Rêber APO gelekî giring e.

Rêber APO dibêje: ‘Heta di zanista civakî de, danasîna bingehîn a têgîn û teoriyan neyê kirin, zehmet e ku mirov bikaribe nirxandinên watedar pêş bixe.’ Rêber APO li vê derê destpêkê behsa giringiya danasînê dike, dadikeve nav û wiha didomîne: “Zanista civakî di mijara danasîna xwe de dûr e ji nêrînek hevgirtî.” Bi gotina (1) ew xetimîna ku zanistên civakî tê de ne radixe ber çavan. Ji ber vê yekê jî, ew tevlîhevî û mişewişiya têgînan an jî veşartin û windakirina wateyê, wekî tehlîlkirinek ji hêla lîberalîzma bîrdoziya kapîtalîzmê ve hatî çêkirin, digire dest û dinirxîne.

Her dîsan di vê derbarê de, Rêber APO wiha gotina xwe didomîne: “Ev pînika têgîn û teoriyan a ku di bin navê zanistê de mirovê civakî lê tê firotin, herçend e ku heta roja me ya îro qeyraneke kûr dijî jî, qalibên bingehîn ên hişmendiya civakî pêk tîne.” (2) Dide xuyakirin ku hewldana serdestkirina têgînên xwe di zihniyeta civakî de, yek ji taybetmendiyên destpêkê yên desthilatdariyê ye ku dizê hemû nirxan e.

Dîsan dibêje: “Bingehê zimanê sembolîk, bi peyvan derbasî hizra razber bûye. Li şûna îşaretan, bi têgînan ji hev famkirin, di

dîroka mirovahiyê de şoreşek mezin e.” Û dîsan dide xuyakirin ku têgînên hatine çêkirin mê ne, ji ber bi amajekirina jinê hatine çêkirin. Ji ber ku pêwîst bû jina dayîk navlêkirinek daba zarokên xwe, klana xwe, rêveberiya xwe ya cewherî, derdora xwe û nebatan, bi kurtî her hemû xususiyetên ku giyandar didîtin, diviyabû nav lê kiriba, binasandiba û teşeyek dabayê. Cihê jinê yê di jiyanê de çi ba, wateya têgîna ku dihat pêşxistin jî ew bû. Paşê her tişt guheriye; cewherê jiyanê ji jinê hatiye dizîn, bi zilam derbasî rewşa desthilatdariyê bûye û hemû cewhera heyî hatiye berevajîkirin. Bi vê yekê re jî, cîhana îmgeyên zihniyeta analîtîk ji zihniyeta hestyarî qutbûyî hatiye pêşxistin û hemû cûrên kemîn û dekûdolaban li zihniyeta civakê hatine enjektekirin. Têgînên ku di nava civakê de çêbûyîn û bi wate bûyîn, paşê bi bikaranîna hesasiyetên civakê, ji derve ve hatine enjektekirin û cewherê wan têgînan hatiye guhertin. Amajekirin û balkişandina li ser vê xalê giring e. Di civaka komînal a xwezayî de, têgîn di nav civakê de diafirîn û bi wate dibûn, lê şaristaniya dewletdar, ji bo civakê tepeser bike û bi rê ve bibe, mîrasa civakê jê didize, têgînên xwe çêdike û civakê enjekte dike.

Ji bo têketina Zanistên Civakî yên Alternatîf, giring e ku mirov bi şik û guman li têgînên paradîgmaya modernîst binêre û li ser vê rastiya dîrokî veçemandinekê çêbike. Ji bo vê jî, pêwîst e têgînên Modernîteya Demokratîk ji nû ve bên pênasekirin da ku li cewherê wan bên vegerandin. Divê têgînên civakên ku li derveyî şaristaniya dewletdar mane, dîsan bên bi dest xistin, ji nû ve bên avakirin. Hemû yekeyên civakê yên ji derveyî şaristaniya dewletperest heyîn, ji ber ku bê rêxistinbûn û bê pergal in, ji hemû amûr û amrazên xwegihandin û xwesereraskirinê mehrûm in. Beriya her tiştî, di maneyek alternatîf de nehatine

birêxistinkirin û ber bi vî şêwazê birêxistinbûnê ve neçûne. Ji ber vê yekê, ji pergalên dîrokî û civakî mehrûm û bê par in. Di ceribandinên Reel Sosyalîzmê de hatiye dîtin ku bi têgîn û teoriyên li ser qalibên hişmendiya hegemonîk, bi rêketin û pêşketin çênabe. Ji bo vê jî, wekî gava destpêkê, ji bo ku hemû beşên civakê yên ji derveyî civaka dewletperest mayîn bibin xwedî rêxistin û pergaleke nû, pêwîstî bi rabêjiyek nû heye. Ji bo vê jî, armanca paradîgmaya şaristaniya demokratîk; hemû beşên civakê yên ji derveyî dewletê mayîn, bi rêxistin bike û bike xwedî pergalek a xwebirêvebirinê. Gotin û kirinên destpêkê yên vê armancê jî têgîn û teorî ne.

Ji bo vê jî;

Têgîn, kevirên bingehîn ên avakirina zihniyet û pêşxistina hafizeya civakê ne. Bêyî xwegihandina van kevirên xweavakirinê, ti çalakiyên civakî pêk nayên û ti sazîbûneke civakî ava nabe. Wek tê zanîn hemû geşedanên civakî yan jî afirandinên civakî, bi sazûmaniya pêkhateyên zihniyetê pêş dikevin. Zihniyet, bi pergala têgîna ziman re avaniyeke giştî pêk tîne û tevdigere. Her ku mirov zimanê xwe yê hêmanî pêş xist, di avakirina têgînê de jî lezayî çêbû, ev jî di zeka û zihniyetê de bû sedema destpêkirina qonaxeke mezin a şoreşgerî. Hemû teoriyên ku hişmendiyê pêk tînin, di koka xwe de bi têgînan hatine honandin û avakirin. Ji mîtolojiyê bigire heta ol, ji felsefeyê bigire heta zanistê, ji aboriyê bigire heta polîtîkayê, çêbûna û pêşketina hemû pêkhateyên civakî û teoriyan; bi ziman, têgîn û bi hêza ramanên ku bi van ve têkildar, pêkan e.

Civakîbûn bi ziman, bi têgihiştinê, bi dadmendî û bi hiş mimkun e. Civaka ku hiş û zimanê xwe winda kiribe, yan tine

bûye yan jî xwe spartiye rastiyek din û tine tê hesibandin. Lewma, ji bo civakekê ya giring û bingehîn, ne domandina hebûna xwe ya maddî li ser asta biyolojîk e, ji wê zêdetir û ya esasî, ew e ku ziman û hêza xwe ya hiş-aqil li gorî hafizeya xwe ya civakî, kevneşopî, ol, felsefe û zanistê pêş bixe. Divê ev wekî tiwaneyek a avakirina zihniyetê be.

Bihêzbûna zihniyeta şaristaniya yekdestdar a ku li ser bingehê mêtingeriyê pêş ketî, civak ji cîhana wê ya watedana rastî û şert û mercên wê yên hebûnê daye dûrxistin. Pergalên şaristaniyên navendî heta asta ku karibin civakê ji wate û cewhera wê dûr bixin, bi dayîna teşeyên nû, civakê di bin kontrola xwe de dihêlin û li gorî asta biserxistina vê jî, ji bo ku kontrola xwe ya li ser civakê bidomînin, timî di nav lêgerîna hizir û watedanên nû de ne. Li şûna ku rastiya zihniyeta xwe ya desthilatdar bide xuyakirin, ji wê zêdetir nêzîkatiya wê ya bingehîn ew e ku kedxwariya xwe veşêre û paşperde bike. Di vê çarçoveyê de, hêmanênên bingehîn ên ku di zihniyetê de rola stratejîk dilîzin, têgînên nû hatîn çêkirin in. Desthilatdariya ku xwe di qada zihniyetê de dayî avakirin, bi têgînên ku wê bi xwe çêkirine, xwe dide avakirin û pêşxistin. Qada herî zêde ku zihniyeta desthilatdar têde bûyî hosta, qada çêkirina têgînan e. Hêzên şaristaniya desthilatdar, hêz û bandora çêkirina têgînan di hiş de baş dizanin. Digel xweveşartina bi têgînan û rewakirina kedxwariya xwe, yek ji pêwîstiyên xwevakirina vê zihniyetê, bênoverokirin, şewişandin û berevajîkirina têgînên ku hêza civakê ya watedanê ne. Xuyaye ti ferq di warê çêkirina têgînan de, di navbera rahîbzanyarên modern û Sûmeriyên ku hosta bûn di mijara berevajîkirina heqîqetê, kûrkirin û pêşxistina kedxwariyê de, tine ye. Di vî aliyê xwe de, sazûmaniyên

desthilatdar wekî xelekên zincîrekê li hev tên zêdekirin û li ser rêç û kevneşopiya hev hebûna xwe didomînin.

Têgîn, çekên herî mezin ên di avakirina bîrdoziya sazûmaniya desthilatdariya hegemonyayê de tên bikaranîn in. Ti hêz û pergaleke hegemonîk tenê bi pala xwe dana hêza qebe ya zorê, nikare vesaziya xwe çêbike û hebûna xwe bidomîne. Her hêzek hegemonîk, bi îdeolojiyek hegemonîk ji xwe re qilifek rewa çêdike û di bin van qilifan de xwe ava dike û hebûna xwe didomîne. Di hemû qonaxên dîrokê de, hatiye dîtin ku hemû pevçûnên çînî û civakî, di serî de di qada bîrdozî-zihniyetê de, yanî di cîhana têgînan de pêş ketine.

Di vî warî de, her diyardeya civakî ya ku li ser bingehê heqîqetê neyê pênasekirin, bivênevê wê rastî pirsgirêkan were. Wekî ku di tibbê de jî heye, teşxîsek şaş, wê wekî encam bi xwe re tedaviyek rast neyne. Di vê wateyê de, pênaseya rast a têgînî û teorîkî bi qasî jiyanê giring e .

Rêber APO di hemû nirxandin û analîzên xwe de, bi awayek kûr li ser pênaseya diyardeyên wekî têgînî û teorîkî disekine, aha ev jî ji ber giringiya wan a jiyanî ye. Pênaseyên ku li ser esasê têgînî û teorîkî derdikevin holê û eşkere dibin, rê û îstiqameta mirov û civakê didin diyarkirin û di vê çarçoveyê de rê û rêçikên ku divê bên şopandin ronî dikin.

Ji ber vê yekê, her pênase rêyekê-aliyekî dide diyarkirin, rêyekê dineqîne û dihêle ku mirov û civak xwe binasin. Di vê wateyê de, her danasînek, pênaseyekê, wateyekê li jiyanê bar dike û maneyekê didiyê. Bi qasî ku tê zanîn watedan û wate lêbarkirin, danadiyarkirina heqîqetê ye û li gorî wê xwenasîn û xwe bi ser hev ve anîn e. Her pênase pêkanînek erênî yan jî neyînî

bi xwe re tîne. Hemû paradîgma li ser esasê îdeolojîk û polîtîk hatine formîlekirin. Her paradîgamayê, îdeolojî û polîtîkayê, çarçoveya xwe ya têgînî û teorîkî û karekterê xwe, li gorî jêdera xwe ya civakî û çînî çêkiriye. Di van xalan de, rast û durist pênasekirina têgînan, ji bo bi awayek bitendurist avakirina pergalên civakî, pêkanîn û pêşxistina wan, bi qasî jiyanîbûnê giring e.

Têgînên ku bi hişmendiya komînal û demokratîk pêk hatîn û civakên demokratîk û civakên bindest bi kar tînin û têgînên ku hêzên şaristaniya yekdestdar bi kar tînin, di warê watedanê de ji bingeh ve, ji hev cuda ne. Sedema vê jî; ji ber xisleta kedxwarî û îstismarê ya şaristaniya yekdestdar e ku têgînên şaristaniya demokratîk ji bo berjewendiyên xwe yên îstismar û kedxwariyê berevajî dike û ji xwe re bi kar tîne. Ji ber vê yekê jî, hin têgînên ku tên bikaranîn, di warê naverokê de ji hev cuda bin jî, di teşe de hema hema yek in. Di vî warî de, tevlîheviyên di têgînan de û bi vê ve girêdayî naveroka têgînan, nixumandin û dana windakirina wateya wan, mijarek giring a li ser sekinandinê ye. Ji ber vê yekê jî, Rêber APO di nivîsandina hemû parêznameyên xwe de, di derheqê têgînan de sererastkirinên pêwîst pêk anîne û têgîn û teorî xistiye navenda mijara xwe.

Rêber APO, dixwaze di zanista civakî de şoreşê pêk bîne. Bi ked û hêzeke mezin a fikrî, bi têgîn û teoriyan, di zanistên civakî de sererastkirinên bingehîn pêk tîne. Paradîgmaya Şaristaniya Demokratîk a ku tarîf dike jî, hewl dide li ser bingehê van têgîn-teoriyan bide avakirin.

Rêber APO, ji paradîgmayên heyî qutbûnek da çêkirin, bi paradîgmaya xwe ya ku pêş xistî, têgîn û teoriya xwe pêş xistiye.

Lewma zihniyeta nû ya zanistên civakî ya ku ji aliyê Rêber APO ve hatî pêşxistin, xwe dispêre zanist û felsefeya kûantûmê. Yanî kevirên bingehîn ên zanistî yên paradîgmaya nû, felsefeya kûantûmê ye. Li ser van bingehan, qadên bingehîn ên zanista civakî, ji dîrokê bigire heta siyasetê, ji etîk bigire heta estetîkê, ji ol heta zanistê, ji hûner heta felsefeyê, ji civaknasiyê bigire heta jineolojiyê ku qadên bingehîn in, naverok û wateya têgînên van qadan ên ku di jiyanê de tên bikaranîn, li gorî armanc û bingehê paradîgmaya nû, ji nû ve pênase dike. Hîn zelaltir, ango têgînên zanistên qadên civakî li gorî prensîb û armancên paradîgmaya nû, ji nû ve pênase dike.

Tişta ji nirxandinên Rêber APO yên ku tê de timî balê dikişîne ser têgîn û teoriyan bê famkirin û mijara bingehîn jî ew e ku; pêwîst e di vê qadê de têkoşînek ciddî bê meşandin. Di vê çarçoveyê de, heta qalibên zihniyeta kevn di asta têgînî û teorîk de neyên şkandin, avakirina zihniyetek nû ne mumkin e. Gotina zihniyet an jî hişmendiya nû tê wateya hem di wate û naverokê de û hem jî di teşe de, têgîn û teoriyên nû. Serkeftina rastî jî encex bi vî awayî çêbibe.

Bêguman, bes di sînorê sererastkirina têgîn û teoriyan de jî çênabe. Ji bo avakirina bingehê civakek nû û mirovek nû ku bibe alternatîf ji modernîteya kapîtalîst re, hewl û têkoşînek ciddî ya bi ruhekî şoreşgerî pêwîst e. Li cihê ku mirovahiyê lê winda kirî, li ser koka xwe ya rastîn ji nû ve hêşînbûn û bi dest xwe ve anîn, têgîn û teoriyên têk çûyîn û winda bûyîn li cewhera wan vegerandin û têkoşînek heqîqî ya ji bo vê dana meşandin, encex bi bidestxwe ve anîna zanista dîrokî ya civakî çêbibe.

Aha ji ber vê yekê, hişmendî û agahdarbûn an jî fêmkirin, bi têgîn û teoriyan çêdibe. Bêyî têgînan, ziman û hizir pêş nakeve, ku ev jî nebin, teorî, zihniyet û hiş pêş nakeve. Peydakirina hinek agahiyên cûrbicûr nabe zihniyet an jî hişmendî. Ji bo ku agahî bibe hişmendî, pêwîst e mirov wateya naveroka wê hişmendiyê zanibe, divê mirov hest bi wê bike û nirxê wê yê jiyanî fam bike. Cudahiya hişmendiyê ji agahiyên teorîk, bi famkirina pergala giştî ya bîrdozî, xwegihandina wateya wê û bi famkirin û destjêneberdana nirxên jiyanî derdikeve holê.

Ji ber vê yekê, zihniyeta civakî bi danasîna rast a têgînan, bi avakirina pergalek fikrî û gihandina hişmendiyekê tê pêşxistin. Rêxistinbûn û çalakiyên civakî jî bi pêkhatina vê re dikarin bigihêjin rastiya xwe.

Rêya xwerizgarkirina ji van şaşiyan, di afirandina hişmendiyek a li ser esasê têgînî û teorîkî, û destpêkê têkoşîna di fikir qezenckirinê re derbas dibe ye.  Ku ev jî dibe şoreşa zihniyetê. Bi kurtî, heke di vê qadê de serkeftin çênebe, di qada siyasî, aborî, exlaqî, çandî û leşkerî de, ango bi giştî di têkoşîna civakî de ti serkeftin çênabe. Ji ber giringiya vê qadê ya stratejîk, hêzên şaristaniya yekdestdar di hemû qonaxan de ev qad wekî esasek bingehîn bi xwe ve dane girêdan. Hizir û zanist li gorî vê çêkirine. Serkeftina wan a bingehîn jî ji ber vê yekê ye. Ango dinyaya têgîn û teoriyên ku çêkirine û  zihniyeta ku li ser vî bingehî formûle kirîn, sedemên sereke yên serkeftina wan in.

Rêber APO cilda dawî ya parêznameyên xwe yên wekî Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk pênase kirîn, "Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk: Parastina Kurdên di Nav Pencên Qirkirina Çandî de" bi nav kir. Di beşa yekem a

berhema xwe de, di bin navê “Çarçoveya Têgînî û Teorîkî” de, 12 têgîn û 5 teorî lêkolîn kirine û nirxandine. Û ev têgîn û teorî li ser bingehên danasîna paradîgmaya xwe, ji nû ve di warê watedanê de pênase kirine.

Di amadekirina lêkolîna vê nirxandinê ya ku me di çarçoveya têgînî û teorîkî nivîsî de, wekî çavkanî; destpêkê wekî bingeh ji parêznameyên Rêber APO, ji xebatên perwerdehiyê yên partiyê, kovar, pirtûk û gotaran sûd hatiye wergirtin. Lewma ev xebata di çarçoveya têgînî û teorîkî de, heke em bi awayekî taybet bibêjin, berhevkirinek e, lê heke em bi awayekî giştî bibêjin, nivîseke nirxandinê ya ji bo giringiya vê mijarê hatî amadekirin e.

# BEŞA YEKEM ÇARÇOVEYA TÊGÎNÎ

## A- Danasîna Rast A Têgînan

Ji bo çarçoveya danasîna têgînî çêbibe, destpêkê divê peyva têgîn rast were pênasekirin. Têgîn çi ye?

Di Kurdî de têgîn an jî têgeh tê gotin. Koka peyvê ji têgihiştinê tê. Tê wateya têgihiştinê yan jî gihiştinê. Her wiha dîsan di Kurdî de tê wateya gihiştina wateyê û di wateyê de xwe bilêvkirina peyvê û hwd wateyên wê hene.

Rêber APO dema ku paradîgmaya xwe pêş dixist, di çarçoveya anîna ziman a fikrên xwe de, ewil bi hûnandina têgînan dest pê kir. Çawa ku hemû ekolên zanista civakî dikin wekî mecbûriyetekê, divê têgîn jî li gorî naveroka teoriyan hebin, ji nû ve bên pênasekirin yan jî yên nû bên çêkirin. Heke wisa nebe, wê tevlîheviyek mezin a têgînî çêbibe. Fîlozofê Almanî Deleuze dibêje: “Felsefekirin (kirina felsefeyê), tê wateya îcadkirina têgînan.” “Ji ber ku Deleuze felsefeyê ji çalakiya ramanê zêdetir wekî afirandina têgînê pênase dike, lewma di hemû berhemên xwe de têgînên nû derxistine holê.” (3) Ji ber vê yekê, felsefevanên Alman têgînên nû bi ser zimanê Almanî ve zêde kirine.

Lewma, divê her feraseteke zanista civakî çarçoveya xwe ya têgînî çêbike. Ji ber cûrbicûriya pirsgirêkên dîrokî û civakî, pênasekirin û nasandina diyardeyê di asta têgînê de, hem pêwîst e, hem jî ji bo derbaskirina krîza heyî mecbûriyetek e .

Ji bo xwegihandina van têgînan, divê mirov ji asoya têgihiştina pergalê derkeve derve, divê mirov xwe bigihîne

şêwazê famkirin û zanîna gerdûnê, xwezayê û civakê yê ji derveyî têgîn û teoriyên ku pergal bi kar tîne.

Ji bo famkirin û zanîna çarçoveya têgînî û teorîkî, rêbaza herî baş a famkirina mijarê ew e mirov li ser bingehê têkilî û nakokiyên di navbera şaristaniya yekdestdara navendî û şaristaniya demokratîk ku dubendiya diyalektîka civakî pêk tînin, bisekine û li ser vî esasî nêzî têgîn û teoriyan bibe û binirxîne. Dema ku ji vî alî ve lê were mêzekirin, wê bê dîtin ku her têgîn hem şaristaniya demokratîk û hem jî şaristaniya yekdestdar dihewîne. Ji ber ku her têgînê rengê pergala ku di nav de çêbûyî û rewşa ku di encama têkoşînên di navbera pergalan de derketî holê bi xwe re hilgirtiye. Ji ber vê yekê, di dema danasîna pîvana têgînî ya paradîgmaya şaristaniya demokratîk de, xebata bingehîn paqijkirina têgînan ji bandorên şaristaniya yekdestdar e û li cihê ku ev têrê neke jî, bi îcadkirina têgînên nû wê cudahiya şaristaniya demokratîk derkeve holê.

Modernîteyê, hemû têgîn û nirxandinên bi navê agahiyên ansîklopedîk ên ji aliyê nêzîkatiya modern ve hatin sîstematîzekirin, li gorî xwe, li gorî pergala xwe çêkirine û bi ferzkirina wan ser civakan hewl daye zanistên civakî di bin banê van têgînan de binirxînin. Pergala şaristaniya yekdestdar a li pişt van kirinan jî, xureka bingehîn a moderniteyê pêk tîne. Û wiha êdî hemû zanistên civakî, di serî de felsefe, dîrok, siyaset, ekonomî û sosyolojî... hemû li gorî van têgînan hatine pênaskirin û li gorî van têgînan li bûyer û diyardeyan hatiye mêzekirin. Û hemû pêşketin û geşedanên civakî êdî bi vê ramana ku li têgînan hatî barkirin hatine nirxandin.

Bi taybetî cîhana têgînan a ku ji Platon û Arîstoteles hatî destpêkirin û paşê bi Descartes hatî domandin û hizirmendan, ev kevneşopiya pêşxistina têgînan dewam kirî, di çaxê ronakbîriyê de gihiştî lûtkeyê, di roja me de jî xwedî cihekî giring in. Marks û Engels nekarîne xwe ji vê rizgar bikin. Wan jî herçend e ku behsa diyalektîkê kiribin jî, xwestibûn pergaleke sosyalîst a monolîtîk li ser esasê jiholêrakirina dubendiyê ava bikin, ku ev jî înkara diyalektîkê ye. Sedema vê ya herî bingehîn jî ew bû ku hewl didan pergala xwe bi têgînên modernîteyê ava bikin .

Ji ber ku hewl didan pergala xwe bi têgînên modernîteyê ava bikin, kirin û nekirin nekarîn asoyên pergala kapîtalîst a ku digotin ew li dijî wê ne derbas bikin û ji aliyê çepê ve ji kapîtalîzmê re bûn xwînek nû û di nav avên wê de xeniqîne.

Têgîn ayîdî kê be, wateya wê jî ayîdî wî ye. Ji ber ku ew têgînên bi pevbestin û pevxistinê hatîn çêkirin, li ser esasê armanc û zihniyeta vê pergalê hatine avakirin. Lewma ew zihniyet ayîdî kê be ew têgîn jî ayîdî wî ye.

Wê demê pêwîst e em têgînên xwe li ser bingehê civaka exlaqî û polîtîk ku rewşa rastiya hebûna xwezaya civakî ne binirxînîn û bi vê ve girêdayî hişmendiyek nû ya ku dest jê nayê berdan ava bikin. Divê mirov bi mêzekirinek rast a wekî gerdûnê, xwezayê û civakê li zihniyetê mêze bike. Yanî bi gotinek din, divê mirov bi nêrînek rast û nêzîkatiyek giştgir zihniyetê bigire dest.

Ji ber vê yekê, Rêber APO di vê qadê de, di nav hewldanek ciddî de ye. Lêkolîn û vekolînan dike, timî pênaseyan dike û cudahiya têgînên xwe bi vî awayî dide xuyakirin. Ji ber ku têgîn amade û bi rêya wehiyê nayên. Têgîn wekî berhemeke hewldana zihin, bi lêkolîn û têgihiştinê derdikevin holê. Di mijara têgînan

de, divê mirov diyardeya zeman û mekan jî li ber çavan bigire. Her têgînekê dem û mekanek xwe heye. Çawa ku di çêbûn û pêkhatina hebûnê-heyberê de pîvana zeman û mekan mecbûrî ye, heman rewş ji bo têgînan jî derbasdar e. Di vê mijarê de mirov dikare nimûneyekê ji gumanbariya Descartes bide ku dibêje " Cogito ergo sum-Ez difikirim, lewra ez heme." Bi hûrgilî difikire û ji her tiştî guman dike. Ji ber ku rewşa ew têde ne rewşek normal bû. Di vê wateyê de, avakirina têgînekê, hewldan û kedeke mezin a hebûn û hizrandinê dixwaze.

Ji ber vê yekê jî Rêber APO dibêje: "Zihniyeta herî bilind, zihniyeta bîrdozî û rêxistinî ye." Di dîtina Hegel de felsefe ev e. Di herî jêr de malbat, aborî, hiqûq, siyaset, serbazî û di herî jor de jî têgihiştina felsefeyê cih digire. Heke em asta hişmendî û têgihiştinê bilind nekin, em nikarin têkoşîna sêwirandineke civakî ya ku em xeyal dikin pêk bînin. Heke zihniyet-hişmendî tine be, ne mimkun e ku mirov karibe di sêwirandina civaka ku tê avakirin de cih bigire. Heke rewşên wekî zihniyet û têgihiştinê tine bin, wê mirovên ku karibin timî wê civakê pêş bixin, pêşengiya ji çalakiyên wê re bikin û wê civakê ava bikin jî tine bin. Tişta bingehîn û çavkaniya me ya sereke, hêza zindî ku em li ser piyan hiştîn, ku dikare me li beramberî ew qas dijmin bide şerkirin û tevî hemû bêderfetiyan pêşketin dayîn çêkirin, tişta nemimkin pêk anî û em li ser xeta serkeftinê bi rê ve birin, piştevaniya hêza mezin a zihniyeta Rêber APO ye. Di hemû têkoşînên civakî de, hêza serkeftinê û faktora diyarker zihniyet e. Tiştên din hemû bi vê ve girêdayî bi wate dibin û pêş dikevin. Ji ber vê yekê, di esasê xwe de şer di zihniyetê de tê meşandin. Yên ku di şerê zihniyetê de bi ser bikevin, di şer bi xwe de jî bi ser dikeve, ango kî di şerê zihniyetê de bi ser bikeve, di şer bi xwe de jî bi ser dikeve û

qezenc dike. Şerê zihniyetê bingehê hemû şeran e. Her tişt li vir tê qezenckirin û li vir tê windakirin. Bi vê mijarê ve girêdayî Rêber APO wiha dibêje:

“Di dîrokê de aqilmend û pêximber dibêjin, şerê herî mezin ew şerê mirov bi nefsa xwe re dike ye. Kalanosê aqilmend ê ku ji Hindistanê bi dilxwaziya xwe hatibû ba Îskenderê Mezin, beriya şahiyê wî dixwest ku xwe bişewitîne û Îskenderê Mezin dibîne ku li hember îsrarê jî, ji biryara xwe nayê xwarê û dev ji çalakiya xwe bernade. Li ser vê yekê wiha dibêje: "Wî kariye rikberên xwe yên ji min mezintir têk bibe". Îskender mezintirîn şervanê di dîrokê de ye. Wî bi xwe jî dizanî ku şerkeriya aqilmendiyê ji ya wî hê bi watetir e.

Dema ku Hz. Muhemed şerê di navbera artêşan de wekî “cîhad-el esxer=şerê biçûk” û “cîhad el ekber=şerê mezin” bi nav dike, heman wateyê dide. Şerê nefsî yê mirovan, bi wateyek din tê heman maneya şerê zihnî(4) ”

Di kefneşopiya Rojhilata Navîn de şerê ku wekî nefsî tê kirin, di esasê xwe de şerê zihniyetê ye. Di vî warî de Rojhilata Navîn cihekî kêmpeyda û nimûneyî ye ku şahidiyek mezin ji damezrênerên zihniyetê re kiriye .

Moderníteya kapîtalîst îro çawa ku li hemû dinyayê kiriye, bi parçekirina zihniyeta gelê Kurd jî ew ji çanda wî ya resen û zihniyeta wî daye biyanîkirin. Ji ber vê yekê, zihniyeta parçebûyî ya civakê tê wateya heqîqeta civakê ya parçebûyî. Lewra destpêkê erkê me yê bingehîn bi dest xwe ve anîna zihniyetê û avakirina zihniyetê ye.

Pêvajoya zihnî; pêvajoyek a têgihiştin, têgihandin, fikirîn, girêdana bûyeran bi hev ve, şîrovekirin, xwegihandina dadweriyê û hwd. encam derxistinê ye. Ango pêvajoyeke ku tê de hemû kapasîte û jêhatîbûna mirov bi hev re dixebite. Kapasîteya mirov a hûnandina fikir, razberbûnê, plandananê û çêkirina daxwaz û armancê ye. Ew ne tenê beşa fîzîkî-bedenî ya mirov, di heman demê de beşa giyanî ya hebûna mirov bi tevahî pêk tîne.

Zihniyet an jî bi navê xwe yê din hişmendî, diyardeyek e ku di pêvajoyên zihnî yên mirov û civakê de derdikeve holê. Çand, hûner, felsefe, zanist, ol, bîrdozî, mîtolojî, hizir û hwd. hemû sobje-kirdeyêkin ku ji hêla zihniyeta mirov ve tên hilberandin. Mirov dikare jê re bibêje hiş an jî awayek ê dîtinê. Bêguman divê neyê jibîrkirin ku çavkaniya vê sûbjektîvîte-kirdeyê, zihniyet û aqilê gerdûnî ye ku civaka mirovahiyê bi xwezayê re li hev kiriye.

Zihniyet ne tenê pêvajoyek a bidestxistina agahiyekê ye, awayek têgihiştin û hizirandinê ye. Şêwazê hizirînê yê mirov an jî yê mirovên civakî yê di derbarê civak û xwezayê de, nêrîn û awayê wan ê nirxandinê û şêwazê jiyanê yê ku bi vê yekê re pêş dikeve, zihniyeta wan ava dike.

Ji ber vê yekê, pêşxistina cîhana zihniyetê û kirina nêzîkatiyek yekpare û giştgir, pêşderfetek e ji bo avakirina jiyanek rast. Wekî zihniyet, destpêkê divê rast li xweza, civak û bi taybet li gerdûnê bê mêzekirin. Û bi xeyala zanabûna ku ji vê hatî bidestxistin, civakek demokratîk û azad bê avakirin û pênasekirin. Ango bi gotineke din, divê bi nêzîkatiyek rast û yekpare li zihniyetê bê mêzekirin û li ser bê sekinandin. Zihniyet bes ne tenê mêzekirin, têgihandin û fêmkirin e, di heman demê de divê reftarên vê jî bên pêkanîn. Di vî warî de, ji bo pêkanîna

zihniyetek rast, bi derbaskirina ramana ku heqîqetê di nav materyalîzm û îdealîzmê de parçe dike û bi nêrînek giştî-giştgir li made-ramanê mêzekirinê mimkun e.

Mihyedîn Bin Erebî dibêje: “Xwedê li ser tehtan radizê xewnan dibîne, di nebatan de, di ajalan de, di kêzikan de û di mirov de şiyar dibe.” Li gorî vê hevoka felsefeya Wehdet-el Wicûd, cewherê xwedayî xwe di her hebûnê de cuda pêşan dide. Li gorî radeya kamilbûna heyînê, cewherê xweda xwe bi awayek kamil bi asteke bilind di wê heyîn-hebûnê de olan dide. Heke em li şûna navê xwedê yê di vê vegotinê de, têgîna zihn bi cih bikin, em ê karibin bi awayekî sosyolojîk merema xwe bi lêv bikin.

“Zihn li ser tehtan radizê xewnan dibîne; di nebatan de, di ajalan de, di kêzikan de, di mirovan de şiyar dibe”.

Ji ber vê yekê Rêber APO ji bo mirovan van pênaseyan dike:

“Pêkane ku mirov di wateyekê de, mirovan wekî rêzbendiyek a heybera zindî ya difikire binirxîne(5) ”.

“Mirov bi xwe, dikare xwe wekî xwezaya difikire ya herî tekûz pênase bike(6) ”.

Bi pêkhateya civakî ve girêdayî, pêwîst e du awayên zihniyetê werin bilêvkirin.

1. Zihniyeta civaka demokratîk, komînal, exlaqî-polîtîk e ku Paradîgmaya Şaristaniya Demokratîk e. Ev awayê zihniyetê hem rojane ye hem jî xwedî raboriyek mezin a dîrokî ye.

2. Zihniyeta çînayetî, mêrperest, desthilatdar û nîzama dewletperest a Şaristaniya Yekdestdar li ser hatî avakirin e.

Şaristaniya çînayetî û dewletperest, destpêka ku avabûyî (B.Z.3000 salan bi avabûna dewleta Sûmeran re...) heya roja me, ango bi qasî pênc hezar salan e karê avakirina zihin-hişmendiyê bi rê ve dibe. Li gorî vê û rêgezê herî bingehîn ê ku ev zihniyet li ser hatî avakirin, prensîba bingehîn; 'civakek bê dewlet nabe, pêş nakeve û nikare yekîtiya xwe pêk bîne.' Hema hema tê wateya wekî keriyek pez bê şivan nabe. Li gorî vê prensîbê; dewlet pêwîst e, mecbûrî ye, xwezayî ye û wekî pîroz hatiye dîtin. Li vir, li gorî vê zihniyetê, civaka ku bifikire bê dewlet bijî, ne mimkun e, ev jî tê wateya civak azad nebe û bi koletî bijî.

Wekî ku di nimûneyê de jî hatî dîtin, zihniyeta civakî ya çînayetî, mêrparêz, desthilatdar û dewletperest çawa ye, çawa tê birêvebirin, ji pratîkên wê yên dîrokî tê zanîn. Em ji dîrokê dizanin ku vê zihniyetê rê li ber rewşek çawa vekiriye. Êdî ji nivîsên tabletên ku wan bi xwe nivîsîne, tê zanîn ku ev zihniyeta bi Sûmeran re hatî afirandin, civak ber bi bobelatên çawa ve biriye. Ji ber vê yekê, cihê hemû sazî û kesayetên di nav vê zihniyetê de, hem parastina civakek hatî berevajîkirin e, hem jî di nav hemû xirabiyên vê zihniyetê de cihê xwe girtin û rol leyîstin e.

Lewra, pêwîst e zihniyeta nû ya civakî ku bi têgînî û teorîkî li ser bingehê zihniyeta civakî ya exlaqî û polîtîk li dijî şaristaniya dewletperest û desthilatdar ava bûye, were parastin û avabûna van herduyan di yekparebûnê de pêk were.

Ji ber vê yekê, têgîn mifteyên rêya ku bi peyvan diçe hişmendiyê pêk tînin. Bi wateyek din, ew avaniyên wateyê ne, yên ku bûyer û diyardeyan pênase û şîrove dikin, derdixin holê û heke mimkun be bi nav û nasname dikin.

Lewma her ekoleke zanista civakî, çaxa ku tezên xwe pêş dixe, dixwaze têgînên xwe bi awayek zelel ron eşkere bike. Rêber APO di vê derbarê de dibêje: “Bêyî pênasekirina têgîn û teoriyên ku di civaknasiyê de tên bikaranîn, pêşxistina nirxandinên bi wate zehmet e(7) ”.

Di rastiya xwe de, bingeha şer û nakokiyên ku di jiyana pratîkî de tên kirin, ji ber van têgînên ku di felsefe û civaknasiyê de hatîn pêşxistin in. Lenîn ji kesên ku nîqaşên li ser jihevcudahiyên biçûk şermezar dikin re, dibêje: “Ev ên ku ji dûrbîniyê mehrûm in.” Ji ber ku di koka dabeşbûn û jihevcudabûnê de, jihevveqetandinên girêdayî têgînan hene. Ji ber vê yekê mirov dikare ji şerên îdeolojîk re bibêje şerên têgînî jî. Di têkoşîna azadiyê de jî, dersên têgihiştinê hîn fêmbartir in. Rêber APO di nav nirxandinên xwe de dide diyarkirin ku; tevgerek a mîmîk û reftarekê jî, wateyek xwe ya îdeolojîk heye.

Îro li Kurdistanê bi têgînên wekî sosyalîzm, komûnîzm, konfederalîzma demokratîk, xweseriya demokratîk, azadî, demokrasî, azadiya jinê, exlaq, aborî, civakî, şoreşgerî, Kurdistan, heqîqet, modernîteya demokratîk, xwerêvberî û hwd.şerekî felsefîk, îdeolojîk, polîtîk û leşkerî tê meşandin.

Lewma têgîn di vî warî de giring in. Giringiya wê ji wê yekê tê ku her îdeolojî û teorî bi têgînên xwe pergalekê ava dike û sazûmaniya jiyana xwe ya civakî li ser van esasan pêş dixe.

Ji ber vê yekê, hemû bizav û tevgerên wekî Ol, Marksîzm, Sosyalîzm, Kapîtalîzm û fîlozofên Ronahiyê, pergalên xwe yên têgînî ava kirin.

Gelek têgînên ku îro tên bikaranîn çavkaniya xwe ji Neolîtîk-Civaka Xwezayî digirin. Di warê çanda civakî de, bingeh-koka van têgînan xusûsiyetên civaka komînan radixin ber çavan. Bêguman têgînên ku ji aliyê şaristaniya yekdestdar ve hatîn çêkirin jî hene. Evan e ne li ser esasên jiyana xwezayî-komînal in, li gorî zihniyeta şaristaniya dewletperest hatine çêkirin. Wekî nimûne, di civaka komînal de cihê têgînên wekî hiqûq, desthilatdarî, dewlet, hegemonya, qezenca zêde û hwd. nîne. Ev têgînên ku paşê hatîn çêkirin û pêşxistin in.

Ev têgînên ku hatîn çêkirin û berhevanîn, veguherîne zihniyeta desthilatdarî û qadeke sepandinê. Ji ber vê yekê hema hema bibêje piraniya têgînên ku em îro bi kar tînin, ji aliyê vê zihniyeta desthilatdar ve hatine berevajîkirin û li gorî armanc û mebestên xwe cewherê wan xirab kirine, ji naveroka wan a cewherî dane dûrxistin, manîpule kirine û li gorî zihniyeta xwe wateyên nû li wan zêde kirine. Di rewşa xwe ya heyî de, orjînaliya têgînan hatiye xirabkirin. Ji ber vê yekê, bi guhertin û destkarîkirina li naveroka van têgînan, dikare were gotin ku ev têgîn ji civakê hatine dizîn. Nimûneya herî îdeal a ku li ser vê mijarê bê dayîn, çîroka jê re 104 ME tê gotin e, ku di mîtolojiya Sûmeran de jê re Hûnerê Şaristaniyê jî tê gotin. Têgînên bi 104 ME dihatin binavkirin ên ku Enlîl dizîbûn û dabûn Enkî ku di rastiya xwe de xwediyê wê yê rastî Înanna bû, dema ketin destê sazûmaniya desthilatdariyê, ji aliyê binyatî ve naveroka wan tê guhertin. Ev 104 ME yên girêdayî civaka neolîtîkê ku xuliqkariyek a çanda xwedawenda bûn, ji aliyê Enlîl ê di kesayeta wî de

sazûmaniya dewletperest ava bûyî ve tên dizîn, radestî Enkî yê nû bûyî desthilat tê kirin. Têgînên hatîn çêkirin, ji bo berdewamiya nîzama desthilatdar neçariyek bû. Ji vir jî xuya dibe ku sazûmaniyên desthilatdar bêyî ku têgînên heyî berevajî û xirab bikin, nikarin sazûmaniya civakî jî belawela bikin û sazûmaniya xwe ya desthilatdariyê ava bikin .

Wekî encam, ji ber avaniya nermbûna xwezaya civakî, lêgerîna teqez a di derbarê têgînan de çênebû. Lê belê, li ser esasê jiyana azad û wekhev dikarin bibin mijara şîroveyeke nû. Ev jî bi sererastkirina zihniyet û şêwaz ango bi felsefeyê pêkan e. Bi vî awayî, têgînên ku temsîla hafiza û watedayîna mirovahiyê dikin, dikarin li cewhera xwe ya civakî ya kevin vegerin û di avakirina civakek demokratîk, wekhev û azad de dewreke giring bilîzin.

## B- Têgînên Bingehîn Ên Paradîgmaya Şaristaniya Demokratîk

### 1- Çand

Xwezayiya mirov-cewhera mirov çi qasî were famkirin, hêza têgîna çandê jî ew qasî di wê astê de wateyê qezenc dike. Dibe ku bi zilm û zordariyê, bi darê zor, tund û tûjiyê civakek têk biçe, lê heta ku çanda wê civakê hebe, wê derfet hebe ku ew civak dîsan ji nû ve xwe ava bike. Ji ber ku hêzên şaristaniya yekdestdar vê rastiyê dizanin, bi hemû cûrên operasyonan êrişî diyardeya çandê ku xala bingehîn a berxwedanê ya civakan e, dikin.

Dema besha çandê û wekî danehev kevneşopiya çandê tê kirin, mebest têgînên wekî civak, exlaq, polîtîka, hûner, xwerêveberî, azadî, aborî û têgînên wekî vanan e. Hema hema bibêje ev têgînan e hemwateyên çandê ne. Piraniya têgînên civakî xwedî naverokek çandî ne. Ji ber ku çand hevgihaneka hemû afrêneriya maddî û manewî ye.

Berî her tiştî, zihniyet û pevgihanekê girêdayî wê, di pêkhatina civaka mirovahiyê de xuya bûne. Ji ber ku pergalên desthilatdariya yekdestdar xwezaya mirovan fam dikirin, lewra berê tundiya êriş û operasyonên xwe bi taybet didan çandê. Di dawiyê de ji bo encamên mayînde bi dest bixin, qirkirina çandî xistin destpêka rêbazên xwe yên desthilatdariyê.

Ji ber vê yekê, berbelavbûn û belawelabûna çandî ji hemû cûrên belawelabûnê xetertir e. Ji ber ku bandorên radîkal, berevajîkirinê û mayînde li ser civakê çêdike. Fikir û şêwazê mirov

ê jiyanê diguherîne, hemû îradeya civakan a xweparastinê felc dike.

Çand tê maneya xusûsiyeta sereke ya hebûna civakî. Hemû hilberîn û berhevkariya maddî û manewî ya mirovan, têgîna çandê pêk tîne. Di rastiya xwe de çand û civak têgînên hemwate-wekhev in. Her nirxekî çandî yê ku civakê hilberandibe, tê wateya diyardeya çandî. Pergalên desthilatdar jî, ji destpêkê ve bi dijberiya civakê ango dijberiya çandê hebûna xwe domandine. Ji bo vê jî, li gorî tiwaneyên xwe, hemû cûrên maddî û manewî yên diyardeyan berevajî kirine û nirxên çandî yên civakê bi kar anîne.

Wek tê zanîn, bi vê mebestê, ji serdema Sûmeriyan ve, rêbaza herî bingehîn a çewisandin û tepeserkirina mirovan û berevajîkirina zihniyeta civakî, bi operasyonên pêşxistina zihniyeta desthilatdariyê dane destpêkirin. Sazûmanî yan jî mekanîzmaya çêkirina zihniyetê ya li Zîgûratan hatî avakirin jî, protîpa dewletê bû ku ev binyata zihniyeta hemû sazûmaniyên desthilatdar e. Vê jî bi endustriyalîzekirina çandê, yanî bi kirina objeya desthilatdariyê pêk tînin. Di vê wateyê de, Sûmerî şaneya kok a hemû pergalên yekdestdar in. Yên vê zihniyetê pêk tînin, di serî de yekdestdarên desthilatdar in ku bûne pispor di mijara tepeserkirina zihniyeta civakan û beravajîkirina awayên jiyanê de.

Mînaka Gramscî hem ji bo dana diyarkirina armanca bingehîn a emperyalîzma çandî, hem jî ji bo dana diyarkirina hêza berxwedana çandî ya civaka dîrokî, heya bibêjî balkêş e. Dozgerê dadgeha ku Gramscî dadgeh dike dibêje: “Divê em bîst salan bikaranîna vî mejî rawestînin.” “Gramscî di zindanê de 30 defter, 3000 rûpel nivîs nîvîsî û li pey xwe berhem hiştin. Wek yek ji

rewşenbîrên bi nav û deng û giring ê di dîrokê de naskirî, gelek tişt bi cîhana me ya xewn û xeyalan dan qezenckirin. Gramscî digot: “Mirov encam zihniyet e(8) ”.

Hewldana ku Gramscî beramber îddîaya dozgerê dozê dike, di wateyek rast de wî dike fîlozof. Gotina wî ya “Mirov encam zihniyet e”, helwesta esasî ya berxwedana çandî ya li dijî sazûmaniya dewletperestiyê radixe ber çavan. Helwesta aqailmendan a roja me ya îroyîn jî li ser vî esasî ye. Ji ber ku Gramscî îspat kir ku rêya bingehîn a berxwedan û veguherîna civakî, di zihniyetê re derbas dibe.

Lêgerîn û famkirina hêza Rêber APO, hem di zihniyet, hem jî di vê bedena ku (avaniya civakî) li gorî zihniyetê ava kirî de mimkun e. Ji ber ku Rêber APO zihniyet û beden di nav yekparebûneke giştî de girtiye dest û têgîna şaristaniya navendî û şaristainya demokratîk bi awayekî giştî li ser bingehê zihniyet û bedenê pênase kiriye. Û paşê ji vir rabûye dîroka civakî li ser bingehê şêwazê şîrovekirina xwe ya nû ya sosyolojîk nirxandiye.

Di roja me ya îro de, hîn bêhtir zelal û eşkere bûye ku di serî de çavkaniya zihniyeta bi şaristaniya yekdestdar re pêş ketî û koka destpêkê ya hemû qirkirinan, sazûmaniya dewleta Sûmer e. Divê mirov qirkirina çandî eynî wekî pevvegirêdana xetek a pêşketina şaristaniya yekdestdar, wekî kevneşopiyek a vê pergalê bigire dest. Ji bo têgihiştina mijarê, bi taybetî di vê çarçoveyê de nirxandina diyardeya çandê pir giring e.

Şaristaniya yekdestdar heta ku karîbû çanda exlaqî û polîtîk a civaka neolîtîkê îstismar kir, di asta ku karî de jê sûd wergirt û çanda din a civakî ya mayî jî di qirkirinê re derbas kir. Destana Gilgamêş a ku di nav destanên Sûmeran de cih girtî, mînaka

yekem a darijandin û vegotina vê pratîkê ye. Ev destan, vegotina jenosîda yekemîn e. Di vî alî de, çanda exlaqî û polîtîk a civaka neolîtîkê di hundirê xwe de tê berevajîkirin û dibe obje ji sazûmaniyên dewlet û desthilatdariyê re. Lewma ya derketî holê û kifş bûyî, pratîka talan, xesp û dekûdolaban a sazûmaniya desthilatdar û dewletê ye. Bi kurtasî, ev pratîka talan û xespê mînakeke ji qirkirina çandê. Bi rastî jî, ji vê sazûmaniya ku li ser qirkirina çandî hatî avakirin re, di wateyek rast de, mirov ne dikare bibêje civak ne jî dikare bibêje çand. Pergaleke dewletperest dikare bibe sazûmaniyek zordariyê, tepeserkirin, hikumraniyê, desthilatdarî û kedxwariyê, lê nikare bibe awayekî civak û çandê. Tişta qewimî ne têkoşînek çandî yan jî şer e. Ev sazûmaniya mêrperest-hiyerarşîk e ku li ser bingeha xanedanî û zihniyeta analîtîk derketî holê, bi zordariyê, tund û tûjiyê, sextekarî, komplo û bêbextiyan xwe li ser malbatê, klanê, qebîleyê, êl û eşîretê û bi awayekî giştî xwe li ser civaka etnîkî ferz dike. Ya li vir tê bi rê ve birin, ne têkoşîneke çandî ye. Xweferzkirinek a desthilatdariya ku koka wê bi derew û zordariyê hatî avakirin e. Ji ber vê yekê, dema mijar dibe çanda civakî, di vê qadê de behsa ti alîkariyek a şaristaniya yekdestdar nayê kirin. Lê heke were pirsîn, ka çand çawa di qirkirinê re hatiye derbaskirin, çawa hatiye îstismarkirin, çawa ji cewherê xwe hatiye dûrxistin û valakirin û çawa sazûmaniyek a desthilatdariyê li ser wê hatiye avakirin, wê demê wê pêwîst bike ku ev derew û pratîka darê zorê ya şaristaniya yekdestdar were famkirin. Lewma, ji ber van sedeman hemûyan divê şaristaniya yekdestdar wekî şaristaniyeke dij-çandî were pênasekirin. Pratîka ew ketiyê jî divê wekî dij-şoreşeke li hemberî çanda civakî were pênasekirin. Ji ber vê yekê, serdema dîrokî ya ku bi pergala dewletperestiyê vebûyî, serdemek a qirkirina çandê ye. Bingehê têkiliya ku Gilgamêş bi

Enkîdo re ketiyê, bûye nimûneya yekem a koçkirina komên etnîkî ji cih û warên wan û kolekirina wan a li bajaran û qirkirina çandî. Mirovên ku bi kolekirinê vekişandîn bajaran, hem ji nirxên xwe yên civakî û hem jî ji cih û warên xwe bûn. Ev modêl wê paşê bi hegemonîbûna şaristanya yekdestdar re pêl bi pêl belavî cîhanê bibe. Desthilatdariya hegemonîk a Babîl û Asûriyan û bi taybet jî ya Akadiyan, wê bi kolekirinên vê zihniyetê derkevin ser dika dîrokê û wê bi gelek qirkirin û komkujiyan sazûmaniya kolekirinê bi rê ve bibin. Desthilatdariya Asûriyan a ku bi metihdanê behsa "Çêkirina qesran ji serê mirovan dikir", bingehê pêkanîna vê qirkirina nîjadî û çandî ye. Bi heman awayî, Şaristaniya Yûnan jî wê li meskenê xwe vê pratîkê beramberî her kesê ku ne ji qewmê wan ba ku wekî "barbar" bi nav dikirin, pêk anîba. Û dîsan ê li ser vê şopê bi rê ketî, Îskenderê Makedonî jî bi çanda Helenîzmê ev tevgera qirkirina çandê hîn berfirehtir kir. Helenîzmê bi dû rehendan ev kar pêk aniye. Rehenda yekem a zehmet e, ku Îskender bi şûrê xwe girêka Gordion parçe kir. A duyem jî emperyalîzma çandî ye. Bi awayê, navlêkirina medeniyet-şaristanî birina nav ên ku jê re digotin "barbar", dibe argomana bingehîn a rewakirina qirkirina çandî. Û ev nêzîkatî di serdema destpêka ya xweberhevkirina kapîtalîzmê, bi vedîtinên cografî û vedîtinên parzemînan re gihişt rehendên hêj mezintir. Rêya mêtingeriyê ya van parzemînan bi qirkirina çandî vedibe. Bi taybetî jî ew mîsyonerên bi armanca belavkirina Xiristiyantiyê dişandin van qadan, hemû kevneşopiya jiyanê û çanda van gelan têk dibirin û li gorî xwe teşe didanê. Bi vî awayî, talankirin û destdanîna ser nirxên maddî û manewî yê wan civakên ku ji çanda xwe qut bûyîn, pêkan dibû. Hemû ev şêwazê hovane û dij-mirovî yê kolekirin û mêtingeriyê, bi navê "medeniyet-şaristanî birina nav barbaran" pêk dianîn. Heman gotinê îro jî DYA ji bo

rewakirina dagirkeriya xwe ya li Rojhilata Navîn bi lêv dike. Û slogana roja me ya îro jî “Birina demokrasiyê” ye. Navenda sereke ya hemû ev polîtîkayên qirkirina çandî lê tê hilberandin û rewakirin û li qada civakî belav dike, endustriya çandî ya DYA’yê ye. Li vir, bi taybet divê mirov behsa Hollywoodê bike. Dîsan heke mirov mînakekê ji Ewrûpa bide, ew wê Fransa-Parîs be. Parîsa ku jê re “Keleha moderníte û romantîzmê” tê gotin, wekî modêlekê pêşkêşî mirovahiyê tê kirin. Lê em Kurd baş dizanin ku Parîs di rastiya xwe de bajarê sûîkast û qirkirinê ye.

Di roja me ya îro de, kapîtalîzmê mîna axtapotekî-heştpêyekî, hemû cîhan serpêç û dorpêç kiriye. Di vê qonaxê de, li gorî rewşa nû polîtîkayên desthilatdariyê, stratejî û taktîkên pergala hegemonîk a kapîtalîst hatine guhertin. Têgihiştina dewlet-neteweyê ya hişk, cihê xwe ji sazûmaniya desthilatdar post-lîberalîzmê re hiştiye. Di koka bingehîn a sazûmaniya desthilatdar a nû de jî, rejîma qirkirina çandî û mêtingeriya çandî heye. Ji ber ku desthilatdarî dixwaze têkeve nav hemû genetîka civakê, lewma baş dizane rêya vê jî di çandê re derbas dibe. Ev nîzam, sazûmaniya desthilatdariyê ya ku em jê re dibêjin endustriya çandê, ya ku Foutcault jê re dibêje biyo-desthilatdarî, bingeha mekanîka desthilatdariyê pêk tîne. Biyo-desthilatdarî wekî ku ji navê wê jî xuya dibe, xwe li ser giyandariya mirovan bi rê ve dibe. Wekî vîrûsekê ku ketibe bedenê, bi belavbûnê dikeve hetanî koka demarên mirovan û hemû organ û fonsiyonan kontrol dike. Biyo-polîtîka ya ku li ser vî esasî derdikeve holê, xwe li ser bi destxweveanîn û kontrolkirina bedanan û li ser bingehê ji nû ve avakirinê, pêk tîne. Bi taybet aborî (xurek-xwarin), zayendî-cinsîtî, polîtîkaya nifûsê û çand, hedefên sereke yên vê teknîka nû ya desthilatdariyê ne. Kapîtalîzm, di sazûmaniya xwe

ya qezenca zêde de, bi qirkirina çandî, bedena mirov û civakê ji nû ve li gorî xwe ava dike. Kapîtalîzma gerdûnî, tê wateya biyo-desthilatdariya gerdûnî. Ev jî tê wateya gerdûnîbûna mêtingeriyê, desthilatdariyê û qirkirina çandî. Îro teknolojiya desthilatdariyê ya ku mirov pêre rû bi rû bûyî, hema hema bibêje wekî xwîna di demarên mirov de diherike, ji mirovahiyê re hatî çêkirin, hemû genetîka mirov dîl girtiye.

Wek tê zanîn kapîtalîzma di roja me ya îroyîn de, ji kedxwariya ku li ser bingehê zor û tund û tûjiya hovane tê meşandin zêdetir, xwe bi endustriya çandê li ser piyan digire. Çand hema hema bûye wekî metal-heyberekê, ruh, zihn, îrade, beden û zemanê mirov kirine wekî heyberekê. Hemû nirxên maddî û manewî yên ku behsa dîrok û civakê dikin, bi rêbazên cûrbicûr ji hev dûr xistine û kirine wekî metayan. Rejîmek a qirkirina civakê ya ji vê kûrtir hê nahatiye dîtin.

Têkoşînek li dijî vê were dayîn, divê têkoşînek wisa be ku karibe teknolojiya vê desthilatdariyê derbas bike. Antonio Gramscî bi giringîdana çandê dihat naskirin û heta astekê nêrînên wî ji nêrîna netewperest a teng û çînîtiyê cuda bû, digot: “Çand ji bikaranîna yekdestdariya dewletê ya li ser bingehê zordariyê bi bandortir e.” Ji ber vê yekê têgînên çandê û endustriyê gihandine hev û kirine yek. Lê tevî vê jî, fikrên wî ji asta negatîf a rexneyê derbas nebûne.

Lewma ji bo bidestxistina çandê, rêya bingehîn a têkoşîna li dijî desthilatdariyê bi ji nû ve zindîkirina diyardeya çandê mimkun e. Desthilatdarî li cihê ku civakbûn û çanda civakî parçe bibe, belawela bibe derdikeve holê. Mifteya têkoşîna li dijî desthilatdariyê; ji nû ve avakirina civakîbûnê û çanda komînal-

demokratîk e ku cewhera xwezaya civakê ye. Çawa ku desthilatdarî bi derz an jî qulikên ku di nav civakê de çêbûyîn diherike nav bedenê û li wir xwe zêde dike, di vê rewşê de ji nû ve civakîbûn nêzîkatiya herî bingehîn e ji bo girtina derzan-qulikan. Rêya vê jî di têgîna çandê re derbas dibe. Ji bo vê jî, divê têgîna çandê li gorî xwezaya mirovî û li derveyî şîroveyên şaristaniyê were pênasekirin, li ser bingehê cudabûna wê ji sazûmaniya desthilatdariya dewletê.

Rêber APO, çand bi wateyên teng û fireh pênase kiriye. Di wateya fireh de;

“Em dikarin pênaseyeke giştî ya çandê, wekî tevahiya hemû manedan û avahiyên civaka mirovahiyê di pêvajoya dîrokî de afirandine, bidin naskirin. Em avahiyên pêk hatine, wekî tevahiya saziyên ji veguherînê re vekirîne bidin naskirin û manedanan jî dikarin wekî asta naverok an jî manedanê ya bi hev re ya saziyên vediguherin ên dewlemend û cûrbicûr bidin naskirin. Heke em pênaseyê bi teşbîheke xurttir bidin naskirin, mirov dikare avabûnê wekî çarçoveyek berbiçav a maddî, wateyê jî wekî qanûna wê ya bi fikir, bi hîs, naveroka berbiçav a çarçoveyê û ya wê dilivîne diyar bike. Li vir, em dikarin bibêjin em nêzî têgînên Hegel ên ‘xweza’ û ‘geist’ ê  bûne. Bi taybetî mirov dikare bibêje maneya Hegel 200 sal berê li van têgînan bar kirî û naveroka danasîna wî ya van têgînan, bi pêşketinên zanistî yên piştre dewlemendtir bûye(9) ”.

Em ê di warê watedanê de mijara xwe bi pênaseya teng a Rêber APO ya li ser çandê li vir bidomînin;

“Di warê watedanê de, pênaseya teng a çandê jî gelek caran tê bikaranîn. Di vir de zêdetir hewl tê dayîn ku çand wekî

wate, naverok, zagon û giyandariya avahiyê bê destnîşankirin. Dema mijar dibe civak, em çandê di wateya teng de wekî cîhana maneyê ya civakê, zagona wê ya exlaq, zihniyet, hûner û zanista wê pênase dikin. Di vê çarçoveya teng de, saziyên polîtîk, ekonomîk û civakî têne yekkirin û di çarçoveyeke fireh de danasîna giştî ya çandê çêdibe. Ango li ser vî bingehî, wekî naverok û sazî maneya xwe hebe, mirov dikare wekî hebûn behsa civakê bi xwe bike. Heke mirov tenê behsa civaka bi sazî yan jî tenê behsa ya manedanê bike, têra xwe mirov wê bixape. Civakek taybet encex têra xwe gihiştibe asta sazîbûn û manedanê, dikare wekî hebûn bibe xwedî nasname û bê binavkirin. Bi tenê behsa civaka manedan an jî sazîbûnê were kirin û di nava civakên bi vî rengî de fikirîna li jiyaneke mirovane, çawa di tevahiya civakên dîrokê de hatiye gotin, wê wekî şaşî, jirêderketin, bêexlaqî û kirêtî were qebûlkirin û mehkûmkirin ”.(10)

Rêber Apo, bi çavekî giştî li çandê mêze dike. Zihniyet û sazîbûnê bi tevahî di nav çandê de pênase dike. Ji ber ku saziyên civakê, afrêneriyên wê yên di cîhana maddî de û pêkhateyên çandê bi lêv dikin. Bi ciyewazbûna mirov ji xwezayê, wekî xwezaya duyemîn, hemû nirx û berhevkirinên maddî û manewî yên ku mirov li derdora civakîbûnê diafirîne, çand dihewîne nava xwe. Di vî warî de, cîhana zihniyet û pêkhateyên maddî hevdû temam dikin.

Ji ber vê sedemê, Rêber APO çandê wekî “Xwezaya Duyemîn” pênase dike. Lewma hemû geşedan û pêşketinên maddî û manewî, berhemê xwezaya duyemîn in. Di vî warî de, mirov û civaka mirovahiyê ji xwezaya yekem derketiye û cuda

bûye, veguheriye û wekî xwezaya duyem hatiye pênasekirin û nasandin.

Ji ber vê yekê, heke xwezaya yekem cîhana biyolojîk temsîl bike, xwezaya duyem jî cîhana çandî temsîl dike. Lewma xwezaya yekem, xwezaya ku zindiyan pêk tîne- diafirîne û xwezaya ku jiyana civakî pêş dixîne jî cîhana wê ya çandî ye. Çawa ku gerdûn û xweza tineba, me nikarî behsa zindiyan bikin, her wisa cîhana çandî ya ku wekî xwezaya duyem tê pênasekirin jî tineba, me nedikarî em behsa mirov û jiyana mirov bikin.

Taybetiya sereke ya xwezaya duyemîn ev e; wekî civak xwerêxistinkirina mirovan e û xwezaya xwe derxistina holê ye. Derketina holê ya xwezaya mirov, bes bi hebûnên li ser xwezayê pêk nayê; mirov hebûna xwe bi tevlîkirin an jî lêzêdekirina tiştên ku ayîdî wî ne temîn dike. Ango li gorî şêwazê xwe yê jiyanê, xwezayê di guherîn û veguherînê re derbas dike. Bi aliyê xwe, mirov wekî hebûneke çandî yê ku dikare xwezayê ava bike û biguhere hat naskirin.

Ji ber vê yekê, çanda civakî tê maneya ku mirov bi çalakî û rastiya xwe, xwe diafirîne û hebûna xwe pêk tîne. Xwezaya duyemîn jî ev e. Çandinî jî, sewalkarî û pîşekarî jî, hemû îcad û objeyên maddî di xwezaya duyem de ne. Lê çînayetiya di nava civakê de jî, parçeyek ji xwezaya duyemîn e. Dabeşbûna civakê bi awayê çînan, xwe wekî desthilatdarî-dewlet birêxistinkirina çîna jor jî di xwezaya duyemîn de ye. Em dikarin van pêşketinan hemûyan wekî Xwezaya Duyemîn binasînin.

Lewra, dema em civaka çandî didin naskirin, em behsa xwezaya duyemîn dikin ango em behsa hemû tiştên ku mirovan hilberandine û afirandine dikin. Ji ber vê yekê, xwezaya duyem

hebûneke ku gerdûna maddî û fîzîkî derbas dike. Yanî xwediyê xusûsiyeta metafîzîkê ye. Zihniyeta ramanê ya mirov, avahiya hiş-hest û tiwaneya teşedan û avakirina xwezayê ya mirov, çavkaniya xwe ji vê diyardeya metafîzîkê digire. Ji ber vê yekê hemû têgînên têkildarî civak û çandê xwedî karektereke metafîzîkî ne.

Wekî navlêkirin jî peyva "çand" ji lêkera latînî "colere" hatiye wergirtin. Colere tê wateya; xebitîn, gihandin, sererastkirin, selihandin, avakirin, lênêrîn, pûte pêdan, çandin û çinîn, hînkirin û hwd.

Cara yekem ev peyva "Cultura" ya ji vê lêkerê hatî darişţin, Romaniyan ji bo danasîna xebatên çandiniyê bi kar anîne. Ji bo ku nebatê jixweber di xwezayê de çêdibin û yên ku bi destê mirovan tên çandin ji hev cuda bikin, bi kar anîne. Romaniyan ji "bikaranîna axê re" gotina "agrî-cultura" bi kar anîne.

Ango mirov bi destê xwe axê vedikole-cot dike û bi lênêrîn û guhdarkirinê encam digire. Çareserkirina pirsgirêka xwarina ji bo debara jiyana mirovan pêwîst, bi pûtedana bi axê û berhemdana çandiniyê çêdibe ku ev jî bingehê xwe ji şoreşa gundan digire. Di vî warî de, giring e ku axa ji bo çandiniyê pûte pê hatî dayîn, bi têgîna kok a civakîbûnê re bi wate bibe. Di vê wateyê de xuya dibe ku peyva çand bi axê, çandiniyê û civakê re hevgihandineke hebûnî pêk tîne. Xebitîna bi axê, pûtedana wê ji bo çandiniyê, di nav de çandina berheman û çinîna wê, ev hemû tê wateya çandê. Bi vî aliyê xwe ve, çandina axê, bikaranîna wê, bi dest xwe ve anîna berhemên wê, di heman demê de bûye rêxweşker ku civak jî wekî berhemekê derkeve holê.

Wateya peyva “culture-kultûr” di Kurdî de “çand” e. Ew jî tê heman wateyê. Bi axê ve girêdayî ye û tê wateya çinîn û hilberandina berheman. Di vî warî de, pir vekirî tê dîtin ku çand bi jiyana neolîtîk û jiyana niştecihbûnê ve girêdayiye. Bi derbasbûna civakê ber bi jiyana niştecihbûnê ve û bi destê jinê kedîkirina sewalan û pûtedana bi axê, bi qasî şoreşekê giring e. Û yekem cihê pêşketina vê çalakiyê jî Mezopotamya Jorîn e. Ango B.Z. di salên 12 hezaran de, li gorî pêwîstiyên civakî sererastkirina xwezayê û yekem şaneya kok a têgîna çandê, li Mezopotamyaya Jorîn hatiye destpêkirin û bi lêkolînên arkeolojiyê jî ev zelal bûye ku ji vê qonaxa dîrokî re hatiye gotin şoreşa çandinî û gundan a neolîtîkê. Wateya têgîna çandê bi pêvajoya neolîtîkê re çêbûye. Lê wekî têgîn tê dîtin ku “culture-kultûr” di serdema Greko-Romen de derketiye holê.

Tê zanîn ku cara pêşî fîlozofê Romayî Cicero û helbestvan Horatîus, têgîna çandê di wateya; “hilberandin, çinîn û hînkariya mirov” de bi kar anîne. Peyva ku Cicero wekî ‘cultura animi’ bi kar tîne, tê maneya perwerdekirina nefsa mirov. Peyva çand îro jî di heman wateyê de ji bo mirovakî ku zanîna pêwîst bi dest xistî, xwedî sekin, biaqil, li gorî hin prensîbên xuyayî tevdigere, hakimê nefsa xwe û bi şexsiyet tê bikaranîn(11) ”.

Fîlozof Cicero ku di heman demê de siyasetmedar û helbestvan jî bû, têgîna çandê bi gihandina rehenda civakî pênase kir. Li gorî wî, giyanê mirovan jî mîna axê kovî û bêhiliberîn e. Ji bo vê jî, pêwîst e ruh û aqilê mirovan were terbiyekirin. Dibêje: “Çawa ku ax bi perwerdeyê tê terbiyekirin û berhem dide, divê ruhê mirovan jî bi perwerdehiyê were terbiyekirin, ji bo ku berhem bide.” Û bi vî awayî Cicero têgîna

çandê ji çandiniyê derdixe û ber bi qada mirov û civakê ve dibe rewşek nû.

Mirov dibîne ku peyva “çand” B.Z. ji sedsala 1‘ê heta sedsala 18’ê ku bi Cicero dest pê dike, bi wateya “çanda yekane” hatiye bikaranîn.

Têkildarî giringiya ku felsefeya rewşenbîriyê di sedsala 18’an de dayî "hiş-aqil"; kesên ku zanîna pêwîst bi dest xistine, li gorî prensîbên hiş jiyan kirine, kirinên xwe di wê çarçoveyê de pêk anîne û li ser nefsa xwe hakim bûne û bûne xwedî şexsiyet, wekî “rewşenbîr-entelektuel” hatine binavkirin. “Entelektuel” di Latînî de tê wateya peyva “intellektus”. Ev peyv tê wateya têgihiştin, tiwaneya têgihiştinê. Ango tê wateya bi awayekî rast û durist bikaranîna hiş.

Ji sedsala 18’an ve, bi pêşketina zanistên wekî arkeolojî, etnolojî û etîmolojiyê, pevya çand êdî ne di wateya ‘yekane’de, êdî peyva çand di wateya neteweyekê, grûbekê, refekê yan jî gel-miletekî de hat bikaranîn. Ji vê qonaxê û pêde çand êdî wekî pênaseyeke ku hemû berhemên rewşenbîrî, hûnerî, felsefî, zanistî û teknîkî yên ku yekbûna hest, raman û nirxên civakekê di nava xwe de dihewîne, hatiye pênasekirin û destgirtin. Divê çand di serûvena dîrokî ya mirovahiyê de wekî awayê raman û jiyanê were pênasekirin, ku ji dema mirovan xwe wekî hebûneke civakî pêk anî û ava kirî ve hatiye destpêkirin.

Me dabû xuyakirin ku Rêber APO çandê di wateya teng de wekî awayê têgihiştina mirovan, watedan û şêwazê fikirandinê pênase dike. Ji ber vê yekê çi qas têgihiştin, nirxandin û watdedayîn hebe, dikevin qada çandê.

Mirov wate û maneya xwe li ser bingehên civakî yên wekî; klan, qebîle, eşîret, qewm û neteweyê, zihniyeta xwe jî li ser bingehê bawerî, ol, ziman, felsefe, zanist, hûner, edebiyat, dîrok û tiştên wekî exlaq pêk tîne û dibe xwedî nasname. Û çand jî xwe li ser van têgînan bi gewde û bilêv dike. Ew gotina di nava gel de bi gelemperî tê bikaranîn a ku dibêje: “Ji bo naskirina neteweyekê, komekê û kesekî; pêwîst e çanda wan were naskirin,” di vê wateyê de hatiye bikaranîn.

Ev têgînane hemû aliyek ê mirov û civakê tînin ziman. Nêzîkatî û taybetiya her ferdekî cuda ye. Bêyî van, naskirina mirovekî, grûbekê ne mimkun e. Ji ber vê yekê, hemû taybetiyên giyanî yên em jê re dibêjin şêwazê hizirînê, xwedî karektera metafîzîkê ne. Watedan, têgihiştin û manedan girêdayî karekterê metafîzîkê ye. Ji ber vê yekê, çanda maddî ya mirovî di bin teşedana metafîzîkê yan jî çanda manewî de pêş ketî, teşe digire. Ji ber ku mirov bi şêwazê xwe yê hizirandinê û bi destê xwe pêk tîne.

Wê demê em dikarin her yek ji taybetiyên gel an jî neteweyekê yên wekî ziman, ol, efsane, aborî, teknoljî, zanist, felsefe û hwd. wekî derbirîna çandekê bihesibînin û bigirin dest. Çand xwe li ser şekildana van qadan ava dike.

Di heman demê de çand diyardeyeke dîrokî ye. Berê xwe dide xwezayê, di çarçoveya hedef û armancên xwe de xwezayê diguherîne, ava dike û formeke nû didiyê.

Di encama lêkolînên arkeolojîk ên erdkolînê yên ku piştî şoreşa Fransî pêş ketîn de, bi awayek berfireh nirxandinên li ser çand û xwezaya mirov jî hatin destpêkirin. Ji ber ku nêzîkatiyên heta wê demê dihatin kirin, nêzîkatiya projeyên li ser maseyan û

destwerdana civakan bi mantiqê kolonyalîstî bû. Lê ji ber ku mirov û civak xwezayek pir cihê ne, bi vê mijarê ve girêdayî gelek proje bê encam mane. Ji ber ku cilûbergên li ser maseyan dihatin pêşxistin, li wê civakê nehatine û hatine redkirin. Bi demê re, bi saya arkeolojiyê hatiye famkirin ku mirov hebûnek cuda ye. Ji ber vê yekê, lêkolînên endazyariya civakî yên ji derve li ser civakê hatine ferzkirin, berde feydedana van lêkolînan li civakê, bûne sedem ku çanda civakî bikeve nav lepên kolonyalîzmê.

Wek tê dîtin, çarçoveya pênase yan jî danasîna çandê bi demê re bi nîqaş û nirxandinan berfireh bûye. Di sedsalên 18 û 19’an de nîqaşên sext û dijwar li ser çandê çêbûne. Di warê maddî û manewî de çand bi du beşan hatiye destgirtin. Hinek fîlozofan pênaseya zanîn û perwerdehiya mirov ji danasîna çandê derxistine. Çnad wekî şaxek xweser û serbixwe girtine dest û pênaseyên hatîn kirin derbasî qonaxek nû kirine.

Li gorî hiqûqnasê Alman Samûel Von Pufendort ku di salên 1600’î de jiyaye, çand wekî hemû karên mirovan ên li dijî xwezayê, di çarçoveyek diyar a civakî de derketî holê pênase kiriye.

Dîsan di salên 1800’î de, fîlozofê Almanî Herdel di derbarê çandê de danasînên berfireh pêş xistine. Li gorî Herdel çand mîna şêwazê jiyana neteweyê û gelekî pêş dikeve, ji ber vê yekê jî daye diyarkirin ku her çand bi awayekî cuda teşe digire, pêş dikeve û heman çand çênabe. Her wiha Herdel daye diyarkirin ku hemû tiştên maddî û manewî yên bi çandê ve girêdayî, dikevin çarçoveya çandê û dîsan daxwaz kiriye ku wekî qadeke serbixwe hebûna xwe bidomîne. Herdel bi vê fikra xwe bandor li hemû

fîlozofên piştî xwe kiriye ku di derbarê çandê de nîqaşên nû pêş bixin.

Fîlozofê Alman Nietzsche jî mîna Herdel hiziriye û daye diyarkirin ku çand xwedî xwezayek organîk e.

Hegel, herçend e diyalektîka madde û giyanî pêşxistibe jî, zihniyetê ango giyanê dide pêş û nêrînek manewî di derbarê çandê de derdixe holê û li ser mijarê mêzekirinek hîn felsefîktir pêşxistiye. Ji ber vê yekê, Hegel danasînek felsefîk ji têgîna xweza û ruh-giyanê re pêşxistiye. Mebesta Hegel ji têgîna ruh zanîn e. Ji ber vê yekê dide xuyakirin ku ruhek ê xwezayê jî heye, zihn an jî zanîn ji berê de hebûn, ji bo ev zihn xwe pêk bîne-pêş bixe, avakirina xwezayê pêk aniye. Lewma bi dana pêş a vê nêrîna xwe ya 'divê ev zihn xwe pêk bîne-pêş bixe,' formûla dewletneteweyê pêş dixe, Napolyon jî bi têgîna xweda bedena wî ruhê li ser rûyê dinyayê dimeşe, ev qonax bi vê nêrînê gihandiye hev.

Dîsan pêvajoya nîqaş û guftûgoya Herdel ê xwedî pênaseyên bi hêz ên çandê ya bi Hegel re tê zanîn. Dema Hegel aliyeke manewî-rûhî bi çandê dida qezenckirin, Herdel çand wekî yekparebûneke giştî ya maddî û manewî-rûhî girtiye dest û pêşinyaz kiriye ku xweser bimîne. Ev nêrîn ji bo pêvajoya xwejinûve avakirinê ya civaka Alman bû bingeh ku bi gelek prensîban pergaleke nû ya siyasî pêş bixe. Hegel jî helwest girt ku bi pergala dewletneteweyê, neteweya Alman hev bigire û nêrînên xwe yên felsefîk li Almanyayê serdest kirin.

Li hêla din Marks çand wekî saziyek a vesaziyê ya li jor girtiye dest. Li gorî Marks çand wekî zihniyetê avahiyek bilind a vesaziyê ye. Li  gorî wî, çand ew tiştên maddî yên ku dîrok afirandîne, ango binesaziya aboriyê ye. Ji ber vê yekê têgihiştina

marksîst a li ser çandê wekî her tiştê mirov afirandî, li dijî afrêneriya xwezayê tê îfadekirin.

Rêber APO wekî ku me li jor jî bi berfirehî dayî diyarkirin, dibêje: “Em dikarin bi pênaseyek giştî çandê wekî tevahî avahî û wateyên ku civaka mirovahiyê di pêvajoya dîrokî de afirandî, bidin naskirin.” Heke em bala xwe bidinê em ê bibînin ku Rêber APO ew peyvên ku Samuel Von Purfendort û Marks ên ‘li dijî xwezayê’ yan jî ‘dijber’, bi kar neanîne. Ji ber ku paradîgmaya Rêber APO avakirina civakek ekolojîk e.

Ji ber vê yekê, Rêber APO bi awayek giştî li çandê dinêre û li ser vî bingehî pênase dike. Rêber APO çandê li ser esasê dîroka civakî digire dest, afrênerî û wateyê di nav hev de pênase dike û çandê wekî bingehê xwezaya duyemîn dibîne. Rêber APO bi çavekî giştî tevî zihniyetê li sazîbûnê (bi gewdebûnê-bedenê) dinêre û digire dest. Sazîbûnê, di çarçoveya çandê de pênase dike û wê wekî amûr û şêweyê guherîn û veguherînê dinasîne. Wekî mînak, heke em avakirinê bigirin dest, saziyek wekî avahiya çandê tê pênasekirin, watedariya wê jî; şêweyê xebitîna vê saziyê, teşeyê wê yê jiyanê, şêwazê wê yê jiyanê, ruhê wê, zihniyeta wê û bi giştî naveroka wê ye. Heke ev mînak were giştîkirin, mirov dikare çanda gelekî, civakekê; wekî şêwazê wan ê jiyanê, ruhê wan, awayê wan ê hevkarî-piştgiriyê, şêwazê wan ê beşdarbûnê, awayê wan ê hilberîn û mezaxtinê û ji awayên wan ên hevnêzîkbûn û têkiliyan bigire heta hezkirina wan a ji bo cih û warê wan, cografyaya wan, zimanê wan û gelê wan ku di nava xwe de digire.

Di çandê de aliyê bingehîn çanda manewî (ruhî-giyanî) ye. Di rastiyê de mirov dikare ji vê re bibêje çanda îdeolojîk jî. Bi qasî

hemû aliyên fikrî û manewî yên ku em dizanin, avahî û îcadên maddî jî dikevin çarçoveya çanda îdeolojîk. Zanist, hûner, zihniyet, exlaq, evane hemû rasterast bi çanda bîrdozî ve girêdayî ne.

Lê bi heman awayî bi gewdebûna vê çanda îdolojîk jî heye. Çanda îdeolojîk û maddî (bi gewdebûn) di rewşek giştî-tevahî de çêdibe û pêş dikeve. Di vê tevahîbûnê de, hemû avahî û berhemên ku çanda maddî derxistine holê, dikevin çarçoveya çandê. Ango wate bi gewde dibe, dibe avahî û hevsengiyek di navbera herduyan de çêdibe. Di warê dîrokî de, ev pêvajo heta derketina şaristaniyê zêde rastî ti probleman nayê. Ji ber ku di navbera zekaya analîtîk û zekaya hestyarî de hevsengiyek hebû û vê hevsengiyê şoreşa civakî pêşxistiye û rê ji yekparebûna zihniyet û sazîbûnê re vekiriye.

Divê were zanîn ku ji dema mirovê pêşî kevir hildayî destê xwe û heta roja me ya niha, wî xweza û jiyan li gorî hedef û armancên xwe guhertiye. Tê zanîn ku zemanekî bi qasî 2 milyon sal e ku kevir wekî amûrek ê parastin û têkiliyan tê bikaranîn. Kevir hişmendî-zihniyeta wê serdemê pêk tîne. Heke îro ruh, hest û jiyana wê serdemê heta astekê jî bê bi watekirin, di bingeha vê de guherîna kevirê ku afrêneriyek maddî ye, heye. Em nêzî wê zanînê bûne ku ev kevir bi çi zihniyetê bi kar anîne. Ji ber ku kevir çîroka zanistê, çandê, zihniyetê û jiyana civakî pêk tîne. Navê hemû serdeman li gorî awayê bikaranîna kevir hatine binavkirin. Civaka neolîtîkê jî bi wateya çaxa nû hatiye binavkirin. Ji ber vê yekê Rêber APO bes bi zihniyetê li bûyer û diyardeyan mêze nekiriye. Sazîbûn wekî bedena zihniyetê dîtiye. Nêrîna esasî ya Rêber APO, hevtemamkirina avahiyên maddî û cîhana zihniyetê ye, û bi şêwazekî giştî girtina dest bi şekil dibe.

Wek nimûne, gelo serdema Girê Mirazan (Xirabê Reş) ê ku dîroka wî digihêje B.Z. 12 hezar sal, an jî Til Xelef (B.Z. 5-6 hezar sal) çawa were şîrovekirin? Dane û şopên dîrokî yên têkildarî vê serdemê çi ne? Ji bo vê gewde-bedenek maddî yan jî bisazîbûn pêwîst e. Têkildarî mijarê wêne hene, şeklê kevirê di dest de guherî ye, sîmgeyên xweza û baweriyê hene, lewma çand û wateyê (zihniyetê) xwe di wan sazî û sîmgeyên maddî de fambar û kifş kirine. Derbirîna ku em jê re dibêjin karekterê metafîzîkê (exlaq, ol, hûnera edebiyatê, ziman, dîrok, bawerî, mîtolojî) pêş dikeve.

Di şaristaniyên navendî de, sazî û avahiyên dêwane yên pir mezin hene, lê di wan de manedan tine ye. Ji ber vê yekê, wateya di nav saziyên şaristaniyê de heyî, mijareke hêjayî vekolîn û lêpirsînê ye. Wateya van avahiyan di nava xwe de hilgirtîn çi ye? Rêber APO di vê mijarê de, piramîtên Misrê wekî nimûne destnîşan dike. Pîramîtên ku tên wateya tirbeyên Firewnan in, avahiyên mezin ên dêwane ne. Dîsan li Çînê bajarek bi navê bajarê miriyan an jî bajarê binerd heye, di hundirê wî de artêşek ji peykeran hatî çêkirin heye, dîsan di hundirê wî de avahiyên mezin ên dêwane jî hene. Lê divê were zanîn ku naveroka wî ji kelex-cesedên hatîn mûmyakirin pêk tê, ango bi piranî bê watebûn e.

“Bi nimûneyekê em ê karibin fikra xwe hîn baştir bidin diyarkirin. Pîramîtên Misrê avahiyên maddî yên mezin ên dêwane ne. Lê belê berdêla vê bêfonksiyontiyê û bêberpisyariyê, bi milyonan mirovên ku jiyana xwe ya bi wate û azadiya xwe jidestdayî ango çanda xwe ya îdeolojîk jidestdayî, ne. Şaristanî aha tiştek wisa ye. Dikare avahiyên mezin ên hûtane çêbike, dîsan dikare perestgehan, bajaran, kelehan, piran, zevî-

kêlgehan, embaran û heta dikare bi berheman mezinbûna xwe bide pêşandan. Civakên wiha di şaristaniyan de mimkun in. Lê di heman civakê de, dema li fonksiyon yanî li nirxê çanda îdeolojîk bê gerandin, tişta ku bê pêşberî mirov an wê jidestdana nirxê wê be yan jî wê rewşek hatî berevajîkirin be. Hindikahiyek a mirovên ku ji civaka giştî qut bûyîn, hemû civak an xistine bin stemkarî, bêmerhametî û mêtingeriyek hovane, yan jî ew çanda wan a îdeolojîk dane qutkirin an jî çanda wan bi berevajîkirinê pêşkêşî wan kirine û civak ji nirxên wê yên çanda îdeolojîk a esîl bêpar û mehrûm kirine(12) ”.

Ji ber vê yekê, em dikarin wateyê, naverokê û çanda îdeolojîk bi fonksiyoneliyê pênase bikin. Fonksiyoneltî û avakirin-afrênerî, du qadên bingehîn ên hebûnê pêk tînin. Her heyîn xwedî avayiyekê (çêbûnekê) ye û fonksiyona vê avayiyê jî heye, dibe ku ew fonksiyon têk biçe, xirab bibe. Di vê derbarê de Rêber APO pêşan dide. Av xwediyê hin taybetiyên xuyayî ye, madeyek bê reng e, şil e, di hin şert û mercan de tim xwediyê heman van taybetiyan e. Di vê wateyê de, fonksiyonek diyar a avê heye, ev fonksiyona wê tê zanîn. Lê heke madeyeke biyanî têkeve nav avê, wek nimûne heke petrol têkeve nav avê, av wê têk biçe, xirab bibe û êdî av nikare fonksiyona xwe ya berê pêk bîne. Dîsan şil e-rûhn e, lê nikare fonksiyonên ku av pêk tîne êdî pêk bîne. Lewma divê mirov li ser guhertina wê ya di teşe de bisekine.

Beramberî desthilatdariya hegemonîk a yekdestdara çaxa pêşî, destpêkê Musewîtiyê, Xiristiyaniyê, Îslamê û gelek tevgerên wekhevî û edaletê, wekî tevgerên çandî yên manewî û civakî çêbûn û şer û têkoşînên bêeman dimeşandin. Lê paşê ketin bin hukumraniya desthilatdarî û dewletê, fonksiyona xwe ji dest dan û fonksiyona wan têk çû. Berevajî, bûn amûr ji awayên herî xirab

ên desthilatdariyê re. Heke em bi awayekî giştî di çarçoveya danasîna çandê de dîroka civakî bigirin dest, awayê desthilatdariyê yê hegemonîk tije ye ji sazî û avahiyên mezin ên dêwane. Lê di warê wateyê de, wekî nimûneya ava petrol rijiyayî navê û fonksiyona xwe jidestdayî ne. Heta hê rasttir mirov dikare bibêje, gelek sazî û binyatên mezin ên dêwane hene, lê ti wateya wan tine ye.

Beramberî vê, tevgerên demokratîk, wekhevîxwaz û komînal di warê wateyî û zihnî de xwedî cîhanên pir mezin in. Lê wekî tevgerên ne sazîbûyî, bê laş-bê gewde û polîtîk nebûyîn, hebûna xwe didomînin. Pirsgirêka herî bingehîn a van tevgeran ew e ku nikarin sazîbûnekê li gorî wateya xwe çêbikin .

Rêber APO di derbarê ve rewşê de gotina “tirsnak” bi kar aniye. Ji ber ku, heke em behsa du civakên cuda bes di warê wateyî û avahiyê de bikin, her du rewş jî tirsnak in. Ji ber ku di vê rewşê de ti şopa civakê nemaye. Civakek di rewşek wisa de bijî, civekek ji hemû cûrên îstismarê re vekiriye.

Pêwîst e çand di rehendeke dîrokî de jî were destgirtin. Mirov dikare çandê wekî hemû raboriya civakê jî pênase bike. Hemû afirandin û xuliqkariyên ku civakekê hilberandin, dikevin çarçoveya çandê. Dema ku mirov behsa çandê bike, mirov behsa zihniyeta wê civakê, behsa pergala wê ya hizrandinê, exlaqê wê, nirxên wê, hûner û zanista wê civakê dike ku ev hemû derbasî çarçoveya têgîna çandê dibin. A din ziman jî heye ku divê rastûrast bi çandê ve were girêdan. Ziman jî ji çandê cuda nabe. Ziman di wateya xwe ya teng de çand bi xwe ye. Mirov çi bijî-çawa bijî, zihniyeta mirov jî ew e. Ji ber ku zihniyet çandê û çand jî temsîla zihinyetê dike. Ziman jî, dema em di wateya teng de

wekî çand bigirin dest û bihesibînin, hêja ye ku mirov ziman wekî mifteya zihniyetê bide naskirin.

Ji ber vê yekê, Rêber APO bi nirxandina zihniyet û laş-gewde, dîroka gelê Kurd digire dest û dide diyarkirin ku Kurd civakeke rastî qirkirinê hatiye. Di warê danasînê de digihêje rastiya gelê ku zihniyeta wî parçebûyî û bisazîbûna wî çênebûyî.

Rêber APO dide diyarkirin ku gelê Kurd ji bo parastina hebûna xwe şer dike. Dide xuyakirin ku hebûna Kurdan di encama têkoşîna dijwar a 50 salan de hatiye îspatkrin, lê hê jî metirsiya tinebûnê heye. Sedema bingehîn a ku bi îsrar û domdarî li ser pirsgirêkên bisazîbûn û avakirinê disekine jî ev e. Dema ku Rêber APO dibêje, ‘bisazîbûna xwe bi hêz bikin’ mebesta wî pêwîstiya bihevrebûna giştî û kûrkirina çandê ye. Bihêzbûn û bêhêziya Paradîgmaya Neteweya Demokratîk, bi qasî wê manedarî û avaniya çandê ya ku pêk tîne ye.

Rêber APO di dema çêbûna şoreşa Rojava de jî xeteriya hebûna qirkirina li dijî gelê Kurd anîbû ziman. Jixwe cilda pêncemîn a parêznameya xwe li ser vî bingehî pêş dixe. Konsepta înkar û îmhakirinê ya di roja me ya îroyîn de jî vê nêzîkatiyê bi zêdahî ve piştrast dike.

Pirtûk û filmên ku şoreşa Cezayîrê wekî mijar girtîn dest, mewcûd in. Dema ku şoreşa Cezayîrê bi pêşengtiya Ehmed Bin Bella pêk hatî, texmîn dikirin ku azadî temam bûye û têkoşîn qediya. Çaxa şoreşa Cezayîrê pêk hatî, xuya bû ku çandek ayîdî Cezayîrê nemaye. Hat dîtin ku ji jiyanê bigire heta cil û berg, têkiliyên civakî, pêkhateyên çînî û ziman jî di bin bandora çanda Fransiziyan de mabû. Ya ku li ser sazî û têkiliyên civakî desthilat û serwer bû, çanda Fransiyan bû. Şoreşgerên Cezayîrî wisa zen

dikirin ku gava yekem divê welat ji mêtingeran were rizgarkirin, lê paşê pê hesiyan ku ya şoreşa wan mayînde bike; pêşxistin û belavkirina çanda Cezayîrê di nav jiyana civakî de ye.

Di şoreşa Rojava de hevşibiyên vê şoreşê hene. Şoreş gava yekem bû. Rêber APO hem di parêznameyên xwe de û hem jî di hevdîtinên xwe de digot “Şoreşa rastî, şoreşa zihniyetê, şoreşa exlaq û şoreşa wijdanê ye.” Gelê Kurd miletekî ku rastî qirkirina zihniyetê hatiye. Mêtingerî di hiş de hatiye qebûlkirin û rewakirin. Ji bo vê, bêyî pêşxistina şoreşa zihn û wijdanê, bi saziyên heyî pêşketina çêbibe jî wê bê wateya meşandina siyaseta mêtingeriyê. Ji ber vê yekê, derbaskirina pergala kapîtalîst û çanda BAAS’ê ya di serdema beriya şoreşê de li Rojava ava bûyî û avakirina Çanda Civakî, Exlaqî û Polîtîk a xwedî dîrokek 15 hezar salî, mijara bingehîn û jiyanî ya xwegihandina serkeftinê ye.

Li Başûrê Kurdistanê jî rewş bi vî rengî ye. Îro Başûrê Kurdistanê di wateya fîzîkî de azad e. Baş e, li wir di warê Kurdîtiyê de çi tiştê me maye? Çanda civakî û berxwedanê ya Kurdan heye? Bisazîbûnên heyî berhemên kîjan zihniyetê ne? Îro mirovên Başûrê Kurdistanê mîna felcbûyan in. Mirovê felcbûyî çawa ye? Bêtevger e-nalive, dibîne behsê nake, ferq dike lê nikare tevbigere, zihniyet û saziyên wî tine ne. Xelkek felcbûyî heye.

Lewma heke şoreşa zihnî pêk neyê, wê tiştek ayîdî Kurdîtiya Azad çênebe. Bi zihniyeta kevn, gava nû nayê avêtin. Mecbûriye, divê hem zihniyet hem jî bedenên (sazî û dezgeh) vê bên avakirin. Wekî ku me di destpêkê de jî dabû diyakirin, çand bi serê xwe bûyereke zihnî ye. Desthilatdaran, mêtingerî bi

zihniyetê dane rewakirin. Şkestin û hilweşandina herî mezin ji vir tê.

Halê hazir, heke em li rastiya roja me ya îro ya dîrokî-civakî binêrin, wê derkeve holê ku gelê Kurd rastiya çand û dîroka xwe nizane. Herçend e ku diviyabû bizanîba, mereq kiriba, guman pêre çêbûba, lê mêtingeriyek wisa di zihniyeta wî de bi cih bûye ku hewldanek wî ya ciddî ya di vê derbarê de jî tinebe. Mereqa wan ji cihên çandî û dîrokî yên wekî Orkêş, Til Xelef, Girê Çetelê (Çatalhöyük), Girê Mirazan (Xirabê Reş) û gelek cih û warên din ên ku avabûyîn û pêşketina mirovahiyê ronî dikin re, tine ye. Di vî warî de, xwebiyanîkirinek mezin a ku divê li ser were sekinandin heye.

Dewleta Tirk li navçeya Sûrê ya Amedê bi navê TOKÎ'yê, bînayiyên tektîp ên mîna hev çêdike. Ango navçeya Sûrê ku bingeha bajarê qedîm ê Amedê ye û di heman demê de qada wê ya çandê ye, bi vê rêyê tê hilweşandin û wêran dibe. A tê hilweşandin û wêran dibe, çanda bajarê Amedê û ya gelê wê ye. Sûrên derdora Amedê xwedî dîrokek 500 salan e. Di bin Sûrê de, salona operayê heye. Desthilatdar bi vî awayî hafize û bedewiyê tine dikin. Herî kêm 500 sal berê hûner, estetîk, fikir, çand û civakîbûnek ku bi vî awayî dijiya hebû. Têgihiştina dîrokî û çandî, têgihiştina herî mezin e. Mirovê ku dîrokê dizane, yek ji mirovên herî bi hêz ê civakê tê hesibandin. Lewma gotina artêşa bi hêz, gotinek tewş û beredayî ye.

Gordon Child û Elî Şerîetî di encama lêkolînên xwe yên 50 salan de gotin: "Bingehê dîrokê, Kurdan û Ereban danîne." Êdî hemû beşên zanistê jî vê bi delîlan derdixin holê. Şoreşa gundan û çandiniyê li Zagros û Torosan pêşketiye.

Heke dîroka civakekê were zanîn, wê bê zanîn ka ji ber çi ew civak paşde maye. Heke aliyên me yên qels û bi hêz bên zanîn, wê were zanîn ku ka em ji kû derê dest pê bikin. Ji ber ku heke dîrok were zanîn, xwenasîn jî pêş dikeve. Hemû cîhan bi ser Rêber APO de diçe, êrişî wî dike, lê kes nikare şonde gav bi wî bide avêtin û nikare têk bibe. Çima? Ji ber ku di warê zanîn û famkirina dîrokê de bi hêz e.

Di sedsala 21. a ku tê de behsa dîrok, siyaset, çand û zanistê tê kirin de, bobelata herî mezin a hatî serê Kurdan ew e ku Kurd çanda xwe nizanin. Kurdîtiya ku em li vir behsê dikin, nezanîna Kurdan a ji rastiya dîrokî ya 15 hezar sal a civakîbûna wan e, ku nekarîne li ser vê binyatê sekneke xweragiriyê raber bikin.

Yahûdî ji heft heta heftê saliyê dîroka xwe dizanin. Qirkirina Babîl dizanin. Dizanin ka çawa bi çendîn caran ji ser hatine kaş û koçkirin, baş dizanin ka çawa ji Ewrûpa û Îspanyayê hatine koçberkirin. Dîroka Mûsa û qirkirina Hîtler gelekî baş dizanin. Ji ber ku dizanin, ji ber wê yekê di pozîsyonek wisa de ne ku niha bandora wan a li ser hemû dinyayê tê dîtin.

Wekî encam jî nirxandina me ya di derbarê çandê de, bi xwezaya sêyemîn temam kirine. Xwezaya sêyemîn; ji bo ku mirov di nava civakê de dawî li çêbûna çînan bîne, divê civak li ser bingeheke zanistî, ne hiyerarşî û derveyî dewletê, li ser bingehê hişmendiya demokratîk û pircivakîbûnê ji nû ve bi rêxistin bibe. Di vê çarçoveyê de, avakirina jiyanek ekolojîk û bi xwezayê re lihevhatî mimkun e. Bi pevrebûn an jî yekbûna xwezaya yekem û xwezaya duyem, xwezaya sêyem derketiye holê. Yanî tê wateya

bi pratîkkirina paradîgmaya Rêber APO ya Ekolojîk, Demokratîk û Azadîxwaziya Jinê.

Rêber APO şkestin-qirkirinên zayendî jî bi şêweyek ku dişibe vê formûle dike; şkestina zayendî ya mezin a yekê ya ku bi mîtolojiyê hatî çêkirin, bi ol derbasî rewşek teqez dibe û rê ji şkestina zayendî ya duyem re vekiriye. Ev her du şkestinên zayendî, di xwezaya duyem de çêbûne. Her wiha dide diyarkirin ku 'şkestina sêyem a mezin a zayendî jî wê vana ji holê rake, jiyanek ku zayend di nav de azad bin, pêk bîne.' Tişta ku li vir em wekî xwezaya sêyem bi nav dikin jî, berevajî dabeşkirina mirovan li çîn û tebeqeyan e ku çîna jor xwe wekî dewlet-desthilatdarî bi rêxistin dike û di dawiyê de civakê ji civakîbûnê derdixe, ye. Ango wateya vê ya bingehîn, derbaskirina pergala desthilatdarî û dewletê û avêtina nav selika gemarê ya dîrokê û li ser bingehê hevsengiyek lihevhatî, di navbera civak û xwezayê de nûjenkirina civaka neolîtîkê ye.

Mirov dikare vê bi vî awayî bide diyarkirin; di warê maneyî de, Şaristaniya Demokratîk-Zihniyeta Modernîteya Demokratîk e, di warê binyatgerî û avakirinê de jî, Konfederalîzma Demokratîk û pergala Xweseriya Demokratîk e. Modêla Neteweya Demokratîk, pergaleke jiyanê ya bi awayek şênber di warê wateyî û bisazîbûnê de bêkêmasî-yekbûyî ye. Lewma pergalek çandî ye. Di warê herêmî de Konfederalîzma Demokratîk a Rojhilata Navîn, di warê gerdûnî de jî Konfederalîzma Demokratîk a cîhanî, mijarên din ên temamkerê vê fikrê ne.

Ev ne xeyalek e. Mumkiniya xwerizgarkirin û derketina ji kaosa vê serdemê û vê pergalê ye. Di van kaosan de, modêlek

biçûk dibe ku veguhere hêviyên mezin. Ji ber wê yekê, Rêber APO di paradîgmaya xwe ya Şaristaniya Demokratîk de pêşketinên dîrokî di sêaliyan de; tez, antîtez, û sentez girtiye dest. Di rewşa niha ya heyî de heke tez; Pergala Şaristaniyê ya Rojavayî be, antîtez jî; dibe Rojhilata Navîn. Baş e senteza vê dubendiyê wê çawa derkeve holê û sentez wê bi kîjan pergalê û li kîjan mekanî xwe bide xuyakirin? Senteza wê, wê kûder be? Ev herikîn wê bi kû ve pêş bikeve?

Ji ber vê yekê, Rêber APO diyalektîka Şaristaniya Neteweya Demokratîk wekî robarekî dinirxîne. Geşedana şaristaniyê, bi teknîkê, cografyayê û cîhana zihniyetê pêşketin pêk aniye. Ev robarê ku antîteza xwe di nava xwe de hildigire û ji Sûmer ber bi şaristaniya Greko-Romen ve û ji wir jî ber bi hemû Rojavayê ve herikî, ji vir û şûnde wê bi kû ve biherike? Madem ku herikîna robarê şaristaniyê ranaweste û mirovahî bê dahatû namîne, derketin wê li kû, çawa û li ser kîjan bingehî pêk were? Faktora bingehîn a ku wê şaristaniya nû bide kifşkirin wê çi be? Ev pirsyar, pirsa ku herî zêde di roja me de tê nîqaşkirin e. Rêber APO yê ku hevkariyek pir giring û pêşketî, watedar û zanistî bi van nîqaşan dide, dema ku li bersiva vê pirsê digere, alternatîfên wekî DYA, Ewrûpa, Asya, Afrîka û Latîn Amerîkayê yek bi yek digire dest û bi rehendên wan ên dîrokî û aktûel ên dema niha ve dinirxîne.

Rêber APO, di encama nirxandin û lêkolînên piralî de, pêşbînî dike ku Rojhilata Navîn tekane cihê xwedî potansiyela afirandina antîtez a pergala şaristaniya heyî ye. Ji bo bi zelalî îsbatkirina vê tesbîtê ka çi qas rast e, wê têrê bike ku bes mirov li pêvajoya siyaseta cîhanê ya van 34 salên dawiyê binêre. Ji ber ku ev 34 salên dawiyê, serdema şerê cîhanê yê sêyemîn e û ne

diyar e ka wê di şer û cengên hegemonîk de pergalek çawa derkeve pêş.

Ji geşedanên ku di salên 1990'î de li Rojhilata Navîn rû dayîn, ên ku bi Şerê Yekem û Duyem ê Kendavê yê bi destwerdana DYA'yê ya li Iraq û Afxanistanê û yên bi Bihara Ereban, şerê Sûriyê û Deryaya Reş re çêbûyîn, hat xuyakirin ku rehjena siyaseta dinyayê li vir lêdikeve, bandor û dengvedanên vê di asteke giring de piştgiriyê didin rastiya vê pêşbîniya navborî.

A rast, di dinyaya roja me ya îroyîn de, êdî ne mimkun e ku em behsa hebûna cografyayek nehatî destdan bikin. Li ser rûyê dinyayê qadek tenê jî nemaye ku şaristaniya kapîtalîst xwe neberdabiyê, destê xwe neavêtibiyê û xwe negihandibê. Ber bi dawiya sedsala 20. ve, rastiya globalbûnê êdî wekî diyardeyeke şênber derket pêşberî me û wekî wê gotina ku timî tê bikaranîn, hema bibêje dinya kiriye wekî gundekî û pir nemaye hemû xuyanka dinyayê talan û wêran bike. Lewma cografya nikare bibe faktorek diyarker di dana diyarkirina awayê şaristaniya nû de.

Heke em bên teknolojiyê; herçend e ku di serdema me de gihiştibe astek pir pêşketî û geşedanek sersorman û ecêbmayînê jî, lê wê jî di şert û mercên dinyaya me ya niha de taybetiyên xwe yên diyarker ên berê ji dest dane. Çima? Herçend e ku teknolojî xwedî taybetiyek a leza belavbûn û pêşketinek bêhempa û sersorman e jî. Ji ber ku teknolojiyek nû dikare di demek kurt de bigihêje her herêma dinyayê, dikare bikeve destê her hêz û her kesî, bi vî awayî di destê derdorek diyar an jî di destê yekdestdariya civakê de namîne, di vê wateyê de piştî heyamekê nikare ji ti kesî re serdestiyekê pêk bîne.

Encex di dawiyê de ev encam derkeve holê; xala ku mirov dikare bibêje heta qismek giring a kesên ku xwedî fikrên cuda, bi hev re nakok û dijber jî li ser hemfikir in, di wê baweriyê de ne ku faktora bingehîn a ku serkêşiyê ji pêşketina şaristaniyê re bike; çand û kevneşopiya çandê ye. Bi mijarê ve girêdayî divê em cih bidin hinek nêrînan;

"Hîpoteza min ev e ku; di vê rewşa nû de, çavkaniya bingehîn a têkoşînê destpêkê wê îdeolojîk û ekonomîk be. Parçebûna mezin a di nav beşeriyetê de û çavkaniya hikumdar a têkoşînê, wê çand be... Xetên şkestî yên di navbera medeniyetan de, wê xetên danûstandinê yên siberojê pêk bînin(13) ".

"Pevçûnên dahatûyê wê ji îqtîsadî û îdeolojiyê zêdetir, bi faktorên çandî werin sincirandin(14) ".

Fûkûyama dibêje: "Her ku biçe, wê li hemû dinyayê di asteke navneteweyî de belavbûnek nû ya hêzê xuya bibe. Ev belavbûna hêzê, êdî wê ne li ser bingehê modêlên siyasî yên ku nêzî hev çêbibe, wê li ser bingehê çandê çêbibe(15) ".

Lewma, herçend e ku Immanuel Wallerstein ji yên ku li jor me nêrînên wan dayîn xuyakirin, cudatir disekine û xwedî nêrînên pir cuda ye jî, dema ku jeo-çandê di wateyekê de wekî zemîna jêr a  jeopolîtîkayê pêşan dide, 'dibêje; çand qada şerê berjewendiyên dijber e, qada sereke ya têkoşîna îdeolojîk e' heman rastiyê destnîşan dike.

Ji ber vê yekê, faktora sereke ya ku wê di zayîna şaristaniya nû de -li şûna cografya û teknolojiyê-rola xwe bilîze, çand û kevneşopiya çandî ye. Ev rewş wê di heman demê de bibe

ronîkirinek ji pirsa ka çima Rojhilata Navîn wê bibe mekan ji zayîna antîteza şaristaniya kapîtalîzma heyî re.

Ji ber ku Rojhilata Navîn ji serdema neolîtîkê û vir ve xwe dispêre nasname û daneheveke çandî ya xwedî raboriyek nêzîkî 20 hezar sal, wisa tê dîtin ku diyardeya vejînek nû bide mirovahiyê; ev mîrateya çandî ya dewlemend a ku Rêber APO wê dişibîne dara beroyê ku rehên xwe bera kûrahiyên dîrokê dayî, bi hêvî ye ku careke din wê ji nû ve hêşîn bibe.

## 2- Ziman

Di derbarê têgîna ziman de, gelek danasîn, agahî û şîrove hene. Di vê dema ku li her qadê lêkolînên zanistî tên pêşxistin de, serikek ê van lêkolînan hemûyan teqez xwe digihîne ziman. Ev pêşketinên bi mijara ziman ve têkildar, dibin rêxweşker ku bi awayekî giştî li ziman were nêrîn. Di derbarê danasîna ziman de, teqez pênaseyek a her gelekî û her çandekê heye. Di cih de ye ku em cîhana xwe wekî baxçeyê zimanan bidin nasandin û bi nav bikin. Bi kurtasî, ev pênaseyên cuda yên di derbarê ziman de, didin xuyakirin ku ziman çi qas giring e û ji bo civakê jî çi qas hewcehiyek dev jê nayê berdan e. Lê mixabin, em bi cîhaneke ku baxçeyê zimanan vediguherîne dojehê re rû bi rû ne.

Ziman şêweyekî yê îfadekirinê ye. Bêhtirî xwe ew wekî axaftinê tê destgirtin. Lê zimanê îşaretan û zimanê bedenê jî heye. Di vê wateyê de, ziman bes bi axaftinê ve girêdayî nayê tarîfkirin. Ji şêwazê giştî yê îfadekirinê re em dibêjin ziman .

Ziman, amûra jiyanê ya herî zindî, herî dînamîk û herî bingehîn e. Dev ji wî nayê berdan. Şêwazê hemû zindiyan ên

domandina hebûna xwe û xwedana îfadekirinê heye. Mirov dikare ji van awayên hebûnê re jî bibêje cûrek ê ziman. Di nava hemû zindiyan de yê herî zêde pêşketinên ziman pêk anî, mirov e ku bi hêza hiş û aqil pêk aniye. Bi vê rê, hebûna xwe gihandiye asta gotinê, nivîs pêk aniyê, amûrên xwe, rê û rêbazên xwe cûrbicûr û zêde kirine.

Lê belê xala herî girîng a di derbarê ziman de ku divê li ser were sekinandin, hewldana xistina bin desthilatdarî û hegemonyaya îdeolojîk a hêzên desthilatdar û dewletê ye.

Pêvajoyên ku mirov dikare jê re bibêje zimanê dewletê, artêşê û desthilatdariyê çêbûne. Bo nimûne: Di serdema împaratoriyan de, di Çaxa Destpêkê û ya Navîn de, dewletê xwe nedikir mîna civakê, berevajî xwe ji civakê cuda dikir. Civak paşverû, civaka bi dewletê re û pergala desthilatdariyê jî serwer û bilind didît. Xwexistina nava civakê-xwekirina wekî civakê, mîna heqaretekê dihesiband. Lewra bi baldarî xwe jê cuda dikir. Ji ber vê yekê, zimanê wê jî cuda dibû. Dewletên navborî, zimanê xwe wekî heyî li ser civakê yan jî civakan ferz nedikirin.

Ev rewş di pergala dewlet-neteweyê de guheriye. Dewletnetewe; dibe pergalek a ku dewletê dike netewe û neteweyê dike dewlet. Dewlet-netewe dixwaze di bin navê dewletê de, civak û şexsan ji aliyê zihniyetê, ji aliyê şêwazê jiyanê û ji aliyê bîrdozî ve bike malê xwe. Dixwaze dewletê têxe rewşek wisa ku kesek bi tena serê xwe karibe temsîla dewletê bike. Dixwaze fikrek, hestek û ruhek wisa li cem her ferdekî civakê çêbike wekî ku dewlet ew bi xwe be. Dema wisa dibe jî, ev tê maneya wekî ku dewlet veguherandîbe civakê. Li vir, xweferzkirinek a ziman û a çandê çêdibe.

Aha qirkirina çandî bi vî rengî pêş dikeve. A xeter jî jixwe ev e. Berê dewletan ji civakê dûr, ji xwe re zimanek çêdikir, ev ne xeteriyek bû li ser zimanê ku civakan afirandibû. Lê di serdema dewlet-neteweyê de, hewldanên dewletê yên kirina civakê wekî xwe, hemû civak xistina nava dewletê, kirina kole û hewldanên wê yên behicandina civakê, bûn sedem ku zimanê civakê tine bibe û zimanê dewletê hikum li ser hemû civakê bike. Ev wekî êrişek a li dijî ziman jî derdikeve holê. Heman êriş di warê çandî, exlaqî, aborî û siyasî de jî pêk tê. Bi vî awayî, ziman dibe wekî amûrek ê êrişa îdeolojîk. Ji ber vê yekê, hebûna dewlet-neteweyê bi xwe û mantiqê wê, dibe qirkirin bi xwe.

Jixwe zimanê dewletê tije ye ji têgînên îdeolojîk. Dewlet hebûnek siyasî û îdeolojîk e. Lewma êrişa li ser zimanekî, êrişek îdeolojîk e. Dewletbûna ferdan û hemû civakê, berî her tiştî bi dewletîbûna ziman pêk tê. Ev xalek pir giring e. Bi taybetî jî civakên ku bi asîmîlasyonê re rû bi rû ne, divê vê yekê bi baldarî binirxînin.

Di diyalektîka civaka dîrokî de, ziman ji civaka dîrokî û çanda wê cuda nehatiye dîtin. Ji ber vê yekê, ziman ji çandê nayê cudakirin. Di wateyek teng de, ziman bi xwe dibe çand. Mirov çawa-bi çi awayî dijî, zihniyeta mirov jî li ser wî bingehî pêk tê. Ji ber ku çand zihniyetê û zihniyet jî çandê temsîl dike. Heke em ziman jî di wateyek teng de wekî çandê bigirin dest û binirxînin, wê guncaw be ku em ziman wekî mifteya bilêvkirina zihniyetê bi nav bikin.

Ji ber vê yekê, çawa ku ziman di çanda civakî de roleke avaker dilîze, di heman demê de veguhêzer û barhilgirê çandê ye jî. Dîroka civakekê, cografyaya wê, nirx, folklor, mûzîk, wêje,

zihniyet, nêrîna wê ya cîhanî û hemû nirxên hevpar ên ku civakê dikin civak, di safoka filtera sedsalan re hatîn darivandin û bi peyv û biwêjan sembolîze bûyîn, timî herikîne xezîneya ziman û cewhera xwe li wir parastine.

Ji ber vê yekê, veguherîna ziman a wekî zihniyetekê û sazîbûneke maddî-manewî û bi vê yekê pêşketina civakîbûnê, di rastiyê de ev tê wê wateyê ku ziman xwevegotin-xweîfadekirin e, ku ev jî di wateyek berfireh de çandê pênase dike. Hemû bisazîbûn û avahîsaziyên ku di pêvajoya dîrokê de pêk hatîn, wekî ku ziman bi sazîbûnê xwe îfade dike, tê jiyîn, teşe digire û li ser vî bingehî tê destgirtin. Lewma heke zimanek negihiştibe asta xwebilêvkirinê-xweîfadekirinê, di pêvajoyeke asîmîlasyonê yan jî di pêvajoyek oto-asîmîlasyonê de ye. Em ji vê re jî dibêjin; qirkirina çandî yan jî qirkirina fîzîkî.

Rêber APO ziman di du aliyan de digire dest. Berî her tiştî ziman amûrek a ragihandinê ye û paşê jî hîmê bingehîn ê ku civak pêk anî û ava kiriye. Rêber APO dema ku taybetiyên bingehîn ên jiyana civakî vedibêje, ziman jî wekî pêkhateyekê digire dest;

-3“Ziman ne tenê amûrek ê zihniyeta civakî ye, di heman demê de faktorek bingehîn ê avakirinê ye. Ziman yek ji taybetiya bingehîn a hebûna civakekê ye. Wekî amûrek ê zekaya kolektîf, nermbûna xwezaya civakî pir bi lez pêş dixe(16) ”.

Dîsan em dikarin dîtina Rêber APO ya di derbarê mijara ziman de bi hevokek wiha kurt bigirin dest. “Belkû şoreşa herî mezin a dîrokê ya ku hê nehatî kifşkirin û navlênebûyî, ev be. Dibe guncaw be ku mirov ji şoreşa destpêkê ya herî mezin re bibêje ‘ŞOREŞA ZIMAN(17) ” ’

Di çavkaniya vê pênaseya pêk hatî de, xuya dibe ku ziman diyardeyeke civakî û dîrokî ye. Di vê çarçoveyê de, dîroka pêşketina ziman heye. Di wateya dîroka civakî de, şoreşa ziman vegotina yekem e di piraniya dîroka gerdûnî de. Derketina zimanan û xwepêşxistina her civakekê, mirov dikare bibêje encama pêşketina pircivakîbûnê ye. Di vê wateyê de, ziman dibe pîvana bingehîn a xwepêşxistina piraniya dîroka gerdûnî.

Di dîroka gerdûnî de klan, di rola şaneya bingehîn a civakê de ye. Ji ber vê yekê, ew temsîla avahiyeke yekane û bisînor dike. Derbasbûna klanê ber bi qebîleyê ve, di warê civakî de rê ji pêşketina nîtelîka pirrengiyê re vedike. Bi vî awayî avahiya yekane û yekreng a klanê, bi pêşketina qebîletiyê re vedibe. Klan, ji serdema ku hê mirov ji xwezayê qut nebûbûn, bi komkirina giya û nêçîrê debara xwe ya jiyanê dikirin re, tê gotin. Lewra ew ji ber neçariya hewcedariyên debarê xwedî karektereke yekane bûn. Û her klan di qada xwe de ji klanên li qadên din qut û cuda dijiya. Ji ber ku xwedî karekterên ji hev cuda bûn, nedikarîn teqebûlî civakîbûnek berfireh bibin, hebûna wan wekî toxum-dendik bû. Lewma, hem ji ber yekanetiya xwe ya jiyanê û hem jî ji ber kêmbûn û qelsiya têkiliyên wan ên bi hev re, derfeta klanan wekî pêkhateyek civakî bi wate û pirreng tine bû .

Klan ji komeke civakî ya bi qasî 20-25 kesan pêk tê, ev bingeha civakî ya ku wê paşê bi awayekî piralî-berfireh pêş bikeve û fireh bibe, dendika bingehîn a civakê ye, lê ne civakîbûna berfireh bi xwe ye. Çêbûna civakên li ser bingehê karekterê berfireh, bi pêşketina ziman re pêkan bû. Tê gotin piştî serdema Çaremîn a Qeşayê, ango sed hezar sal berê, ligel zimanê îşaretan gav bi gav derbasî zimanê sembolîk bûye. Ligel zimanê

îşaretan, bi qismî jî be zimanekî sembolîk hebû, lê hê pêş neketibû.

Jixwe derfeta pêşketina zimanê sembolîk di nav pergala klanê de tine bû. Avaniya gewriyê-qirikê, têlên deng û mosûlkeyên ziman a mirovê wê demê ji bo zimanê sembolîk ne guncaw bû, ango ji ber tengbûna jiyana civakî ya di klanê de, ne pêkan bû ku di asta dihat xwestin de şoreş di ziman de çêbiba. Ziman, piştî serdama Çaremîn a Qeşayê pêş dikeve û nîtelîkek baş qezenc dike.

Çêbûna grûbên zimanan, çêbûna civakên ji hev cihê, danûstandina bi civakên ji hev cihê re û  xweşekilandina li ser bingehê ziman û civakên ji hev cuda, bû esasê bingehîn ê civaka gerdûnî. Ev jî piştî serdema Çaremîn a Qeşayê çêbûye. Dema were pirsîn 'zimanê klanên wê demê yên bi awayê grûbên 20-25 kesî diiyan ên berî serdema Çaremîn a Qeşayê çawa bû, kî bi çi zimanî diaxivî, çi grûbên zimanan hebûn, amûrên bingehîn ên ragihandinê yên wê demê çi bûn, ferqa wan ji hevdu çi bû? Ti bersiv ji pirsek tenê ya van re jî tine ye.

Ji ber ku piştî 20.000 B.Z grûbên zimanan ên bingehîn çêbûne. Çêbûna grûbên bingehîn ên zimanan, di rêxistinkirina civakê de û danûstandinên wan ên bi hev re, amaje bi xwegihandina asteke berbiçav a pêşketinê dike. Bi awayekî giştî, mirov dikare bibêje: Çêbûna sê grûbên bingehîn ên ziman hebû.

A yekem, grûba Ziman a Semîtîk e. Grûba Zimanê Semîtîk, yekem ziman e ku ji aliyê mirovên Deryaya Sor derbas dikirin ve, hatiye bikaranîn.. Di roja me ya îroyîn de, ji Rojhilata Navîn, Biyabanên Erebistanê, Çola Sehra ya Mezin û heta Îranê dirêj

dibe re tê gotin. Tê dîtin ku di vê herêmê de grûbek a ziman pêşketiye. Ji vê re ‘Grûb an jî Koma Zimanên Semîtîk’ tê gotin.

Grûba duyem a zimanan jî hema hema li kêleka wî, ji Mezopotamyaya Jêrîn dest pê dike û heta rojhilatê Deryaya Spî, Toros û Zagrosan û ‘Kevana bi Bereket’ a ku li qontara wan cih digire, pêk hatiye. Aryenên li herêmên girêdayî Mezopotamyayê, di çêbûn û avabûna Grûba Zimanên Hînd-Awrûpî de, xwedî kedek giring in. Wer xuyaye ku ev rewş bi derfeta şert û mercên cografî pêk hatiye .

Grûba ziman a sêyem jî, em dikarin wekî 'Grûba Zimanê Ûral-Altay' pênase bikin. Vê grûba ziman xwe li ser herêmên erdnîgariya Çînê, Moxolistanê, Turkmenistanê, Tirkistanê û hwd. deveran bi rêxistin kiriye.

Ludwig Wittgenstein dibêje: “Sînorên zimanê min, sînorên dinyayê ne(18)”.

Baş e, çima sînorên zimanê me, sînorên cîhana me ne? Ji ber ku sînorê tişta ku em dikarin fam bikin, bi sînorê tişta ku em navê wan dizanin tê pîvan. Tişta ku mirov navê wê nizanibe, mirov nikare ferq bike. Mirov dikare hîs bike û pê bihese, lê ev rewş nikare di derbarê wî tiştî de agahiyek komplêks bide. Wê demê dewlemendiya têgînan di ziman de rasterast bandorê li kapasîteya ramanê dike. Zimanê me di warê têgînan de çi qasî dewlemend be, tê wê maneyê ku di warê civakî de jî em xwediyê ramanek ew qas kûr in. Ji ber vê yekê, divê em hevgirtina hebûnî ya fikir û ziman fam bikin. Raman têgînan, têgîn zimanê sembolîk, zimanê sembolîk jî ziman pêş dixe. Divê em vê hevsengiyê berevajî jî bixwînin. Çi qas ziman pêş bikeve, wê zimanê sembolîk û bi vê rêyê ramanê mirov jî pêş dikeve. Bêguman xala bingehîn

a di bin van hêmanan hemûyan de jî wekî ku me li jor jî dayî xuyakirin, diyardeya civakîbûnê heye.

Çima civakek nikare xwe, rewşenbîrê xwe hilberîne? Ji ber ku astek an jî qamîtiyek a ziman heye. Heke ziman kêm be, fikir jî wê kêm be. Heke fikir jî kêm be, ma rewşenbîr wê çawa çêbibe? Mînak: Almanan mohra xwe li sê sedsalên dawiyê xistine. Hizirvanên herî mezin hilberandine. Ji ber ku her hizirvanekî bi qasî dinyayekê têgînên nû bi zimanê Almanî dane qezenckirin. Van têgînên nû, sînorê fikra civaka Alman-ramana civaka Alman berfireh kir.

Çima mirov ji nasnameya xwe fedî dikin? Çima em ji zimanê xwe yê dayikê direvin? Çima em zimanê xwe li paş û bêfonksiyaon dibînin? Çima reqabetek a xwegihandin û fêrbûna zimanên populer (Ingilîzî, Almanî û hwd) heye, lê çima ji bo zimanê me bi xwe tine ye? Tişta ku di bin hişê me de tê jiyîn çi ye?

Bêgûman rasterast têkiliya bersiva van pirsan bi şaristaniya navendî û çanda ku wê xuliqandî ve heye. Ferq û cudahiyên wekî medenî-barbar, pêşketî-paşketî, modern-paşvemayî û hwd. pêşketina zihniyeta şaristaniyê pêk tîne û civakan jî di vê çarçoveyê de bi şekil dike. Di encama vê de jî, teqlîdkirin, pûte bi wan dan û xweînkarkirin derdikeve holê. Ji bo ku xwe pêşan bide ne barbar e, ne paşverû û ne hov e, zimanê xwe înkar dike, beramberî vê jî ji bo ku îspat bike ku şareza, pêşketî û modern e, teqlîdkirina zimanê pergala serdest derdikeve holê.

Di salên 1600’î de, li cîhanê 10 hezar ziman dihatin axaftin. Îro rûpela vê hejmarê daketiye 6 hezarî. Ji vana jî 4 hezar bi tinebûnê re rû bi rû ne.

Heidegger dibêje: "Ziman mala bûnê ye ku tê de hebûn heye, mirov tê de bi parêzvaniya heqîqeta hebûnê, dibe ayîdî wî." (19) Civakek ji zimanê xwe yê dayikê qut bûbe, ne mimkun e ku karibe hebûna xwe û rewşa xwe ya avabûnê bidomîne.

Mewlana dibêje: “Dil behr e, ziman qerax e. Di behrê de çi hebe, ew xwe li qeraxê dixe.” Ziman şahidê dil û mifteya ramanê ye.

Rêber APO, ziman di çarçoveya çandê de digire dest û şoreşa ziman wekî yekemîn şoreşa mezin a dîroka mirovahiyê pênase dike.

Têkiliyek xurt a têgîna ziman bi têgîna çandê re heye. Di wateya teng de, ziman çand e. Ziman; zihniyet, exlaq, estetîk, hest û daneheva ramana civakî ya ku civakekê bi dest xistî ye.

Civakên ku ev xusûsiyet nexistîn warê vegotinê, yan civakek nexweş e, yan jî civakeke mehkûmê jiyanek trajedî bûyî ye. Ziman û civak yekparebûnek giştî ye ku mecbûriyetek wan a hevtemamkirinê heye, heke yek nebe xwedanajiyankirina ya/yê din ne mimkun e.

Pêşketina ziman hem di warê fîzîkî û hem jî di warê fikrî de, bi hiş ve girêdayî ye. Zimannas fosîlan wekî baxçeyê ziman dibînin. Fosîlê destpêkê di sala 1995’an de li Etiyopyayê hatiye dîtin û ev fosîl delîlê 195 hezar sal berê ye. Mezinbûna mejî û erzinkê, zemînek ji bo xebitandina ziman e. Zimannasê Amerîkî Chomsky mejî û erzinkê (çene), ji bo ziman wekî delîl dihesibîne.

Mijareke din a ku divê di derbarê ziman de were vegotin, teoriyên giring ên di derbarê pêşketina ziman de ne. Wê bi sûd be ku em bi kurtasî vana jî bidin diyarkirin.

a- Teoriya Xwedayî: Di pirtûkên pîroz de hatiye xuyakirin ku ziman bi Adem re pêk hatiye.

Zimanê Adem zimanê hemû mirovahiyê bû. Di dinyayê de otorîteyek a vê teoriyê tine ye. Bes di wateya teolojîk de çîroka ku bi Adem û Hewayê hatî destpêkirin e. Li vir rengê zihniyetê yê ziman tine ye.

b- Refleksên Dengan: Pêşengê vê Platon e. Wî bingeha ziman wekî tekîtiyê girtiye dest.

Yekem awayê zanînê yê zindiyan xerîzî, biyolojîk e, lewra refleksa yekem ev e. Qonaxa duyem jî teqlîdkirin e. Xwezayê û tiştên din teqlîd dike. Di şkeftan de wêne hebûn û awayê zanîn û hînbûnê bi wêneyan hatiye vegotin, heqîqet bi wî awayî hatiye xêzkirin. Tîp, axaftin û vegotin tine bû, bi wêneyan awayê çêkirina hafize û vegotinê hebû. Di zanista teqlîdî de bingeh ev bû. Divê em li gorî şert û mercên wê demê, bi empatî li mijarê binêrin, ne li gorî aqilê îro. Heke fîzîk xurt nebe, pêşketina ziman jî wê di çarçoveya ra-gihandinê de bimîne.

c- Teoriya Tedbîr û Bergiriyê: Hezkirin, xemgînî, melûlî, sosret, fikar, hêrs, kêfxweşî, rihet bûn û...hwd. evane hemû sedemên dengderxistinê ne. Bingehê ziman li ser van hêmanan ava bûye. Pêşketina wan dengên derveyî îradeyê yên ji gewrî û qirikê derdikevin ên wekî qîrîn û bangkirinê, evane ji bo pêşketina ziman pêşmerc tên hesibandin. Zihniyet û ziman berhemê heman qonaxê ne. Heke ziman pêş nekeve, ti wateya zihniyetê jî tine ye. Deng pêşmerc e ji bo ziman û zihniyetê. Wêneyê ku hebûna zihniyetê îspat dike, di heman demê de

vegotina zihniyetê ye jî. Chomsky fîlozofekî zimannas e. Çêbûna ziman ji fîzîkê qut nîne. Di ziman de, bi qasî zihniyetê, fîzîk jî mercek e pêşîn e. Dema ku çene-erzîng û mejî mezin dibe û teşe digire, deng û ziman jî pêş dikeve.

d- Teoriya Hevkarî û Bi Hev Re Xebitînê: Ev teorî, bi klanê re dest pê dike û teoriyek lawaz e. Têkiliyan, lez û bizavê û xebatê ji pêşketina ziman re wekî zemîn dihesibîne.

e- Teoriya Zimanê Bedenê: Ev teorî bi awayekî giştî armanca xwe, kar û xebata xwe ya rojane û pratîka xwe, bi vegotina bedenê ve girê dide.

f-Teoriya Hewcehî û Mecbûrîbûnê: Hewcehî û mecbûriyet rê ji pêşketina ziman re vedike. Ji ber dema têkiliyên civakî sext û dijwar dibin û pêş dikevin, zimanê bedenê têrê nake. Li gorî vê, ziman li ser bingehê hewcedariyan neçar dibe ku pêş bikeve.

Chomsky dibêje: “Biyolojî û beden ji bo ziman giring in.” Teqlîdkirin, hevkarî, tedbîr û hewcedarî, ji bo ziman rêgez û zemîn in. Lê ji bo ziman, fîzîk û mekanîzmaya pergala demaran taybet e. Ji bo vê yekê, divê qanûnên çêbûna biyolojîkî temam bibin.

Pergala demaran rê ji derketina dengê mirov re vedike. Divê bilêvkirinek, vegotinek a tişta ku mirov jiyayî hebe. Fîzîk-Erzînk, pergala demaran, aliyê taybet ê mekanîzmaya biyolojîk in. Pêşketina ziman wekî şoreşa zihniyetê tê bilêvkirin. Ziman, ji bo civakekê qonaxa avakirina zihniyet û exlaq e. Serwextbûna xwegihandina wateyê, bi ziman û zihniyetê pêş dikeve.

## 3- Şaristanî

Têgîna şaristanî bi bajar, dewlet, çînayetî û desthilatdariyê re pêş dikeve. Bi hilweşandin û redkirina pergala civaka xwezayî re, pergalên navborî yên desthilatdariyê hatine avakirin. Em têgîna şaristaniyê ji bo pergala hiyerarşîk, dewletperest û çînayetî bi kar tînin. Têgîna şaristaniyê, têgînek ji nîqaşê re vekiriye. Di Erebî de, wateya wê medeniyet û şehr e. Şehr (bajar) û şaristanî, ne heman wate ne. Têgîna bajar û bajarvanî herçend e ku paşê pêşketibe jî, di pêvajoya civaka xwezayî de, wekî şêwazek ê jiyanê hatiye dîtin. Di encamên dawiyê yên li Girê Mirazan (Gopeklitepe) derketî de, hat îspatkirin ku li wir proto-bajar pêşketiye. Lê, bajarvanî di heman demê de ji desthilatdariyê, çînayetiyê û dewletê re bûye navend-cihê xwe bi per û baskkirinê jî. Ango bûye mekanê bi teşebûna dewletê.

Rêber APO, civaka dîrokî li ser bingeha diyalektîka di navbera Şaristaniya Yekdestdar û Şaristaniya Demokratîk girtiye dest û nirxandiye. Ev sifatek e, lê wekî peyv koka wê şaristanî ye. Dema ku aliyek ji aliyên şaristaniyê derdikev pêş, an şaristaniya navendî yan jî şaristaniya demokratîk, ew aliyê wê tê pênasekirin. Li vê derê, wê kêmasî û nebesiyên di danasîna destpêkê hatîn kirin de, werin dîtin. Dema ku em têgîna şaristaniya demokratîk bi dîrokê re berawird dikin, em berê xwe didin civaka xwezayî, danehev û pêşketinên ku çêbûyîn, em wekî bingehê Şaristaniya Demokratîk digirin dest. Ji hêla din ve jî, em bi şaristaniya navendî ya ku em wekî aliyekî yê diyalektîkê hesab dikin re, têdikoşîn.

Di Erebî de medeniyet bi peyva bajarvaniyê re hevwate ye. Di Tirkî de şaristanî û bajarvanî wekî hemwate tên bikaranîn. Di Erebî de ji Şaristaniyê re; 'hedare' yanî di wateya niştecihbûn-cihwarbûnê de tê bikaranîn. Şaristanî di wateya daneheva çandê de tê dîtin. Bi gotineke din, ji rewşa daneheva nirxên ku civakên bi tevger, di jiyana xwe ya niştecihbûnê de pêk anîn re, şaristanî tê gotin. Wekî pêvajoya pêkanîna çanda ku civakan ji nifşê dahatûyê re hiştî, tê destgirtin.

Belkû mirov şaristaniyê wekî daneheva çandê yan jî pevcivandina çandê binasîne, hîn bi tenduristtir be. Dibe dewlet, çînayetî, desthilatdarî û şaristaniya navendî bi bajarvaniyê ve girêdayî bin, lê bi wê re ne heman in, ne wekhev in.

Ma şaristanî û medeniyet heman-yek in, wê demê şaristanî wê kengî were destpêkirin? Divê em vê bipirsin. Heke wisa were pênasekirin, şaristanî bi bajarbûnê re hatiye destpêkirin. Heke em wisa lê binêrin, gelo ma civakên berî şaristaniyê ne şarezabûn-şarezabûna wan tine bû? Li gorî wateya vê pênaseyê, tine bû. Heke ev bê wê wateyê, wê demê ji bo çi em hêmanên Şaristniya Demokratîk ji dîroka civakên ewilî dest pê dikin?

Pir nêrîn hene ku bajarbûn û dewletbûnê wekî bextewerî, qencî û pêşketinê dihesibînin. Peşveçûn û pêşketinê bi vê binyatê ve girê didin. Ji ber vê yekê, dewletê bi bajarvaniyê re, bajarvaniyê bi dewletê re wekhev û heman dibînin. Lewma ew di wê qenaetê de ne ku wek neçariyekê, pêwîstiya bajarvaniyê bi dewletê heye.

Bêyî hebûna bajar, şert û mercên ku dewlet karibe wekî şebekeyekê xwe bi rêxistin bike, pir zehmet e. B.Z. di navbera salên 6-5 hezarî, di serdema neolîtîkê de, desthilatdariyê bi

gihandina baviksalariya ku tê maneya nîzama hiyerarşîk, xwe di malbatê, klanê û qelebîleyê de bi rêxistin kiriye. Ev pergala navborî, berî bi rêxistinkirina nîzama dewletê, bi awayekî hiyerarşîk bi şêwazê xanedaniyê pêşketî ye. Lewma ev hiyerarşiya mêr di nav malbatê, klanê, qebîle û eşîretan de, hêzek e. Her çi qasî nebûbe dewlet û bisazîbûna wê çênebûbe jî, tê dîtin ku xweçêkirina destpêkê ya desthilatdariyê, bi vî awayî derketiye holê. Vê pêvajoya desthilatdariyê, paşê di nava bajar de xwe bi awayê dewletê bi rêxistin û ferz kiriye. Ji ber vê yekê, fikra ku bajarbûn desthilatdariyê çêdike, fikrek nakok e. Fikra ku civaka bajarî wekî mecbûriyetekê dewlet afirandiye û dewlet wekî avahiyeke civakî ji cewhera xwezaya civakî çêbûye û pêşketiye; ji aliyê zanistî ve fikrek şaş û ne rast e.

Di rastiya xwe de, bajar jî wekî gundekî, cih û mekanek ê ku jiyana civakî lê pêk hatiye. Dibe ku hinekî tevlîhev û dabeşiya kar lê cuda be. Lewma dewlet ne encam bajar e .

Heke dewletîbûn bi bajar re were wekhevkirin, wê demê yên ku dewletîbûna wan çênebûbe, bajarbûna wan çênebûbe ango nebûbin dewlet û bajar, barbar û hov in?! Heke bi vî awayî li mijarê were nêrîn û bi vî wayî were nirxandin, ên ku pergala dewletperestiyê diparêzin û erênî dibînin, wê xwe pêşverû û pergala dewletperestiyê jî wekî başiyê bibînin. Û yên ku li derveyî dewlet û bajar dimînin jî, wê wekî paşverû û sersebeba xirabiyê werin dîtin û qebûlkirin.

Lewra, heke mirov dewletbûnê wekî bajarbûnê bigire dest, ev tê wateya berzkirina pergala dewletperest, bi gotinek din tê wateya parastin û parêzvanîkirina dewletê. Ji ber ku her tişta ji derveyî vê sazûmaniyê dimîne, wekî paşketî û barbar tê dîtin.

Teoriya Modernîteya Demokratîk, dewletbûnê wekî qutbûna ji mirovahiyê, dij-şoreşa li dijî xweza û civakîbûnê û sersebeba hemû xirabî û nepakiyê dibîne. Dewletîbûnê wekî sazûmaniyek mêtinger a zordarî û tepisandinê ya li dijî mirov, civak û xwezayê, wekî rewşek jirêderketinê ya xwezaya civakê dibîne.

Me li jor dabû xuyakirin ku di Tirkî de bajarbûn û şaristanî hevwate ne. Lê di Erebî de wateya bajarbûn û şaristaniyê ji hev cuda ye. Ev dibe ku şaşiyeke têgînî ya ji Tirkî hatibe. Ji ber ku dewletneteweya Tirk, koka hemû peyvan di çarçoveya berjewendiyê dewletneteweyê de girtiye dest. Lewma em nikarin têgînên zanista civakî bi têgînên Tirkî pêş bixin.

Wê demê em çawa xwe bigihînin rastiyê? Em çawa vê tevlîhevî û nakokiyên van têgînan derbas bikin? Em çawa dikarin bersiva rast ji van pirsyaran re bibînin? Ji ber ku pêwîst e têgîna şaristaniyê tam bi zihniyetê were rûniştin .

Şaristanî, pergala îstismar û desthilatdariyê, di sêgoşeya hatina ba hev a bajar-çîn-dewletê de hatiye avakirin û veçêkirinek a desthilatdariyê ye. Heke yek bi yek were destgirtin, li şaneyan were parvekirin, ferq û cudahî wê derkeve holê. Mijara bingehîn a ku divê binê wê were xêzkirin, ew e ku sêgoşeya (bajar-çîn-dewlet) di nav hev de were nirxandin. Divê cuda cuda li şaneyan were parvekirin û pênasekirin, wekî xefikekê were destgirtin. Em bi giştî ji serdema ku sêgoşeya bajar-çîn-dewletê bi hev ve girê dide û sazûmaniyek mêtingerî û îstismarê ava dike re, dibêjin Şaristaniya Navendî. Ji ber vê yekê zelalkirina danasînê giring e.

Rêber APO têgîna Şaristaniya Demokratîk wekî nav kêm dibîne û heta dibêje: “Dibe ku hewcehî bi gelek rexneyan jî hebe. Lê her çiqas em xwezaya civakê ya dîrokî-civakî li ser esasê van parametreyên bingehîn bi kar tînin jî û têgîna 'şaristanî' yê li pêşiya têgîna 'demokratîk'ê deynin jî ,

Divê bê zanîn ku ev ne bi razîbûnê ye(20) "

Di vî alî de, bi qasî ku em têgîna şaristaniyê wekî têgîna serdemekê bi nav dikin, çi wateyê em didinê jî giring e. Wê demê dibe rast be ku em danasîna têgîna Şaristaniya Navendî wekî yekparebûna dewlet, bajar û çînayetiyê bi kar bînin.

Ji ber ku “Şaristanî bi çanda çînayetiyê û dewleta wê ve girêdayî ye. Bajarî, bazirganî, îlahiyet û bi sazîkirina zanistê, pêşxistina pêkhateya polîtîk û leşkerî, li cihê exlaq danapêş a hiqûqê û zayendperestiya mêr a di nav civakê de, evane hemû nîşanên desthilatdariyê yên şaristaniya civaka nû ne. Di wateyek din de, mirov dikare ji kombûna van taybetiyan hemûyan re bibêje çanda civaka şareza jî”.

Em ji pêvajoya şaristaniyê ya ku hemû xirabiyê pê re serê xwe hildayî re dibêjin pêvajoya Şaristaniya Navendî. Ji ber ku beriya wê jî mînakên proto bajaran hebûn, lê di wan yekeyên bajaran de, ti nîşanên serweriya mêr, îstismar, zext û zor, talan û bi kurtasî serdestiya mirovan li ser mirovan û hikumdariya mirov li ser civak û xwezayê nedihat dîtin. Dîsan wek tê zanîn, di qonaxa avakirinê ya bajarên Sûmeran de, rewşa dualî ya çandî, xirecir û nakokî hebûn .

Bi kinahî, ji vê zayîna bi êş a nexweş a ku em hewl didin binirxînin re tê gotin 'şaristaniya navendî'. Baş e, ji bo çi em di nav pergalek wiha de pênaseya Şaristaniya Demokratîk dikin?

Marksîzm jî di nav de, gelek nêzîkatiyên zanistên civakî dema ku pergalên civakî girtîn dest, pergala heyî bi perspektîfek tekjimarî û tekperestiyê girtine dest. Pêşketina civakî ya di Marksîzmê de, di çarçoveya têkoşîna di navbera yên nû û yên kevn de, li ser esasê yek yekî tine bike, dihat meşandin.

Li gorî vê nêrîna tekperest, heke civaka destpêkê ya exlaqî û polîtîk wekî pergalekê hatiba derbaskirin, pergala nû wê ketiba şûna wê û ya kevn êdî di heman qonaxê de nedima. Li gorî vê perspektîfê, di pêvajoyên civakên sosyalît û kapîtalîst de jî, ev awayê xebitînê yê koletî û feodaltiyê didome. Ti fonksiyon û şopek ji forma civakî ya hatî derbaskirin, ji forma civakî ya dahatûyê re namîne. Ji ber vê yekê, em ji dîtinên ku hevûdû ji holê radikin, hevûdû tine dikin re dibêjin rêbaza diyalektîkî ya negatîf.

Li gorî teoriya Modernîteya Demokratîk, dibe ku pergala civaka xwezayî wekî pergal têk çûbe, lê ev nayê wê maneyê ku ew bi tevahî ji holê rabûye yan jî tine bûye. Pergala nû pêşketî (pergala dewletperest), nekariye ya kevn (civaka xwezayî) tine bike, ew tepeser kiriye, şûnde xistiye, bi sînor ve kaş kiriye, lê xwe bi wê xwedî jî kiriye. Ev jî tê wê maneyê ku şaristanî ne qonaxek wisa ye ku tenê bi dewletê û çanda wê pêk hatibe.

Di serdema ku şaristanî bûyî dewlet de, rastiyeke civakî ya pir berfireh jî hebû ku bi zext û êrişên dewletê re rû bi rû bû. Nebû dewlet, nexwest bibe dewlet, li hember zextên dewletê li ber xwe da. Lewma mirov bi rihetî dikare bibêje dîroka civakî, li

hember şaristaniya dewletperest bûye dika têkoşîna bê dawî ya qewman, çandan, bawerî û etnîsîteyan.

Aha mebest ji têgîna Şaristaniya Demokratîk, şaristaniya ku tê de beşên civakê yên nebûyîn dewlet, yên ku piştî pêşketina şaristaniyê li dijî pergala dewletperest têkoşîn dayîn û xwestîn jiyana civaka xwe ya xwezayî ya kevn biparêzin, yanî şaristaniya ku wan beşên civakê yên ji derveyî pergala dewletê mayî, temsîl dike.

Rêber APO di vê derbarê de wiha dibêje: "Li gorî pêdiviya danasînê, ez Şaristaniya Demokratîk hem wekî sîstematîkek a fikir û daneheva ramanê, hem jî wekî yekparebûna rêgezên exlaqî û organên polîtîk dibînim. Ne tenê behsa dîroka ramanekê dikim, ne jî behsa pêşketina polîtîk û exlaqî dikim, ez behsa realîteya civakî ya di hundirê wê de dikim. Wekî gotûbêj du mijarên di nav hev de û bi hev ve girêdayî ne(21) ".

Ji ber vê yekê, şaristanî xwediyê avaniyek dualî ye û di pêvajoya dewletbûnê de ev avanî bi girift û zehmet bûne. Ev tesbît avaniya tekîtiyê ya şaristaniyê ji holê radike. Ev jî tê wê wateyê ku li kû derê dewlet hebe, demokrasî jî ango civaka polîtîk û exlaqî jî heye.

Her beşê ku li dijî şaristaniya fermî nebûyî dewlet û li hemberî hemû rengên êrişên dewletê hewl dayî nirxên demokratîk-komînal biparêzin, ji çi beşî dibin bila bibin, faktorên bingehîn ên Şaristaniya Demokratîk in. Ji ber vê yekê, dema ku ji % 10 xwe di asta fermî de sîstematîze dikin, ji %90'ê qismê ji dervayî vê mayî jî, erê di warê pergalê de berbelav bûye, lê wekî hebûneke civakî ya exlaqî û polîtîk jiyana xwe domandiye.

Rêber APO di vê derbarê wiha dibêje: “Dema ku ez hem bala xwe didim cewhera civakê ya dîrokî-civakî, hem jî dîroka komên klanan, eşîretan, qebîleyan, qewman, cemaetên olî û hwd. tevgerên wan tînim ber çavên xwe, ne dilê min û ne jî zihniyeta min qayîl nabe ku ez van tevgeran wekî ‘barbar’ pênase bikim an jî wekî ‘olperestiya paşverû’ bi nav bikim(22) ”.

Wekî encam, dîroka şaristaniya fermî diçe hetanî pêkhatina hiyerarşiya îcada yekem a zilamê qurnaz û bi hêz ku pergala serdest a tekparêz xwe li ser vî esasî bi kok dike.

Civaka xwezayî (klan û qebîle) şaneya bingehîn a civakîbûnê ye. Bêyî civaka kok, qet ti civak pêk nayê. Ji ber vê yekê, Civaka Xwezayî şaneya bingehîn a Şaristaniya Demokratîk e. Her du kevneşopiyên ku di bingeh de li dijî hev, di nav têkilî-danûstandin û nakokiyan de heya roja me ya îro hatine. Heke mirov bi kurtasî bibêje; şaristanî, çandek a dewlet-çîn-desthilatdariyê ya navend bajar e, ku di encama dûrketina ji civaka destpêkê ya exlaqî û polîtîk derketî holê ye. Dema ku ew ji kenala şaristaniyê yê ku di avaniya civakî de parçebûyî û temsîla dewletbûnê, desthilatdariyê, çînayetiyê dike re dibêjin şaristaniya çîn-dewletê, em jî ji kenala ku beşên civakê yên li derveyî dewletê mayîn, nebûyîn desthilatdar ku temsîla piraniya beşê civakê (%98’ê civakê) dike re, dibêjin Şaristaniya Demokratîk. Şaristaniya çîn-dewlet û Şaristaniya Demokratîk, karekterê dualî yê dîroka şaristaniyê ne. Bi gotineke din tez û antîtezê pêk tînin.

Tişta ku divê li ser pênaseyên Şaristaniya Demokratîk û şaristaniya hegemonîk a yekdestdar di zihniyetan de were

rûniştandin, hişmendî û cudahiya şîrovekirina bingehê civaka dîrokî ye.

Pênaseya teoriya Modernîteya Demokratîk a di derbarê têgînên şaristaniyê, Şaristaniya Demokratîk û Şaristaniya Navendî de, bi vî awayî ye. A giring danasîna bingehîn e. Di van mijaran de, nêrîn û pênaseyên cuda jî hene. Lê wê bi sûd be ku mirov mijarê ji rê dernexîne û binirxîne.

Jon Zerzan ku anarşîstek e, dibêje: “Dayîka hemû xirabiyan şaristanî ye û divê rasterast were redkirin”.

Ibin Xeldûn, nivîskarê pirtûka Muqedîmeyê ye. Desthilatdarî wî sirgûnî Yemenê dike, li wir dîroka Îbîryayê dinivîse. Ev berhem bi navê Muqedîme dibe pirtûk. Li hemû dibistan û zanîngehan tê xwendin. Di zanistên civakî de meheng û otorîte ye. Bingehê orjînal ê avaniya civakê esas digire. Wî çanda Bedewiyan vekolîn kiriye. ‘Li ser gund û bajar’ vekolînan pêk tîne. Ev civak orjînal e, ji derveyî bajar, çanda maddî-manewî ava dike. Exlaq û sazûmaniya xwe ava dike û bi rê ve dibe. Ji civaka derveyî desthilatdariyê re dibêje civaka orjînal.

Ibin Xeldûn têgînê diafirîne. Dibîne ku bajarbûn li ser bingeha nirxên heyî pêş dikeve. Ibin Xeldûn ji siyastê hat qedexekirin, li Yemenê li taxên feqîran di konan de jiya û faktorên şaristaniyê jî li bajar dijiyan. Ango kesayetiyek wisa ye ku ew bi xwe li herêmên ji derveyî şaristaniyê jiyaye. Ji ber ku Ibin Xeldûn jiyana bedewîtiyê hîn bêhtir bi exlaqî, durist, hevgirtîtir û hîn bêhtir civakî didît, wî bajarbûn wekî jiyanek lûks, mezêxer, bêedalet, veçirî û çelexwehr didît. Ibin Xeldûn, civaka resen a Bedewiyan û bajarbûn wekî du robarên ji hev cuda didît. Bajarbûn pêş dikeve lê orjînalîte-resenî winda nabe, hebûna xwe

diparêze. Wisa tê famkirin ku Ibin Xeldûn tam bi sîstematîk neke jî, şaristanî wekî du kuçeyên ji hev cuda digirt dest.

Ji aliyê din ve Marks, ji serdema fermî ya berî dîrokê re dibêje Civaka Komînal a Prîmîtîv û dide xuyakirin ku civaka xwezayî nemaye û pêş nakeve jî. Ango dibêje vê civakê tiştek nexuliqandiye, ava nekiriye û pêş nexistiye. Dîrokê, bi desthilatdariyê, bajarbûnê, bi pêkhatina çînan û şaristaniyê re digire dest. Rêber APO, behsa jiyana hatî jiyîn a sedhezaran sal ya pêkhatina Civaka Xwezayî, pêşketina wê û avabûna wê dike. Civaka xwezayî wekî çavkaniya bingehîn a jiyan û mirovbûnê dibîne. Kûrbûna pirsgirêkê ji vir digire dest. Dibêje, civaka xwezayî niha teng bûye, vekişandine aliyekî û qels hatiye hiştin, wekî pergal dibe berbelav bûbe, lê wekî çavkaniyek a azadiyê, bi berxwedanê hebûna xwe ya bi wate didomîne.

Wekî encam, di derbarê şaristanî û bajarbûnê de, divê em behsa çîrokekê bikin ku B.Z. di salên 400'î de li ser tabletekê hatibû nivîsîn. Wê bi sûd be ku em dubare bikin, 'bajarbûn haveynê civaka dewletperest e'.

Di mîtolojiyê de, behsa çîroka Înanna û baxçevan tê kirin. Di çîroka ku behsa rewşa di navbera Înanna û baxçevan dike de, Înanna bang li baxçevan dike û dixwaze hesab jê bipirse. Di vê navberê de, baxçevan xwe davêje tor û bextê Enkî. Ji ber ku şert û mercên civaka xwezayî hîn bi giranî li pêş bûn, Enkî dizane nikare baxçevan biparêze. Lewra ji baxçevan re dibêje: 'Here bajar, xwe li wir veşêre.' Ji ber ku bajar cihê ku mirov ji mirovbûnê, jin ji civakîbûnê, civakîbûn ji xwezayê û cihê ku hilberîn ji dilpakiyê qut bûyî ye. Aha hê di wê demê de, derbasî tomaran bûye ku bajar cihê veşartina xirabiyan e. Ev çîroka ku

jiyana bajar, çîn, hiyerarşî û desthilatdariyê radixe ber çavan, çîrokek herî berbiçav e ku ka şaristanî bi çi mebestê pêş ketiye.

Ruhê gund, mekanê ku hevgirtin, hilberîn, dilpakî û edalet lê pişkivî, yê exlaqî û polîtîk ê ku neheqiyê qebûl nake ye. Divê ev ruhê civaka xwezayî têkeve bajar û jiyanî bibe. Ji ber vê yekê, divê modêla gund û bajaran a Şaristaniya Demokratîk were pêşxistin. Rêbaz û nêzîkatiya têkoşîna Şaristaniya Demokratîk, pêşketin û mezinbûna wê, ji bajaran nayê destpêkirin. Ji bo destpêkirina hişmendiya komînal demokrat ji gund dest pê bike û dû re belavî her derê bibe, divê ev pergal wekî tiştekî nebe nabe, derbasî rewşek mayînde bibe.

## 4- Desthilatdarî

Desthilatdarî, hebûna xwe li ser tinebûna xwerêveberiyê pêk tîne. Ji ber vê yekê, desthilatdarî bêyî tinekirina xwerêveberiyê-rêvberiya cewherî, nikare pêş bikeve. Rêber APO desthilatdariyê wekî “mêtingeriya aboriyê û potansiyela hêzê ya tîrbûyî” pênase dike. (23) Desthilatdarî, yekdestdar e û hemû danehevên maddî û manewî yên di jiyanê de, di destekî de digire .

Dema ku rahîbên Sûmer nîqaş dikirin ku ‘em ê civakeke çawa û pergaleke çawa ava bikin’, digotin; ‘em ê pergal û sazûmaniyek wisa ava bikin ku pergala asîmanî ya jorê daxînin ser rûyê erdê.” Ango têkiliya di navbera stêrkan de, fonksiyona bêkêmasî ya di navbera rokê û gerestêrkan de û sazûmaniya asîmanî ya bi rêkûpêk tevdigere, bigerînin nava civakê. Bi afirêneriyeke îdeolojîk a ku lêhûrbûn û fikirandinek pir mezin dixwaze, desthilatdariyê li ser rûyê erdê bi rêxistin dikin.

Afrêneriya îdeolojîk a destpêkê ya Sûmeriyan, desthilatdarî ye. Pergala xwe li ser vê ava dikin.

Lewra, wê bi sûd be ku mirov têgîna desthilatdariyê û pêşketina wê di vê çarçoveyê de, li ser esasê wê yê dîrokî bigire dest û binirxîne. Ji ber ku hemû tîrên rexneyan, desthilatdariyê pêşan didin. Heke çavkaniya hemû sazî, avahî û amûran desthilatdarî be yan jî hemû girêdayî desthilatdariyê bin û bingehê paradîgma me jî dij-desthilatdarî be, wê demê mirov dikare têgîna desthilatdariyê di zihn û nêrînan de hîn zelaltir pênase bike.

Ji ber giringiya vê sernavê, gelo divê em ji gotina Rêber APO ya li jor a li ser desthilatdariyê “mêtingeriya aboriyê û potansiyela hêzê ya tîrbûyî” ye, çi fam bikin? Gelo divê em vê tesbîta heya bibêjî giring, çawa binirxînin?

Hemû desthilatdarî, bi daneheva berhemên dîrokî derdikevin holê. Lewma formê hemû dewletan wekî gewdeyê van desthilatdariyan tên birêxistinkirin. Ji ber vê yekê, ne mimkun e ku mirov desthilatdariya di roja me ya îro de pêş ketî, ji qonaxa wê ya destpêkê ya avabûnê cuda bigire dest. Ji ber ku hemû dewlet, forma bi sazîbûyî yê desthilatdariyan e.

Desthilatdariyê cara yekê di Sûmeran de xwe gihandiye vê formê. Ji bo vê jî, desthilatdarî ji bo dana dewamkirina pergala xwe, xwe bi şêwazê zincîrî yê rêxistinbûna dewletê berfireh dike. Ji ber vê yekê sermaye û bi vê ve girêdayî dewlet, li ser danahevên dîrokî hebûna xwe pêk tînin .

Hemû sermayeya hatî desteserkirin û zeftkirin, her cûrê danehevê û maliyetê, îca êdî çi be, teqez wekî daneheveke dîrokî

derketiye holê. Sermaye li ser vê pêş dikeve, desthilatdarî û dewlet jî di vê çarçoveyê de tên pêşxistin .

Wê demê desthilatdarî divê wekî yek ji vegotinên danehevê were pênasekirin. Û helbet sermayeya ku ji wir bi dest xistî, qet ji wir ranebû û di rewşa xwe ya mezinbûnê ya bêsekin de, mezin bûye heya gihiştiye geşedana kapîtalîzmê. Ji ber vê yekê, desthilatdarî timî di rewşek mezinbûnê de ye.

Her ku desthilatdarî mezin dibe, dewlet jî bi heman awayî li ser bingehê pêkanîna daxwazên desthilatdariyê, bê rawestan di rewşek mezinbûnê de ye. Rewşa ku em jê re dibêjin mezinbûna hertimî ya desthilatdariyê ev e. Ji ber ku desthilatdarî her tim wekî daneheva sermayeyê xwe mezin û berfirehtir dike.

Bi dewleta yekem a ku cara yekê ji aliyê Sûmeriyan ve hatî avakirin re, di çarçoveya lêhûrbûna ramanî ya ku li ser hatî kirin de, zihniyet jî mezin kiriye û di heman astê de, di warê kirdarî de jî pêk aniye. Û wiha di carekê de dema vê qada jiyanê ji bo xwe pêk tîne, hem di warê dîzayna zihnî de pêşketinek mezin bi dest dixe û hem jî di warê pêkanîna wê de jî ev ji bo wê pêşketinek mezin pêk tîne.

Ev heman tişt ji bo sermayeyê jî derbasdar e. Çawa ku sermaye dixwaze xwe li ser civakê mezin bike, mecbûre ku qezenca zêde bi dest bixe, bi vê mecbûriyetê di heman astê de desthilatdariyê jî dixe tevgerê. Ango faktora desthilatdariyê ya ku sermayeyê di destê xwe de digire, çawa ku her tim kar û qezencên xwe zêde dike, ji bo karibe vê di destê xwe de bihêle, bi qasî pêşketina serdestiya sermayeya têrnexwar a li ser civakê, divê bi heman rêjeyê dewletê jî pêş bixe.

Li vir, tişta ku divê were famkirin, bivênevêtiya dewletê ye. Ji ber ku dewlet li vir wekî danehevek desthilatdariyê her roj di hewldana xwezêdekirinê û di warê sermayeyê de jî di hewldana xwemezinkirinê de ye.

Ji ber vê yekê, her çi qas sermaye, desthilatdarî û dewlet yekdestdariyên ji hev cuda bin jî, wekî YA'yê, DYA'yê, dewlet û yekîtiya neteweyên din, di rastiya xwe de ev hemû yek tişt in û di heman xalê de, bi heman armancê ve girêdayî ne.

Xala ku timî Rêber APO li ser disekine û jê re dibêje mezinbûna kûmûlatîf (mezinbûna zêde) aha ev e. Awayê rojane yê mezinbûna desthilatdariyê, digel zihniyet, fikir û tevgerê, tecrûbe, kevneşopî û geşedan jî her tim bi vî awayê sazîkirinê, bi berdewamî mezin dibin.

Gava mirov bi çavê sermayeyê li desthilatdariyê binêre, wê demê mirov ê karibe kevneşopiya şaristaniya dewletê ya li ser bingehê çînayetiyê bigire dest û rewşa di roja me ya îroyîn de ew gihiştiyê binirxîne. Forma dewlet-neteweya kapîtalîzmê xwe dispêre vê rastiyê. Divê ev rewş wekî mezinbûna herî zêde ya sermaye yê, bi berdewamî di nav de were pênasekirin.

Rêber APO, dema behsa dîrok û civakê dike, dibêje, ji bo mirov rastî û şaşiyê ji hev cuda bike, di nav labîrentên dîrokê de winda nebe, ango ji bo mirov fêlbaziya destpêkê û xefikê bibîne û ji bo çareseriyê jî, divê mirov çavkaniya wê ya bingehîn desthilatdariyê û dewletê bigire dest û binirxîne. Ferqa sereke ya ku modernîteya demokratîk ji hemû ekolên din cuda dike ev e.

Heke mirov pêşketina dîrokî ya pêvajoya desthilatdariyê di çarçoveya wê ya dîrokî û civakî de bigire dest û bişopîne, mirov ê

destpêkirin û pêşketina wê hê zelaltir bibîne. Rêber APO bi berfirehî ev mijar şîrove kirine û bi nêrînek cuda pêşketinên dîrokî raxistine ber çavan. Heke em bi kurtî bibêjin; em ji tomarên dîrokî dizanin ku desthilatdariya mêrê fêlbaz, jin xistiye di nav sazûmaniya hiyerarşî-baviksalariyê de. Divê bingehên sosyolojîk ên navikên destpêkê yên pêvajoya hiyerarşîka ku hê nebûyî dewlet, lê bûbû desthilatdarî, bên ronîkirin û ji vir bên destpêkirin.

Tê zanîn hiyerarşî sekneke ku di tebeqeya herî jor de cihê xwe digire. Heke rewş wisa be, zemînê yekem ê desthilatperestiyê xwe di nav de pêşxistî, malbat e. Divê were zanîn ku heta ev cudahî neyê famkirin, dîroka gerdûnî ya desthilatdariyê jî nayê famkirin. Sedema ku mêrê fêlbaz xistîn navenda sosyolojiyê jî ji ber vê yekê ye. Hiyerarşiya mêran, di nav malbatan, klanan, qebîleyan û eşîretan de hêzek e. Tê dîtin herçend e ku hê nebûbû dewlet û sazûmaniyeke wê ya baş çênebûbû jî, zemînê desthilatdariyê yê destpêkê bi vî awayî derketiye holê.

Lewma qada destpêkê ya ku desthilatperestiyê ji xwe re wek zemîn dît û lê pêş ket pergala malbata baviksalariyê bû ku li dijî pergala malbata neolîtîkê bi awayekî pêş ket, di pergala baviksalariyê de malbat saziyeke xanedaniyê ye. Beriya ku çîn, şaristanî û dewlet derkevin holê, xanedanî derdikeve holê, ji nav xanedaniyê jî dewlet, çîn, desthilatdarî û şaristanî derdikeve holê.

Hê şênbertir, wekî ku di dîrokê de jî tê dîtin, beriya çîn, dewlet û desthilatdariyan, pêşketinên li Mezopotamyaya Jêrîn ên di serdema çanda El Ubeyd de, pêvajoya ku em jê re dibêjin

hiyerarşiya civakî, hebû. Dîrokê piştrast kiriye ku ev çanda şivantî, nêçîrvantî, koçerî û baviksalariyê ya wekî qebîleyan hebûna xwe domandî, di nav pergaleke hiyerarşîk de hatiye jiyîn. Şayed, heke dîrokê ev heqîqet îspat kiribe, mirov dikare ji vê xalê dest bi pirsên esasî bike û xwe bigihîne hinek vedîtinan. Wê demê kî vê hiyerarşiyê bi rê ve dibe? Kî ye ev ê timî em behsa wî dikin û em jê re dibêjin zilamê fêlbaz? Şaman, fermandar kî ne û ev hêman xwe dispêrin çi? Dema me bersiva van pirsan da, wê karekterê desthilatdariyê jî were famkirin.

Heta ku rewşa vê tifaqa sêalî neyê hilpesartina hiyerarşiya malbatê ya baviksalariyê, hemû şîroveyên werin kirin an wê giştî û ne zelal bin an jî wê dogmatîk bin. Wek tê zanîn, li gorî nêrîna rast (dûz) a dogmatîk, di desthilatdarî û pergala baviksalariyê de, zeman û mekan û nêrîn û tezên ji civaka neolîtîkê derketîn, hatine piştguhkirin. Pêşketina civaka dîrokî daye xuyakirin ku Sûmeriyan xwe spartine daneheva civaka neolîtîkê, bi îstismarkirina vê danehevê, çavkaniya xwe ya sereke red kirine. Lê tevî vana tevan jî, li qadên ku civaka neolîtîkê lê heyî, pêkhateya dewletê lê çênebûye. Lewma, ji Mezopotamyaya Jêrîn dest pê bike, heta ku baviksalariyê malbat nekirî navendek a hêzê, pozîsyona malbatê xurt nekirî, ne pêkan bû ku têgîna desthilatdariyê jî pêş ketiba. Em dibînin ku ev pêşketin destpêkê di şexsê zilamê fêlbaz û piştre jî di şexsê xanedaniyê de wekî navenda desthilatdariyê derketiye holê. Ango çavkaniya pergala desthilatdarî, çînayetî, xanedanî û dewletê, Mezopotamyaya Jêrîn e.

Pêvajoya serdestiya hiyerarşîk, beriya pêkhateya dewletê, di nav Sûmeriyan de bi giştî li ser bingehê danûstandinên malbatî û xanedanî hebûna xwe parastiye. Ev serdem B.Z. di salên 5500-

3500'î de bû. Pêvajoya avabûna pergala malbatî ya baviksalarî û xanedaniyê, heta salên 2 hezarî didome. Ji ber vê yekê, têkiliyeke rasterast a xanedanî, desthilatdarî, çîn û şaristaniyê bi hev re heye. Û çîn û dewlet jî, di nav malbat û xanedaniyê de pêş ketine.

Ji ber vê yekê, teza ku dibêje piştî çînan desthilatdarî, dewlet û şaristanî pêş ket, ne rast e. Di çavkaniya vê pêşketinê de, hiyerarşiya baviksalariyê û xanedanî heye.

Çîn, ne ji jêr ve û bi tena serê xwe ji qadên hilberînê derketine holê û pêş ketine. Berevajî van hemûyan, pêvajoya çînayetiyê piştî pêşketina hiyerarşiyê, xanedaniyê, desthilatdariyê, dewletê û şaristaniyê, pêş dikeve. Yanî pêkhatina çînayetiyê ji jor ber bi jêr ve bi kûrbûnê çêbûye. Piştî derdikeve holê, ji bo karekterê xwe yê çînîtiyê bi rêxistin bike, çînên dijber çêdike û bi vî awayî hebûna xwe pêk tîne. Civaka bi çîn û şaristanîperest, li ser vê binyatê pêş dikeve.

Her çi qas şîroveyên çîn, dewlet û desthilatdarî bi bajarbûna li nav Sûmeriyan û derdora Zîgûratan derketine holê û li wir pêş ketine, rastiyek jî be, heqîqeta wê hemûyê ne ev tenê ye. Herçend e ku vê pêvajoyê jî dihewîne nava xwe, lê gava ku pêvajoyên baviksalariyê, hiyerarşiyê, malbatê û xanedaniyê bi hev re werin destgirtin, hingê wê pêvajoya bajarbûn û zîgûratan karibe bi wate bibe. Çînayetî, di asta pêşketina têkiliyên malbat û xanedaniyê de, bi dewlet û desthilatdariyê re pêş ketiye. Û wiha bi berfirehbûna desthilatdariyê re, ji jor ber bi jêr ve, çînên dijber hatine afirandin.

Baviksalariya ku bi çîroka zilamê fêlbaz û bi hêz hatî destpêkirin, avaniyeke ku pergala serdema rêveberiya dayîkê-jinê ya xweser guhertî û li ser bingehê dana avakirina binemalek

(malbat) hê tengtir, desthilatdariya xwe dayî avakirin e. Pêngava destpêkê ya avabûna desthilatdariyê, bi vî awayî ye. Heke bingehê desthilatdariyê di warê sosyolojîk de neyê şîrovekirin, nirxandinên dogmatîk û giştî wê pêş bikevin. Di serê van nirxandinên dogmatîk de, ya herî xwe dide der ew nirxandinên ku dibêjin desthilatdarî li Mezopotamyaya Jorîn ji nav pegala xwerêveberiya dayîkê derketiye. Ev awayê nirxandinan ne rast in. Rast e şaristaniya çînî xwe dispart îstismarkirina nirxên Mezopotamyaya Jorîn, lê desthilatdarî li Mezopotamyaya Jêrîn ji nav çanda El Ubeyd derketiye holê.

Pergalên şaristaniyê, pergalên desthilatdariyê ne û çavkaniya wan jî zihniyeta desthilatdariyê ye. Divê şaristanî bi giştî û bi hemû rehendên xwe ve, bi hemû pêkhateyên xwe ve û bi çavkaniya xwe ya jixweber ve were destgirtin. Girtina dest an jî nirxandina rehendek a desthilatdariyê, ji pêkhateyek tenê ya wê destpêkirin û ji wir dest bi azadiyê kirin, şaş e. Ev awayê parçe parçe girtina dest ê şaristaniya giştî, di dubendiyek 'baş' û 'xirab' de hiştinê, nirxandina zihniyeta 'baş' û 'xirab' di nav çembera hatî çêkirin de, wekî xefikek a desthilatdariyê pêş ketiye.

Mînak, di manîfestoya komûnîst de, tê gotin ku heta pergala sosyalîst amûrên xwe yên hilberînê, hêza xwe ya îqtisadiyê parçe parçe ji bûrjuwayan nestîne, yekdestdariya wan hilneweşîne, pergala sosyalîst ava nabe. Aliyekî tenê, parçeyek tenê girtina dest a şaristaniyê, dibe sedem ku mirov di nav çembera ku desthilatdariyê dayî çêkirin de bimîne. Wê bibe wekî teorî û pratîka sosyalîzma çêbûyî. Wê bibe sedema derneketin û helandinê di nav pergala şaristaniyê de. Lewma, di vî alî de, ev hêzên ku wekî aktorên li dijî pergalê tên naskirin, di pêşketina desthilatdariyê de dibin xefika herî bingehîn a desthilatdariyê.

Rêber APO aktorên vê pêvajoyê wekî ‘mezheba kapîtalîzmê’ pênase dike.

Pergala dewlet û şaristaniyê, şeklê rêxistinî, siyasî, aborî, hiqûqî, leşkerî û yekdestdariya desthilatdariyê ne. Dewlet organîzasyoneke ku sînorên wê bi awayekî hiqûqî hatîn xêzkirin e. Lê desthilatdarî li her derê ye.

Bakûnîn di yek ji polemîkên xwe de yên bi Marks re gotibû: “Dewlet hejariyê diafirîne.” Di bersiva vê de Marks dibêje: “Koletiya siyasî hejariyê tîne.” Teza Bakûnîn a ku dibêje: “Dewlet, ji bo ku jiyana xwe bidomîne hejariyê diafirîne,” digel rastiya wê jî, di dawiyê de dewletê wekî “Xirabiya mecbûrî” pênase dike. Marks jî dibêje: “Hejariya siyasî koletiyê diafirîne, ev jî dewletê neçar dike.” Bakûnîn di berdewamiya polemîkên xwe yên dijberî hev de dibêje, rêya ji holêrakirina hejariyê, di hilweşandina dewletê re derbas dibe.

Kropotkîn jî, bi ceribandinên xwe yên reel sosyalîst tevlî nîqaşê dibe. Li gorî wî, tu çi qasî dewletê navendî bikî, azadî jî ew qasî di wê astê de dimire.

Nîetzsche jî dibêje, di nava dirindeyan de ya herî hov dewlet e. Bi dengê bilind dibêje, li cihê ku dewlet lê hebe, heqîqet li wir ji holê radibe û winda dibe.

Rêber APO, tevî vê nîqaş û teşhîrkirina xwe ya xurt û berfireh a li hember desthilatdariyê, hem ji bo yên diperçiqînin û hem jî ji bo yên diperçiqin, desthilatdariyê wekî “fahîşeya ducinsiyet” digire dest. Ji ber ku desthilatdarî, bi xweveşartinê û ji şeklekî derbasî şeklê din bûnê, xwe pêş dixe.

Hegel ê ku wekî mîmarê dewletneteweyê tê naskirin, dewlet û desthilatdariyê wekî nûnerên xweda yên li ser rûyê erdê dibîne. Li gorî Hegel, teqez divê her civak bibe xwedî dewlet û her dewlet jî mecbûre bibe dewletnetewe. Li gorî wî, civaka herî bi nirx civaka xwedî dewlet e, civaka bê dewlet bê armanc û bê nirx e. Hegel teza xwe dispêre tinebûn-hejariya civakê ya beriya dewletê. Li gorî Hegel, beriya dewletê şexs hebûn, her ku ew şexs bi hêz dibûn, sînor derbas dikirin. Beramberî sînorên dihatin derbaskirin, pevçûn çêdibûn, ev jî dibû sedema kaosê. Aha di vê serdemê de, dewlet derdikeve holê. Û di berdewamiya axaftina xwe de dibêje, kaosa civakî ya ji ber pevçûnên di navbera kesan de çêdibe, bi dewletê hel dibe. Ji ber vê yekê, gotina Hobbes a dibêje, "Mirov gurê mirov e", wekî rabêjiyek a misogeriya avabûn û rewabûna dewletê pêş dikeve.

Hobbes ê ku hizirvaneke Brîtanî ye, beramberî pirsa 'ji bo sazûmaniyek nû civakek çawa?', ew gotina hin kesan a ku dibêje, 'em desthilatdariya hinekan bi civakê re parve bikin', wekî tiştekî ku qet nayê qebûlkirin, dibîne. Û dibêje, dewleta ku serweriya xwe parve bike, nikare wekî dewlet bimîne. Lê îddîa dike ku heke dewlet di mijarên ewlekarî û parastina civakê de rolekî baş pêk bîne, wê civak ji dewletê re îtaetê bike.

Her hizirvanê ku bi awayek hûr û kûr mijara desthilatdariyê nîqaş kiriye, dema ku nêrîna xwe dida pêş, di heman demê de hewl daye ku nêrîna xwe dîrokî û zanisî bike. Mînak, hizirvanê Ingilîz Hobbes, îdia dike ku mirovên beriya dîrokê ji ber ku wekî gura xirab bûn, hevdû dixwarin. Dibêje, mirov gurê hev in, dewlet ji bo vê yekê rola dadwer dilîze .

Lewma, dema Hobbes teza xwe pêş dixe, dibêje pêwîst e dewlet rewa be. Ji ber vê yekê, ji bo hebûna dewletê divê sedemek hebe, egerek hebe, baş e çi ye ew sedem? Dema ku wî rabêjiya xwe ya mirov gurê mirov e pêş dixist, Xiristiyantiyê ji xwe re dike mînak û esas digire.

Di Xiristiyantiyê de, civak wekî kerî tê dîtin. Felsefeya şivantiyê, li ser vî bingehî civak çawa were birêvebirin, dane pêş.

Foucault ku fîlozofekî Fransî ye, danasînên pir berfireh li ser desthilatdariyê dane pêş. Di bin çar sernavan de desthilatdariyê digire dest:

a- Venêrîn (Çavdêrî-Kontrol): Di Erebî de tê wateya 'mutewa'. Li gorî Foucault, civakên modern bi rêbazên xwe yên taybet, kesan dixin bin hukumraniya xwe. Yek ji amûra vê metodê ya herî giring jî kontrol e. Ev rêbaz, ji bo kontrolkirina liv û libatên gewde û sererastkirina metoda mekanîzmaya zanistî pêş dikeve.

b- Disiplîn: Li gorî pêvajoya biyo-desthilatdariyê, êdî li şûna ku desthilatdarî wekî berê bi kuştinê mirovan bi rê ve bibe, divê mirovan bi zindî bigire bi rê ve bibe. Serikê van rêbazan jî disiplîn e. Disiplîn, normalîzekirina domandina desthilatdariyê, bi zindî gewde xistina di xeta hilberînê de û li gorî pêvajoyên aboriyê eyarkirina nifûsê ye. Berê bi kuştinê, di serdema nû de bi dana jiyankirinê, sûd ji gewde-bedena mirovan digirin û bi rê ve dibin. Li gorî Foucault, ev serdema biyo-polîtîk e. Bi gotinek din serdema sererastkirina nifûsê ye.

c- Pêvajoya Hiyerarşiyê: Zindan (modela panapticon) modêla bingehîn e. Birca çavdêriyê heye ku her

odeyê dibîne. Hemû tevger di vê birca çavdêriyê de tên şopandin. Heke li vir ango di wê bircê de ti kes tine be jî û ti kes neşopîne jî, girtî difikirin ku timî li wan tê mêzekirin û hemû tevgerên wan di bin şopandinê de ne. Îca li gorî fikra ku 'em tên şopandin û li me tê temaşekirin' tevdigerin û teşe didin tevgerên xwe. Cihên ku hiyerarşî herî zêdê lê xurt û pêşketî, baregeh, kargeh û girtîgeh in. Di girtîgeh an jî zindanan de, mûdîr û gardiyan xuyayî ne. Cewhera vê teknîkê, xwe dispêre dîtina bêyî bînîn, di nava civakê de, di gelek saziyan de ev rêbaz tê bikaranîn.

d- Pêvajoya Normalîzekirina Ceza û Qanûnê: Êdî ji bo civakê cezakirin normal û rewa tên dîtin û dibin tiştekî hundirîn. Ferdên ku li hember an jî berevajî van pêvajoyên ku desthilatdariyê çêkirine derkevin, divê bên cezakirin. Di vê çarçoveyê de, cezakirinên cuda yên hiyerarşiyê hene û bi cûrbicûrkirina cezayan, ew ber bi pêvajoyek a normalîzekirinê ve birine. Yên ku li gorî vê jihevcudakirinê tevnegerin, tên vederkirin. Berê gund hebûn, pirsgirêkên xwe yên di mijarên civakî, aborî, çandî û ewlehiyê de wan bi xwe çareserî jê re didît, hel dikirin. Dema mûdîrek, karmendek ê hejmartina nifûsê-serjimêriyê diçû gund, bi çavekî ecêb û ximam lê dihat mêzekirin. Karmend digot: "Em ê pirsgirêkên we çareser bikin." Wisa dest bi gotinê dikirin. Lê di rastiya xwe de, gel bi xwe pirsgirêkên xwe çareser dikir. Hewcehiya gel bi wî tine bû, nedihat qebûlkirin jî.

Dema ku bi demê re ev rewş hat qebûlkirin, jiyana bi karmed û mûdîr ve girêdayî jî hat qebûlkirin. Piştî ku derbasî pergala hiyerarşiyê ya desthilatdariyê bûn, rêbazên din jî tên bikaranîn û meşandin. Êdî piştî wê her tişt normal dibe û ber bi hundir ve diherike. Normalbûn, refleksan dikuje. Refleksên ku

dimirin, cihê xwe ji pencên mekanîzmaya desthilatdariyê re dihêlin.

Di vê derbarê de, pênaseya Foucault a li ser desthilatdariyê, gelekî kûr û bi hêz e. Di warê danasînê de, ji Marksîst û anarşîstan veqetiyaye. Desthilatdariyê ji serdestiya bûrjûwayan wêdetir digire dest, dide xuyakirin ku serdema desthilatdarî û dewleta navendî ya klasîk qediyaye. Lewma desthilatdariyê wekî bênavend pênase dike, ji ber ku ‘desthilatdarî li her derê ye’.

Dibêje, desthilatdarî li her derê û her qadê heye, bi gotin û zanistê xwe pêk tîne û xwe zêde dike, xwe di hemû çavikên civakê de bi cih kiriye û têgihiştina desthilatdariyê ya civakî pêş ketiye.

Zanyarê Amerîkî Signul Browan jî, bi pênaseyên xwe Foucault derbas dike. Dibêje, berde zêdebûn û li her derê hebûna desthilatdariyê, êdî di serdema ku em tê de dijîn de, desthilatdarî veguheriye girêdanbûnek dilxwazî û wekî şêwazê xwehesibandinê. Dibêje, mirov bi daxwaza xwe diçe cem psîkologan, zarok, jin û hevjîn li van deran hêza çareseriyê dibînin, mirov bi rêya amûrên moda, reklam û televîzyonan bi dilxwazî tên birêvebirin, bi kurtasî dide diyarkirin ku hêza çareseriyê ya hemû pirsgirêkan, bi mayîna di nav sazî û mekanîzmayên hatin avakirin de tê çareserkirin. Û dide diyarkirin ku ev sazî û pergal wekî navnîşana çareseriyê tên destgirtin û bi xwestek û dilxwazî ber bi wan ve tevgerîn çêdibe .

Dema ku Foucault dide xuyakirin û dibêje di bin kontrola mirovan de ev pêkhatinên di girtîgeh, baregeh, tîmarxane, dibistan û kargehan de çêdibin, Signûl Browan jî wî derbas dike û dibêje, êdî mirov bi daxwaza xwe beşdarî wê mekanîzmayê dibin

û dibêje ji kontrolkirinê ber bi pabendbûneke dilxwazî ve çûye. Behsa serdemekê ya armanca wê jiholêrakirina nakokiyan dike.

Mînak, mirov ji bo standina şûşeyek av diçe navendên kirîn û firotinê. Ji bo şûşeyek av bistîne, çûye wî cihî, lê bi kirîna du kîs tişt ji wî cihî derdikeve. Mirov li gorî hewcedariyên xwe dijî. Baş e, kî van hewcedariyan dide diyarkirin? Bi reklam û bangeşiyan, xwestek û bibîrxistinê çêdibe, tê birêvebirin.

Budçeya Pentagon û Hollywoodê mînakek din in. Budçeya Hollywoodê ji budçeya Pentagonê zêdetir e. Filmek bi deh zimanan tê wergerandin. Axaftin, hezkirin, şekl û şemal, danûstandin, bibîrxistin û têgihiştin tim heman e. Bombebaranek çandî heye.

Wekî tê zanîn, êdî biyolog li ser şaneya mirovan lêkolînê dikin. Nakokiyên civakî hatine mehandin, êdî lêkolînên li ser başî û xirabiya genên mirovan pêk tên. Êdî nêrîn hene ku dibêjin, di şaneya mirovan de genek xirab jî heye. Heke gena xirabiyê hebe, gena qenciyê jî heye, ku gena xirabiyê jê hat derxistin, mirovê qenc ango civaka qenc wê çêbibe. Mirovan sewqî fikrandinek bi wî awayî dikin. Mesele, dibêjin “Gena şîdetê heye, heke em vê gena şîdetê bibînin û derxin, em ê karibin pêşî li hewldana şîdetê ya mirovan bigirin!” Binêrin, ji bo pêşî li şîdet-tundûtûjiya civakî, tundûtûjiya takekesî bigirin, nîqaşan bi kû ve dibin? Em bi pergalek a desthilatdariyê ya ku hegemonyayê, mêtingeriyê û desthilatdariyê spî û rewa dike û di şaneyên genetîk û biyolojîk de li bingehê pirsgirêkê digere re, rû bi rû ne.

Refleksa Nietzsche ya beramberî rewşa jiyanê ya zemanê xwe ‘Xweda mir” bû. Ango digot, manewiyet û cewher miriye.

Foucault jî ji serdema ku di nav de jiyayî re gotibû mirov mir ango ‘kirde mir.’

Fîlozof Zîzek jî pênaseya ‘mirovê winda’ pêş xist û got, ‘mirov li xwe digere.’ Mirov, giyandar û xweza bi bobelateke tinebûnê re rû bi rû ne. Sersebeba van a bingehîn jî desthilatdarî ye.

Ji ber vê yekê, li cihê ku kirde û exlaqê civakî lê mirî bin û lêgerînên nû yên mirovahiyê bê encam mabin, êdî li wê derê hikmê jiyanê, desthilatdarî dide diyarkirin. Danûstandinên civakî û şêwazê jiyanê, vê hêmanê piştrast dikin.

Propagandaya zêde tê kirin ku mirov di vê sedsalê de pêş ketiye û bi pêşve çûye. Mînak, bînayiyên wan 10 qat in û hevdû nas nakin. Mirovek dimire bêhn dikeve laşê wî, lê cîranê wî yê li kêleka wî dijî bi vê nahese.

Desthilatdarî, êdî di her kêlî û çirkeya jiyanê de tê dîtin. Dikare were gotin ku ev veguheriyê nav şêwazê jiyan û fikrandinê jî. Êvaran jî, dema mirov tên malê, rastî filman, reklaman û tercîhên medyaya dijîtal tên, dikevin cencereya xuyankên cuda cuda, jiyana mirovan a civakê û civakî, bi parçeparçekirinê ji hev tê veqetandin. Û li ser vî esasî, her mirov û  her malbat, her kom, her cihê kar û her cihê bêhnvedanê û hwd. cih û derdor, wekî cihên kûr yên ji hev parçekirin û ji hev biyanîkirinê tên pêşxisitn.

Berê, li hemberî hinek înad û xweferzkirinan û li dijî bêedaletiyê mirov bi hêrs dibûn, bertek û protesto dihatin pêşxistin. Lê niha, li hemberî her rewşê, ji bo avêtina stersê ji ser xwe, mirov diçin koaforê û sûkê ji bo kirîna tişt û mişta.

Engels, ji bo rewşa karkerên Alman belavokekê dinivîse. Di binê wê belavokê de jî noteke wiha dinivîse, “Navê xwe biguhere, ev çîrok behsa te dike.” Ji ber ku rewşa hemû karkeran heman tişt bû û heman rewş dijiyan. Heke ev gotin di çarçoveya civakîbûna desthilatdariyê de were destgitin, ev şêweyê desthilatdariyê her kesî vedibêje. Ti kes ji derveyî wê namîne. Fîlozofê Rûm ê bi navê Emîr Kûryor, fîlozofekî yê felsefeya exlaq e. Di pirtûka xwe ya bi navê ‘Rizîn’ de dibêje, ‘Destpotên herî mezin, ji bindestan derdikevin’. Hîtler, Mûssolni û hwd hemû wisa bûn. Tevî li hemberî nêzîkatiyên desthilatdariyê ew qas têkoşîn û venêrîn hatibe kirin jî, ji ber ku têkoşînek pir ciddî ya îdeolojîk û têkoşînek a nefsî nehat meşandin, hinek nirx bê wate bûn û yekparebûna kesayetê ji hev ket, belawela bû.

Nietzsche dibêje, ‘desthilatdarî hiş ji serê her kesî dibe û ji rê derdixe.’ Bi rastî jî dema ku mirov li dîroka têkoşînan dinêre, hema hema hemû tevgerên ji bo azadiyê li dijî dewlet û desthilatdariyê têkoşiyayîn, ji ber ku nekarîne diyardeya desthilatdariyê çareser bikin, tevlî desthilatdariyê bûne û berevajî hizra xwe ya azadîxwaziyê tevgeriyane. Heta ku pergalên alternatîf ên demokratîk, bi analîzkirina desthilatdarî û dewletê paradîgmayan pêş nexin, armanc çi dibe bila bibe, encam wê têkçûn û di nav desthilatdarî û dewletê de helandin be. Ji ber vê yekê, Rêber APO got, hemû bandorên desthilatdariyê yên bi kapîtalîzmê têkildar ‘divê bên vereşandin.’ Û got şayed, heke azadî çêbibe, ew jî wê ji derveyî desthilatdariyê çêbibe.

Baş e, tevî ev qas teşhîrkirinê, çima hê jî desthilatdarî dilhebîniya xwe diparêze? Bêguman, sedemên wê yên bingehîn, ji ber pêşkêşkirina derfeta bêhed û hesab a kedxwariyê, dîsan ji

ber pêşkêşkirina derfetên ku karibe bibe hêzeke mezin a maddî ya îstismarê û dîsan ji ber bihêzbûna wê ya di warê leşkerî û siyasî de ku li ser vî bingehî îmkanên kûr ên ekonomîk bi kedxwariyê derxisitne holê. Ango, di çavkaniya wê de kedxwarî heye. Desteserkirina nirxên ku ji aliyê kesên din ve hatîn afirandin heye. Desteserkirina berhemê zêde, nirxê zêde heye. Desthilatdarî di rastiya xwe de van derfetan bi îstismarkirinê pêşkêş dike.

Li kêleka vê jî, xwe wekî rêveberiya civakî dana nasîn a desthilatdariyê, xwe bi vî awayî bi mirovahiyê dana ferzkirin, evane hemû rasterast bi hev ve girêdayîne. Yanî bi awayek pir vekirî em dikarin behsa operasyonek a zihniyetê bikin. Ev mijar wê di mijara me ya rêveberiyê de were destgirtin, lê di bingehê ferasetên di warê zihnî de desthilatdariyê qebûl dikin û ferasetên ku ji wê qut nabin de, operasyona îdeolojîk heye. Ji ber vê yekê, divê rêveberiyên wan, wekî baregeha navendên veşartî yên desthilatdariyê werin nirxandin .

Di vî warî de, têgîna desthilatdariyê gelekî ji dewletê kevintir e. Dewlet di şeklê organîzasyoneke ku sînorê wê hatî diyarkirin de ye. Ji ber vê yekê, dema desthilatdarî bi sazî, qayde û rêgezan ve tê girêdan, dibe dewlet. Heke desthilatdarî nebe xwedî rêgez û bi rêgezan ve neyê girêdan, temenê wê dirêj nabe û mayînde jî nabe. Mînak, gotina ‘çil heramî’ ‘eşqiya nikare bibe hukumdarê dinyayê’, li ser awayek ê desthilatdariyê hatiye gotin, lê desthilatdariyekî ku nikare mayînde bibe. Mayîndebûna desthilatdariyê, bi rêgez û qanûnan ve girêdayî ye. Di vî warî de, nuqteya ku dewletê ji çete, mafya û şebekeyan cuda dike,

xwedîderketina wê ya li qanûnan, hiqûqê û rêgezan e. Tê gotin ku di serdema Atînayê de, Îskender gelekî ji korsanan bi hêrs bûye û li hemberî hemû cûrên korsantiyê, tedbîrên tund digire. Her bi mijarê ve girêdayî, li Atînayê korsanek tê girtin, Îskender bi şexsê xwe dixwaze vî korsanî mehkeme bike. Îskender ji korsan re dibêje: "Tiştekî bibêje, ji bo ku ez te efû bikim." Korsan dibêje: "Ez çawa dikarim bi kelekeka xwe ya biçûk bibim korsan û tu jî bi keştiya xwe ya mezin hatî çêkirin dibî Îskenderê Mezin?" Cudahiya dewletê ji korsan ev e. Di wateya şekil de, tişta ku dewletê ji çete û korsanan cuda dike, xwedîderketina wê ya li qanûnê ye. Aha tişta ku Îskenderê mezin ji korsan cuda dike, çêbûna rewşek şeklî ye.

Di dawiyê de, wekî encam, tiştekî di cih de ye ku mirov mîna diyardeyekê, bi awayekî sîstematîk desthilatdariyê bigire dest, binirxîne û bide nasandin. Kî di nava pergalê de ma, miheqeq wê bibe parçeyek ji pergalê. Mînak, divê mirovên serdest-bindest, dewlemend-hejar, karker-bûrjûwa û jin û mêrên heyî û hwd wekî diyardeyên di nava sîstematîka desthilatdariyê de tevdigerin, bigire dest. Erê rast e di nav wan de nakokî hene, lê ji ber ku pergala desthilatdariyê derbas nekirine û di nav de mane, ji hemû aliyan ve bi desthilatdariyê re di danûstandinê de ne.

## 5- Rêveberî

Heta ku pergala civakê ya dewletperest, têgîna rêveberiyê berevajî bike, wê karibe hukumdariya xwe li ser civakîbûnê bidomîne. Jixwe koka etîmolojîk a têgîna rêveberiyê, ji

hukumkirinê tê. Ev têgîna ku bi têgîna desthilatdariyê re heman tê destgirtin, têgînek biyanî ye û ji derve li civakê hatiye ferzkirin.

Dema desthilatdar têgînên xwe pêş dixin, naveroka heqîqî ya têgînan tine dikin û li ser tasfiyekirina wan têgînan, têgînên xwe ava dikin. Rêvberiya desthilatdariyê ya ku li ser bingehê tinebûna xwerêveberiyê pêş ketî, hem diyardeya rêveberiya civakî red dike, hem jî heta hetayê xwe dixe cihê xwerêveberiyê û hebûna xwe teqez dike.

Her çi qasî were gotin “her tişt ji bo sazûmaniya civakê û bexteweriyê ye” jî, rola ku ji civakê re hatî dayîn, di asta amûrtiyê de ye. Dewleta stabîlîze, ji derveyî hemû mijarên nîqaşê ye. Ji ber ku stabîlîze ye, tê îddîakirin ku nikare bibe çavkaniya pirsgirêkan jî. Heke pirsgirêkek hebe jî, wekî ku sersebeba wê hêzeke dînamîk a civakê be, dewlet civakê wekî amûrekê gunehkar dibîne.

Li gorî feraseta hatî ferzkirin, “Başî jî û xirabî jî ne ji dewletê ye, ji yê ku wê bi kar tîne ye.” Ji ber vê yekê, asta mijara nirxandin li ser bê kirin, wê bes di çarçoveya civak çawa û çi qasî dikare li dewletê zêde bike, de ye. Ji dewleta ku civak hê zêdetir di nav de û baş tê birêvebirin re, tê gotin dewleta  “baş.”

Ev danasîn bêguman teorî û pratîkên desthilatdariyê ne, ku li ser bingehê xwexistina cihê rêveberiya xweser û xwe wekî wê bidin îspatkirin, hatine pêşxisitn. Piştî ku rêveberiyên xweser tasfiye kirin û têk birin, hizrek wisa çêkirin ku civak ‘bê rêveberî namînin’, rêveberiya yekdestdar bi awayekî şeklî xwe xist cihê rêveberiya xweser û qaşo heman wekî wê, xwe da pêşandan. Eşkerekirina vê danasîna berevajîkirinê, ji bo famkirina mijarê pir giring e.

Heke em bi nêzîkatî û danasîna agahî û disiplîna mutleq a moderníteya kapîtalîst bikevin rê û mijarê bigirin dest û pênase bikin, wê têgîna rêveberiyê ji zeman û mekan qut û teng bimîne. Heke welê be, ji bilî danasînên hatîn qebûlkirin ên epîstemolojiya navborî, yên di derbarê guherîn û pêşketinên civakî de, em ê nikaribin xwe bigihînin agahiyên rast ên derbarê rêvêberî û têgînên ku dînamîkên guherîn û pêşketina civakê ne.

Tişta ku pirsgirêka rêveberiyê giring dike, hemû pirsgirêkên jiyana civakî bi vê pirsgirêkê ve girêdayî, xwe didin der û derdikevin holê. Ango sedema ev qas zêdebûna pirsgirêkên civakî û çaresernebûna wan, bi rêveberiyê ve girêdayî ye. Di warê dîrokî de, li gorî ku tê zanîn, sedema derketina pirsgirêkên civakî yên tên zanîn, destwerdan û tepeserkirina xwerêveberiya civakî ye.

Rêber APO vê rewşê wekî "Tecawizkirina diyardeya rêveberiyê" pênase dike û wiha dibêje:

"Pirsgirêka civakî, ji ber destavêtina (tecawizkirina) diyardeya rêveberiyê ji aliyê desthilatdariya hiyerarşîk û dewletperest derketiye holê. Ji ber ku bêyî destavêtin, ji rê derxistin û berevajîkirina diyardeya rêveberiyê, zext û mêtingerî bi sazî nabe, ev diyarde yan pêk nayên an jî nikarin xwe ji demkîbûnê rizgar bikin. Û wiha bi qasî xesb û tepeserkirina rêveberiyê, mekanîzmayên berfireh ên zext û mêtingeriyê, li ser civakan tên avakirin. Bi vî awayî jî, wekî mînaka vekirina Qotiya Pandorayê, hemû diyardeyên civakî di nav pirsgirêkan de dixeniqin(24) ".

Heke rêveberiya civakê ji aliyê “zilamê bi hêz û fêlbaz” ve rastî tecawizê nehatiba û ji rê nehatiba derxistin, desthilatdarî, mêtingerî û zordestî jî ev qasî bi sazî nedibû û pirsgirêkên civakî jî ev qasî zêde nedibûn. Bi qasî ku rêveberiya civakî hat xespkirin û tepeserkirin, pirsgirêkên civakî jî wisa serî hildan, zêde bûn û ketin rewşeke welê ku êdî ji hev neyên derxistin.

Ji bo ku mirov zanibe civakek azad e yan jî kole ye, (bêyî ku mirov gelek faktorên din înkar bike) bi mêzekirina li diyardeya rêveberiyê xuya dibe. Erênî yan jî neyînî, sedema hebûna diyardeya rêveberiyê, di bingeha hemû lêgerînên dîrokî de ev e. Hemû lêgerînên mîtolojîk, olî, felsefî û zanistî di aliyekî yê xwe de, li bersiva pirsa “rêveberiyek çawa” digerin.

Ji Arîsto û Platon bigire, heta Hobbes, Rousseau û Hegel, hemû felsefevanên siyasetê yên dema antîk û serdemên modernîteya kapîtalîst (yên di vê xetê de), diyardeya rêveberiyê bi dewlet û desthilatdariyê re wekhev kirine; civak jî bê rêveberî, terkeserî dîtine, li ser vî bingehî tezên xwe pêş xistine. Û bi çavê girsehêzeke objektîf a ku teqez divê di bin nîzama dewlet û desthilatdariyê de cih bigire, li civakê mêze kirine. Li ser vê binyatê, rêveberiya dewletperest-desthilatdar wekî hêza herî mezin a ku karibe sazûmaniya esasî û bexteweriyê pêk bîne dane pêş. Her ji ber vê yekê ye, dema mijar tê ser rêveberiyê, tişta destpêkê tê bîra mirov dewlet-desthilatdarî ye. Di vê maneyê de, ev berevajîkirin û çelexwartiya îdeolojîk a hegemonyayê didome. Di vir de, tişta trajîk-dilsotîner jî ew e ku yên li ser navê bindestan tevdigerin jî, vê berevajîkirin û çelexwartiyê di vê astê de ji xwe re esas digirin.

Di rastiya xwe de, divê civakîbûn û çanda azadiyê bi têgîna xwerêveberiyê re were destgirtin û nirxandin. Rêber APO desthilatdariya dewletperest di wateya civakî de wekî “rêveberiya biyanî” pênase dike. Ji ber ku ne ayîdî cewhera wê derê ye, ji gerdûn û civakê re biyanî ye.

Ji ber ku xwerêveberî, hêza rêvebirinê ya ji nav civakekê bi xwe derketî û nûnertiya îradeya wê ye. Rêveberiya biyanî jî, dibe ku hêzek dagirker a biyanî ya ji derve be, dibe jî awayekî yê desthilatdariyê yê hindikahiyeke hundirîn  be.

Wê demê em ê ji rêveberiya desthilatdar û dewletê re bibêjin ‘rêveberiya biyanî’, ji rêveberiya civakê bi xwe re jî bibêjin xwerêveberî. Rêber APO xwerêveberiyê (rêveberiya xweser-rêveberiya cewherî) wekî ‘demokrasiyê’ pênase dike. Li ser vê binyatê, bi demokrasiyê re wekhev dibîne. Xwerêveberiya civakê, ango xwe bi xwe rêvebirinê, wekî demokrasiyê dide naskirin.

Rêber APO, diyardeya rêveberiyê wekî “Mejiyê civakî” jî pênase dike. Di rewşa me ya îro de, divê mirov bi awayê mejiyê parçebûyî li pirsgirêka bindestan binêre. Ev parçebûna mijara gotinê, ji vesazûmaniya hiyerarşiyê heya roja me didome. Li hemberî vê jî, berxwedana ku bindestan pêşan jî dayî, ji bo parastina mejiyê xwe yê civakî bûye. Ji ber ku encex bi vî awayî karibin bibin xwedî derfetekê ku hebûna xwe ya jiyanê bi awayekî watedar bidomînin. Bêyî mejiyê civakî, ne mimkun e ku civak hebûna xwe ya jiyanê bi awayekî watedar bidomîne.

Xwerêveberî, ne diyardeyeke tenê bi mirov û civakê ve sînordar e. Ev pêvajoya di civaka mirovahiyê de heyî, ji gerdûnê re jî derbasdar e. Tişta ku piştî teqîna mezin, kaosa li gerdûnê ji

holê rakirî û rêkûpêkî di gerdûnê de pêk anî, diyalektîka xwerêveberiyê ya di gerdûnê de ye. Diyardeya xwerêveberiyê ya di gerdûnê de, navenda enerjiyê ye. Çêbûn, pêkhatin, pêşketin, guherîn û veguherîn, bi navenda enerjiyê pêk tên.

Di vê wateyê de, çawa ku enerjî ‘dayîk’a her tiştî ye, rêkûpêkiya her tiştî ye jî. Dema ku enerjî xwe pêk tîne, hem şekil dide maddeyê hem jî hevsengiya di navbera maddeyê de, bi têkilî û ragihandinê diparêze. Danasîna enerjiyê ya wekî “aqilê gerdûnê” yan jî wekî “ruhê ku maddeyê bi rê ve dibe”, ji vê rastiya xwerêveberiyê û diyardeya “mejî” derketiye pêş. Pergala rokê, hêmana herî newaze ya vê xwerêveberiyê ye. Bi milyonan stêrkên ku tên zanîn û yên ku nayên zanîn ên di pergala rokê de, bi xwerêveberiya gerdûnê pêk hatine. Di piçikên jêr atomîk de jî, organîzasyoneke tekûz a bêkêmasî heye. Heke di cîhanek piçpiçik a ew qas cihêreng û cuda de ‘mejî’ ne xwerêveberî ba, di cîhanek jêratomî de pergalek ava nedibû .

Dema diyardeya rêveberiyê tê pênasekirin, tişta ku divê esas were girtin, ev şêwazê rêveberiyê yê di gerdûnê û civakê de pêk tê ye. Encex bi vê pênaseyê mirov karibe di diyalektîka aktûel û gerdûnî de nêzîkatiyek rast a pratîka rêveberiyê pêş bixe û bibe bersiv ji hewcehiyên civakî re.

Rêber APO, diyardeya xwerêveberiyê ya di mirovan de bi awayê; “rêveberî jî diyardeyeke wekî çandê ye û di civakê de hebûna wê timî didome,” pênase dike. Ji ber ku mirov hebûneke xwe bi xwe, xwe bi rê ve dibe ye. Yanî, pêvajoyek a pêşketinê ya hundirîn heye. Diyardeya rêveberiyê jî, bêyî ku jê qut bibe, bi vê hebûnê ve girêdayî ye.

Dema ku ‘mirovê destpêkê’ çavên xwe li jiyanê vekir û bi rêveçûnê gav avêt, bi hebûna xwerêveberiyê xwe pêş xist û civakîbûn pêk anî. Girêdana rêveberiyê ya bi civakîbûnê ve jî, ji ber vê yekê ye. Lewra cewhera rêveberiyê, pêşketina wê û tevgera wê navxweyî ye, ew li gorî pêwîstiya kapasîteya xwe ya zihin û îradeyê, xwe bi rê ve dibe û siberoja xwe diyar dike. Ji ber vê yekê, tişta ku divê mirov balê bikişîne ser û binê wê xêz bike, divê pêşketina ku çêbibe ne derveyî be, hundirîn-navxweyî be. Mekanîka Kûantom daye diyarkirin ku sedema nezanîna rûdana pêl û piçikên di maddeyê de çêdibe, ji ber rewşeke hundirîn e, ne ji ber ‘kêmûkurtiyeke teknîkî’ ye. Û daye xuyakirin ku dibe ev yek bi tevahî neyê zanîn, lewra dide diyarkirin ku dibe ev di nav îhtîmaleke ku çêbibe de were zanîn. Ji ber ku guherîn û veguherîn rewşeke hundirîn e.

Ev heqîqet ji bo rastiya civakê jî derbasdar e. Heta ku mirovahî biryarên xwe ew bi xwe bide, hiş, hest û tiwaneyên xwe yên din li ser esasê parastina hebûna xwe û ji bo saxlemiya berdewamiya xwe pêk bîne, dîsan xwe li ser hêlên xwe yên maddî û manewî yên çandî bide xwedîkirin, dibe civakî û her ku bibe civakî jî, wê xwerêvberiya xwe jî hê bihêztir bike û karibe xwe hê baştir bi rê ve bibe. Herikîna xwezayî ya çêbûnan û pêvajoya wan a xweavakirinê, di vî warî de hundirîn e. Tişta ku vê pêvajoyê xirab û berevajî dikin, destwerdanên derveyî ne.

Formên civakî yên xwedî nasnameyên sosyolojîk, di serî de bi klan, qebîle, eşîret û civakên ku xwe dispêrin etnîsîteyan, bi sedhezaran sal hebûna xwe bi vê feraseta xwerêveberiyê pêş xistine û domandine. Bi vê feraseta xwerêveberiyê, hemû zorî û zehmetî derbas kirine, bi çareserkirina nakokiyên xwe yên civakî,

hewcedariyên xwe peyda kirine û bi hev re rêbazê çareseriya pirsgirêkan pêş xistine.

Hemû zanistên civakî yên ku hişmendiya desthilatdariyê pêk tînin û çêdikin, têgihandina desthilatdarî û rêveberiyê wisa xurt û bi hêz çêkirine ku, hema bibêje desthilatdarî û xwerêveberî wekhev lê kirine. Ji ber ku dizanin civak bê rêveberî nabe. Lewra karîne bi awayekî pir xurt di avakirina zihniyeta desthilatdariyê de bi ser bikevin. Û karîne dewleta ku rêveberiya desthilatdariyê ye, wekî tiştekî xwezayî bidin qebûlkirin. Aliyên hevpar ên Sokrates, Platon û Arîstoteles, hewl didan sazûmaniya civakê çêbikin. Heke pêwîstiya civakê bi rêkûpêkî, sazûmaniyekê hebe, ev tê wê wateyê ku sazûmaniya civakê hatiye xirabkirin. Hersê hizirvanan jî ev nexweşiya têkçûna çerxa dewletê, bi destên şaş ve girê didan û hewl didan dewletê restore bikin. Sokrates ê ku ilmê exlaq diafirîne, di wê qenaetê de ye ku ji bo avakirina welatiyan, ilmê exlaq dikare dewletê li ser piyan bihêle. Sokrates û peyrewên wî yên ku tê hizirîn jidil nêzî civakê û cewherê mirov bûne, dema digotin divê mirovên baş, dilpak û têgihiştî di rêveberiyê de cihê xwe bigirin, dewlet jî wekî hebûneke bi ti awayî nabe dest bê dayîn didîtin. Platon pêşniyaza çêkirina rêxistinekê bi ûtopyaya dewletê ku karibe koleyan baş bide xebitandin dikir. Arîstoteles, bi dû avakirina dewletekê bû ku bi hêzkirina şexsiyeta endamên xwe karibe xwe jî xurt û bi hêz bike .

Piraniya rewşenbîr û hizirvanên ronesansê (Machiavelli, Destcartes, Kant, Locke, F. Bacon, Spînoza, J. Bodin, Montesquieu, Rousseau, Hobbes û yên wekî Hegel) - li gorî zeman û mekanê ku jiyayîn, li gorî avakirin û cudahiyên fikrê

felsefîk ê ku xwe spartibûnê- di heman şopê de meşiyan e û wan deriyên zihnî yên dewletneteweya îro jî dewam dike, lêkirine .

Heman ev tişt ji bo çîrokên teolojîk ên çêkirî jî derbasdar e. Prensîba anîna desthilatdarek hê baştir li cihê desthilatdarê xirab danîn, yek ji prensîbên herî bingehîn ên di kevneşopiya olî de ye, ku vê prensîbê di Îslamê de rê li ber encameke berbiçav vekiriye. Bi rastî jî di olekê de, ku rêveberî û kar û barên civakî di asteke ew qas bilind de bike û bibêje, “hukmê xweda ye”, xususiyetek e ku divê li ser fikirandin çêbibe, ku pêximber bi zelalî nade xuyakirin ka piştî wî kî wê were ser hukum û rêveberiyek çawa wê çêbibe. Problema exlaqî ya olan “di cihê rêveberekî xirab de danîna rêveberekî baş”, bi vê ferasetê pirsgirêkê digirin dest û çareseriya esasî vê dibînin. Ji bo vê jî, mînaka herî baş û şênber Îslamiyet e.

Rêveberên desthilatdar, timî wekî ku ew çareserî bin, xwe ferz dikin. Ev rewş wekî çerxa xapandinê ya bêwec berdewam dike û diçe. Mirov dikare çerxa bêwec a mijara me ya gotinê (kısır döngü) di filmê Kîbar Feyzo ya Şener Şen û Kemal Sûnal dilîzin û ‘Ebdî Axa’ yê di romana Yaşar Kemal a bi navê “Înce Memed” de, vê şibandinê bibîne. Ji ber ku pergal, di çarçoveya nîtelîka sazûmaniya xwe de axatiyê çêdike, dema ku axayek diçe, axayek din tê şûna wî. Înce Memed ev çerxa xapandinê ya bêwec didît, lê ji ber ku pirsgirêk di sîstemê de nedigirt dest, bêçare dima. Kîbar Feyzo jî, ev çerxa xapandinê ya bêwec didît, lê daxwaza serhildanê ya mirovekî bêhêz, encex bi xwekuştinê bi encam bibe. Heke em ehlê wî gundî bi cîhanê re berawird bikin, modêla Kîbar Feyzo û ya Miho hê jî didome. Yên tên çewisandin û axa hê li cihê xwe ne. Ji ber vê yekê, bêyî guhertina pergalê û bi berdewamî peydabûna axayên nû çareserî çênabe. Ji bo

avakirinê jî, heta ku şêwazê desthilatdariyê yê ku pirsgirêkan çêdike neyê derbaskirin, ne mumkine ku mirov karibe ji nav diranên desthilatdariyê rizgar bibe.

Wekî gotina Îsa pêximber: "Bi hevkariya îblîsan, şeytan nayên qewitandin." Ji ber ku pirsgirêka rêveberiyê, bi şêwazê rêveberiyeke ku pirsgirêkan çêdike re, çareser nabe. Ji ber ku dewletperestî û desthilatdarî tiştekî wisa ye ku "Heke xwediyê desthilatdar we bi lingên xwe biperçiqîne, hûnê ji binê lingê wî bi nexweşiyê bikevin".

Bi xwerêveberiyê û bi redkirina her cûr têkiliyên desthilatdariya dewletperest û otorîter, mirov dikare ji tevnepîrka ku ji aliyê desthilatdariyê ve hatî vedan derkeve derve û azad bibe.

Wekî encam, divê rêveberî wekî çalakiyeke exlaqî û polîtîk a livandinê were dîtin. Mîna polîtîkayê, rêveberî jî diyardeyek wisa ye ku bi peresîna civakîbûna mirovan re pêş dikeve û wekî çandê timî hebûna wê dewam dike. Heke polîtîka hemû kirinên hebûnê yên civakê be, rêveberî jî, ji koordînasyon û pêkanîna van kirinan pê ve ne tiştekî din e.

## 6- Polîtîka

Polîtîka, têgîneke Grekî ye tê wateya rêvebirina bajar. Lê dema ku wekî diyardeyek civakî tê ziman, mirov dikare wekî tiwaneya civakê ya xwerêvebrinê û bi azadî jiyankirinê, xwe ber bi siberojê ve birin û ji bo vê stratejî, taktîk û amûrên pêwîst avakirinê, tê pênasekirin.

Ji bilî vê jî koka peyva polîtîka pol, ji rehên ‘pel’ û ‘ple’ ku di malbata zimanên Hind-Awrûpî de bi maneya “gelek-pir” tê bikaranîn, hatiye. Lewra, koka peyvê me dibe serdema qedîm, gelekî qedîm, me dibe hetanî pêvajoyên (Şoreşa çandiniyê-civaka neolîtîkê) avabûna ziman. Peyva pel, ple ‘pir-gelek’ a ku ji malbata zimanê Hind-Awrûpî hatî, pênaseyeke ku karektera piraniya civakê radixe ber çavan. Polîtîka, bi vê wateya xwe, di warê pênaseya fonksiyonel de, hevsengiyekê li danasîna teoriya Modernîteya Demokratîk dide qezenckirin. Di bin vê perspektîfê de, polîtîka dibe têgînek a ku divê bi civakîbûna demokratîk-komînal ve girêdayî were destgirtin.

Heke mirov bala xwe bidiyê, wekî ku ji pênaseyên polîtîkayê yên li jor jî tê famkirin, mirov digihêje wê qenaetê ku divê polîtîka bi hûnera azadiyê re jî were destgirtin. Heke mirov danasîna polîtîkayê bi vî awayî deyne holê, wê hê baştir were famkirin.

Azadî, di wateyek xwe de heqîqetê jî li bîra mirov tîne, wê demê wê têkiliya herî giring a di navbera azadî, heqîqet û polîtîkayê de jî were famkirin. Ji ber ku polîtîka ji pevrebûna heqîqet û azadiyê afirî ye. Ne mumkin e ev ji hev werin veqetandin.

Ji bo ku mijara polîtîkayê baş were famkirin, belkû baştir be ku destpêkê mirov zanibe ka polîtîkaya hatî berevajîkirin çi ye. Ango heke em berevajî bikin û bidin naskirin ka çi ne polîtîka ye, wê demê dibe ku polîtîka baştir were famkirin.

Di vê çarçoveyê de, mijara destpêkê were destgirtin, polîtîka wekî bi tenê karê dewletê û rêveberên dewletê dana naskirin û bi ser civakê ev têgihiştin dana fezkirin e. Karên

dewletê ne karên polîtîk in. Ev qad karekî îdarî ye. Ji ber ku polîtîkayek spartî dewletê çênabe, lewra tişta ku tê kirin karên îdarî ne. Ango bi kurtî, dewlet di wateya xwe ya rastî de tê maneya burokrasiyê û sazûmaniya hiyerarşîk. Burokrasî û hiyerarşî jî tê wateya sazûmaniya li gorî qanûnan dixebite. Wekî tê zanîn, qanûn jî ji metn û yasayên şênber pêk tê. Qanûn natewin û naçemin, çawa bin wisa tên pêkanîn. Aha ji ber vê, em nikarin bi çavê burokrasî û sazûmaniya hiyerarşiyê, karên ku ev sazî dikin wekî polîtîka pênase bikin. Karê ku tê kirin, karê îdarekirinê ne. Wê demê, dewlet pergalek hatî avakirin e û karên rojane yên sazûmaniya navxweyî yên dewletê jî, karên awayê îdarekirinê ne. Lewma, karên ku têkiliya xwe bi karên heyatî yên civakê ve neynin, wekî polîtîka nayên hesibandin. Evane karên rûtîn in. Ji ber vê yekê, pêkanîna karên pratîkî yên rojane yên pergalên bi sazî bûyîn, nakevin qada çalakiyên polîtîk. Rojane xebitandin û birêvebirina mekanîzma û pergalên saziyan, ne polîtîka ye. Birêvebirina karên bi vî awayî, tenê tê wateya pêkanîna îfadeya wê ya pratîkî. Îdarekirina karûbarên ku bi ser pergala dewelê hatîn amadekirin û bi program bûyîn, ne polîtîka ye. Sedema bi dewletê re wekhevkirina polîtîkayê, ji ber li şûna polîtîkayê bicihkirina dewletê û organên wê ye. Ji ber vê yekê, hemû karûbarên dewletê wekî polîtîka hatine hesibandin û li ser vî esasî di zihnê mirovan de hatiye bicihkirin.

Karên ku ne bi demokrasî, azadî, wekhevî û edaletê ve girêdayî bin, di rastiya xwe de ti têkiliya wan bi polîtîkayê ve tine ye. Polîtîka, bi azadî, wekhevî, edalet û demokrasiyê ve girêdayî ye û bi van re têkildar e. Têkiliya polîtîka, demokrasî, azadî, edalet, exlaq û hwd. ji vir derdikeve holê. Bêyî bi hev ve girêdana bi van re û bêyî vana; polîtîka, wekî polîtîka nayê hesibandin. Divê

were zanîn û zelal bibe ka berevajîkirina polîtîkayê dibe çi û polîtîka dikeve çi rewşê? Wê demê polîtîka çi ye?

Em dikarin hemû qadên heyatî yên berjewendiyên civakê, yên wekî; jîndarî, ewlekarî, xwexwedîkirin (xwarin û vexwarin), hebûn û qadên ku dewletê pêşî lê girtîn ên wekî azadî, wekhevî û demokratîkbûnê, wekî qadên polîtîk bidin xuyakirin û zelal bikin.

Heke mijar berjewendiyên heyatî yên civakan be û berjewendiyên heyatî yên civakan di bin metirsiyekê de bin, her çalakiya ku were pêşxistin, derbasî qada polîtîkayê dibe. Ji ber ku jiyana civakê di xeteriyê de ye, polîtîka di hewldana lêgerîn û dîtina dermanê zindîbûna civakê de ye, bi karên dîtina çareyan û xuliqkariyê ve mijûl dibe.

Ewlekariya civakê di metirsiyê de ye. Lêgerîna çareyan ji bo qadên bingehîn ên wekî ewlekariya civakê, parastina civakê û rêxistina civakê, dikevin qadên polîtîkayê. Dîsan hewcehiya civakê bi xwarinê-vexwarinê-xwexwedîkirinê heye. Dîtina çareyekê ji pirsgirêka xwexwedîkirinê, xwarin û vexwarinê re, yek ji pirsgirêka bingehîn a qada polîtîkayê ye. Her wiha pirsgirêkên civakê yên wekî nasname û xwerêveberiyê hene. Polîtîka, sazî û çalakiya pêkanîna vê têkoşînê û peydakirina amûrên têkoşînê ye. Dîsa pirsgirêka azadî û wekheviyê yên ku desthilatdarî û dewletê pêşî lê girtî hene. Wê demê bi rêxistinkirina qadên civakê yên wekhevî, azadî û demokrasiyê, lêgerîn û peydakirina şêwazê çareseriyê beramber dewletê û pergala desthilatdariyê, li ser esasê xwerêveberiyê, hewldan û pêşxistina xebatê dikeve qada polîtîkayê. Karên polîtîk û karên dewletê, ne heman kar û heman

çalakî ne. Di navbera wan de ferq û cudahî û nakokiyên mezin hene.

Lewra, divê qada polîtîk û têgîna polîtîkayê, di vê wateyê de bên famkirin û ji hev bên veqetandin. Ji ber ku dewlet û polîtîka, du tiştên ji hev cuda û berevajî hev in. Karê ji aliyê saziyên dewletê ve tê kirin û karê polîtîkayê, ji serî heta binî, bi temamî li dijî hev in.

Yên ku vê cudahiyê nexin navbera wan, nikarin xwe ji desthilatdariya şaristaniya çînî veqetînin. Dîsan, heke bi têgînên giştî û bi perspektîfek li ser van esasan hatîn pêşxistin, li polîtîkayê were mêzekirin, wê derfeta derketina ji nav çerxa xapandinê ya xirab û bêwec a ku pergala desthilatdar û saziyên wê dayî avakirin, çênebe.

Gelekî giring e ku destpêkê di derbarê polîtîkayê de ji hev cudakirin çêbibe. Ji ber ku desthilatdariyê derdor mîna girêkorekê lê kiriye û xetimandiye. Dinya li hev qelibandine; rêyên hespan bi şopên kûçikan re têkel bûne. Hatiye astek wisa ku êdî kes nikare ji nav vê alozî û tevlîheviyê derkeve û bi berevajîkirinê ev qad şêlû kirine. Dema ku em li sûk û piyaseya ku şaristaniyê afirandî binêrin û rastiya hemû têgînan bigirin dest, wê baş were famkirin ka mebest ji kaos û tevlîheviyê çi ye. Her hêzeke desthilatdariyê têgînan li gorî berjewendiyên xwe bi kar tîne, yan jî her kes bi hêza di destê xwe de, ji bo xwerêvebirinê û bûna xwedî hêzê, wekî polîtîka dihesibîne .

Di vî warî de, tenê wekî hêz li polîtîkayê mêzekirin û bi hêzê ve girêdayî bi rêxistinkirina wê, li ser vî bingehî hukimkirin û avakirina hegemonyaya wê û ev jî ji bo berjewendiyê takekesî, çînî û grûbî bê kirin, dibe înkarkirina polîtîkayê. Di çarçoveya

danasîna polîtîkayê de, ji hevveqetandina rastî û şaşiyê û zelalkirina ka çi polîtîka ye û çi ne polîtîka ye, pir giring e.

Rastiya dîrokî jêderek xurt pêşkêşî têgîna polîtîkayê dike. Dema ku mirov li dîrokê mêze bike, mirov dikare vê cudahî û encamê bibîne. Şêwaz û awayê pêkhatina civaka dîrokî, exlaqî û polîtîk e. Bêyî polîtîkayê ne mumkine ku civak çêbibe. Di vî warî de, têkiliyek e ku dest jê nayê berdan di navbera polîtîkayê û civakê de heye. Ji ber vê yekê, polîtîka xwedî fonksiyonek wisa ye ku hemû karûbarên civakê yên maddî û manewî pêk tîne, datîne holê û çareser dike.

Heke bi vê nêzîkatiyê tevgerîn çêbibe, wê xuya bibe ku civakek bê polîtîka ne mumkin e. Ji ber ku çawa civak xwe bi polîtîkayê ava dike, divê polîtîka jî civakê ber bi pêşerojê ve bigihîne. Afirandina derdor û jîngehekê ji bo tiştên wekî stargeh, xurek, xweparastin, ji nû ve hilberandin, zêdebûn û hwd. evane hemû bi polîtîkayê ve girêdayî ne. Lewma çalakiya zihnî yan jî fikira ku vana tevan diafirîne, herî zêde bi polîtîkayê xwe dide der. Di heqîqeta xwe de heke mirov bibêje; polîtîka, çalakiya lêgerîn û peydakirina hewcehiyên civakê yan jî hêza wê ya afirandina ye, wê hê rasttir be.

Rêber APO, jiyana etnîsîteyê ya ku ji klan, qebîle û eşîran pêk tê, bi berfirehî dinirxîne. Dema ku em li dîrokê temaşe dikin, em dibînin ku piştî helîna qeşaya dawî, klan hêdî hêdî ji şkeftan derketin û her ku çû yan li ber deriyê şkeftan an jî li kenarên cihên avî bi cih bûn. Ev pêşveçûnek e. Gelekî giring e û divê mirov zanibe ku guhertina qadên xwe yên jiyanê û veguhestina wan bo qadên nû, bi polîtîkayê pêk hatiye. Bêguman, di wateya xwe ya dîrokî de, sedemên vê yên cografîk, sirûştî û avhewayê jî hene.

Bê virde wirde, ev geşedan ji bo civaka klanê di asteke heyatî de, pir giring bû. Ev îcadeke mezin bû ku klanê karî bi ked û hewldana xwe, xwe ji tengasî û zehmetiyan rizgar bike. Ji ber ku tiwaneya klanê ya xwegihandina hawirdorek hê çêtir a jiyanê, li gorî dema berê pêşketinek pir mezin e.

Civaka klanê ya ku xwe gihandî qadeke jiyanê-qadeke jiyanê bi dest xistî, paşê hêdî hêdî, gav bi gav kon û kozikên xwe ava kirine û gav bi gav derbasî avakirina gundan û jiyana niştecihbûnê ya di serdema neolîtîkê de deketî holê, bûye. Bêguman ev jî di encama raman û çalakiya afiranadinê de pêk hatiye. Ev bûyer bi polîtîkayê pêk hatiye. Di heqîqeta xwe de, ev pêşanî me dide ku polîtîka hûnera azadiyê ye.

Ev jî tê wê maneyê ku di pêkhatina civakîbûnê de, cihekî xuyayî yê polîtîkayê heye. Di rastiya xwe de, civakîbûn tê wateya xwegihandina exlaq û polîtîkayê. Di vê wateyê de, polîtîka û civakîbûn xwedî heman nirxan in. Di pêkhatina civakîbûnê de, roleke diyarker a polîtîkayê heye. Di wan şert û mercan de, lêgerîn û peydakirina karekî, hostatiyek bû.

Ji ber nermbûna zihniyetê, neqandina karekî bi berçavgirtina alternatîfên cihêreng, karê baş kîjan e, neqandina wî karî ji civakê re, çalakiyeke pir zehmet û dûr û dirêj bû. Di nav ew qas nebat û ajalên cûrbicûr ên di xwezayê de, zanîn û dana eşkerekirinê ka kîjan baş e, kîjan xirab, kîjan bi tendurist e, di encama  lêgerîn, tecrûbe, ked û hewldanek pir mezin de derketiye holê. Bi pêşxistina çandinî û şert û mercên wê re, peydakirina çareseriyeke teqez ji pirsgirêka xurekê re, li gorî serdemê çalakiyeke bingehîn a aborî-polîtîk bû. Di encama vê polîtîkayê de, mirov li ser axê bi cih bûne, gund ava kirine û ji bo

ku karibin nifşê xwe bigihînin siberojê, rêyên saxlem çêkirine. Çanda jiyana hevpar, bi hev re jiyan, bi hev re xebitîn, avakirina sazî û îcadên nû, pêşxistina zihniyet û hûnerê, tam polîtîka bi xwe ye.

Pêkanîna pir keşfên wekî kîjan nebat bi jehr e, kîjan ne bi jehr e, bi hev re berawird û muqayesekirina wan, hesibandina wan û rê ji pêşketinên wisa re vekirin ku karibin tîrêjên xwe yên roniyê bidin roja me ya îro, pêvajoyeke polîtîk e. Gava mirov şert û mercên wê demê di ber çavan re derbas dike û li ser dihizire, mirov dibîne ku mîmariya bajaran, polîtîkaya çêkirina xanî û stargehan çawa ji wê deme gihiştiye roja me ya îro. Heta ku ev pêşveçûna wê demê baş neyê famkirin, polîtîka jî nayê famkirin. Rêya fêrbûna hemû îcadan a bi çi xuliqkariyê gihiştine heya vê roja me ya îro, bi famkirina polîtîkayê mumkin e.

Ji bo pevvegirêdana mijarê, divê ev jî were berçvagirtin; kirin û temamkirina karekî heyî, ne karekî polîtîk e. Divê qedandina karekî, zû qedandina wî û bicihanîna wezîfeya xwe wekî polîtîka neyê hesibandin. Pîvanên polîtîkbûnê ne ev in.

Di çarçoveya pergala heyî de, wekî ferd, çîn û grûb xwe xistina di ewlehiyê de ne polîtîka ye. Di vê çarçoveyê de, polîtîka li ser hesabê feyde û encamên xebata çîn, grûb û takekesî nayê kirin. Tişta ku ji bo feyde û zirara takekesî, çînekê yan jî grûbekê tê kirin, ti peywendiya wê bi polîtîkayê ve tine ye. Ev mantiq me ber bi pragmatîzmê ve dibe ku dawiya vê jî antî-civakîbûn û pêşketina ferdperestiyê ye.

Polîtîka, heke li ser bingehê hewcedariyên civakê, ji bo vedîtina îcadên nû fikirandin çêbibe, rewşên nû li ser vî esasî li ber çavan werin girtin, nirxandin, pênasekirin, fêmkirin û li ser vî

bingehî teşedana xwe çêbike, xwe li gor vê rewşê sererast bike û li ser hemû nirxên ku polîtîkaya civakî afirandîn xweavakirin çêbibe, polîtîka derdikeve holê. Lewma, di encamê de ferd, grûb û çîn li ser wan derfetan, berjewendiyên xwe difikirin. Ku ev jî dibe îstîsmarkirina nirxên civakî. Îstîsmarî jî ne polîtîka ye, dizî ye!

Ev nêzîkatî, ji polîtîkbûnê zêdetir, rewşeke ku dişibe destpêka derketina desthilatdariyê. Ev kiryara di dîrokê de çêbûyî, tifaqa hiyerarşîk a baviksalariyê ye ku di şexsê zilamê fêlbaz û bi hêz de, berjewendiyê xwe li ser îstîsmara civakê bi rêxistin dike. Em ji vê pêvajoyê re dibêjin pergala şaristaniyê.

Heke ev nêzîkatiyên bi vî awayî, bişibin derketina dewletê, wê demê dewlet wê bi navê polîtîkayê çi nesîhetê bike, çi bide fêrkirin? Bêguman wê bide fêrkirin bê ka dewlet çawa û bi çi rêbazî derketiye holê. Di vê çarçoveyê de, pênaseyên wekî qurnazî, fêlbazî, derew, dizî, tepeserkirina kedê, talankirin û mêtingeriyê, girêdayî desthilatdariyê ne. Heke mirov bala xwe bidiyê, di roja me ya îroyîn de, polîtîka wisa tê nirxandin.

Rojane nêzîkatiyên bi vî awayî yên xwekirina navend û xweperest tên dîtin. Di polîtîkayê de pîvana bingehîn; hewcehiya civakê bi çi ye, ji bo berdewamiya jiyana civakî, beşdarbûna di nav çalakiyên  peydakirina hewcehiyên civakê de ye.

Wê demê ev pirs giring e. Di çarçoveya  polîtîkayê de ferd, grûb û çîn wê li gorî kîjan pîvanan xwe di ber çavan re derbas bikin? Polîtîkvanekî ku li gorî esasên civakê nêzîk bibe, heke girêdayî esasên bingehîn ên civakê; wekhevî, azadî û rêveberiya demokratîk be, teqez wê bibe sedem ku ji ferdperestiyê dûr bikeve.

Ji ber ku ferdek li ser esasên civakî ava bûbe, dibe endamek ê civaka polîtîk. Ev ferd, bi pêkanîna prensîbên civaka ku endamê wê ye, wê bi berhemdariya domdar civakê dewlemend bike û bi qasî ku vê pêk bîne, wê hem xwe, hem jî civakê pêş bixe.

Ji bo famkirin û têgihiştina mijarê, me hewl da pîvanên pratîkî yên berawirdkirinê û yên bingehîn ên polîtîkayê bidin naskirin. Piştî vê, em ê mijarên dubendiyên diyalektîkî yên di navbera rêveberî û polîtîkayê, exlaq û polîtîkayê, qad û pergalên polîtîk û mijarên girêdayî siyaseta demokratîk de, bigirin dest û derbasî pênaseyên giştî bibin.

Heke em ber bi terîfeke teorîk a polîtîkayê ve biçin, divê em cih bidin pênaseya Rêber APO. Rêber APO polîtîkayê wisa pênase dike:

“Mirov polîtîkayê wekî qada azadiya civakê, wekî qada afirandinê ya ku lê pêşxistina mane û îradeyê tê zêdekirin şîrove bike, ev zêdetir nêzî rastiya wê ye. Heta mirov dikare polîtîka û azadiyê wekhev bibîne. Li vir, mijara li ser tê axaftin ev e, civak hem bi fikir, hem jî bi çalakiyê li xwe û nasnameya xwe serwext dibe, xwe pêşde dibe û xwe diparêze. Dema ku polîtîka bibe erka xwerêvebirinê, hingê wekî polîtîka demokratîk dibe xwedî nasname, lê dema veguhere rêveberiya desthilatdariyê, hingê polîtîka ji rastiya xwe dûr dikeve û dikeve rewşekê ku xwe înkar dike. Qada desthilatdariyê ew qada ku polîtîka lê tê înkarkirin e ”. (25)

Em dikarin vê pênaseyê wekî çarçoveya bingehîn a polîtîkayê “civak hem bi fikir, hem jî bi çalakiyê li xwe û nasnameya xwe serwext dibe, pêşde dibe û diparêze”, bidin diyarkirin. Li vir, krîtera bingehîn a derdikeve pêş

“berjewendiyên heyatî yên civakê, pêşketin û bexteweriya wê ya manewî û afirandinê ye”.

Di çarçoveya danasîna rast a polîtîkayê de, diyardeya rêveberiyê jî zelal dibe. Rêveberiya wê; divê wekî çalakiyeke herikbar a exlaqî û polîtîk were dîtin. Rêveberî jî diyardeyek mîna polîtîkayê ye ku bi pêşketina civakîbûna mirovan re pêş dikeve û di heman demê de diyardeyek wekî çandê domdar e. Heke polîtîka hemû tiwaneya hebûnê ya civakê be, rêveberî jî ji koordînasyona pêkanîn û pratîzekirina vê pêve, ne tiştek din e.

Wekî ku li jorê jî hatî diyarkirin, têgîna polîtîkayê bi têgîna dewlet û desthilatdariyê re hatiye wekhevkirin. Ji ber vê yekê jî, wekî têgînên din di danasîna polîtîkayê de, nêrînek hevpar peyda nebû. Bêguman, têkiliyek xurt di navbera polîtîkayê û rêveberiyê de heye, lê bi rêveberiyan re ne heman e.

Heke mirov polîtîkayê wekî qada azadiya civakê, qada afirandinê ya pêşxistina mane û îradeyê şîrove bike, ev wê hê zêdetir nêzî rastiya wê be. Heta Rêber APO polîtîka û azadiyê wekhev dibîne. Polîtîka di warê civakê de, bi tenê wekî rêveberî nayê dîtin. Ji ber wê yekê, bi demokrasiyê re ne wekhev e. Demokrasî, bi rêveberiyê re wekhev e, ev jî tê wateya “Xwerêveberiyê-rêveberiya xweser”. Polîtîka, ne rêveberî ye, bi rêveberiyê re têkildar e. Rêveberî, bi biryardan û plansazîkirina karûbarên civakê ve têkildar e. Rêveberî, qadeke ku hem bi biryargirtin û plandanînê ve, hem jî bi pratîze û pêkanîna wê ve mijûl dibe. Ji ber vê yekê, polîtîka bi rêveberiyê re pêwendîdar û têkildar e. Di vê wateyê de, rêveberiyê jî dihewîne nava xwe, lê tenê bi rêveberiyê re sînordar namîne.

Divê mirov zanibe û li ser nîqaş bike, ka ji bo çi têgîna polîtîkayê dualî yan jî şêlû hatiye hiştin û çima bi rêveberiya desthilatdariyê re wekhev hatiye destgirtin.

Yek ji wan mijaran a ku di maneyek teng de polîtîka pêve mijûl dibe, rêveberî ye. Nêrîna ku rêveberiyê bi polîtîkayê re wekhev pêşan dide û îddîa dike ku polîtîka karê rêveberiyê ye, di roja me de serdet e. Polîtîka û rêveberiya dewletê, di termînolojiyekê de heliyane û hema hema bibêje bi hev ve bûne yek.

Wek tê zanîn, di çaxa antîk de, polîtîka di wateya rêveberiya bajêr de dihat bikaranîn. Bi qasî kesên ku ew wekî rêveberiya bajar û dewletê pênase dikirin, kesên ku ew wekî 'demos' ango 'rêveberiya gel' pênase dikirin jî ne kêm bûn. Hewldana ramanê ronîbûnê ya ji bo rikibandina polîtîkayê wekî heyî, bi vê serûvena dualîst a peyvê ku li Yûnana Antîk hatibû destpêkirin ve girêdayî bû. Li vê derê, kirdeya li ser teşegirtina polîtîkayê, rêveberî ye. Karûbarên rêveberiyê, kirin û pêkanîna polîtîkayê, dibe krîtereke bingehîn. Xusûsiyeta sereke ya ku dibe sedema nîqaşan jî, wateya rêveberiyê çi ye û bi çi amûran pêk hatiye. Gelek bîrmend hene ku li ser polîtîka û rêveberiyê hinek şîroveyên bingehîn pêşkêş kirine. Li gorî van bîrmendan, kî kar û barên rêveberiyê, bi çi armancê, bi kîjan amûran û çawa pêk tîne? Dema ku dibêjin rêveberî, gelo mebest di wateya dewletê de rêveberiya polîsî (bajar-sîte) yan jî wekî bilêvkirina 'demos' rêveberiya gel e? Di serî de tevlîheviya wateyê ji vê têkilhevbûna dualîst tê. Divê tesbîtên di vê mijarê de bi şêweyekî baldar di ber çavan re werin derbaskirin.

Li Atînayê, beşdarbûna welatiyên azad di civîn û pêvajoyên biryargirtinê yên di derbarê jiyana bajar de, li cihên wekî Agora kombûn û tevlîbûna wan di karûbarên rêveberiyê de bi vî rengî, wekî demokrasiya di wateya “rêveberiya gel” de dihat pênasekirin. Rêveberiyeke ku gel beşdar nebûbe û tenê bi hinek kesên esilzade ve sînordar jî, wekî mînaka Spartayê zordarî û stemkarî bû .

Heke mirov bala xwe bidiyê, xala hevpar a di herdu mînakan de jî, civaka ku rêveberiyê karekterîze dike derdikeve pêş. Awayê beşdarbûna civakê di rêveberiyê de, bûye cihê nîqaşê di hemû pergal û modêlan de.

Bi pêvajoya civaka dewletperest re, polîtîka jî di nav de, gelek têgîn ji aliyê fîlozof, pêximber û civaknasan ve hatine gengeşekirin. Di serê van gengeşe û nîqaşan de, pêwîstî bi rêveberiyek çawa heye û piştre jî awayê tevlîkirina civakê di nav rêveberiyê de hatiye nîqaşkirin.

Dihat texmînkirin ku civak çi qasî di warê hejmarî û cewherî de zêde tevlî karûbarên rêveberiyê were kirin û di derbarê polîtîkayê de were serwerkirin û pêşxistin, ew qas demokratîk bibe.

Di encamê de, tevlîbûna rastûrast û ne rastûrast a civakê ya di rêveberiyê de, nayê wateya ku civak polîtîkayê dike. Lê di çarçoveya dem û mekan de nirxek ê vê tevlîbûnê heye. Bi awayek xwezayî xuyaye ku rêveberiyek ku civak û kesayet zêdetir beşdar bûbin, “baş e” û wê baş be. Lê ev di qada polîtîk de civakê nake xwedî gotin û hêza biryardanê.

Pirsyara herî giring û heyatî, çima civak paşê tevlî polîtîkaya ku jixwe qada wê ya hebûn û azadiyê ye, hatiye kirin? Çima paşê tevlî kirine? Polîtîkaya ku rojane bi karûbarên zihnî û maddî yên civakê ve mijûl dibe û çareseriyê jê re peyda dike, çima paşê tevlî nav civakê û rêveberiyê kirin û çima xwestin tevlî bikin?

Wekî pêwîstiyekê, xwezaya tiştan bi xwe ferz dike ku dibe di her tiştî de hewcehî bi qadek derveyî hebe. Tişta ku li derve dimîne tê tevlîkirin. Ev jî tê wê maneyê ku civak li derveyî rêveberiyê ye, ne polîtîk e. Li cihên ku polîtîka tenê bi karên desthilatdariyê ve sînordar mabe û rêveberî jî di destê komikek elît de hatibe tengkirin û navendîkirin, piraniya herî zêde ya civakê, ji derveyî vê pêvajoyê dimîne û li derve hatiye hiştin.

Forma desthilatdariyê û dewletê, li ser dijberiya bingehê civaka xwezayî pêş ket. Ji ber vê yekê, mirov dikare bibêje desthilatdariyê xwe li ser civakê û li derveyî civakê bi rêxistin kiriye. Forma desthilatdarî û dewletê, di qonaxa xwe ya avabûnê de, ne tenê bi zordarî û şîddetê, destpêkê bi xuliqkariya avakirina zihniyet û îqnakirina îdeolojîk pêş ket. Tê zanîn ev jî di zîggûratên Sûmeriyan de hatiye bi ser xistin.

Wekî ku tê dîtin, bi vê dij-şoreşa ku li dijî civakê pêş ketî, dema ku qada polîtîk a civakê hat valakirin, îdareya dewletê û rêveberiya wê, ew qad dagirtin. Wekhevbûna polîtîka û desthilatdariyê xwe li ser vê çavkaniyê dide xwedîkirin. Piştî wê jî, pêvajo û nîqaşên ketina civakê di nav desthilatdarî û dewletê de û şeklê desthilatdariyê dikeve rojeva hemû fîlozofan, di serî de Sokrates, Arîsto, Platon û di çaxa ronakbîriyê ya Ewrûpayê de jî dibe rojeva nîqaşan a hemû felsefevan, fîlozof, rahîb, pêximber û hozanên wê serdemê.

Halbûkî, desthilatdarî li ser talankirin û windabûna rêveberiya civakî pêş dikeve. Di vir de zelalbûn giring e. Heke em bala xwe bidinê, bi tevlîbûna rêveberiyê ya welatiyên Atînayê, sînorek ji desthilatdariyê re tê dayîn. Lê heke em ji hêla din ve lê mêze bikin, em ê bibînin ku desthilatdariyê bi tevlîkirina civakê di rêveberiyê de, desthilatdariya xwe daye rewakirin.

Di vê wateyê de, polîtîka ya ku ew terîfa wê dikin, di heman naverokê de bi lihevkirinekê desthilatdariyê û rêveberiyê wekhev dikin. Ji ber vê yekê, di roja me ya îro de têgîna polîtîkayê bi rêveberî û desthilatdariyê re tê bi bîrxistin. Lewma li gelek cihan polîtîka wekî “hûnera lihevkirinê” tê dîtin û nirxandin. Bêguman mebesta me ji lihevkirinê ne çareserkirina pirsgirêkan e, lihevkirina dewlet û civakê ye, lê lihevkirinek di berjewendiya dewletê de ye.

Ji ber ku êdî qada polîtîk di nav kozik û xendekên dewletê de ye. Rêveberî jî desthilatdarî ye. Ev pênaseya “rêveberiya dewletê” ya ji bo polîtîkayê hatî çêkirin jî, xwe dispêre jêrxana binhiş. Ji ber vê yekê, her ku pêvajoya civaka xwezayî ku civaka exlaqî û polîtîk bû, rastî ji hev veqetîn û belawelabûnê hat, cihê polîtîkayê ji dewletê re dimîne, exlaq jî veguherî hiqûqê. Dema behsa polîtîka û rêveberiyê dihat kirin, gotina rêveberiya dewletê û ‘polîtîkvanan’ wekî pêvajoyek bisazîbûyî hebû .

Xusûsiyeta duyemîn a ku bûyî mijara nîqaşê jî, têkilî û nakokiya exlaqî ya polîtîkayê ye. Bêguman nêzîkatiya polîtîkayê; bi demokrasî, azadî, xwerêveberî û exlaq re hê zêdetir e. Û ya din jî, hê rasttir e ku mirov ji ber têkiliyên diyalektîka exlaq ên bi polîtîkayê re, polîtîkayê bi azadiyê re wekhev bibîne û di asta şaneya kok de bigire dest û binirxîne.

Ji ber vê yekê, polîtîka û exlaq diyardeyên bingehîn ên civakî ne û nêzîkatiyek xurt di navbera wan de heye. Yek bêyî ya din nayê fikirindin. Herdu bi hev re dînamîkên bingehîn ên civakê ne û karekterê hebûna civakê pêk tînin. Bi vê wateya xwe, exlaq û polîtîka xala pevvegirêdanê ya bingehîn a civakê û cihê destpêkirin û bi dawîbûnê ne. Hemû diyardeyên din ên civakî, bi têkilî û fonksiyona exlaq û polîtîkayê bi gewde bûne.

A ku exlaq bi livûlibat û herikbar dike, polîtîka bi xwe ye. Polîtîkaya ku çavkaniya karekterê xwe ji nermbûna zekaya analîtîk digire, timî meyldarê hilberîn û afirêneriyê ye. Bi vê wateya xwe, hêza bingehîn a afirênerî û dînamîka civakê ye. Bi afirandina qadên nû yên hilberînê yên manddî û manewî, her tim qada jiyanê dewlemend dike, pêş dixe û kûr dike. Lewma exlaqê ku bi polîtîkayê re di nav têkiliyan de, exlaqê ku timî di livûlibatê de ye. Polîtîka di rola hêza bingehîn a livandina exlaq de ye. Heke em polîtîkayê wekî robarek her timî diherike bihesibînin, em dikarin exlaq jî wekî zemînê wê bihesibînin. Robar di cihê xwe de diherike û bi wî re rêkûpêkî û krîter tên bidestxistin û pêşveçûn didome.

Bi qasî têkiliya polîtîkayê ya bi exlaq re, divê mirov li ser nakokiyên wan ên bi hev re jî bisekine. Wekî pêwîstiyek xwezayî ya exlaq, qayîdeyên hişk ên exlaq hene. Ji ber vê taybetiya xwe, piştî nuqteyekê dibe ku hewldanek kevneperest-muhafizekar û dogmatîk xwe pê re bide der. Ev hewldan berevajî prensîbên diyalektîkê ye; heke neyê derbaskirin, bi demê re wê têkçûn û dejenerebûnê bi xwe re bîne.

Exlaqê ku dogmatîze bûyî, dişibe ava sekinî-di cihê xwe de mayî; ji ber ku nikare bilive, piştî mideyekê wê têk biçe, birize,

genî bibe û wê fonksiyona xwe ji dest bide. Bi awayê sosyolojîk, jê re "rizîna civakî" tê gotin. Dogmatîzebûna exlaq, tê wateya qutbûna têkiliyên wî ji polîtîkayê.

Rêber APO, polîtîkayê; wekî qonaxa derbasbûna ji îdeolojiyê ber bi civakîbûnê ve, polîtîkbûnê jî; wekî ber bi hêzê ve çûna fikir, rêxistinbûna wê, derbasî rewşa propagandabûnê û bûna milkê civakê pênase dike.

Ji ber ku têgînên exlaq û îdeolojiyê ji karekterên rênîşander in, hemû şewqvedanên vê, karê polîtîkayê ye. Ji ber ku hemû karê polîtîkayê ne. Ji bo polîtîkayê jî ev rewşên dişibin van derbasdar in. Ji ber ku polîtîka berhemê zekaya analîtîk e, di rewşên qutbûna wê ji exlaq de, wê têkeve rewşeke metirsîdar. Polîtîkaya ku ji exlaq qut bûyî, ji ber ku çi pîvan û prensîban nas nake, wêranker dibe. Diyardeya dewlet-desthilatdariyê mînaka vê wêrankariyê ne.

Bi giştî, di bingeha vê birçîbûn, şer, krîz û kaosa ku 5 hezar sal e berdwam dike de, qutbûna polîtîkayê ji exlaq, qutbûna zekaya analîtîk ji hestyariyê ye. Civaka di bin desthilatdariya rejîma dewlet-neteweya kapîtalîzma heyî de, rastî xetimandineke kûr a exlaq hatiye, ji polîtîkayê hatiye vederkirin. Prensîbên hiqûqê yên çêkirî û îdarevaniya dewletê, li şûna vê hatiye bicihkirin .

Mijara din a pir giring jî, mijara polîtîkaya demokratîk e. Jixwe pêşxistina siyatseta demokratîk, tê wateya pêkanîna rêxistinbûna wê. Ji ber vê yekê, divê mirov polîtîkaya demokratîk wekî erkê xwerêveberiyê pênase bike. Mirov dikare xwerêveberiyê jî wekî "Siyaseta demokratîk-Polîtîkaya Demokratîk" pênase bike. Têgîna "Siyaseta Demokratîk" mijarek

heta tu bibêjî kûr e, lewra divê baş were famkirin. Siyasta Demokratîk tê maneya erka xwerêveberiyê. Ango siyaseta demokratîk wezîfeya xwerêveberiyê ye. Qada ku erkên xwerêveberiyê pêk tîne, qada siyasta demokratîk e.

Heke berjewendiyên heyatî yên civakê di metirsiyê de bin, destpêkê karê polîtîkayê derbaskirin û ji holê rakirina wan astengiyên desthilatdariyê yên ku nahêlin civak pêş bikeve ye. Û dîsan divê polîtîka wekî karê xwe yê bingehîn vê neheqî, newekhevî, bê edaletî ya ku diyardeya dewletê li ser civakê ferz dike, derbas bike. Di vê wateyê de, polîtîka berpirsyar e civakê bi rêxistin bike, ji bo ku çareseriyekê ji van pirsgirêkan re bibîne. Em ji rêxistina civakê ya bi awayê siyaseta demokratîk xwebirêxistinkirinê re yanî xwegihandina bisazîbûna civakê re dibêjin Konfederalîzma Demokratîk.

Dema ku Rêber APO bê rawestan timî qala siyaseta demokratîk û behsa civakîbûna polîtîk dike, ji civaka ku her ferdekî wê, grûb, bawerî û her çandeke wê wekî kirdeyekê bibe xwedî nasname, ew bi xwe pirsgirêkên xwe çareser bike û xwe bi rê ve bibe re, dibêje ‘civaka polîtîk’. Îca li gorî vê, her ku di warê kirdarî de civak pêş bikeve, her ku çalak bibe û bibe xwedî îrade, civak digihêje tevna heqîqetê û wê demê digihêje pozîsyona fikir û bizavê.

Siyaseta demokratîk, wê bi vedîtina hawîrdoreke ku sûbje di nav siyasetê de aktîf, ne bi awayekî temsîlî, bi awayekî rasterast beşdarbûn, bi redkirina têkiliyên stemkarî û kedxwariyê, li ser bingeha wekheviya zayendî, di hawîrdoreke ku ti cudahiyek di navbera ferd û grûbên civakê de nebe û derfeta xwebilêvkirin û pêkanîna çalakiyan dide, ava bibe.

Di vê wateyê de, divê rêzgirtina ji ziman û çandan re, ji awayên jiyanê re, ji tercîh û daxwazên cuda re çêbibe. Dîsan divê siyaseta demokratîk bi hişmendiyeke ku ked û hevpariyê esas digire, her tişt bi nîqaş, lê bihevrebûnê esas digire re pêk were.

Di siyaseta demokratîk de, hêza bingehîn ne dewlet e, civak e. Siyaset ne ji bo ku mirov hêzê di destê xwe de kom bike, ji bo sûbjebûna civakîbûnê û azadiya civakê ye. Di vî warî de, polîtîka hûnera derxistina dewletê ji qada xwe ye. “Hê kêmtir dewlet û hê zêdetir civak” slogana siyaseta demokratîk e. Xwerizgarkirina ji zihniyeta dewletê ya bêyî ti dewletê fikirandin çênabe, hemû pirsgirêk bi dewletê çareser dibin, di avakirina hevsengiyek tekûz û rûkûpêk a civakê û ferdan re derbas dibe.

Siyaseta modernîteya demokratîk a wekî alternatîfa modernîteya kapîtalîst, mecbûre ji zihniyeta siyaseta desthilatdariyê, ji amûrên wê û ji rêveberiya wê cuda, reseniyeke xwe, amûrên xwe yên xweser, rêbazên xwe û rêxisitina xwe ava bike û biafirîne.

Divê komîn, meclis, yeke, sendîka û kooperatîf bibin pêkhateyên rêxistinbûna resen û xweser a hemû beşên civakê. Bi taybetî pêkhateya jin û ciwan, divê li ser bingehê rêbazek dewlemend, zihniyetek demokratîk, di nîqaşê de xurt û berfireh, di bihevrebûnê de israr dike de, bi rêxistin bibin. Lewma, wekî pêwîstiyek a siyaseta demokratîk, divê ev pêkhate di pêvajoya avabûnê de xwe temam bikin û tevlî pergala xwerêveberiyê bibin. Jixwe maneya siyaseta demokratîk ev e. Pergala konfederalîzma demokratîk bi xwe, ji derveyî organîzasyona dewletê, xwegihandina birêxistinbûnê ye.

Teoriya Moderníteya Demokratîk a li ser bingehê rêxistinbûna siyaseta demokratîk, modêla Konfederalîzma Demokratîk, Xweseriya Demokratîk û modêla Neteweya Demokratîk, modêlek a civaka demokratîk a xwedî xusûsiyeta antî-kapîtalîst û antî-modernîst e ku xwe dispêre civakên ji derveyî dewletê mayîn, civakên jêrdest û tepeserbûyî. Dema ku mirov dibêje xweserî, xwecihî, cudahî û siyaseta xwecihî, tişta ku divê bala mirov bikişîne, şêwaz, armanc û bi vê ve girêdayî têgînên ji derveyî zihniyeta dewletperest hatîn avakirin in.

Ji ber ku di cîhana roja me ya îro de, polîtîkayek a neo-lîberal heye ku dewlet biçûk dibe û hinek hukumranî bi civaka sivîl re tê parvekirin. Dibe ku polîtîkayek a neo-lîberal a xwecihiyê, ya xweser jî çêbibe. Polîtîkayên neo-lîberal ên bi awayê sivikirina burokrasiyê û navendîbûnê, giringîdan bi însiyatîfa herêmî û hinek selahet dewrî civaka sivîl bikin an jî hinek kompanyayên sivîl derxin pêş jî hene. Ji ber vê yekê, giringî pêdanek bingehîn a pêkanîna pergala xweserî û herêmiyê ya civakîbûna derveyî dewletê ango giringiyek hîn zêdetir bide çîna tê çewisandin, çîna bindest û di warê siyasî û hêza civakî de dana pêşxistin heye.

Wekî mînak, di ezmûna Rojava de, rêxistina civakî ya xweseriya demokratîk hate avakirin. Ev ji bo pergala demokratîk a civakê wekî nîqaş û modêlek nû tê hesbandin. Lê heke ev modêl bi awayek cuda dûrî hişmendiya moderrnîteya demokratîk were destgirtin, mirov nikare bi serê xwe vê modêlê wekî antî-modernîst û formek ji derveyî dewletê bihesibîne. Dibe ku pergaleke îdarî ya tam berevajî vê ya ku dewletê meşrû dike, awayên wê yên mêtingerî ya dewletê hebe û li gorî têkilî û şêweyên desthilatdariyê adapte bûbe. Tişta giring û bide

xuyakirin ku ev ne wisa ye, naveroka pratîka kantonan, komînan û xweseriyê çawa hatiye tijekirin, ango xwediyê zihniyetek çawa ye û bi projeyek çawa ya siyasî yekpare bûye. Divê kanton bi perspektîfek teng, wekî sazûmaniyeke îdarî û siyasî neyên destgirtin.

Divê kanton bibin xwediyê mekanîzmayeke ku karibin di têkiliyên milkiyeta civakî de, di berjewendiyê civakên jêrdest de ber bi veguherînê ve herin, veguherînekê pêk bînin û di nav xebatek wisa de bin ku deng û daxwazên wan bi hêz bike. Ji ber ku pergala xweseriya demokratîk, pergala xweser a bindestan, kedkaran û civakên ku ji derveyî dewletê mayîn, bêyî xwe hewceyî dewletê bikin, li hemberî dewletê têbikoşin û demokrasiyê ava bikin e. Ji ber vê yekê, tiwaneya bi serê xwe biryargirtinê, hêza nîqaşkirin û pêkanînê ya civakan, bi mekanîzmaya siyaseta demokratîk pêk tê.

## 7- Exlaq

Exlaq, yek ji mijarên ku herî zêde li ser tê axaftin e. Dîsan di warê zanistên civakî de jî mijareke sereke ya nîqaşê ye. Di encama van nîqaşan de, nêzîkatiyên ji hev cuda derketin holê. Herçend e ku diyardeya exlaq di bin navê zanista etîk de hatibe teorîzekirin jî, zanista etîkê jî nekariye yekparebûneke wateyî ya bi ruhê civakê re hevseng derxîne holê.

Exlaq wekî pozîsyon û sazî, têgîneke ku berevajî zenkirinan, gelekî giring e û her roja wêdetir giringya xwe hê zêdetir dide hîskirin. Bê gengeşe, hem di bingeha krîzên dîrokî yên derketîn holê, hem jî di bingeha qeyranên îro yên ku ji ber pergalê derdikevin de, problemên di qada exlaqî de tên jiyîn hene. Heke

em bala xwe bidinê, dema ku rewşa heyî tê nirxandin, di hemû geşedanên ku çêbûyî de, behsa têkçûna exlaqî tê kirin. Ev rastiyek giring dide xuyakirin. Aliyê erênî û neyînî yê hemû geşedanan, encex li derdora diyardeya exlaq were îzahkirin. Mînak, heke em aliyên erênî û yên pêşketina civakî bi exlaq ve girêbidin, divê em diyardeyên neyînî yên rûyên xwe bi xirabiyê jî pêçayîn, dîsan di çarçoveya exlaq de bigirin dest û binirxînin. Ev çi derdixe holê? Ev rewş derdixe holê ku di warê hebûn û pêşketina civakî de, exlaq mijareke hebûnê ye û vê jî daye diyarkirin ku rastiyeke civakî ya xwe nespêre diyardeya exlaq çênabe.

Di her ziman û her civakê de, pênaseyên taybet û kurt ên exlaq hene. Lê di warê çarçove û cihgirtinê de ev mijarek pir kûr û berfireh e. Destpêkê em exlaq di warê etîmolojîk de bigirin dest. Exlaq wekî têgîn, di Yûnanî de gotina etîk tê bikaranîn ku ji 'Ethos' hatiye, di Latînî de 'moral' ku ji 'Mores' ê hatiye û di Erebî de jî 'xulq' ku ji têgînên afirandin û seciye (karekter, kok, cewher) hatiye, tê bikaranîn. Di rewşa xwe ya ku di Erebî de tê bikaranîn, wateyek bi naveroka civakê ve girêdayî derxistiye holê. Hêmanekî ontolojîk e ku civakê diafirîne, palpişt û cewherê bingehîn ê avakirina civakê yê ku karekterê civakê dide diyarkirin û di vî warî de wekî pîvan tevgerên rast û şaş ê civakê dide xuyakirin e. Di vî alî de, pêwîst e koka exlaq bi civaka xwezayî ve were girêdan ku modêla destpêkê ya civakîbûnê ye.

Heke em ji avakirina civakîbûnê ya destpêkê dest bi exlaq bikin, wê nêzîkatiya me ya exlaqî jî hê baştir xuya bibe. Wê demê, wê pêkan be ku em li gorî çanda civakî, edet û teqalîdên civakî, li gorî hînbûnan û rêgezên civakî îzaha exlaq bikin. Edet û teqalîd, kevneşopiyên bi sedhezarê salan in. Civak bi kevneşopî, bi edet û

teqalîdên xwe hebûna xwe pêk tînin. Û bi kevneşopî û danehevan xwe digihînin siberojê. Her ku kevneşopî ber bi dahatûyê ve diçe, wekî pergala rêgezan qonax derbas dibin. Rastî û şaşiyên civakê, başî û xirabiyên wê, red û qebûla wê, bedewî û kirêtiya wê wekî pîvan bi van rêgezan diyar dibe.

Ji têkiliya organîk a mirov bi xweza û civakê re, ji wî awayê têkiliyên di encama vê danûstandinê de ku ji bo pêşxistina jiyanê derketîn holê û ji yekîtiya hemû rêgezan re, exlaq tê gotin. Etîk jî zanista exlaq e û di wê çarçoveyê de pêş dikeve. Herçend e ku ji bo pêşxistin û teorîzekirina exlaq şêwazek ê şîrovekirinê hebe jî, dema ku em li pênaseyên derketîn holê yên li ser exlaq dinêrin, di warê exlaq de encamek berevejî derxistine holê. Şîroveyên ku civakê û ferd bi dewlet û desthilatdariyê didin xwarin û dewletê didin pêş ên herî zêde ne.

Di zanista etîkê de, rêya ku mirov tê de qenc û bi exlaq be, durist be, bi namûs û bi wijdan be, bi pêkanîna berpirsyariya xwe ya li beramberî desthilatdaran derdikeve holê. Lewma, rêya bi exlaqbûn û bi wijdanbûnê; bi dilsozî û bi pêkanîna berpirsyariyên xwe beramberî dewleta xwe, miletê xwe, ala xwe û sirûda xwe, wekî pîvan derketiye. Ferd jî, welatî jî xistine rewşek welê ku nirx bide dewlet û desthilatdariyê. Bi vî awayî jî, bi pergalê ve dane girêdan.

Ji ber vê yekê, dema ku mirov li nirxandinên zanista etîkê dinêre, peywira exlaq ew e ku rêyên herî baş bibîne da ku ferdên civakê bi dewletê ve bide girêdan. Ev awayên nirxandin û pênaseyan, şîroveyên şaristaniyê ne. Lewra zanista etîkê, exlaq ji cihê wî yê rastî û reseniya wî derxistiye, xistiye di rolekî yê wekhev ê pêkanîna armancên desthilatdarî û şaristaniyê de.

Yên ku baca xwe bidin, eskeriya xwe bikin, li gorî makezagon, qanûnan, rêziknameyan û li gorî sînorên hatîn diyarkirin tevbigere û vê esas bigirin, bi exlaq û dilpak in. Ango bi kurtî; mirovê bi exlaq, çi dewlemend be çi feqîr be, ew e yê ku zanibe ji rewşa xwe re şukur bike, îtiraz neke û îtaetê bike.

Lê belê di rastiya xwe de exlaq esasê xwe yê bingehîn ji hebûna civakê digire û diyardeyeke ji nav civakê, ji bo civakê pêş ketiye. Mirov dikare bi hêsanî bide xuyakirin ku ev exlaqê wekî wijdana civak û xwezayê pêş ketî, bi dewlet û desthilatariyê re bi nakok e, ji serî heya binî berevajî hev in.

Lê di roja me ya îro de, pênaseya mirovê baş û xwedî wijdan, bi dilsoziya bi dewleta xwe, bi miletê xwe û wekî ku me li jor jî dayî diyarkirin, bi pêkanîna berpirsyariya xwe ya beramber pergalê tê pîvan.

Di eslê xwe de wijdanê civakê, bi wî awayê ku hatî şîrovekirin nayê xuyakirin û naxebite. Exlaq hê zêdetir diyardeyeke ji bo demokrasî, azadî û edaletê, beramberî neheqiyê helwest nîşandan e. Bi dewlet û desthilatdariya ku li hemberî pêşketinên civakê dibe asteng re, bi nokok e û nelihevkirineke kûr di navbera wan de heye.

Heke nirxandinek etîk a exlaq çêbibe, divê li ser bingehê rewşa pêkhatina civaka destpêkê ku koka exlaq e, çêbibe. Û divê li hemberî pêkhateyên desthilatdariyê yên li hemberî pêşketina civakê dibin asteng, dijberî çêbibe. Lewma divê bi civaka dîrokî dest bi exlaq were kirin. Ji ber ku exlaq bi civakê re heman e, yek e.

Bêguman têgîna exlaq di pir çax û serdeman de hatiye destgirtin û nirxandin. Lê têgînên girêdayî exlaq ên di her çaxê de pêşketîn yên wekî baş, xirab, bedew û hwd. li gorî heqîqeta berjewenidiyê civakîbûnê nehatine destgirtin.

Gelek tevger û felsefevanên exlaqî ku ji Sokrates dest pê kirine û li ser esasê vê sazûmanî û desthilatdariyê bi têgînên qencî û xirabiyê ve mijûl bûne, lê qet berê qelema xwe nedane dewletê. Ji derveyî dewlet û desthilatdariyê, li hemû tiştên xirab û ne baş geriyane. Lewma mirov dikare bibêje van geşedan û hewldanan hê zêdetir dewlet rewa û mayînde kiriye. Timî di rêveberan de li pirsgirêkê hatiye gerandin û tenê li ser esasê rêveber û rêveberiyek qenc wê çawa çêbibe, nêzî mijarê bûne. Di roja me ya îro de, hê baştir tê famkirin ku ev şîrove û geşedanên bi vî awayî şîroveyên şaristaniyê ne.

Wekî ku me li jor jî dayî diyarkirin, têgîna exlaq rewşa hebûna civakê ye. Civak bê têgînên wekî dewlet, desthilatdarî, ol û hwd. dibe, lê bêyî hebûna exlaq ne mumkin e ku mirov behsa hebûna civaka mirovahiyê bike. Ji bo vê jî, divê têgîna exlaq bi hemû fikir û têgînên ku hebûna civakîbûnê didin diyarkirin re were destgirtin û bê xuyakrin. Di vê çarçoveyê de, pêwîst e têgîna exlaq ku esasê bingehîn ê şaristaniya demokratîk e dubare were zindîkirin.

Ji ber vê yekê têgîna exlaq; ji çandê, polîtîkayê, demokrasiyê, ekonomiyê, hûner, totem, anîmîzmê mîtolojiyê, metafîzîkê, ol, zanist û azadiyê qutbûyî nayê destgirtin. Dibe were gotin ku dikare bi ferqekê bi van têgînan re were wekhevkirin. Têgîna exlaq, çiqê bihevrebûn û bihevremanê yê jiyana civakî ye. Navê wê xerca ku civakê li ba hev digire ye.

Lewma di serî de têgînên wekî polîtîka, demokrasî, hûner, aborî, azadî, tenduristî, xweparastin, xwerêveberî û perwerde ku navbeykariyê ji pêşketina jiyana civakî re dikin û hemû pêwîstiyên jiyanê dabîn dikin, di nav vê jiyanê de ava bûne. Lewra nêzîkatî û wekheviyek a exlaq bi van têgînên çandî re heye.

Lê dema behsa exlaq were kirin, nabe hem bi tena serê xwe wekî razber û hem jî wekî navenda her tiştî were dîtin. Erê, rast e qada exlaq pir berfireh e û pir avaniyan digire nava xwe. Di serî de felsefe, totem, ziman, hûner, dîrok, bawerî û nirxên din ên erênî yên wekî metafîzîkê hemû xwe di exlaq de didin der û tên dîtin. Lê wê ne şaş be ku mirov nirxên civakî û çandî yên ku bi civakê re pêş ketîn wekî maddeya xam a exlaq an jî hêza wî ya dehfdanê bibîne û exlaq jî wekî encam û çiqa hevgirtinê ya van hemûyan bi nav bike. Mirov dikare bibêje her tiştê bi jiyanê ve girêdayî, bi exlaq şeklê xwe yê dawiyê digire.

Heke mirov bi awayek felsefîk di qada madde û enerjiyê de jî exlaq binirxîne, mirov ê karibe xwe bigihîne vê encamê. Dema ku di rehenda gerdûnê de behsa cudahî û cûrbicûriya zêde ya awayên madde û enerjiyê tê kirin, di rehenda vê ya pêşketinê ya têkiliyên civakî de, cudahî û cûrbicûriya zêde bi çi teşe qezenc dike, di vê pirsyarê bi xwe de jî rastiya bi wate ya hebûna exlaq derdikeve holê.

Wê demê exlaq tê wateya bihevrebûna cudahî û cihêrengiyan. Û pênaseya exlaq ‘çîmentoya civakê ye’ jî vê wateyê erê dike. Derbirîn û cihêrengiya azadiyê di qada civakî de jî bi çandê, demokrasiyê, xwerêveberî û polîtîkayê bi wate dibe. Rastiya ku di çarçoveya prensîbên exlaqî de bi tevgerên

pêşketina hundirîn teşe digire, dide îspatkirin ku azadî di dahûrandina dawîn de, rewşa herikbar a exlaq e.

Di vê çarçoveyê de, bêyî hebûna cudahî û cihêrengiyan, ti wateyek a prensîbên exlaqî û sazûmaniyên polîtîk çênabe. Dibe ku were gotin, têkilî û nakokiya di navbera wan de dişibe zagona gerdûnê ya maddeyê ya hevkişandin û hevdehfdanê (dehfdan-kişandinê). Dema ku em behsa cudahî û cihêrengiyê dikin, divê em di wateya ji holêrakirina têgîna bihevrebûna cudahiyan de, nenirxînin. Divê em di wateya civakî de, cudahiyê-pirrengiyê wekî zagona dehfdanê bigirin dest û bibînin. Heke cudahî zagona dehfdanê be, em dikarin nirxên exlaqî-polîtîk jî wekî zagona kişandinê binirxînin .

Heke rasteka zagona kişandinê ya gerdûnê tineba, ne mumkin bû ku bihevrebûna maddeyê dewam kiriba û atomên cihêreng wê ji dendikê qut û belawela bûban. Vê jî nedikarî hebûna maddî ya jiyanê ya zindî û ne zindî pêk bîne. Bi heman awayî, heke zagona dehfdanê jî tineba, atom ji hev cuda û zêde nedibûn û wê wekî gumlatek bê teşe bimana.

Ev prensîb, ji bo civakê jî di wateya felsefîk û etîk de derbasdar e. Heke wekî zagona dehfdanê cudahiyên çandî yên civakê tineban û wekî zagona kişandinê jî nirxên exlaqî û polîtîk ên civakê tineban, ti şeklek, teşeyek ê civakê jî çênedibû. Lewra, heke nirxên exlaqî û polîtîk tine bin, civak jî bi cudahiyên çandî û karbeşiyan nêzî hev nabe û bihevrebûna civakê çênabe.

Tişta ku divê li vir were famkirin û binê wê were xêzkirin, ew e ku exlaq encamek e. Encama hemû qewimînên çandî û manewî yên di civakê de çêbûyîn, teqez bi exlaq re xwe daye der. Ji ber vê yekê, wê di cih de be ku mirov hemû pêkhateyan wekî

maddeya xam, kereste yan jî wekî hêza dehfdanê ya exlaq fam bike û exlaq jî wekî pevgihaneka van hemûyan bi nav bike. Lewma Rêber APO ji vê pêvajoya ku ev dewlemendî li ser bingehê jiyanek demokratîk bi gewde bûyî re dibêje; Civaka exlaqî ya polîtîk, ji rewşa bi serkeftî ya pêkhatina hemû nirxan re jî dibêje; azadî !

Her têgîn bi qasî wate û cihê xwe bi gewde dibe. Bêguman di vê gerdûnê de, cih û cihêrengiya her têgînekê heye. Sûdê giştîbûyînê bi qasî reduksiyonîstiyê jî tine ye. Zanista pozîtîvîst, diyarde û têgîn bi awayek wisa parçebûyî û kategorîk girtiye dest, wekî ku hemû diyarde ji hev cuda bi awayekî serbixwe pêş ketibin, afirêneriyek a zihniyetê çêkirine. Lê di rastiya xwe de, heqîqet yek e û nayê parçekirin.

Heke em xwezaya civakî di vê çarçoveyê de bigirin dest û binirxînin, wê cih û di nav hev de bûna her têgînekê jî were dîtin. Ji ber ku civakê têgîn çawa girtibe dest, çawa bi kar anîbe û çawa xebitandibe, heqîqet jî li gorî wê ava kiriye. Lewma, dema ku me xwezaya duyemîn pênase kir, ev wê were wê wateyê ku me behsa civakîbûnek wisa kiriye ku ew di encama zihn, îrade û çalakiya xwe de pêk hatibe û ava bûbe. Di vî şeklê wê yê pêkhatinê de, peresîna wê di pêşketina wê ya hundirîn de ye. Lê ev pêvajoyek giştî ya çandî ye. Ji ber vê yekê, mumkine ku em exlaq di çarçoveya çandî, fikrî û çalakiyê de pênase bikin. Têkiliya zihniyet û çalakiyê, li gorî hewcedarî û berdewamiya jiyana civakan e. Lewma şêwazê jiyanê çi be, pêkanîna rêxistinbûyînê jî bi wî awayî teşe digire.

Wê demê, exlaq awayê destpêkê yê birêxistinbûna civakîbûnê ye. Sazûmaniya hundirîn, di encama hewcedariya

navxweyî ya prensîb, norm û nirxên civakî de, bi exlaq çêdibe. Nimûneya vê ya destpêkê jî klan e. Di klanê de prensîba "hemû ji bo yekê, yek ji bo hemûyan' tê bikaranîn. Di klanê de, cezayê herî mezin ê mirov 'ji civakê dûrxistin' e. Ev prensîbek exlaqî ye. Pêvajoya tecrîdkirinê di roja me ya îro de jî hê wekî kevneşopî û zagoneke exlaqî didome.

Me da diyarkirin ku exlaq şeklê dawî yê hemû çalakî û aktîvîteyên jiyanê ye. Lewma diyardeyeke ku têkilî û nakokiyên mirov bi civak û xwezayê re bi rêkûpêk dike û şeklê wê yê dawiyê didiyê. Ji klanê bigire heta formên din ên civakî, rêkûpêkiya têkiliyên ferd bi civakê re, yên civakê bi xwezayê re, bûna xwedî pîvan û di formeke xuyayî de bicisimbûn, hemû bi zagonên exlaq pêk tê.

Di vî warî de, du alî qayîdeyên exlaq hene. Yek ji vana, di çarçoveya têkiliyên ferd-civakê de, qayîdeya ku dana diyarkirina awayê têkiliyên di navbera jin, mêr, karbeşiya xwezayî, pîvana karên ku tên kirin û têkiliyên civakê yên bi ferdên din re ye. A din jî, têkilî û danûstandinên di navbera xweza û civakê de dide diyarkirin. Bêyî ku zirarê bide xwezayê, bêyî ku ji hewcedariyê zêdetir berê xwe bide xwezayê û jê sûdmend bibe, qayîdeyek exlaqî ye.

Herdu rehend jî, di nav hev de ne û di rewşeke yekpare de tevdigerin. Di nav herikîna diyalektîka jiyanê de, hemû kiryar, îcad û awayên têkiliyên ku danûstandina di navbera ferd-civakê û civak û xwezayê de bi rêkûpêk û bedew, xwedî dikin û pêş dixin, di wijdanê kolektîf re derbas dibin û vediguherin pîvanên exlaqî û nirxên civakî. Ji ber vê yekê, hê di serê çêbûn û pêkhatinê de,

hemû hewldan, têkilî û awayê nêzîkatiyên ku ziyanê didin jiyanê û danûstandinên derveyî exlaq, dibînin û red dikin.

Di derbarê awayê teşegitina exlaqê civakê de, Rêber APO wiha dibêje: “Jixwe tişta ku dide xuyakirin ka kar wê çawa bi rê ve biçe, prensîb e. Di derheqê kar de, çalakiya destpêkê exlaq e. Dema em dibêjin kar mebesta me her tişt e. Xwarin, razan, peydakirina xwarinê, hezkirina heywanan û hwd. endamê klanê her kes dikare bi awayekî fêhmbar bijî. Di vê wateyê de, xwenaskirin, têgihiştina qayîdeya karên ku dike, pûte pêdan û hayjêbûnek beramberî derdor û xwezayê ye. Hayjêbûn û berêxwedana ber bi xwezayê ve, qayîdeya exlaqî dide diyarkirin. Ango qayîdeya exlaqî, bi xwezanînê-xwenaskirinê çêdibe.” (26) Ji ber vê yekê, exlaq awayê jiyana civakî ye, şêwazê pêkanîna kar dide diyarkirin û pîvanê didiyê.

Di civaka klanê de, ji pêvajoya nîqaşkirin û diyarkirina pêwîstiyan re demokrasî, ji pêvajoya zemînxweşkirinê, peydakirina kar û pêşxistina çareseriyê re jî polîtîka û ji wê pêvajoya dawî ya dide diyarkirin ku ev pêvajoya nîqaşkirin, biryargirtin û plandananê wê çawa û bi çi rengî di qada pratîkê de pêk bê re, exlaq tê gotin. Exlaq, di van pêvajoyan tevan de bi fikir, bi çalakiyê, bi kar, bi pîvanan û bi têkiliyên jiyana civakê pêş ketiye. Ango mirovekî ku exlaqê wî tine be karekî nake, lê di rastiya xwe de teqez karek heye ku bike, lê ew nake.

Dema ku polîtîkayê kar da peydakirin û kar derxist holê, exlaq jî di pozîsyona danadiyarkirina cewher û awayê vî karî de bû. Yanî, tişta ku pevvegirêdana fikir û kar pêk tîne, pêwendiya di navbera kar û çalakiyê de dide pêşxistin û hevgirtinek yekpare

di navbera fikir, çalakî û kar de pêk tîne, exlaq e. Ango bi gotinek din, jiyana civakî û civakîbûn, bi hevgirtinek rikibandî, guncaw a di navbera zekaya analîtîk û zekaya hestyarî de pêş ketiye.

Tişta ku vê rikibandinê pêk tîne jî exlaq e. Lê dema mijara axaftinê dibe civakîbûn, li şûna ku exlaq rikibandinê pêş bixe, hişk dibe, ji bo civakan jî ev nebe nabe. Ji bo hê baştir famkirina exlaq çêbibe, divê bi vê perspektîfê li pêvajoya avakirin û pêşketina civakîbûnê were mêzekirin. Ji ber vê yekê, fonksiyona herî giring a exlaq, ji bo başiya civakê, çawaniya pêkanîna rikibandin û birêxistina zekaya analîtîk û zekaya hestyarî û xistina di warê prensîb û helwestê de ye.

Di vî warî de, bêyî exlaqê civakî zekaya analîtîk çênabe. Heke mirovek bi hêrs bûbe, bi bikaranîna zekaya analîtîk dibe ku hemû zindî yan jî hemû civaka mirovan a li dijî xwe bikuje, tine bike. Ji ber ku civakê hê ji destpêkê ve ev zanîbû, di prensîba xwe ya birêxistinkirinê de, exlaq esas girtiye. Lewra, bêyî exlaq jiyana civakî nabe.

## 8- Hiqûq

Hiqûq, têgînek e ku bi dîroka yekdestdariya desthilatdariyê re pêş ketî. Bi pêvajoya yekdestdariya desthilatdariyê re, li şûna exlaq ku bingehê civaka xwezayî bû, hiqûq hat bicihkirin. Di vî warî de, heke mirov pêşketina civaka dîrokî wekî pevçûna di navbera herdu têgînan de bi lêv bike, wê ne şaş be.

Bi dîroka bikaranîna hiqûqê re, hukumraniya yekdestdariya desthilatdariyê jî hatiye destpêkirin. Ji ber ku kereste û maddeya xam a hiqûqê; bazirganî, qezenca zêde, îstîsmar, çînayetî,

hegemonya û desthilatdariya ku kereste û hemû danehev tê de yekdestdar bû. Ji bo ku hiqûq berjewendiyên yekdestdariya desthilatdariyê bi darê zorê biparêze û bide ferzkirin, diviyabû yekdestdariya desthilatdariyê li qadekê hukum kiriba û maddeya wê ya xam û keresteyên wê pêş ketiban. Temambûna vê pêvajoyê bi hiqûqê, di encama bi sînordarkirin, tengkirin û ji holê rakirina exlaq de çêbû. Li vir tişta ku divê were zanîn ew e ku hiqûq encamek e. Dawiya herî dawî ya van pêvajoyan, pêvajoyên hiqûqê û pênaseyên wê ne. Cewherê hemû pênase û danasînan, bi awayê parastina desthilatdariyê hatine destgirtin.

Baş e, ma çawa dibe têgîneke bi navê hiqûqê ku koka civakê dikole û xirab dike û biyaniya civakê ye, mîna têgîneke di şeklê komek qayîdeyên ku reftarên mirovan bi rêkûpêk dike derdikeve holê ?

Geşedana hundirîn a mirov a li gorî prensîban a li gorî çand û kevneşopiyên civakan a bi sed salan hatî bidestxistin û derketî holê, jiyana çandî ya ku bi reftar, ziman û têkiliyên mirovan re bûyî yek, hem ji aliyê hiqûqê ve tê qurçifandin û tine tê hesibandin, hem jî di bin têgîna hiqûqê de wekî qayîdeyekî ku danûstandina mirovan bi rêkûpêk bike, pêş dikeve.

Ev jî tê wê maneyê ku li vir operasyonek pir kûr û berfireh heye. Hem di warê zihnî û hem jî di warê jiyanî de derxistin û dûrxistiina civakan ji cewherê wan, ji xwezaya wan û xistina di bin hukumaraniya hişê çêkirî yê desthilatdariya yekdestdar de, dibe ku bi operasyon û kopmloyek mezin mumkin be. Em dikarin mîtolojiyê, felsefeyê, ol, zanist û hûnera ku bi desthilatdariyê re

kirîn yek ên ku vê cîhana çêkirî (sunnî) pêk tînin, wekî operasyonên zihniyetê bi nav bikin.

Aha, ev rastî di binyata hiqûqa yekdestdariya desthilatdar de, wekî yekparebûna qayîdeyên ku reftarên mirovan bi rêkûpêk û pênase dike, cih digire. Eynî pêvajoyek mîna ku destpêkê mirov ji civakîbûnê qut bikin û bikujin û paşê jî wekî ku li dinyayek din mirov ji nû ve zindî bikin, hatiye destpêkirin.

Wekî encam, hiqûq mekanîzmayek a ku pêşan dide ka divê tevger û reftara mirov çawa be, bi pêkanîn û ferzkirinên li ser bingehê cezayan û bi prensîbên girêdayî stratejiyên desthilatdariyê, civakê, grûban û ferdan ji xwezaya wan derdixe, mehkûmî jiyaneke biyanî dike û bi vê rêyê mirovan ji civaka wan biyanî û xerîb dike.

Di warê kokê de, peyva hiqûq têgînek Erebî ye. Pirjimariya peyva ‘heq’ e û tê wateya “mafan.”

Hiqûq wekî “Prensîbên mecbûrî yên tên danîn û diyarkirin yên ji bo misogeriya desthilatdariya pergalê û rêkûpêkî û edaleta di nava mirovên ku di nava civakê de dijîn,” tê pênasekirin. Prensîbên ku li ser bingehê tinekirina aliyên exlaqî yên civakê yên bi darê zorê tên ferzkirin in. Hiqûq, çawaniya wan tevger û reftarên rast ên di civakê de pêşanî mirovan nade, çawaniya awayê reftar û tevgerînê yên li gorî berjewendiyên yekdestdariyê, ka divê mirov di civakê de çawa tevbigere, pêşanî mirov dide. Hiqûq, ji ku tu li gorî wê bî û wê pêk bînî heye. Bi fermana; “li gorî min be; min pêk bîne,” bang li mirovan dike.

Ji ber vê yekê, hiqûq bi xwespartina qayîde û krîteran, bi pêkanîna ferman û xweferzkirinan, reftar û tevgerîna mirovan

kontrol dike û divê çawa be pêşan dide, li ser vî bingehî mîna amûrekê hemû şêwazê jiyana mirovan bi qayîde û prensîban ve girêdide û bi lêferzkirinan dide ecbandin.

Pergala hiqûqê ya dewletê, pergaleke qeydkirinê (tomarkirinê) ye. Dewlet bi qeydkirinê, civakê dixe di bin emirgirtinê de. Di rastiya xwe de tomarkirin-qeydkirin; bendkirin e, 'qeyd û bend kirine.' Di zimanê Kurdî de, ji wê zincîra ku bi lingên hespên kovî ve tê girêdan re "qeyd" tê gotin. Hiqûq, bi awayekî giştî têgîneke ku bi bajar, çîn û dewletê re, bi pêşketina yekdestdariya bazirganiyê, bi yekdestdariya sermaye û bi yekdestdariya desthilatdariyê re pêk hatî û bi dûvdirêjiya bajar û bazarê re pêş ketiye.

Di pêvajoyên meylên bazirganiyê, sermaye û yekdestdariya desthilatdariyê de, pevçûn di navbera exlaq û hiqûqê de tê destpêkirin. Ji ber ku exlaq berevajî pêşketina bazirganî û sermayeyê ye, lewma exlaq di pozîsyona astengkirina vê geşedanê de ye, dibîne ku bi vê (bi hiqûqê) êdî hêdî hêdî sînorê exlaq tê derizandin û derbaskirin.

Hiqûq, di vî warî de, ji bo parastina sazûmaniya sermayeyê û qezenca zêde, wekî amûrekê ji bo piştevaniya desthilatdariya siyasî û avabûna sazûmaniya nû, hatiye birêxistinkirin. Bi derketina holê ya şaristaniya çînayetiyê re, şaristaniya çînayetiyê xwe bi hiqûqê daye naskirin. Esasên bingehîn ên şaristaniya çînî pêkanîn û esasên bingehîn ên civaka exlaqî û polîtîk pêkanîn, ji hevdu cuda ne. Yek bi xwespartina hiqûqê hebûna xwe didomîne ku ev jî bi zagonê, yasayan, rêziknameyan û makezagonan tê meşandin. Civaka bi Exlaq û Polîtîk jî bi dilxwaziyê ve girêdayî,

xwe li ser pîvan û qayîdeyên exlaqî pêş dixe û hebûna xwe liser vî esasî didomîne. Di bingeha xwe de, herdu têgihiştin jî berevajî hev in û bi hev re bi nakok in. Divê ev cudahî bi awayekî zelal were famkirin.

Jixwe her ji destpêka dîrokê ve, ev herdu têgihiştin-herdu nêzîkatî timî bi hev re di nav nakokî û pevçûnê de bûne. Dema ku şaristaniya bi çîn, ji bo parastin û ewlehiya pergala yekdestdarî û desthilatdariyê wekî amûrekê hukumraniya hiqûqê pêk anî, şariştaniya demokratîk jî, li ser esasê zindîhiştina exlaqê civakê hebûna xwe domandiye. Lewma ev rewş timî bûye sedema pevçûn, demartûndî û rageşiyan. Ji ber vê yekê, pevçûna heyî bû pevçûna exlaq û hiqûqê.

Nimûneyên belgeyên nivîskî yên hiqûqî yên destpêkê, ji bo armanca îdeolojîk û siyasî ya desthilatdariyan hatîn çêkirin, di nav Sûmeriyan de wekî qanûnên Ur-Nammû, B.Z. di salên 2100-2050'yan fe, bi navê Qral Hemmorabî derketine, ku B.Z. di navbera salên 1810-1760'yan de hatine nivîsîn.

Qanûnên Hemmorabî ji nêzî sêsed yasayan pêk dihatin. Dema mirov li Babîlê dinêre, mirov dibîne ku ew ji împaratoriyek yekdestdariya bazirganiyê pêk hatiye. Xuya dibe ku qanûnên hatîn çêkirin, ji bo berdewamiya yekdestdariya sermaye û bazirganiyê hatibûn çêkirin. Qanûnên Hemmorabî hêza rewakirina pergalê bûn. Mînak, heke tu malê kesekî ji rêzê bidizî, tu mecbûrî du qat zêdetir bidî xwediyê wî. Dîsan heke tu malê dewletê bidizî, vê carê jî divê tu sîh qat zêdetir ji mal û milkê ku te dizîbû, bidî dewletê. Dîsan li gor van qanûnan, heqê mîras ji bav re tê dayîn, ji ber ku bav wekî aliyekî dihat destgirtin. Nimûneyek din, heke tu yekî ji rêzê bikujî, tu wê bi awayek ji rêzê

werî cezakirin, lê heke tu endamekî yê dewletê bikujî, wê te bavêjin nav avê. Heke tu nemirî, tu yê vê carê werî kuştin. Ango bi ti awayî xilasiya ji sûcê ku li dijî dewletê hatî kirin, tine ye.

Dema Ûrnabî û Hemmorabî qralên Lagaşê ku qanûndanerên destpêkê ne gotin, 'em nûnerên Mardûk in, xweda berpirsyariya me eşkere kiriye', di rastiya xwe de eşkere dikin ku çavkaniya hiqûqê jî di bin maskeya xwedayî de, li gorî daxwaz û berjewendiyê tazî yê yekdestdariya desthilatdariyê derketiye holê. Her wiha ji bilî vê jî, di mîtoloyiyan de derketiye holê ku şerê Enkî-Înanna û Mardûk-Tîamat şerê exlaq û hiqûqê bûye .

Her wiha, ew 104 Me'yên di civaka xwezayî de exlaqê civakê sembolîze dikirin, hem hatine dizîn û hem jî li gorî xwe hatine nirxandin û destgirtin. Dîsan, divê were zanîn ku şîroveyên mîtolojîk ên pêşîn û formên dînî yên ku piştre pêş ketîn, wekî exlaqê di nav dîn de pêş ketî, hatine pêşandan. Li vir, di bin navê hiqûqa dîn de, hem exlaq hatiye qurbanîkirin hem jî bi şîroveyeke nû ya îllahî exlaq li gorî berjewendiyên çîna serdest hatiye nikirandin.

Exlaq, forma ku bi sedhezaran sal piştevaniya kevneşopî, edet û teqalîdên jiyana civakî pêşxistî û parêzvanê hebûna civakîbûnê ye. Ne qayîdeyên nivîskî; kevneşopî, edet û teqalîdên di jiyana eşîret, klan û qebîleyan de, nimûneya herî berbiçav a vê yekê ne. Lê hiqûq, diyardeyek bi mebesta parastina berjewendiyên çînên serdest ji jor ve hatî ferzkirin û bi hêzê hatî organîzekirin e. Qutbûn, veqetîn û dubendî bi wî awayî pêş ketiye.

Ji ber vê yekê, feraseta hiqûqî ya bi civaka çînî ve girêdayî ya destpêkê ya herî pêşîn di nav Sûmeran de çêbûye, awayê wê yê nivîskî jî cara ewilî li Babîlê derdikeve holê. Awayê wê yê esasî û hê pêşketîtir jî di nav şaristaniya Grek û Romayê de derketiye holê. Prototîpa hiqûqa Romayê, hiqûqa Atînayê ye. Ev zemîn jî qanûnên Solonê pêk tîne. B.Z. di sedsala 6. de, qanûnên Solonê bi şopandina geşedanên li Misrê û Mezopotamyayê derketine holê. Cewherê hiqûqê piştevanî û parastina dewletê ye. Ev wezîfeya bingehîn a hiqûqê ye.

Atîna ya ku xwe dispêre bajardewletên ji hev cihê, ji 300 giravan pêk hatiye. Her qebîleyekê hukumranî li giravekê dikir. Herçend e ku qonax bi qonax rêveberiyên hevpar ên navenda wan Atîna hatibin avakirin jî û di serdemên cuda de qral ji qebîleyên cuda pêk hatibin jî, qebîle timî di nav hev de bi pevçûn û reqabetê de bûne. Ji bilî vê jî, ji ber ku berê li Atînayê qanûnên nivîskî tine bûn, melikan-qralan edet û kevneşopiyên kevn ên civakê li gorî berjewendiyên xwe bi kar dianîn û bi kêfa xwe tevdigeriyan. Ji ber vê sedemê, B.Z. di navbera salên 622 û 621’ê de, Qral Drokan hate wezîfedarkirin ji bo berî Solonê rêgez û qanûnên bi rêkûpêk ên civakî pêk bîne. Bi van qanûnan, bi tevahî berjewendiyên çîna esilzade hatine nivîsandin û bi darê zorê pêkanîna wan hatiye pêşbînîkirin. Qanûnên Drakon mîna kopyaya qanûnên Hemmorabî bûn.

Ev qanûnên ku wekî qanûnên Drakon tên naskirin, pirsgirêk çareser nekirine û hê zêdetir kirine. Ji ber ku van qanûnên ku çavdêrî li mafê esilzadeyên ku piraniya erd û karên rêveberiyê di destê wan de bû dikir û bi çavek din li çînên din ên civakê dinêrîn, kesên ku sûcên biçûk jî dikirin di van qanûnan de bi mirinê dihatin

cezakirin, lewma di serî de çîna navîn, dewlemend, karmend û beşên din ên gel ne kêfxweş bûn û ev qanûn rexne kiribûn.

Qanûnên Drakon, di rastiya xwe de, di warê zêdekirina cezayên beramber tebeqeya jêr û parastina esilzadeyan de, ji bo pêşandana rûyê rast ê desthilatdariyê giring bûn. Berde dîtina çareseriyê ji pirsgirêkan re, qanûnên Drakon bûbûn sedem ku alozî û kaos hê kûrtir bibe. Êdî ji ber zêdebûna pirsgirêkan, pêwîstî bi çûna cem dadmendekî dihat dîtin. Ev dadmend jî Solon bû. Solon hiqûqek danîbû, heya tu bibêjî nerm bû, qanûnek wisa bû ku hemû çîn di hevsengiyekê de dihewand. Reformên wisa çêdikirin ku çîna navîn, esnafên biçûk, karmend û burokrat jî digirt nav xwe. Bi yasa û reformên ku Solon pêk anîbûn, deynên hemû gundiyan hatibûn jêbirin, kesên ku ji ber nedana deynên xwe ketibûn di rewşa koletiyê de, ji wê rewşê rizgar bûbûn, bi vî şêwazî kolekirina mirovan hatibû rakirin, dawî li dewlemendiya jidayîbûnê ya bêked anîbû.

Lê cudahiya çînan ji holê ranekiribû, li gorî dahatê tesnîfkirina gel çêkiribû, her wiha li gorî asta dahatê maf dabû gel ku beşdarî nîqaşên “Meclisa Çarsedî” yan jî “Meclisên Gel” bibin. Her wiha, meclisa dadgeha gel li gorî dahatên kêm û hiyerarşiya çînan, ne li gorî serweriya qebîleyan, li gorî herêman kota dabû diyarkirin. Ev meclisa ku pêkhatî, di pozîsyoneka çavdêriya rêveberiyê de daye pênasekirin. Vê pêvajoyê heta pêvajoya Romayê dewam kiriye. Pêvajoya Romayê jî di rastiya xwe de serdemek wekî ku bişibe pêvajoya Atînayê bû. Di vê demê de li Romayê hiqûqek nivîskî tine bû, esilzade jî li gorî berjewendiyên çîna xwe û li gorî kêfa xwe nêzî pirsgirêkan dibûn. Gelek caran pirsgirêkên ku çêdibûn bi şêwazên xwe çareser dikirin. Di bingeha pirsgirêkên ku timî derdiketin holê de, bêhevsengiya di

feraseta rêveberiya Romayê û têkoşîna çînayetiyê ya di navbera meclisa dewlemendan a girêdayî binemaleyan ku wekî meclisa Patrician dihat naskirin û meclisa Plep a ji beşên civakê pêk dihat, hebû. Ji bo ku li Romayê jî ji pirsgirêkan re çareseiyek mayînde peyda bibe, pêvajoyeke ku dişiba ya Solon li Romayê jî pêş diket.

Romayê B.Z. di navbera salên 451-450'yan de, bi Zagonên 12 Lewheyî çareseriyek ji vê pirsgirêkê re peyda kiriye. Zagona 12 Lewheyî, zagoneke ku li Romayê di encama nakokiya çînan de derketî holê û ji bo lihevhatina di navbera çînan de hatî amadekirin e. Zagona 12 Lewheyî ya ku bi awayê hemû hiqûqê bigire nava xwe hatî amadekirin, ji pêşketinên hiqûqî yên ku piştî wê çêbûyîn re jî bûye bingehek. Zagona 12 Lewheyî ji ber ku li ser 12 lewheyên zîv hatibû berhevkirin, navê wê kiribûn "Zagona Duwazde Lewheyî". Bi Zagona 12 Lewheyî, cara yekem zagon li Romayê derbasî wareke nivîskî bûbûn. Bi van zagonan, reftarên kêfî yên Patrician (esilzadeyan) hatibûn sînordarkirin û li gorî hiqûqê darizandin ji esilzadeyan hatibû standin û radestî burokratên ku ji aliyê dewletê ve hatibûn diyarkirin, bûbû. Û her wiha têgîna welatîbûnê ya Romayê hatibû pêşxistin û rê li ber welatîbûna Romayê vebûbû. Dîsan mafê tevlîbûna di nav karûbarên dewletê yê Plepiyan û zewaca wan a bi Patrician re jî hatibû dayîn.

Zagona Duwazde Lewheyan, bingeha hiqûqî ya Ewrûpayê ye. Vê zagonê rê ji geşedanên hiqûqî yên berfireh ên wekî zagona milkiyetê, hiqûqa giştî, zagona mafên medeniyan, zagonên koletiyê û hwd. re vekiriye.

Împaratoriya Romayê ya ku hema hema bibêje hukum li nîvê dinyayê dikir, di encama serhildanên navxweyî û bi êrişên

qebîleyên Germanan hilweşiya û hat xwestin ku ew erdên bêserî û bêbinî yên mezin û berfireh, milk û derfetên heyî, ji hêla xenedanan, esilzadeyan, derebegan, qralan û malbatên wan ve werin desteserkirin.

Li parzemîna Ewrûpayê, malbatên dewlemend û xanedanan li herêmekê desthilatdariya xwe ragihandibûn, ew gundiyên ku li çolter û gundewaran dijiyan jî kiribûn kole û derbasî qonaxa tarî ya ku jê re Çaxa Navîn tê gotin, bûbûn. Dêra Katolîk jî ji vê kaosa mezin û ji vê pêvajoya pevçûnê û nakokiyan re çareseriyek nedîtiye. Û dema Roma hildiweşe jî, Ewrûpa sê tiştên esasî wekî mîras jê digire û xwe lê dike xwedî; ya yekê Xiristiyanî, ya didoyê hiqûqa Romayê û avaniya wê ya rêvebirinê û ya sêyemîn jî ewlehiya Sînor.

Ji bilî vê jî, dema ku ew qebîle, xanedan, derebeg, prenses, senyor û ên wekî vana li parzemîna Ewrûpayê belav bûyîn, gelek malbat bi hev re di nav pevçûnan de bûn. Bi armanca ji holê rakirina vê belawelatiyê û ji bo dîtina çareyeke esasî ji krîza pergalê re, di warê fikrî, hiqûqî, civakî û fîzîkê de gelek hêlên zanistî hatin pêşxistin. Di nav van de ya sereke hiqûq bû. Li cihên manastiran ên ku berê perwerdehiya teolojîk lê dihat dayîn de, paşê veguherîn zanîngehên hiqûqê. Van zanîngehan û zanistên din ên civakî, bi armanca ji holê rakirina kaos û parçebûna heyî, lêkolîn dane destpêkirin.

Awayê beşdarbûna vê serdemê di qada hiqûqê de, bi nûkirina hiqûqa Romayê û bi tezên ‘hiqûqa xwezayî’ pêk tê. Netewebûyîna ol, civaknasiyên ku cudahiyên civakî ji holê radikin, felsefeyên aqilê rastyonel ên li dijî ol, zagonên fîzîkê yên ku vê piştrast dikin û hwd. nîqaşên zanistî tên pêşxistin. Dema ku

di warê hiqûqî de, hiqûqa xwezayî xwe dispêre mafê gerdûniyê yê mirovan, bi navê nûkirina hiqûqa Romayê, lêgerîna pergelên hiqûqî yên wekî qanûna mafê milkiyetê, hiqûqa giştî, hiqûqa mafên sivîlan û hwd. pêş dikeve.

Gava ku ev pêk hat, ji aliyê din ve feraseta hiqûqa pozîtîf pêş ket ku armanca wê ji holê rakirina cudahiyan bû. Mafên hiqûqa xwezayî yên derneketina ji derveyî esasên yekîtiya siyasî ya hatî avakirin û mafên di çarçoveya hiqûqa hatî nûkirin a Romayê de, di nav van mekanîzmayên siyasî yên li ser vî bingehî hatîn damezrandin de, dihat dîtin û diviyabû dernektiba ji derveyî vana.

Qonaxa yekem a vê yekîtiya siyasî, di sala 1215'yan de, bi peymana Magna Carta pêk hatiye. Peymana din jî, peymana Westphaliayê (Westfalyayê) bû ku di sala 1648'an de hatibû îmzekirin û bûbû bingeh ji avakirina dewletneteweya girêdayî sînorên cografîk re. Herçend e ku peymana Magna Carta li ser bingehê hişmendiya bi sînorkirina desthilatdariya qral bû, lê di esasê xwe de yekîtiyek girêdayî hiyerarşiya dêrê, qral, senyorên herêmê û rêveberên bajaran bû. Hiqûqa Magna Cartayê li ser binghê çareserkirina belawelabûn, reqabet û kaosa heyî, çînên cuda jî girtin nava xwe û bi esasgirtina parvekirinek hevpar û rêveberiyek hevbeş derbaskirina rewşê esas digirt. Lê hiqûqa Westphaliayê dixwest bi peymanan, dawî li şerê li ser esasê mezheban bîne, bi peymanan sînorên her neteweyekê werin diyarkirin, bi peyamanan mafên bazirganî û daneheva sermayeyê werin pêşxistin û ev pêvajo bi vî awayî werin derbaskirin.

Şoreşên piştî wê pêş ketîn û di berjewendiyê çîna serdest de bi encam bûyîn, di rastiya xwe de, di rehendek hê bilindtir de

wekî berdewamiya van pêvajoyan pêş ketine. Şoreşa Fransa, Ingîltere û yên wekî van, di esasê xwe de bûne sedem ku hiqûqa dewletneteweyan di warê hişkbûnê, homojeniyê û tekperestiyê de pêş bikeve.

Mîna ku tê dîtin, her ku têkiliyên bazirganiyê, sermayeyê, çînan û yekdestdariyên desthilatdariyê, bajar û bazarê pêş dikevin, di hindava têkiliyên navend-derdorê de, çaxa ku rêjeya mezinbûnê bi rêjeya mezinbûna danehevan re dibe yek, kûrbûna şer û kaosê jî misoger dibe. Pêşketina hiqûqê ya ku bi Qral Lageş hatî destpêkirin, bi Hemmorabî, Solon, 12 Lewheyan, Magna Carta û bi Westphaliayê berdewam kirî, dewletnetewe derxist holê û karektera van pêşketinan diyar kiriye. Ji aliyê din ve jî, di olan de heman pêvajoyê berdewam kiriye.

Ji ber vê yekê, divê bi şaristaniya çînayetiyê re, hiqûq wekî siyaseta ku di makeqanûn, zagon, rêzikname û rêvebernameyan de hatî veguherandin were pênasekirin û divê wekî rûyê pêçayî yê dewletê were şênberkirin.

Çavkaniyên hiqûqî yên hiqûqa TC’ê, hiqûqa Sûriyeyê û hiqûqa gelek dewletên din Ewrûpa ye, bi taybet a Fransa ye. Gelek dewletan feraseta xwe ya Hiqûqê ji Fransayê girtiye. Fransayê jî, ji Romaya yekdestdariya desthilatdariyê girtiye, Romayê ji Atînayê, Atînayê ji Babîlê, Babîlê jî ji Sûmeran girtiye. Sûmeriyan jî bi dizîna ji civaka xwezayî, ferasta exlaq di warê ol de formûle kirine.

Wekî ku tê dîtin, çi di teolojiyê de be çi jî di zanistê de be, hiqûq wekî amûrek a parastina serdestiya desthilatdariyan bi awayên cuda cuda hatiye formûlekirin. Ji bo vê jî, teolojiyê exlaq

kir qurbana ol, felsefeya ku bi Atînayê re pêş ketî jî, di çaxa şaristaniya kapîtalîst de exlaq qurbana hiqûqê kiriye.

Desthilatdariyan tenê kariye li ser esasê hegemonyayê, sermayeyê, bazirganiyê, serdestiyê û li ser ferdên çînan, rewşa mezinbûna xwe ya domdar pêşan bidin û heke ev jî pêk tê, civaka ya bi exlaqî û polîtîk tengav û belawela dibe. Desthilatdariyan destpêkê ev bi exlaq dane xwarin, bi ol û hiqûqê dane xwarin ku ev jî bi feraseta exlaq pêk anîne. Lewma di cewhera ol û hiqûqê de, sermaye, bazirganî, serdestiya çînî û yekdestdariya desthilatdariyê veşartiye.

Herçend e ku hêzên yekdestdar di nav mezinbûnek berdewam de ne jî, di heman demê de ew neçarin timî di nava xwe de guherînan pêk bînin. Guherîna zihniyetê di vî warî de misoger e. Dema ku guhertina timî ya zihniyetê pêk tînin, hemwextê vê, pêjvajoyên ku vê bidin ferzkirin û bi civakê bidin qebûlkirinê jî didin destpêkirin. Yekdestdarî encex bi vî awayî dikarin mirovan ji xwezaya wan a civakî derxînin.

Jixwe di qonaxên destpêkê de, geşedanên xwedayê jor ê xwezayê û qralê jor ê civakê, hema hema hemwextî hev di heman demê de pêş ketine. Dema ku qralxweda bûn yekdestdar û hêza dehfdanê ya van pergalan, heman pêvajo û derketin bi çêbûna ferd a bi kapîtalîzmê re têkildar e.

Di vî warî de, ferdperestî daxistine di maddeyê, xwezayê û xwezaya mirovan de û birine heta asta xwedê jî. Ev pêvajoyên hatîn pêşxistin, bi derfetên hêzê yên di destê desthilatdaran de, bi taybet bi darazê, bi hêza leşkerî, artêşê, zindanê û ji bilî van jî bi amûrên çêkirina zihniyetê yên wekî çapemenî-medya, zanist, çand, perwerde û hwd. civak hat parçeparçekirin û veguherandin

şaneyek herî biçûk. Ev parçeparçekirin jî bêguman xwestine bi hiqûqê pêk bînin.

Di heqîqeta xwe de, çi hiqûqa teolojîk be, çi hiqûqa xwezayî be, çi hiqûqa pozîtîf û çi hiqûqên din jî bin, ji Qral Lageş dest pê bike heta wekî ku di mînakên pêvajoyên dewletneteweyan de hatî dîtin jî, li ser esasê maf û edaletê ava nebûne û pêk nehatine. Her çi qas tê îddîakirin ku hiqûq ji bo parastin û berevaniya mafan hatiye pêşxistin jî, lê ev rastiyeke desthilatdariyê li gorî berjewendiyên xwe yên îdeolojîk, siyasî û aborî bi rêxistin kiriye û bi rê ve dibe.

Yek ji mijara bingehîn a hiqûqê ku divê were destgirtin, danasîna têkiliyên di navbera hiqûqê û Pergala Neteweya Demokratîk de ye.

Me di serî de jî dabû diyarkirin, şaristaniya bi çîn xwe li ser esasên hiqûqê bi rê ve dibe, Şaristaniya Demokratîk xwe li ser pîvanên exlaqî pêş dixe. Li ser vî esasî, divê were zanîn ku pevçûn û nakokiyên di navbera her du pergalên şaristaniyê de rû didin, bi feraseta exlaq û hiqûqê ve girêdayî ne.

Mijarek giring e ku em xala xwe ya cudakariyê ya bingehîn a di derbarê hiqûqê de derxînin holê û bidin xuyakirin. Hiqûq, di rastiya xwe de ne di pozîsyonek wisa de ye ku karibe stratejiyê bide diyarkirin. Li ser esasê stratejiyên yekdestdariya desthilatdariyê hatiye pêşxistin û versiyona qanûnî ya van stratejiyan e.

Amûra hiqûqa desthilatdariyê, sermaye, bazirganî, qezenc, hegemonya, çînên serdest û yekdestdariya desthilatdariyê ye. Ji

ber vê yekê, hiqûq encamek e. Di vî warî de hiqûq, amûr û rûyê parastinê yê desthilatdariyan e ku berjewendî, pîvan, tevger, sînor, sazûmanî û şeklê desthilatdariyan diparêze. Ya rastî heke mirov hiqûqê ji nav hilde, stem û zordariya repûrût a çerxa mêtingerî wê xuya bibe.

Heke rewş wiha be, yekeyên exlaqî û polîtîk ên di roja me ya îroyîn de wê bi têkiliyek çawa di nav hiqûqê de bin? An jî bihevrebûna exlaq û hiqûqê wê çawa çêbibe? Yan jî 'hiqûq' di destê kê de be, pêkanîna wê wê li gorî wî/ê cuda be? An jî ew hiqûqa bi exlaq dayîn xwarinê, divê çawa be? Bi van pirsyaran ve girêdayî, ji bo em zanibin ka hişmendiya me ya hiqûqê divê çawa be, em neçarin formûlasyonekê çêbikin.

Berî her tiştî em formûlasyona exlaq û hiqûqê, di têkilî û nakokiyên di navbera şaristaniya demokratîk û şaristaniya bi çîn de bigirin dest. Her du feraset jî li ser nakokiyên heyî hebûna xwe pêşan didin. Hevûdû bisînorkirin, tengavkirin, hevûdû derbaskirin û hevûdû tasfiyekirin, pêwîstiyek li gorî xwezaya wan e. Wê demê aştî, lihevkirin û nepevçûnî jî di xwezaya vî karî de heye.

Şêwazê aştî û lihevhatinê jî, dikare wekî rewşa seknek di nav hev de ya bê kuştin û bê çek pêş bikeve. Formûlasyona dewlet+demokrasî di vê çarçoveyê de ye. Bi qasî pevçûna timî ya beramberî hev a van her dû ferasetan, formûla van herdu ferastan a bihevrebûnê jî heye. Ev rewşa ku li ser bingehê hev tinenekirinê pêş dikeve, wekî pêvajoyek bê çek û bê kuştin pêş dikeve. Heke civak karibe xwe îfade bike yan jî dewlet bi awayek hesas li pêşketina îradeya civakî ya heyî binêre, feraseta yekeya exlaqî-polîtîk jî, pêvajoya xwe ya tinekirin û ji holê rakirina

dewletê bisekinîne, têkoşîna xwe vekişîne nav rêrewek bîrdozî û siyasî, wê rewşa aştî û lihevhatinê pêş bixe. Timî pevçûn û timî aştî rewşek heyamî ye.

Mijara didoyê jî, gelo mirov dikare di çarçevaya neteweya demokratîk de feraseta hiqûqê ya di nav exlaq de hatî bicihkirin-bi exlaq dayîn xwarin, bi awayek sîstematîk bi rêxistin bike?

Heta ku dewlet hebe, her çi qas hebûn, naverok û feraseta hiqûqê were guhertin jî, wê hebûna wê bidome. Ji ber ku dinyaya em tê de dijîn, dinyayek a dewletê ye. Piştguhkirina vê ne mumkin e. Di demekî kurt de ev ji holê ranebe.

Lewra, her çi qas hiqûq têgînek bi pirsgirêk e jî, yekdestdariyên desthilatdariyê maneya xwe dane naveroka wê. Wê demê demokratîkkirina hiqûqê; dibe ku bi sînordarkirinê, bi qelskirinê, bi bêwatekirinê û bi tevlîkirina demokrasiyê, polîtîkayê û bi feraseta exlaqî mumkin be.

Dema di pergaleke dualî de formûlasyon bibe hiqûq+exlaq, di xebateke hundirîn a pergaleke demokratîk de jî, mumkin e ku hiqûqek bi maf û edaletê ve girêdayî, li ser exlaq were avakirin. Dibe ku hevpeymaneke civakî ya nû girêdayî hişmendiya xwerêveberiya dayîkê û hempayê ruhê Neteweya Demokratîk, esasên Şaristaniya Demokratîk bide diyarkirin.

Wekî ku li jor jî hatî xuyakirin, hiqûqa yekdestdariya desthilatdariyê, piştî şkestina yekem û duyem a zayendiyê, serdest dibe. Qral Lageş, Hemmorabî û modêlên din ên piştî wê, mînakên şênber ên vê yekê ne.

Wê demê, heke Netewaya Demokartîk xwe bispêre yekeya Civaka Exlaqî û polîtîk, divê bi dîtina vê rastiyê, zihniyet û pratîk

were birêxistinkirin. Pêwîst e ev jî li ser bingehê hevpeymanek civakî ya nû, bi hişmendiya xwerêveberiya dayîkê ve girêdayî be.

Jê û pê ve, ji xeynî belgeyek a di çarçoveya hiqûqa giştî de ku nakeve nav hûrgiliyan û çavkaniya wê ev hevpeyman e, rêvebirina karûbaran û çareserkirina pirsgirêkan, civak bi xwe dikare di çarçoveya exlaq de pêk bîne. Ji ber ku di tecrûbeyên împaratorî û olan de jî, civakan pirsgirêkên xwe ji derveyî çarçoveya hiqûqa giştî çareser dikirin. Qebîle, eşîr û klanan bêhtirî pirsgirêkên xwe, bi pîvanên exlaqî hel dikirin. Di roja me de jî civak bi xwe pirsgirêkên xwe bi nîqaşê çareser dikin.

Belgeyek hiqûqî ya hevpar a têkildarî giştî, dikare di şert û mercên roja me ya îroyîn de pêdiviyên bingehîn ên civakî pêk bîne. Ji ber ku çaxa em tê de dijîn, ne serdemek exlaqî û polîtîk e. Yên diçewisînin û yên tên çewisandin hene. Hê jî dewlet wekî diza herî mezin û amûra tinekirinê hebûna xwe diparêze. Heta ku hejarî û çînayetî hebe, wê dizî, bê dadî, qetil û mirovkujî hebe. Mirov dikare li van zêde bike. Ev encam in. Heke ev rastiyek be, pêwîstiya civakê bi metneke hiqûqî ya hevpar a her kesî bigire nava xwe, bi berçavagirtina cudahiyan û bi rêgezên girêdayî maf û edaletê heye. Civak bêyî qayîde û prensîb nikarin bijîn; jixwe di xwezaya civakan de jî ev tine ye. Divê prensîb hebin.

Ji derveyî çarçoveya giştî ya hiqûqê, komîn, meclis, kanton, partî, rêxistinên sivîl, malbat û hwd. dikarin rojene werin ba hev û pirsgirêkên xwe di çarçoveyeke exlaqî de nîqaş bikin û çareseriyê jê re bibînin. Û li ser vî bingehî, bêyî hewcehiya hiqûqê, dikarin jiyana xwe ya civakî bidomînin. Teşwîqkirin û kevneşopîkirina vê pêvajoya nîqaşê, nêzîkatiya herî bingehîn a ber bi civaka demokratîk ve ye. Heke ji malbatê heya meclisên

giştî hatina ba hev di çarçoveyek azad de be, nîqaşkirin wê rê ji serwextbûnek demokratîk re veke, di qonaxa pêkanînê ya biryarên hatîn girtin de jî, exlaq wê têkeve dewrê, ji ber ku kirina xebatê, pêkanîna biryarê, ka wê li gorî çi pêk were, prensîbên exlaq wê bide diyarkirin. Divê çalakî di rasteka berjewendiyên xweza û civakê de û li gorî qenciyê bê destgirtin.

Li vir, pîvana bingehîn çanda rojane hatina ba hev, bi hev şêwirîn, bi awayek azad, wekhev û li ser bingeheke demokratîk nîqaşkirin û biryargirtin e, divê ev jî li ser bingehê hebûna mekanîzmayên demokratîk pêk were. Heke pirsgirêk bi exlaq werin çareserkirin, wê bi watedartir be ku belgeyek an jî hevpeymanek di çarçoveya hiqûqa giştî de bi exlaq re were yekkirin, wê bide xuyakirin ku bi demê re prensîbên exlaq wê rênîşander bin ji jiyanê re. Wê mumkin be ku ev hêdî hêdî bi herikîna demê re veguhere reftar û teşeyan.

Li vê derê ya giring, ew maddeya bingehîn û xam a ku belgeya çarçoveya hiqûqê xwe dispêrê ye. Divê ev, demokrasî, azadî, polîtîka, maf, edalet, wekhevî û cihêrengî be. Ji ber vê yekê mirov dikare bi awayekî giştî çarvçoveya hiqûqê ya bi prensîban re bûyî yek, bi pîvanên bingehîn ên bi exlaq ve girêdayî, yên wekî qencî, rastî, bedewî, ked û hezkirinê re, bi dilxwazî bêyî belgeyek nivîskî bigihîne hev.

Bi vî rengî, bi şêweyek cuda ji hiqûqê, pîvanên exlaqî bi awayek dilxwazî û jidil, bi jiyîn û hînbûnê çêdibe, başî û xirabî bi tecrûbeyê xuya dibe. Ev pîvanên bingehîn in, bêyî vana jiyana civakî dewam nake û pêk nayê.

Wekî mînak, heke zarokek destê xwe bide agir, wê destê wî/ê bişewite, ev jî tê wê wateyê ku ev tiştek xirab e. Zarokek ji

malê dûr bikeve wê zirarê bibîne-wê biêşê, ev tiştek xirab e. Dîsan tundiya li dijî jinê, dizî, li derveyî klanê-civakê man mirin e, qezenca bê ked xirab e- heram e, heke mirov karekî bike, li gorî pîvanan pêk neyne, wê xirabiyan bi xwe re bîne û her wiha mirov dikare gelek mînakên din jî bibêje. Wekî ku ji mînakan jî tê famkirin, mirov dikare vê rastiyê hê bêhtir kûr û berfireh bike ku parastina civakê ji xirabiyê, pêşxistina qencî û bedewiyê pîvanek exlaqî ye.

Exlaq, ji bo pêşxistin, qencî, pakirin û parastina jiyanê heye. Wê demê exlaq, navê jiyana li dijî xirabiyê radiweste, qencî û bedewiyê pêş dixe ye. Û bêyî wî mirov nikare bijî.

Lewma exlaq, hemû kar, perspektîfan û pirsgirêkên rojane yên civakî yên derdikevin holê, bêyî ku pêwîstî bi hiqûqê bibîne, bi safoka exlaqê ku wijdanê civakî ye, çareser dike. Exlaq şeklê dawî dide van hemûyan û di çarçoveya irf û edetan de vediguherîne danûstandina çandî.

Li vir a ku di asteke giring de stratejiyê bide diyarkirin, pêkanîna hevsengî û bihevrebûna guncaw a di navbera zekaya analîtîk û zekaya hestyarî de ye, ku ev wê rê bide civak karibin hemû pêdiviyên qada xwe ya jiyanê, yên wekî ewlehî, paratin, stargeh, xurek û hemû pêwîstiyên xwe yên din ên maddî û manewî pêk bînin û jiyana xwe bi azadî û wekheviyê bigihînin siberojê.

Bi şênberbûna diyardeyên wekî demokrasî, çand û xwerêveberiyê di yekeyên (komîn-meclis û hwd) exlaqî û polîtîk de, Pergala Şaristaniya Demokratîk wê li gorî bingehên exlaqî derbasî pêvajoya xwe ya pêşketinê bibe.

Mijarek din a di warê hiqûqê de ku divê were nirxandin jî, têkiliya di navbera exlaq û hiqûqê ya Pergala Xwerêveberiya Demokratîk a di çarçoveya dewlet-demokarasiyê de hatî pênasekirin e.

Hiqûq di destê kê de be, berjewendiyên wî yên siyasî û bîrdozî esas digire. Di rastiya xwe de, civakên ku bi desthilatdariyê ve girêdayî, civakên hiqûqî ne. Ji ber ku Civaka Demokratîk xwe dispêre esasên exlaqî, wekî civaka polîtîk û exlaqî pêş dikeve. Lewra feraseta hiqûqa ku wê pêş bikeve, divê piç bi piç di nav exlaq de cih bigire û bi exlaq re zindî bibe. Li ser van esasan, mirov dikare wateyê li qayîdeyên hiqûqê zêde bike û pêş bixe.

Şaristaniya Demokratîk, civakek bi exlaq û polîtîk e. Dema em dibêjin hiqûq, mebesta em ev e. Mebesta me ne feraseta civaka hiqûqî ye. Di çarçoveya mijarê de, xebateke hiqûqî ya ku feraseta Neteweya Demokratîk derxîne holê, di heqîqeta xwe de dibe ku rastî zehmetiyan bê. Ji ber ku stûna siyasî û civakî ya Neteweya Demokratîk, li gorî xweseriyê bi teşe bûye. Rêveberiyên xweser, di rastiya xwe de hêza xwe ji xwerêveberiya civakê û ji xwe bi xwe çareserkirina pirsgirêkên xwe digirin.

Ji ber vê yekê, di neteweyên demokratîk de rêveberiya xweser, di neteweyên hiqûqî û dewletneteweyan de rêveberiya desthilatdariyê, mafan destnîşan dike. Di vî warî de, pêkhateyên rêveberiya xweser, hişmendî û bi gewdebûna wê, ne hiqûq, exlaq dide diyarkirin. Ji ber vê yekê, civaka xweseriya demokratîk bi xwespartina bingehên exlaqî, hebûna xwe pêş dixe. Ji ber ku serdema civaka ku em tê de dijîn, ne serdema tam civaka polîtîk û exlaqî ye, di nav de ji bo heyamekê mirov dikare pergalekê li

ser têkiliyên exlaq û hiqûqê ava bike. Bêguman a giring hiqûq di destê kê de ye, li ser nirxên bingehîn ên wekî maf û edaletê ava bûye yan na.

Mebest ji gotina 'Hiqûq di destê kê de be', ne cudakirina hêzan a li ser bingehê şaristaniya bi çîn e. Yekeya civaka exlaqî û polîtîk hêzê dide mekanîzmayên civakî. Ev jî komîn, meclis, kanton û sendîka û yekeyên din ên wekî van in. Nîqaş di çarçoveya pêvajoyên plansaziya biryaran û girtina biryaran de çêdibe. Di van pêvajoyan de prensîba hêz di destê civakê de ye, esas e.

Wê demê edalet û maf çi ye? Gelo maf û edalet wekhev in? Maf; di serî de ewlehiya jiyana mirov, misogerkirina ewlehî, xurek û parastinê ku hewcehiyek civakî ye, dabînkirina hewcedariyên rojane, ji bo pêşxisitin û parastaina çand, perwerde, tenduristî, bawerî û ziman, bi awayek wekhev parvekirina derfetên aboriyê, misogerkirina azadiya ramanê, bi ayîdiyeta xwe ya civakî, bi çand, dîrok û kevneşopî û hwd. ên xwe yên resen jiyîn û bi awayek wekhev ji her kesî re dabînkirina derfetan e. Ev mafên herî bingehîn in û ji her kesî re derbasdar in.

Edalet jî, dema van mafan pêk bîne, dibe edalet. Heke her kes bi awayek wekhev ji van mafan sûdmend bibe, wê edalet û her wiha hiqûq pêk were. Heke li cihekî mafê geşt û gerê, mafê birêxsitinkirinê û azadiya ramanê, mafê xebatê yê azad, mafê bi awayek azad sûdgirtina ji derfetan, û wekî vana mafên pêkanîna baweriya xwe bi cih neyên, yekser li wê derê bêedaletî dest pê dike.

Aha, dema hêzên dewletê û amûrên wê yên zordestiyê dibin asteng û rê nadin ku mirov û civak mafên xwe yên bingehîn bi kar bînin, li wê derê bêedaletî çêdibe. Li cihê ku bêedaletî lê hebe, li wê derê serîhildan, protesto û têkoşîn pêş dikeve. Ji ber ku mirov û civak nikarin hem mafên xwe yên xwezayî û hem jî mafên ku bi destxistîn bi kar bînin û nikarin bi awayek wekhev ji derfetên heyî sûdmend bibin û bi darê zorê tên astengkirin. Di dîroka mirovahiyê de, dirûşmeya pêşketî ya yekemîn a hemû têkoşîn û serhildanan bûye edalet.

Mafên dîrokî û civakî, mafên bûyîna mirov, mafên zikmakî ne; ziman, nasname, urf û edet, xwerêveberî-xwe bi xwe rêvebirin û hwd. mafên ku nayên înkarin in. Ev feraset û pergalên hiqûqî yên heyî, aha ji bo pêşî li van mafan bigirin û berjwendiyên yekdestdaran biparêzin, li ser înkara van mafan hiqûqa xwe ava kirine. Îca ji ber van sedemên dîrokî û civakî, heke hiqûq li ser maf û edaletê were avakirin, bi wate dibe-dibe xwedî wateyekê.

Di Neteweya Demokratîk de, bi hiqûqek bi vî rengî edalet û maf, asayîş û dadgeh pêk nayê. Civaka herî azad û dadperwer, civaka ku polîs, dadgeh û zindan lê tineyî ye. Wek tê zanîn, ji ber hebûna diyardeya sûc, saziyên asayîş, dadgeh û girtîgehê hene. Aha, nexwe ji ber ku bêedaletî û bêmafî heye, asayîş, girtîgeh û dadgeh hene. Ji ber ku li cihê ku ferq û cudahî, çînayetî, yekdestdarî, serdest û bindest hebe, li wê derê bêdadî heye. Ji ber vê sedemê, ev serdema ku em tê de dijîn, ne serdemek exlaqî û polîtîk e. Li vê derê zorlêkirin û neçarî heye.

Li Rojava şoreşek pêş ket, ev gava yekem e. Lê mîrasek bi pirsgirêk hate dewrgirtin û niha jî li ser mîrasê dewr hatî girtin pêvajoyek pêş dikeve. Şoreş pêş ket, lê hemû kirêtî û gemara

vereşîna kapîtalîzmê, wekî pirsgirêkekê li pêşberî me rawestiyayî ye. Ne şoreşgeran diyardeyên wekî tiryak, tecawîz, xizanî, DAIŞ, mêtingerî, çînayetî, parçebûn, bê çandî, bê dîrokî û hwd. afirandine. Baş e li dijî van divê çi were kirin?

Nirxên şoreşê yên civakî, yan wê bi girtîgeh, asayîş û dadgehan werin parastin an jî wê bi awayê pêşxistina exlaq, sazûmaniya civaka polîtîk û exlaqî were birêxistinkirin û pêşxistin. Li vir jî paradoks derdikeve holê. Cîhana me û rewşa mirovahiyê aniha ne di asteke welê de ye. Lê belê Rêbe APO bi pergala ku ava kirî, bêyî ku azadiyê bi şûnde bixe û bihêle ji rojek din re, got, divê bi avakirina pergalê re pêşketina wê jî çêbibe. Ji ber ku azadî aniha ye. Em di nuqteyek wisa de ne.

Ji ber vê paradoksê, hiqûqa xweseriya demokratîk ne zelal e û hê jî li gorî ku tê xwestin pêk nehatiye. Lewra Rêveberiya Xweseriya Rojava, ji pêvajoyên ku di vê qadê de pê re derbas bûn, tecrûbe girt û Hevpeymana xwe ya Civakî ragihand. Ev jî di Pergala Xweseriyê de dibe belgeyek esasî. Ji ber ku me civakek ji hemû cûrên azadiyê bêpar, bi newekhevî û bêdadiyê hatî dorpêçkirin, ji pergala Sûriyê dewr girt. Ev rewşek ciddî ye. Bo nimûne, heke li cihekî xizanî çêbibe, çînayetî pêş dikeve, li cihê ku çînayetî lê hebe jî tawan çêdibin. Evane wê wekî encamekê derkevin holê. Ji ber vê yekê, sermayeya ku xwe spartî yekdestdariya desthilatdariyê û pergala wê ya bê hed û hesab a qezenca herî zêde, sedema hemû pirsgirêkan e.

Vê sedemê, realîteyek civakî ya newekhev û ji hemû cûrên azadiyê pêbar derxist holê. Heke ji ber vê realîteyê her roj pirsgirêkên bi nakok ên maddî û manewî derkevin pêş, teqez li wê derê ji ber newekheviyê tawan heye. Di roja me de, di

pêvajoya civaka bi exlaq û polîtîk de, ev tê dîtin û têkoşîna sext a wê tê dayîn. Ji ber vê yekê, di van şert û mercan de pêşxistina civakê di warê exlaqî de heya bibêjî pir zor û zehmet e. Lewma di van şert û mercan de, pêwîstiya hiqûqê tê famkirin. Wê demê divê mirov bipirse, hiqûqek çawa, hiqûqek bi çi rengî?

Heke hiqûq lazim be, gava ku em hiqûqê di aliyekî de li ser edalet û mafan ava dikin, divê em di aliyê wê yê din de jî heya bibêjî exlaq jîndar û zindî bikin. Ji ber vê yekê, berî her tiştî divê hiqûq di asta xwespartina edalet û wekheviya mafan de were avakirin û pêşxistin. Lewma, divê hiqûq pîvan û qayîdeya edalet û mafan bi rêxistin bike. Em alîgirê avaniyeke hiqûqî ya bingeha xwe ji maf û edaletê digire ne.

Divê hiqûqa neteweya demokratîk, bi parastina hizir, bîr û baweriyên avakirina civakê, bi parastina  mafên çandî, ziman, ekonomî, rêxistinî û bi ferzkirina edaletê pêş bikeve. Di vê qonaxa navberê de, divê hiqûq hebe, ji ber ku çîn hene û nakokî pir zêde ne. Di vê realîtya civakî ya em îro dijîn de, zehmet e ku civak bes li ser exlaq û wijdan bimeşe.

Metneke hiqûqî, ya ku teferrûatên wê ne zêde bin, dikare hewcehiyan pêk bîne. Belge û çarçoveyek hiqûqî ya civaka xweseriya demokartîk heye (divê belge û çarçoveyek hiqûqî hebe), lê rêbaza herî baş ew e ku pirsgirêkên rojane bi nîqaşên hevpar bên çareserkirin û pergal li ser qayîdeyên exlaqî û polîtîk bimeşe .

Pêwîst e prensîba me ya bingehîn ew be ku em pirsgirêkên rojane yên derheqê hiqûqê de bi nîqaşkirinê, bi mekanîzmayên demokratîk çareser bikin û em hiqûqê têxin di rewşek wisa  de ku beramberî demokrasiyê hesas be. Pîvanên wê yên bingehîn li

jor hatine diyarkirin. Hiqûq ne rengek tenê ye. Divê were zanîn ku pêkhateyên Reqayê, Minbicê, Dêrezorê, heta yên Dêrikê, Kobanê û bi kurtasî cih û warên civakî û çandî ne wekhev in. Cuda cuda li gorî pêdiviyên herêmî û çandî dibe ku çarçoveya hiqûqê ya cuda hebe yan jî ew navçe dikarin bi nîqaşan qayîdeyên xwe çêbikin.

Dewletnetewe hiqûqekê tenê pêk tîne, lê her kes ji ber avaniya civakî û çandî ne wekhev e. Heta di nav Kurdan de jî nabe hiqûqek tenê hebe. Di nava kantonan de jî divê hiqûqên cuda hebin. Feraseta li her derê heman hiqûq, dewletnetewe pêş dixe. Lewma divê hiqûq li gorî çand, civak, aborî û xwezaya mirov pêş bikeve. Bi vê armancê, çarçoveyek hiqûqî ya giştî yan jî hevpeymana  Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye ragihandin. Bi vê belgeyê, têkiliyên di navbera rêveberiyên xweser, konseyan û saziyan de hatine sererastkirin. Ev jî perspektîfên têkildarî mijarên giştî yên yekparebûna neteweya demokratîk in. Dema ku ev belge dihat amadekirin, bi nîqaşa hevpar a hemû komîn, meclis û saziyan hat pêşxistin. Ji derveyî vê jî, çareseriya pirsgirêkên rojane, ji îradeya li qadê ya kanton û çandên li herêmê re hatiye hiştin. Baş e, di Xweseriya Demokratîk de divê hiqûqa rêveberiyê (karbidestiyê) û ya têkiliyan çi be?

1- Dîplomasî: Divê di civaka navneteweyî de nûrnetiya maf û hiqûqa rêveberiya xweseriya demokratîk bike.

2- Parastin: Her çi qas xweparastin qadeke ku her herêm û her kanton pêre eleqedar dibe jî,  divê di pêvajoyên şer

û berxwedanê de, strajetiya parastinê bi awayek hevpar were diyarkirin.

3- Petrol, gumrik û bendav: Ev qadên han her kesî eleqedar dikin. Divê polîtîkayeke giştî were pêşxistin.

4- Budçe: Divê dahat li cihekî were komkirin. Lê, divê dahat û lêçûna wî welatî bi awayekî vekirî û zelal bi gel re were parvekirin. Û ji bilî vê jî, divê hemû dahat li gorî pêwîstiyan bi awayekî wekhev û dadmendane were dabeşkirin û parvekirin.

5- Di Xweseriya Demokratîk de, Mufredatên hînkarî û perwerdehiya civakî; divê bi polîtîkayek giştî digel nîqaşê û bi berçavgirtina xweserî û reseniyan, were diyarkirin. Kanton û meclis dikarin li gorî sosyolojiya xwe belgeya xwe ya hiqûqê derbixin.

Pergala edaletê jî, divê bi rêya sulhê û li ser esasê hêza gel were çareserkirin. Ji bilî sûcên herî giran, divê hemû pergala dadmendî û edaletê li ser esasê sulhê were çareserkirin. Û civak bi prensîbên ku bi exlaqê civakî hatîn destnîşankirin, xwe bi rê ve bibin. Divê ev pêvajo hemû bi nîqaşên bi komîn, meclis û kantonan re were diyarkirin, bi taybet jî divê platformên gel bên teşwîqkirin, divê prensîbên exlaqî yên civakî yên wekî kedê bên pêkanîn û zindîkirin .

Wekî encam, pêwîst e em bi nîqaş, ceribandin û bi tecrûbeyên ji ezmûnan derdikevin, feraseteke hiqûqî ya hemtayî rewşa şoreşgerî ya ku em di nav de dijîn, bi rêxistin bikin. Divê em fam bikin û jê haydar bin ku heta em modêla xwe ya civakî pêş nexin, çi modêla hiqûqê bê bikaranîn, wê dawiya wê bigihêje

desthilatdariyê. Feraseta hiqûqê ya pergala xweseriya demokratîk, di vî warî de, ferasetek a hiqûqê ya bi exlaq pêk hatiye.

Li hêla din jî, di modêlên hatîn pêşxistin ên civakên dewletperest de, di formûlên wan de, awayê 'cudahiya hêzê' girêdayî hêza hevsengî û parvekirinê ya desthilatdariya pergalên zordest e. Lê di civaka exlaqî û polîtîk de, quwet ji meclis û komînan re tê dayîn, ku hewl dide hem di warê îrade û hem jî di warê kirdarî de civakê esas bigire.

## 9- Demokrasî

Têgîna demokrasiyê jî wekî wan têgînên din, yek ji wan têgînên herî zêde pê hatî lîstin û hatî berevajîkirin e. Yekdestdarên desthilatdariyê wekî têgînên din, têgîna demokrasiyê jî ji bo sazûmaniyên xwe yên îstîsmarê, wekî amûrekê bi kar tînin.

Heke ev têgînên han ji yekdestdarên desthilatdariyê bên standin, wê rastiya wan bi awayekî tazî ji derve xuya bibe û ji derveyî amara wan a zordariyê, maskeyek din namîne ew xwe pê binxumînin. Piştî pêvajoya Atînayê, bi qasî du hezar salan têgîna demokrasiyê di refikên bi toz de maye. Rewşa ku di van salên dawiyê de derketî holê ew e ku serdestan xwe bi têgîna demokrasiyê nixumandine û ji bo vê mebesta xwe jî têgîna demokrasiyê dane pêş û xistine piyaseyê. Wê demê divê mirov demokrasiyê çawa bigire dest?

Di warê paradîgmayî de, pêşketina civakî ya dîrokî B.Z. derdora 5000 sal, rastî qutbûnê hatiye û di pêşketina civakî de, giriftên zor û zehmet xwe dane der. Aliyekî yê vê cemserê, Şaristaniya Demokratîk (ku bingeha wê xwe dispart civaka neolîtîkê) bû, cemsera dijberî wê jî wekî şaristaniya serdest (li ser hiyerarşiya baviksalarî ya xanedaniyê ku paşê bû dewlet) pêş diket. Bi vî awayî, girtina dest a civaka dîrokî ferz dike ku mirov bi awayekî cuda têgînan û pêşketinên derketîn holê bigire dest.

Şaristaniya bi çîn, awayê şaristaniyeke serdestiyê ye û heya roja me va 5 hezar sal e didome. Di van 5 hezar salên dewam dike de, cemsera dijbera şaristaniya bi çîn, şaristaniya demokratîk e. Wê demê, divê têgîna demokrasiyê beramberî cemsara dijber di warê exlaqî û polîtîk de were destgirtin û pênasekirin. Heke têgîna demokrasiyê di vî warî de were pênasekirin, wê demê em ê karibin her tiştî li cihê wê yê resen bidin rûnişkandin (her tişt wê li cihê xwe rûnê) û encex bi vî awayî nezelaltiya heyî ji holê rabe.

Heke heqîqet ev be, wê demê divê demokrasî ne bi şîroveya şaristaniyê, bi cewhera civaka polîtîk û exlaqî were şîrovekirin. Bi şîroveya bi vî awayî, em ê hem bibînin li cihê ku cihêrengî û cûrbicûriya civakê lê heyî çawa demokrasî lê dipişkive û hem jî em ê bigihêjin wê encama bêyî zihniyeta dewletê nixandina demokrasiyê.

Heke têgîna demokrasiyê di çarçoveya dewletê, desthilatdariyê, hegemonyayê û yekdestdariyê de were destgirtin, ew ne demokrasî ye. Ji ber ku demokrasî ne dewletbûn e, şêwazekî jiyanê yê ku hêmanên ji hev cuda û cihêreng ên civakê xwe tê de îfade dikin e, heke em wekî

pergaleke ji derveyî dewletê û ji aliyê civakê ve hatî avakirin bigirin dest û ji cihê ku demokrasî lê çêbûyî dest pê bikin, wê her tişt li şûna xwe, hemû kevir li cihê xwe rûnin. Danasîna giştî ya vê pêvajoyê jî, şaristaniya demokratîk e.

Dema em têgîna demokrasiyê digirin dest, divê em bi têgîna civakê, çandê, polîtîkayê, exlaq, xweseriyê, azadî û têgînên din ên wekî van re bigirin dest. Ji ber ku xwezaya civakî ji cudahî û cihêrengiyan pêk hatiye. Di vî warî de, demokrasî diyardeyek a di encama hebûna cûrbicûrî û cihêrengiya civakê de pêş ketiye ye. Aha civaka exlaqî û polîtîk jî bi van vehûnandinan tevdigere. Ji ber ku civak nûnertiya heqîqeta ku li gorî esasê wê pêş dikeve, dike. Civaka exlaqî û polîtîk tam wekî tevna vehûnandina mirovekî ye. MIROV BI VEHÛNANDINA XWE YA XWESER DIBE MIROV!

Dibe ku organên laşê mirov ziyanê bibînin, li gorî ku tên xwestin baş nexebitin, mirov dikare tedawî bike û jiyana xwe bidomîne. Di vî warî de, tevnên mirov pêk tînin ji cihekî cuda nayên, ew bi xwe, bi pêvajoya pêşketinê re pêş dikevin û gewde pêk tînin. Têgînên tevna civakê yên wekî exlaq, polîtîka, rêveberiya xweser, azadî û demokrasî, wekî tevnên vehûnandinê yên civaka exlaqî û polîtîk pêş dikevin. Ji hev veqetandin û ji hev cudakirina vana ne mumkin e.

Dema yekdestdarên desthilatdariyê tevnên vehûnandina mirov ji mirov distînin û dibin, hem dixwazin mirov seqet û felc bikin û hem jî dixwazin sedema hebûna wê tevnê biguherin û ji hev veqetînin û qut bikin. Zihniyeta şaristaniya bi çîn tam vê dike. Wekî nimûne, em demokrasî û polîtîkayê ku tevna raçandinê ya civaka exlaqî û polîtîk in bigirin dest. Ji bo xuliqandina pêşketina

civakê, divê rojane têkiliyên civakî çêbibin, ji bo berdewamiya jiyanê divê plan û plansazî çêbibin, ji bo xwexwedîkirinê divê hilberîn çêbibe, nêçîrvanî bê kirin, ji bo xwestrandin û xweparastinê divê cihek peyda bibe, bi kurtasî çalakiya çareseriyê ya van mijaran tevan, girêdayî mijara polîtîkayê ye. Baş e, ma heke wisa be, polîtîka wê çawa xwe îfade bike? Bêyî hawîrdorek azad, mumikn e ku derfet û şêwazê xweîfadekirinê hebe?

Aha li vê derê demokrasî dikeve dewrê û xwe dide pêş. Lewra rêya bingehîn a pêkanîna polîtîkayê, demokrasî ye. Rêber APO, polîtîkayê wekî hûnera azadiyê, demokrasiyê jî wekî AWAYÊ PÊKANÎNA polîtîkayê pênase dike. Bi pênaseya roja me ya îro jî, em jê re dibêjin siyaseta demokratîk .

Ji ber vê yekê, têkiliya demokrasiyê bi hemû têgînan re di vî alî de ye. Hemû têgîn û raman, îca çi xwerêveberî, çand, exlaq, aborî û azadî bin, û çi jî totemîst, anîmîst, çanda xwedawendiyê, metafîzîk, mîtolojî û fikrên felsefîk û hemû bawerî, têgîn û fikir rasterast bi demokrasiyê re têkildar in. Mebest ji tevna takekesî ya mirov an jî ji tevna polîtîk a exlaqî ya civakê ev e.

Her çiqasî wekî têgîn li sîteyên Yûnan hatibe bikaranîn jî, bingeha wê civaka xwezayî ye. Koka wê, hişmendiya wê, fonksiyon û şeklê wê yê pêşketinê, xwe digihîne civaka neolîtîkê ya ku mirov wekî hebûneke civakî lê pêşketî.

Jixwe dîroknasên wekî Gordon Child, Elî Şerîetî û A. Gûnder Frank, bi gotina ‘Dîroka mirovahiyê çavkaniya xwe ji Mezopotamyayê digire’ hemû nêrînên heyî guhertin.

Di dawiyê de wekî encam, heke têgîna demokrasiyê were destgirtin, divê ji bêdewletbûnê were destpêkirin û li ser xeta civaka berxwedêr a beramberî dewletê radiweste, were destgirtin. Ji klanê heta pêvajoya neteweya demokratîk, hemû qonax dikevin çarçoveya demokrasiyê.

Di vî warî de, pêwîst e were zanîn ku demokrasî wekî şêwazek ê jiyanê, bi civakîbûnê re dest pê dike. Qonaxên klan, qebîle, êl û eşîretan ku awayên civaka neolîtîkê ne, derxistine holê ku şeklê herî paqij ê demokrasiyê, bi pêşengtiya jinê hatiye jiyîn. Rewşa resen û heqîqî ya destpêkê ya demokrasiyê, di civaka neolîtîkê de pêş ketiye. Di vî warî de, pêwîst e demokrasî wekî şaneya kok were hesibandin û binavkirin.

Piştî ku civaka neolîtîkê bi pêşengtiya civaka şaristaniya bi çîn rastî şkestinê hat, li hemberî vê jî pêvajoya bi karekterê şaristaniya demokratîk a ku hebûna xwe ya civakî parastî, hatiye destpêkirin. Ev pêvajo bi pêşengtiya jinê li hemberî yekdestdariya desthilatdariya ku bi mêr pêk hatî, li dijî dewlet û çînayetiyê wekî DEMARA KOK a destpêkê, li hemberî vê sazûmaniya yekdestdar pêş ketiye. Şerên ku derbasî mîtolojiyê bûyîn yên Înanna-Enkî, Mardûk-Tîamat û Gilgamêş û Îştar, di rastiya xwe de şerê civaka dewletperest a li hemberî têkoşîna xeta civaka demokratîk û berxwedêr temsîl dike.

DEMARÊ DUYEMÎN Ê KOKA demokrasiyê, bi dîroka baweriyan, olan, felsefe û zanistê dewam dike. Tevgerên çandî û civakî yên bi feraseta bawerî û ol ve girêdayî û dîsan meylên ku bi pêşengtiya felsefe û bîrmendên zanistî pêş ketîn, wekî pêkhateyên bingehîn ên xeta duyemîn a demokrasiyê pêş

dikevin. Bi taybetî di vê çarçoveyê de, mirov dikare Mazdeîzma ku xwe dispêre çanda xwedawendiyê binirxîne.

Mazdeîzm, xeteke berxwedanê ya îdeolojîk-polîtîk-felsefîk e. Û mînaka berxwedanê ya serdema şaristaniya bi çîn a kevneşopiya berxwedanê ya dayîka xwedawend e. Zerdest, Mazda, Manî, Hûrrem, Cawîdan, Babek û Ebû Muslimê Xuresanî, barhilgirên çanda civaka demokratîk in. Çanda dayîka xwedawend a wekhevîxwazî û azadîxwaziyê, bi rêya Mazdeîzmê xwe gihandiye Zerdeşt û ji wir jî rasterast an jî bi navgînekê, rêçika berxwedanên demokratîk daye diyarkirin.

Pêximber û tevgerên dînî, berxwedana kole û qebîleyan, koça qewman, îsyana gundiyan, tevgerên etnîkî û çandî, berxwedana qewman a li gund û bajaran, tevgerên ronesansê, tevgerên karkeran, tevgerên femînîzm û anarşîstan û hemû pêkhateyên derveyî pergalê yên di roja me ya îroyîn de çêbûyîn, barhilgirên eslî yên koka demarê demokrasiyê ne.

DEMARÊ SÊYEMÎN Ê KOKA demokrasiyê, paradîgmaya şaristaniya demokratîk a ku bi Rêber APO hatî destpêkirin e. Demarê Sêyemîn ê koka demokrasiyê, li ser her dû kokên destpêkê û di esasê xwe de bi sentez û nûkirina nirxên esasî û resen ên civaka neolîtîkê ava bûye. Heke pêkhateyên exlaqî û polîtîk ên civakî esas bên girtin, divê em hêmanên şaristaniya demokratîk ku demarên kok ên çandî yên demokrasiyê ne, wekî mîrasteyên civakî yên di wateya xwe ya heqîqî de demokratîk qebûl bikin û demokrasiyê li ser van nirxên ku nebûyîn dewlet bi nav bikin.

Demarê sêyemîn ê koka demokrasiyê, xwe dispêre koka demarê di civaka neolîtîkê de pêş ketî. Çawa ku ev pêşketin ji

aliyê şaristaniya çînî û dewletî ve rastî vebirandin û jirêderketinê hatiye, xeta şaristaniya demokratîk a ku nebûyî dewlet jî, wê bi sererastkirina dîrokî û bi xwespartina şaneya kok a destpêkê, li cihê ku lê rastî vebirandinê hatî dest pê bike û wê demê wê bigihêje danasîna rast a demokrasiyê, şêwazê wê yê jiyanê û pergala wê.

Piştî ku me demokrasî bi rehenda wê ya civakî pênase kir, divê em di warê têgînî de jî bigirin dest û li ser pêşketina wê ya dîrokî bisekinin.

Heke dîroka demokrasiyê bi van her du cemseran were lêkolînkirin, wê were dîtin ku bi taybetî li Rojhilata Navîn, Atîna, Ewrûpa, Balkanan, Afrîka, Amerîka û bi kurtasî heta salên 1970'yê, her tim di nava xwe de bûne karekterek dualî, lê di van pênc hezar salên dawiyê de serdest hertim bi serketine û ketine rewşeke hukumraniyê.

Di çarçoveya mijarê de, heke hewce bike em bi kurtasî pêşketina dîrokî ya demokrasiyê di çend qonaxan de bigirin dest;

Di çarçoveya van armancan de, yê ku cara yekem têgîna demokrasiyê bi wateya wê ya ku tê zanîn bi kar anî, dîroknasê Yûnanî Heredot e. Di berhema xwe ya B.Z. di sedsala 5'an nivîsî de, têgîna demokrasiyê bi awayê "rêveberiya gel" pênase kiriye.

Demokrasî, xwerêveberiya gel e (gel xwe bi xwe, xwe bi rê ve dibe), îradeya gel e. Wekî peyv, têgîna demokrasiyê Yûnanî ye ku 'demos' tê wateya 'gel' û 'kratos' jî tê wateya 'îdare-rêveberiyê.'

Erê cara yekê di pirtûka Heredot de behsa têgîna demokrasiyê hatiye kirin, lê mînaka herî giring di pêşxistin û parastina demokrasiya ku li Atînayê derketî holê de, Perîkles e. Perîkles, ji Atînayiyan re têgîna demokrasiyê, qencî û xûypakiyên (fazîletên) demokrasiyê yên ku rejîmên arîstokratîk têk dibin, bi van gotinan bi lêv dike: “Rast e em bi demokrasiyê tên binavkirin, ji ber ku rêveberî ne di destê hindikahiyê de, di destê piraniyê de ye”.

Perîkles, li Grek, Atîna û Spartayê, li dijî dîktatorî û mêtingeriya qraltiyê, demokrasî wekî “îradeya piraniyê” pênase kiriye.

Bîrmendê esasî yê Atînayê Perîkles e. Li gorî Perîkles, sê cûrên cuda yên rêveberiyê hene. A yekem, rêveberiya Takekesî ye. Ji vê re dibêje “rêveberiya monark, despot”. A duyemê jî, rêveberiya Hindikahiyê, ji vê re jî dibêje “olîgarşî”an jî “arîstokrasî”. A sêyem jî, rêveberiya Piraniyê, ji vê re jî dibêje “demokrasî”. Li Atîna ya wê demê û derdora wê, vehewîn û bi cihbûnên mezin çêbibû, cûrbicûriya mezin a eşîretên wekî Akarî, Dorî, Mînkenî, Spartayî û hwd. dabaşa axaftinê bû. Ber bi avabûnek nû ve diçûn, ji ber vê yekê pergala vê ya rêveberiyê mijara bingehîn a nîqaş û gengeşeyê bû.

Pêşketina demokrasiya Yûnana antîk a ber bi sazîbûnê ve, B.Z. di sedsala 5’an de hatiye destpêkirin. Lê pêvajoyên vê yên destpêkê heta sedsala 7’an jî dirêj dibin. Şaristaniya Yûnan dabeşî serdemên cuda dibe. Klan û qebîleyên wê yên ku li 300 cihên wê yên ji hev cuda bi cih bûbûn, çanda şaristaniyê li ser bingehê çanda bajar pêş xistine. Lê ji ber ku mijara me xala destpêka derketina demokrasiyê ye, mijara ku em ê bînin ziman

jî di derbarê cudabûn û nakokiyên xeta demokratîk û xeta dewleta desthilatdar de ye.

Digel vê yekê, xuya dibe ku gelê xwecihî yê Yûnanîstanê, her tim bi şaristaniyên Sûmer û Mezopotamyayê re di nav têkiliyan de bûne. Lewra divê were zanîn ku bajarîbûyîn û pêşketinên bi vî rengî, di encama van têkiliyan de pêş ketine.

Paşê, Germenên ku em wan wekî qebîleyên Aka û Dor dinasîn, ji Balkanan hatine Anatolyayê û ji wir jî hatine Yûnanîstanê û êrişî giravên Yûnanê kirine. Li vê derê jî, bi xwespartina mîrasê şaristaniyên ava bûbûn, bi şeklê ku tê zanîn bajardewlet ava kirine. Bi taybetî jî wekî ku hatî gotin, bi yekîtiya klan û qebîleyên cihê ku ji Aka û Doran pêk dihatin, li herêmê bûne xanedan û çîna serdest. Ev qebîleyên ku bi giştî bi girêdana xwînê bi hev ve girêdayî bûn, wan genos-dûndeya herî mezin a Yûnanîstanê pêk anîn.

Ji bo ku hê baştir were famkirin, mirov dikare wan bişibîne pêvajoya dagirkirina Anatolyayê ya ji aliyê qewmên Tirkên barbar ve. Çawa ku li Anatolyayê û Kurdistanê jiyan û civakîbûn pêşketibe, her heman rewş di pêvajoya Yûnanê de jî çêbûye. Çawa ku qewmên barbar ên Tirk li Anatolyayê destpêkê Bîzansî û paşê pergala jiyanê ya herêmî wêran kirin û piştre dest danîne ser erd û milkên wan û li wê derê nifûsa xwe zêde kirine- ku ji vir şûnde dubendî û çînayetî pêş ketiye- qebîleyên Dor û Aka jî li giravên Yûnanîstanê her haman ev şêwaz pêk anîne.

Li Yûnanîstanê, şerê desthilatdariyê her ku diçû di navbera qebîleyên ku berê li wê derê bûn û yên ew der dagir kirîn de, girantir dibû. Ev pêvajo dihat maneya hê bêhtir kolekirin, êsîrkirin û desteserkirina hemû civakê û milkiyetê. Ji ber ku di

encama êrişa Dorî û Akayiyan de, rûniştvanên Yûnan ên ku di bajar de dijiyan û beşa ku di çandiniyê de dixebitîn, ketibûn rewşek wisa ku êdî ji bo vana dixebitîn. Û koletiya ku xwe dispart çînayetiyê jî, bi vî awayî berfireh bû. Di vê qonaxê de, krîza rêveber û rêveberiyê derketibû holê.

Ji ber vê yekê, divê hewldanên bûna dewlet a şaristaniya Yûnanê ya navend Atîna di vê çarçoveyê de were nirxandin. Di dawiyê de qebîleyên esilzade, çînên bajarî û yên ku bi çandiniyê ve girêdayî tesfiye kirin, hemû malê wan ligel kole û milkiyeta wan desteser kirin. Û hewldanên qebîleyên Dor û Akayî yên bajarîbûn û dewlet navendîbûnê jî, di çarçoveya van geşedanan de şekil girtin.

Paşê monarşiyên girêdayî qebîleyên cuda yên ku li hemû bajaran serdest bûn, di sedsala 7'an de selehiyeta mêtingeriyê ya 'desthilatdariya takekesiyê' bi sînor kirin û derbasî pergala olîgarşîk a 10 kesî bû ku tevayî Atîna digirt nava xwe. Ji vê organîzasyona rêveberiyê re digotin 'Arkhon'. Bi vî awayî gelek erd, milk, kole û hwd. derfetên li Atînayê xistin bin kontrola xwe, hem parve dikirin û hem jî gel di rewşa xizmetkarî û koletiyê de dihiştin.

Li hemberî organekî ku hemû civak kiribû milkiyeta xwe, her ku diçû acizî û bertekên gundiyan, koçberan, koleyan, çîna navîn, arîstokratan, esnafên biçûk û welatiyan berfirehtir dibû.

B.Z. di sala 620'ê de, lîderê îsyankar ê bi navê Kylon, bi xwespartina vê, acizî û berteka gelê xwecihî yê Yûnanê, tevgera gel da destpêkirin. Ev serîhildan nerêxistinkirî bû, lê desthilatdarî

hejand û belkû di dîroka Atînayê de berxwedana yekem a berfireh û hewldanek bingehîn a ji bo destpêkirina demokrasiyê bû.

Bersiva vê organîzasyona bi navê desthilatdariya Arkhon li hemberî vê serhildanê, bêmerhamet û hov bû. Serhildanên ku pêş diketin, destpêkê bi awayek hovane dihatin serkutkirin. Paşê bi biryara desthilatdariya Arkhon, selahiyet ji endamê desthilatdariyê Drakon re hat dayîn û ji bo pêkanîna sazûmaniyek giştî hat wezîfedarkirin.

Li şûna rêgez û qayîdeyên ku heya wê demê nehatibûn nivîsandin û li gorî xwesteka serokê her qebîleyekê pêş ketibû, ber bi qanûnên nivîskî yên ku berjewendiyên çîna esilzade diparastin ve diçû. Hema hema bibêje tam qanûnên mîna qanûnên Hemmorabî hatin derxistin û cara yekem qanûnên nivîskî pêk anîn. Bi qanûnên pêvajoya Drakon re, serhildêr bi mirinê dihatin cezakirin. Paşê lîderê serhildêr ê bi navê Kylon jî tê girtin û bi kuştinê tê cezakirin.

Qanûnên Hemmorabî qanûnên ku li ser keviran hatîn nivîsîn bûn. Qanûnên Drakon jî, wekî qanûnên ne bi hibrê, bi xwînê hatîn nivîsîn derbasî dîrokê dibin. Qonax û serdem pir dişibiya pêvajoya Babîlê. Jixwe Drakon behreya xwe ji Hemmorabî wergirtibû .

Li nav Sûmeriyan Înanna-Enkî, li Babîlê Tîamat û Mardûk, li Asûrê Zerdeşt û li Yûnanîstanê jî pevçûn û nakokiyên Kylon û qralên xanedaniyan ên çîna esilzade, wekî ji hev cudabûna çînan û serdestiya desthilatdariyê ya bi qanûnan pêş dikeve. Qanûnên Drakon ên ku dişibiyan qanûnên Hemmorabî, sûcên herî biçûk jî bi kuştinê ceza kirin. Bi vî awayî, hemû serhildêr tên îdamkirin. Û

wiha hemû berjewendiyên çîna esilzade bi awayê nivîskî wekî ‘Qanûnên Drakon’ derbasî dîrokê dibin.

Ev biryara meclisa Arkhon û mudaxelekirina Drakon, dilnerihetî û bêhizûriyê kûrtir dike. Ji bilî hindikahiyeke pir biçûk, her kes di rewşa serîhildanê de bû. Beramberî vê rewşê, meclisa Arkhonê bi biryarek nû helbestvan û hiqûqnasê nêzî çîna navîn Solon wezîfedar dike ji bo ku vê reaksiyonê vemirîne û bêhizûriya heyî li holê nehêle.

Solon vê krîza pergalê kêm dike. Hemû biryarên wî girtibûn, naveroka wan girêdayî civakê bûn û sînorek ji esilzadeyan re da diyarkirin. Lê ew bi tevlîkirina beşên civakê di nav rêveberiyê de, guhertinan çênake. Berevajî vê, li ser esasê milkiyetê 4 çînan çêdike, bi dana pêş a çînan pergala nû bi teşe dike.

Di rastiya xwe de, divê mirov vê jî bide xuyakirin ku ev pêvajoya Solon, di qonaxên civakî yên piştî wê de, wekî modêleke nû li Ewrûpaya Rojava, di xeta dewletperestiyê de hatiye destgirtin û pêşxistin.

Piştre, esilzadeyekî arîstokrat ê bi her kesî re bi mesafe yê bi navê Pîsîtretes tê ser hukim û gelek rêyan ji aramî û hêminiyê re vedike. Lê ew jî bi komploya qebîleyên esilzade tê têkbirin. Û wiha ev pêvajo dem bi dem bi guhertina rêveberiyê dewam dike. Di vê demê de, geşedanên bi pêvajoyê re çêbûyîn yên meclisa 500'î ku di dîrokê de wekî pêvajoya Demos tê zanîn, pêşketinên wekî bi hilbijartinê tevlîbûna jûriyan di dadgehên gel de, wekî encam û dewama pêvajoyên pevçûn û têkoşînê pêş dikevin .

Pêvajoya şaristaniyê ya Yûnanîstanê, wekî mînak hate pêşandan ku xeta dewlet û demokrasiyê bandorek çawa li pêvajoyên piştî xwe kiriye. Jixwe mirov dikare bibêje, demokrasiya pêşketî jî demokrasiya feraseta çînayetiyê bû û ev pêvajo jî bi Solon hatibû despêkirin.

Herçend e ku yasayên Solon di qonaxên destpekê de zêde nehatibûn pêkanîn jî, lê di rastiya xwe de ev wek nuqteya dawî ya feraseta girêdayî desthilatdariya esilzadeyan û vekirina rê li ber çînên xwedî milk bû. Bi mînakan awa û çawaniya pêşketina vê modêlê di qonaxên piştî wê de, giring bû.

Di heqîqeta xwe de heke yasayên Solon nebûna, belkû dîrok bi awayek din hatiba nivîsîn. Ji ber ku armanca yasayên Solon ew bû ku îradeya şoreşa demokratîk a xwe dispêre gel bikşîne nav pergalê, ji bo vê jî rê û rêbaz pêş dixistin. Di vî aliyê xwe de, îhtimala pêvajoya pêşketina şoreşê lîberalîze kiriye.

Ji bilî vê jî yasayên Solon, rewabûna dewleta hegemonîk jî pêk anîne. Û wiha êdî hebûna dewletê nekiriye mijara nîqaşê. Wekî hebûneke bêguneh, ji derveyî dewletê li hemû xirabiyan hatiye mêzekirin (yanî mêzekirinek wisa çêkiriye ku dewlet pak û paqij e, xirabiyek hebe ne ya dewletê ye, divê hebûna xirabiyê di dewletê de neyê hizirîn). Di asta rêveberiyan de, li qencî û xirabiyê bê mêzekirin, dewlet ji derveyî vê hatiye dîtin.

Esilzade hatibûn sînordarkirin û pêşî li çînan hatibû vekirin. Heke mirov bi baldarî lê binêre, mirov ê bibîne ku hemû fîlozofan bi taybet Sokrates, Arîsto û Platon timî serê xwe bi rêveberên ‘baş’ û ‘xirab’ êşandine û dewlet spî û pak dane pêşandan.

Ne şaş e ku mirov bibêje B.Z. di sala 632’an de, serokê serîhildanê yê bi navê Kylon li hemberî esilzadeyan, çînên jêrdest rakirine serîhildanê û vê serhildanê wekî xala destpêkê ya demokrasiya civakî ya li Yûnana Antîk bigire dest û binirxîne.

Di çarçoveya mijara me de ev pirs pir giring e. Gelo heke Kylon bi ser ketiba, wê tiştek hatiba guhertin? Bêguman wê bûba pêşengê pêvajoyek dîrokî û wê şopek xurt bi dû xwe hiştiba. Dibe ku pêvajoyek hê xwesertir, nenavendî pêş ketiba. Ji ber ku piştî wê, Perîkles ji konfederasyona Medan pêşniyazên mîna vana kiribûn.

Lê bi îhtîmaleke mezin heke Kylon bi ser ketiba, dibe ku li ser bingeha pergala dewletê mêtingeriyek hê bi hêztir jî çêbûba. Ji ber ku heya pergala desthilatdarî û dewletê neyê çareserkirin, pevçûn û têkoşîna demokratîk a girêdayî gel her çi qas bi ser bikeve jî, domahîka wê, wê bûba dewlet. Belkû jî wekî ku Perîkles gotî, hişmendiyek a rêveberiyê ya mîna konfederasyona Medan a ku pêşengtiya wê gel dike, hatiba pêşxistin.

Jixwe heke pêvajoya ‘demos’ a têkoşîn, serîhildan û li hember rabûnê, encamek a van pêşketinan jî be, tê zanîn ku ‘demos’a xwe spartibû desthildatdariyê, tevahî gel nedigirt nava xwe û ji xeynî çînên xwedî milk gelek beşên din ên civakê ji derveyî vê mabûn. Ji ber van sedeman, demokrasiya Atînayê wekî demokrasiya çîna koledar pêş ketiye.

Wekî encam jî, bêguman demokrasî, bajar, dewlet, polîtîka, rêveberî, exlaq û îsyan civak bi xwe ne, bi dîroka Yûnana Antîk hatine destpêkirin. Tevî ku demokrasî nav û pêkhateya xwe ji wê derê digire jî, di warê naverok û fonksiyonê de, ne îcada Atînayê ye. Hemû ev karekterên dualî, diyarde û diyalektîk, bi

hezaran sal berê pêş ketine û di çaxa antîk de hatine berhevkirin, bûne pergaleke zihnî û rûbirûyî şkandinê bûne.

Li vê derê cudahiya bingehîn û diyareker a pergala serdest, heke mirov serîhildan û têkoşînên di pêvajoya Yûnana Antîk de pêş ketîn bihesibîne, dewleta ku hebûna wê di serî de bi têkçûna prestîja dewletê ya li Mezopotamyayê û herî dawî bi hilweşîna destpotîzma Asûr ketî metirsiyê, li vir careke din hate restorekirin û bi şkestina cara dûyem a civakîbûnê re dîsa derdikeve holê. Dema ku sazûmaniya dewletperest têkçûna ketî navê ferq kir, rêyên ji nû ve restorekirina xwe derxistine holê. Jixwe paşê di lingê wê yê Ewrûpayê de, bi restorekirina netewe-dewletê, şkestina sêyem pêk hat û ji vê jî herî zêde demokrasî bi bandor bû. Ji ber ku demokrasî ji refikên bi toz hatibûn derxistin û wekî maskeyekê ji bo rewakirina dewletê hatibû bikaranîn.

Piştî Atînayê, ev karekterê dualî bi pêvajoya Romayê dewam dike. Jixwe Roma xwe wekî çanda 'Greko Romen' dinasîne. Û wekî sentezek a vê çandê pêş dikeve. Hema hema Roma pêvajoyek tam mîna ya Atînayê dijiya.

Niştecihên resen ên Îtalî bi awayê qebîle û klan bûn, bêhtir bi çandinî û bi çanda bajarîbûnê jiyana xwe didomandin. Di dîrokê de ji vî gelî re dibêjin civaka Latînî. Paşê, bi koçberbûna qebîleyên Etrûks yên ku li Anatolyayê wekî Troyayî tên naskirin, di encama pevçûnên bi xelkên herêmê re, yekemîn dewletbajar Roma hat avakirin.

Pêvajoyeke mîna bicihbûn û dagirkirinê ya Doriyan a giravên Yûnanîstanê, li axên Deryaya Spî jî pêş dikeve. Gelê Latîn ê ku bi desthilatdariya Etrûskan li vê derê dijiyan, dikevin rewşek

wisa ku xizmetkariyê ji vê qebîleya serdest re bikin. Hemû milkiyeta zeviyan û gelê resen ê herêmê dibin ayîdî vê pergalê.

Di heqîqeta xwe de, dîroka Romayê bi têkoşîna di navbera çîna esilzade û civaka xwecihî de pêş ket. Hemû saziyên bajar yên girêdayî dewletê bi pergala fermandar, rêveber û rahîb pêş diketin. Ji bilî vê jî, bi pêşketina çîna dewlemend re, serdest di meclisa bi navê Patrisyan de li hev diciviyan. Û ev pergala ava bûyî, bi qraltiyê dihat birêvebirin.

Meclisa komînal û hevpar a bi navê Plep ku berê gelê herêmê pirsgirêkên xwe bi awayekî komî lê nîqaş dikirin û biryar digirtin, hem ji derveyî vê pergalê tê hiştin û hem jî hebûna wê dikeve metirsiyê.

Herçend e her ku diçû bajardewletên Romayê berfireh û mezintir dibûn jî, lê hemû karên hundirîn yên wekî leşkerî, çandinî, sewalkarî û karên din ên destan, gelê Plep ku gelê xwecihî yê herêmê bû, dikir. Gelê Plepî ne xwediyê ti mafekî bû, ne di warê civakî û ne jî di warê siyasî de ti mafek wî tine bû.

Her ku ferq û cudahiya çînan kûrtir dibû, têkoşîn jî berfirehtir dibû. Û Roma ber bi herêmên din ve diçû û axên di bin destên xwe de berfirehtir dikir, lê leşkerên ku şer dikirin jî Plepî bûn. Û her wiha tişta ku sûk û bazara Romayê vedijand û zindî dikir jî keda ku Plepiyan di çandinî û sewalkariyê de derxistî holê bû. Gelê Plepî ev dizanîn, di ferqa vê de bûn, lê nekarîn bêhizûrî û nerihetiya heyî bi rêxisitin bikin û wergerînin pêvajoyek a serîhildanê.

Plepiyan bertekên xwe bi pêkanîna îbadetên girseyî li hin mekanan li ser esasê çanda civaka xwezayî, girêdayî pîroziyê

pêşan didan û ji bajarên ayîdî Romayê ber bi bajarên din ve bi koçkirinê didan diyarkirin. Wekî nimûne, di dema şerekî de Plepî beşdarî şer nedibûn û bi komî diçûn li wan cihên ku pîroz didîtin ew şer protesto dikirin.

Di berdêla nekirina kar, tevlînebûna şer, derxistina bêhizûriyê, koçberkirinê û carcaran nîşandana dijberiyê de, desthilatdariya Romayê hinek daxwazên Plepiyan qebûl kiribûn. Lê yan soza dayîna van mafan pêk nehatibû yan jî qraltiya girêdayî esilzadeyan bi tepeserkirina van bertekan xwestibû serdestiya xwe hîn bihêztir bike.

Li hemberî vê alozî û bêhizûriya ku derketibû holê û bertekên ku dewam dikirin, hewla çareseriyên navberê yên gelek caran hatîn cerbandin bê encam mabûn. Di dawiya dawiyê de, komîsyonek hevpar ava kiribûn û ji bo lêgerîna li çareseriyê çûbûn Atînayê.

Qanûnên Solon ên ku modêla Atînayê bûn, li gorî şert û mercên Romayê hatin rikibandin û mafên civakî, aborî û siyasî ji Plepiyan re hatin dayîn. Bi vê pêvajoya nû re, Meclisa Romayê ya Plep veguherî rewşa organek ê pergalê. Li Romayê, di encama vê têkoşînê de, qraltiyê cihê xwe ji komarê re hişt.

Û li Romayê, li şûna 'demos'ê, metneke hiqûqî ya bi navê 12 Lewhe hat çêkirin. Bi vê re jî, yekem car bû li Romayê qanûn bi nivîskî hatin danîn.

Li Atînayê, demokrasî li ser esasê çîna xwedî milk û welatiyan bû. Tişta ku ji têgîna serweriya gel dihat famkirin, çîn û welatiyên Atînayê bûn. Bi damezrandina komarê re,

desthilatdariya Romayê alîgirê wê bû ku bi hiqûqê îradeya gel were sînordarkirin. Ev rewş wekî ku komarparêz ne serweriya gel biparêzin, serweriya hiqûqê biparêzin, dihat îfadekirin. Bi vî awayî li Romayê, li ser vî bingehî her tişt bi hiqûqê hat îfadekirin.

Û wiha li ser vî esasî, li Romayê bizavên komînal ên demokratîk û têkoşînên girêdayî rêbazên cuda pêş diketin, di nav komarê, hiqûqê û avahiya nû ya îdarî de man. Paşê, Împaratoriya Romaya Rojava, di encama têkoşînên hundir û derve yên koleyan, tevgerên baweriyan û komên civakî de hilweşiya.

Di dîroka Romayê de, hem di qonaxa komara yekem de, hem jî di pêvajoya piştî wê ya tevgerên olî, serhildanên koleyan û êrişên qebîleyên derve de, civakek demokratîk an jî pergalek ji bo bindestan pêk nehatiye.

Xeta dewletperest a ku li Sûmer, Babîl û Atînayê hatibû pêşxistin, li Romayê bi avaniyeke îdarî ya hiqûqî û feraseteke komarparêz, sentez pêk anî. Bi tevlîkirina nava pergalê ya hemû tevgerên demokratîk, hemû pêvajoyên peydakirina rêyeke din, her tim dihatin astengkirin û bi têkçûn û serneketinê bi dawî bûn.

Di maneya desthilatdariyê de, wekî xelekan zemînek siyasî, leşkerî û aborî yê zihniyeta desthilatdar heye. Bi heman şêwazî, hêceta têkoşînê ya civaka exlaqî û polîtîk, her sala ku diçe zêdetir dibe. Mîna ku di dîrokê de jî hatî dîtin, ceribandinên serhildan û berxwedanê yên serkeftî û têkçûyî timî hebûna xwe domandine.

Lê ji ber ku modêlek a wan civakên ku dihatin tepeserkirin tine bû, nedikarîn vê têkoşînê bi rêxistin bikin û veguherînin pergalekê. Lewra yan di nav pergalê de dihatin helandin û entegre dibûn an jî bi tengavkirinê vedikişiyan û nediman.

Sedema herî mezin a pêşketina van encaman jî, çaresernekirina pergala desthilatparêz û dewletê bû. Spartakûsê ku herî zêde navê wî bi hevkariya bindestan tê ziman, di têkoşîna xwe de bi ser ketiba jî, belkû bûba stemkarê herî mezin. Ji ber ku di xeyala Spartakûs de, xwekirina qral hebû.

Piştî hilweşandina Romayê, li parzemîna Ewrûpayê ev şans û firsend nehatibûn nirxandin. Roma wêran bûbû, derfet çêbûbûn. Tevî ku hilweşandina Împaratoriya Romayê xeyala tik û tinê ya her kesekî zilim lê bûyî bû jî, Roma hilweşiya bû, kevir li ser kevir nemabû, lê ev firsenda dîrokî nehatibû nirxandin. Berevajî vê, li her herêm, navçe û cihî, qebîleyan desthilatdariyên xwe ragihandibûn û her ku diçû nakokiyên xanedanên mezin ên ku dixwestin navendî bibin, bi dêrê re kûrtir dibûn. Ango di nava rêveberî û çînan de, jihevnefamkirin û nakokiyên mezin hebûn. Ji ber vê yekê, li parzemîna Ewrûpayê nakokî û pevçûn di navbera dêrê û qralên girêdayî xanedaniyên mezin, senyor û derebegan de kûr bûbû.

Pêvajoya Magna Karta, wekî encamek a van jihevnefamkirin û pevçûnan pêş ketibû. Di rastiya xwe de, Magna Karta metneke hiqûqî ya lihevkirinê ya sazûmaniya desthilatdariyê ya çareserkirina pevçûn û nakokiyan bû. Ango hevpeyamanek a di navbera dêrê, qraltiyê, derebeg û rêveberiya bajaran hatî erêkirin bû. Li gor vê hevpeymanê, selahiyetên qral tên sînordarkirin û parlamentoyek ji van beşên civakê, di bin serweriya dêrê de tê pêkanîn.

Ji bilî vê jî, ev hevpeymana ji qanûnên 12 Lewheyî ya Romayê wekî mîras hatî wergirtin, li gorî şert û mercên Ewrûpayê

hatibû rikibandin û hevpeymanek a di warê hiqûqî de sînordarkirina elîtên desthilatdariyê yên parçebûyî bû.

Dema ku ev pêvajo li Ingiltere bi awayekî dualî ber bi demokrasiya temsîlî ve diçû, li welatên din ên Ewrûpayê jî pêşketinên bi vî rengî rûdidan. Van qonaxan heya Şoreşa Fransayê dewam kir. Bi Şoreşa Fransayê re, ev pêvajo bi modêla netewe-dewletê temam bû, li tevahî cîhanê bi taybetî li Ewrûpayê hate ferzkirin.

Li Ewrûpayê gundî, mezheb, kedkar û gelên bajarî, li ser bingehê nasnameya xwe ya qewmî û bi zihniyeta neteweya demokratîk, bi dirûşmeyên wekhevî, azadî û edaletê û pêşxistina têkoşînê xwestin vê pêvajoya kaotîk û tevlîhev veguherînin û têxin di berjewendiyên xwe de. Lê belê damxeya dawî, zihniyeta desthilatperest lê xist û ev pêvajo ber bi berjewendiyên xwe ve kişand.

Divê ev pêvajoya Ewrûpayê, wekî pêvajoyeke ku bi Magna Kartayê pêş ketî, bi peymana Westfalyayê dewam kirî û herî dawî bi Şoreşa Fransayê bi encam bûyî, were destgirtin û nirxandin.

Piştî têkçûna Împaratoriya Romayê, şer û pevçûnên desthilatdariyê xwe bera nav Romayê û herêmê dan, ji ber ku vê pêvçûn û nakokiyê, mezheb, çîn û etnîsîte jî girtibûn nava xwe, li parzemîna Ewrûpayê bû sedemek ciddî a zêdebûna kaos û bêserûberiyê. Hema hema bibêje piraniya fîlozofên di vê pêvajoya Ronesans û Ronîbûnê de pêş ketîn û serî hildayîn, hewl dane ji vê rastiyê re çareseriyekê bibînin. Ji ber vê yekê, lêgerînên çareseriyê yên navend-Awrûpî, bi taybet jî sosyolojî û mantiqê pêkhatin, pêşketin û avabûna zanistên din ên wekî îdeolojî,

felsefe, hûner, estetîk, laîktî, aborî û zanistên siyasî, xwe dispêrin vê rastiyê.

Wekî encam, sedema bingehîn a îcada gelek zanistan li ser axa Ewrûpayê û bi taybet jî îcada pozîtîvîzmê, ji ber lêgerîna çawaniya çareserkirina pirsgirêkên civakên ku wekî çîn, mezheb û etnîsîteyan hatîn dabeşkirin bû.

Ji ber ku heke ev pirsgirêk neyên çareserkirin, wê di civaka rojava de hilweşandin û wêranbûnek mezin rûdaba. Ji ber wê yekê, ji lêkolîn û lêgerîna li ser çînên civakî re gotin sosyolojî-civaknasî. Û wiha li ser vî bingehî, li bersiva pirsên çîn çawa bi hev ve girêdayî ne, bi çîn û etnîsîteyê çawa pevgihandina neteweyê pêk tê û neteweya dewletê çawa tê afirandin, digeriyan.

Jixwe di dawiyê de, Hegel pêşxistina yekîtiya neteweyî û derbasbûna forma civakî ya bilind danî holê. Bi helandina hemû çîn, etnîsîte û cudahiyan di nav tek neteweyekê de, rê ji neteweya dewletê re vekir. Mirov dikare pêvajoya Ewrûpayê li ser vî esasî bigire dest.

Mirov dikare pêvajoya Marksîzmê ya ku bi navê bindestan pêşengî ji pêşketina demokrasiyê re dikir jî, di vê çarçoveyê de binirxîne. Marksîzma ku destpêkê dewlet înkar dikir û wekî amûreke dema navîn a bê bingeh û bêkêr dît, piştî ceribandina Komûna Parîsê, wî guhertinek di nêrîna xwe ya Dîktatoriya Proleteryayê û di fikra xwe ya ku navenda wê dewlet e de pêk anî.

Herçend e ku şoreşa Rûsyayê, Çînê, Vîetnamê, Kûbayê û şoreşên din ên Amerîkaya Latîn, bi navê gelan li ser bingehê pergala demokratîk têkoşîn dabin jî, di xala dawiyê de yên herî

zêde zirarên mezin dayîn demokrasiyê û di vî warî de rol lîstin, ew in.

Dema ku desthilatdaran demokrasî ji refikên bi toz daxistin û wekî maske û amûrek a rewakirina desthilatdariya xwe girtin dest, ji ber ku beşên bi navê gel têkoşîn dikirin, demokrasî nedixistin rojeva xwe û dema ku xistiban rojava xwe jî, bi dewlet û desthilatdariyê re digirtin dest, pêvajoyek a nefamkirina demokrasiyê û ji wateya wê ya heqîqî qutbûyî pêş diket. Û wiha demokrasî heta tu bibêjî şêlo kirin û xistin rewşek wisa ya ku êdî neyê naskirin.

Wekî ku tê dîtin jî, nêzîkatiyên ku têgîna demokrasiyê bi çîn, dewlet û desthilatdariyê re girtin dest, bûne sedem ku demokrasî bi desthilatdarî, çîn û dewletê re wekhev were destgirtin. Bêyî ku demokrasiyê fam bikin, ji naveroka wê qut kirine û hema bibêje vê rewşê jî xizmet ji holêrakirina cudahiyê re kiriye.

Baskên rast û çepê yên zanyarên pozîtîvîst ên Ewrûpayê, li ser pêvajoya demokrasiya li Atînayê lêkolîn pêk anîne. Çawa ku Magna Karta ji 12 Lewheyan, 12 Lewheyan ji pêvajoya Solon û Solon jî îlhama xwe ji feraseta hiqûqê ya li Mezopotamyayê girtibe, em di mînaka demokrasiyê de jî dibînin ku hemû rêveberiyên desthilatdar, modêlên xwe bi jêdewrgirtinên bi vî rengî pêş xistine.

Dubendiyên ku bi awayê demokrasiya li Atînayê ya xwe dispêre ‘demos’ê û rêveberiyên civakî yên li Spartayê yên li ser bingehê tîrantiyê (mêtingeriyê) pêş ketîn, berhemên wê qonaxê ne.

Demosa Atînayê pêvajoyek têkildarî çînan bû û piraniya civakê ji derveyî vê bû. Yê bindest û yê serdest jî -ku Marksîzm ji vê re mînak e- heta eger şoreşek an şoreşek dijber pêk anîbin jî, nikarin derkevin derveyî vê rastiyê. Ji ber vê yekê, cûrên demokrasiyê yên pêş ketîn, bi çînan ve girêdayî ne.

Di hemû serdeman de, serhildan û têkoşîna gelan çêbûye. Dem û derfet û firsendên dîrokî jî derketine holê. Û pergalên rêveberiyê yên girêdayî gel jî pêş ketine. Lê belê wekî xet, xeta Şaristaniya Demokratîk nekariye encama ku heq dike bi dest bixe. Sedema vê ya herî mezin jî, demokrasî di çarçoveya polîtîk û exlaqî de negirtine dest û nekarîne rastiya dewletê ji hev derxin û li gorî ku tê xwestin heqîqeta dewletê çareser nekirine.

Bi awayek giştî, derketina holê ya netewedewleta hişk û dogmatîk, pêwîst e bes tenê bi çarçoveya şert û mercên civakî yên kaosa Ewrûpayê ve neyê girêdan.

Di dîrokê de, cara yekem yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê, bi merkantîlîzmê û endustriyalîzmê derbasî qonaxeke nû bûye û piştî wê çîna sermayeyê ya yekdestdar bi neteweya dewletê re formeke nû bi dest xist û paşê veguherî modêleke li ser esasê zorê. Divê rola fîlozofên Ronesansê û Ronakbûnê jî di vir de neyê înkarkirin.

Bêguman tecrûbeyên Ewrûpayê giring in. Di van demên dawiyê de, hewl û lêgerînên wan ên ji bo berdewamiya serweriya wan û bi formên wekî Yekîtiya Ewrûpayê û hwd. dem bi dem xwe restorekirin û planên wan ên helandina gelan di nava vê pergalê de, bê rawestan berdewam bûye. Dîsan lêgerînên wan ên wekî Demokrasiya Beşdarbûnê, Demokrasiya Post Modern, Demokrasiya Temîlî û hwd. çêbûne. Lê lêgerînek di vê astê de bi

awayek sîstematîk ya bindestan çênebûye. Bi qismî têkoşînên parçe parçe çêbûbin jî, bi serkeftî nebûne.

Jixwe pêvajoyek nû ku wekî serdema Postmodernîzmê tê binavkirin pêş ketiye, ev pêvajo di salên 1970'yî de wek nerazîbûnek li dijî nedomandina van serdeman pêş ketiye. Armanceke din a vê nêzîkatiyê heye ku bi awayekî rexneyî li dijî navendên Reel Sosyalîzm û kapîtalîzmê derketiye holê. Divê ev nêzîkatî wisa bê nirxandin ku nefesdayînek e ji bo pergalê û li ser bingehê dirêjkirina modêla netew-dewletê ya li ser esasê sosyolojiya hişk e ku di encama têkiliyên pîşesaziyê yên di sedsala 19'an de bi vî awayî hatî pêşxistin.

Pêvajoya her sê stûnên xwepêgir ên modernîteya kapîtalîst, ango merkantîlîzm, Endûstriyalîzm û kapîtalîzma fînansê, bi neteweya dewletê û gelek diyardeyên din ên ku piştî sedsala 18’yan bi Şoreşa Endustriyê re derketîn holê re, bi nakok e. Ji ber vê yekê, pêwîst e têkiliya herikînên postmodernîzmê bi van pêşketinan re bê danîn.

Bîrmendên postmodern, ramanên ku bi serê mirov dikevin û bi serê mirov nakevin, pêş dixin. (ramanên ku mirov dipejirînin û napejirînin pêş dixin.) Rexneyên li ser pergala ramanê ya navend Ewrûpa rast in û di cih de ne.

Digel vê jî, neteweya dewletê ya hişk a sedsala 19’an derbasî serdema kapîtalîzma fînansê dibe û modêla neteweya dewletdar beramberî gera sermayeyê wekî asteng dîtiye. Di van serdeman de, pêvajoyek nû ya restorasyonê, bi derketina neo-lîberalîzmê re restorekirina dewletan bi awayek lez û bez derketiye pêş. Qonaxa şkestinê ya destpêkê ya dewletên desthilatdar, ji Asûrê hat destpêkirin, bi Greko-Romen dewam kir

û bi neteweya dewletê re dîmenek nû qezenc kir. Paşê, piştî salên 1970'yan, pêvajoyek nû ya restorasyonê da destpêkirin. Bi qasî ku ev pêvajo bi serkeftî be, gel wê dîsan ew qasî ji dest bidin û winda bikin.

Ji ber vê yekê, wê guncaw be ku mirov bi taybet zanistên civakî yên nû û kevin wekî xizmetkarên lêgerîna pergalê ya van pêvajoyan binirxîne. Gelek rexne û ramanên giring ên van fîlozofan hene. Lê cewherê wan ber bi dirêjkirina temenê pergalê ve ye.

Me bi van kurteşîroveyan hewl da bidin xuyakirin ku hemû analîzên dewlet û desthilatdariyê hedef nagirin û ji vê re alternatîfan pêş naxin, di dawiyê de vediguherin xizmeta pergalên hegemonîk û wekî bizavên ku nefesê didin, bidin pêş û derxînin holê. Ne pêwîst e ku yek bi yek fikir û ramanên fîlozof û zanyaran bînin ziman.

Aha ji ber vê yekê, serîhildan û derketina hola dîrokê ya Rêber APO, xwedî giringiyek dîrokî ye. Rêber APO, dîroka demokrasiyê bi pêvajoya civaka polîtîk û exlaqî wekhev digire dest û pênase dike. Çareseriya paradîgmayî ya Rêber APO, WEKÎ DEMARÊ SÊYEM Ê KOKA DEMOKRASIYÊ, li ser nûkirin û senteza herduyên destpêkê û di bingeha xwe de nirxên orjînal û resen ên civaka neolîtîkê wekî esasê bingehîn digire dest.

Ji ber vê yekê, têgîna ku hemû pêkhateyên civakî yên li derveyî dewletê-derveyî Şaristaniya Navendî bi rêxistin dike û di heman wextê de cudahiyên wan diparêze û di nav hev de dihewîne, demokrasî ye. Di wateyek giştî û berfireh de, ji %10 'ê civakê bi rêxistinkirî û di rewşa pergalbûnê de ye, ji %90'ê civakê jî belawela, bêrêxistin û bêpergal e. Rêya herî baş a ku van

yekeyên civakî yên belawelabûyî li ser esasê pirrengiyê li hev bicivîne, bi rêxistin bike û têxe di rewşek a bi pergalbûnê de, demokrasî ye.

Heke em wekî encam bi kinahî nêzîkatiya Rêber APO ya di vê derbarê de bînin ziman, Rêber APO paralelî paşmayîna civaka xwezayî, awayê dawî yê hegemonîk ê civaka dewletperest wekî "Civaka Dewletdar a Kapîtalîst" pênase dike. Tovê destpêkê yê vê, li Ewrûpaya Rojava bi Peymana Westfalyayê ya Aştiyê (1648) hatiye çandin, li Ewrûpayê xala wê ya lûtkeyê 1861'an li Îtalyayê û 1871'an bi dabînkirina yekîtiya neteweyî ya Almanyayê pêk hatiye. Rêber APO amaje bi pêvajoya netewedewletê dike û dide diyarkirin ku pêvajoya netewe dewletê li Ewrûpayê di sala 1914'yan û li hemû cîhanê jî di 1970'yan de, bi dawî bûye.

Wisa bi pergala netewe dewletê, bihevrebûn û xweseriya civakê hema hema bibêje hatiye tinekirin, dewletê bi fikrên wekî Ronîbûnê û Pozîtîvîzmê, di navbera demokrasî û civakê de girêdaneke ontolojîk daye avakirin. Hebûna civakê bi heyîna dewletê ve dane girêdan, hema hema bibêje fikra ku civak dikare bê dewlet jî bijî ji holê hatiye rakirin, bêdewletî wekî ji derveyî dîrokê hatiye hesibandin.

Li gorî tespîtên Rêber APO, civaka dewletdar a kapîtalîst, piştî di nîvê duyem ê sedsala 20'an de, şemitiye nav pêvajoyek a kaosê. Rewabûna netewe-dewletê êdî hem ji jor ve ji hêla alîgirên wê yên kûrewî, hem jî ji jêr ve ji aliyê dijberên kapîtalîzmê, tevgerên neteweyî û ji aliyê tevgerên nû yên civakî ve rastî lêpirsînê hatiye. Beramberî van zextên ji jêr û ji jor ve, qeyrana heyî jî hê kûrtir bûye.

Lewma bi vê pêvajoya krîzê, bi Şerê Yekem û Duyem ê Cîhanê, bi pêkanînên qirkirinê û hwd. rûyê rast ê dewletan hatiye xuyakirin. Bi gotinek din, dewletê bi zextan, bi şîdetê wekî çavkaniya çewisandin û bêçareseriyê, bi hemû rastiya xwe ve, ruyê xwe yê rast daye xuyakirin û bi vê pêvajoyê re "her ku diçe qutbûna gel ji saziyên dewletê kûrtir bûye".

Rêber APO ji vê xalê û pê de, vê pirsyarê dipirse: Gelo bersiva vê krîza hemû têkoşînên azadî û demokrasiyê ya ku di dîrokê de pêş ketî, bi taybetî jî têkoşîna demokrasiyê ya ku di van dused salên dawiyê de pêş ketî, ya bindestan, ya gelan, ya neteweyan, ya tevgeran û ya siyaseta çep beramberî vê krîzê çi ye?

Li şûna pergala netewedewletê ya ku rûbirûyî krîzê bûyî, gelên bindest bi çi siyasetê û bi çi alternatîfê bersivê didin? (beramberî krîza heyî bersiv û alternatîfa gelên bindest çi ye?) Rêber APO aha di bersiva vê pirsê de: Şaristaniya Demokratîk a girêdayî prensîbên azadiya Zayendî, Ekolojîk û Demokratîk pêşniyaz dike.

Lewra Şaristaniya Demokratîk bi xwe tê wateya pîvana mekanî ya têkoşîna xwerêveberiyek a li ser bingehê prensîbên demokratîk, civakek ekolojîk, wekheviya di navbera zayendan de û aboriyek hevpar.

Ji ber vê yekê, Rêber APO nêzîkatiyên heyî yên demokrasiyê derbas dike û bi xwespartina vê paradîgmayê, pênaseya demokrasiyê kûr dike. Ji ber vê sedemê, Rêber APO qîma xwe bi pênaseyên têkildarî demokrasiyê nayne û pênaseyên heyî wekî ‘pênaseyên teng’ digire dest. Û pênaseya berfireh bi awayek cuda şîrove dike.

Rêber APO di wateya berfireh de demokrasiyê wekî “Xwerêveberiya civakên ku dewlet û desthilatdarî nas nekirine," (27) pênase dike. Ji bilî Rêber APO ti kes vê pênaseyê nake. Ji ber ku ji bilî Rêber APO ti kes civakîbûneke bi vî awayî ji derveyî dewletê, ji derveyî şaristaniyê mayî qebûl nake.

Pirsgirêk ne demokrasiya temsîlî, beşdarbûn, piranîparêz an jî demokrasiya rasterast e. Li gorî me, cewherê nîqaşê, şeklê wê û kûrahiya wê heta tu bibêjî giring e. Rêber Apo di hemû parêznameyên xwe de, di çarçoveya bêdewletbûnê de û li ser bingehê hişmendiyek nû nîqaş kir. Di vê wateyê de, kîjan têgîna demokrasiyê tê bikaranîn, kîjan pênase hê bêhtir nêzî me ye û em ê kîjanê esas bigirin, naveroka mijaran naguhere.

Xala esasî ya herî bingehîn a di pênaseyên Rêber APO de, BÊDEWLETÎ-NEBÛNA DEWLETÊ YE. Demokrasiya bêdewlet nîqaş dike. Li vê derê, divê mirov pir zelal û radîkal be, heke ne wilo be, nabe.

Hemû awayên rêxistinbûnê, navê wan çi dibe bila ew be, çi navî li xwe dikin bila li xwe bikin, heta ku serdestiyê, desthilatdariyê û di dawiyê de dahûrandina dewletê ji holê ranekin an jî bi sînor nekin, wê nekaribin mirovahiyê û civakan ber bi pergal û jiyana demokratîk ve bibin.

Di danasîna demokrasiyê ya Rêber APO de, pîvan dewlet û desthilatdarî ye. Ji ber ku armanca demokrasiyê ji holêrakirina serdestî û desthilatdariya ku  cewherê dewletê ye.

Divê qet ti demokrasî serdestiyê çêneke. Divê wekî ku qaşo gel beşdar dike, neke. Hemû pêşniyazên ji aliyê serdestan ve hatîn destnîşankirin ên wekî demokrasiya parlamanteriyê,

demokrasiya civaka sivîl, pergala dabeşkirina desthilatdariyê yên li ser bingehên modêlên rêveberiyên ‘baş’ û ‘xirab’ ên ku di herikîna dîrokê de ji hêla fîlozof, zanyar û siyasetmedaran ve derketîn holê, teoriyên rewakirina dewletê ne.

Hema hema hemû fîlozofên ronakbîriyê, di serî de Spînoza û hemû fîlozofên din, di hemû danasînên xwe yên di derbarê pêvajoya dewlet û civakê pêşxistîn de, pirûpakî û rewabûna dewletê dane pêş.

Mirov dikare bi kurtî nêrînên giştî yên van fîlozofan wiha bîne ziman; civak ji hêla pergala monarşîk û destpotan ve bi awayek xirab tê birêvebirin, dewlet “di destê xiraban de ye”, ji ber vê yekê xirabiyê hildiberîne. Wê demê divê şeklek ê dewlet û rêveberiyê yê ku xirabiyê çêneke “di destên baş de” be.

Hemû vegotinên ji aliyê fîlozofên ronakbîriyê ve hatin pêşniyazkirin wiha ne: "Serweriya mûtleq û birêvebirina qenciyê, pir jiyanî û giring in ku nabe ji xwezaya mirovan û dilpakiyê re werin hiştin". Divê li ser esasê pergal û zagonên hevpar be, ku karibe bêedaletiya di encama hiş û hestên mirovan de çêdibe, ji holê rake. Ji ber vê sedemê jî, fikra ku dibêje tenê “dewleta mutleq” xwedî yekîtî û ewlekariyek bi hêz e, ew e bi tenê ya ku dikare civakê di nav qencî û dilpakiyê de bi rê ve bibe ye.

Wekî encam, fîlozofên Ronesans û Ronakbîriyê, ji derveyî serdestiya dewletê li xirabiyê digeriyan. Têgîna demokrasî û rêveberiyê jî, li gorî vê stratejiyê pêş xistin.

Ji ber ku me bi kurtî pêşketinên dîrokî girtin dest, lewra heke em nêzîkatiya Rêber APO ya di çarçoveya Paradîgmaya

Şaristaniya Demokratîk de jî danîn holê, wê mijar hê baştir were famkirin û sergihayî bibe.

Di dîroka şaristaniyê de, ti kesî têgîna demokrasiyê wekî “şeklê jiyanê û rêveberiyê yê civakên ji derveyî dewletê” bi kar neanî. Heta anarşîstan jî, redkirina dewletê dan diyarkirin, lê nekarîn pergalek alternatîf a demokrasiyê pêş bixin. Têgînên federasyon û konfederasyonê jî bi kar anîn, lê esasê wê danenîn, cewherê wê venekirin. Ji ber vê yekê, dema demokrasî tê nîqaşkirin û pêşxistina demokrasiyê tê guftûgukirin, pêwîst e mirov bêdewletbûnê nîqaş bike û di qadek ji derveyî dewletê de mirov bigire dest û demokarasiyê di qadek wiha ya ji derveyî dewletê de ava bike.

Heke hemû têgîn werin zelalkirin, heke hemû werin sererastkirin û heke em têgînan bikin ayîdî civakê, divê bêdewletbûn were nîqaşkirin û divê têgîn jî li ser bingehê civak çawa jiyan e, ji bo kîjan armancê hatine pêşxistin û ji ber kîjan hewcedariyan pêk hatine, divê bi vî şêwazî û li ser wî bingehî werin destgirtin...

Ji ber vê yekê, dema Rêber APO têgîna demokrasiyê şîrove dike, balê dikişîne ser du xalên giring. Û wiha dibêje: “Demokrasî di maneyeke berfireh de, dikare wekî xwerêveberiya civakên ku dewlet û desthilatdarî nas nekirine, were pênasekirin. Xwerêvebirina klan, qebîle, êl û eşîran dikeve vê kategoriyê. Di civakên ku diyardeyên desthilatdarî û dewletê bi awayekî zêde tên dîtin de, mumkin e ku xwerêveberiyên ji derveyî dewlet û desthilatdariyê dimînin, di wateyek teng de di çarçoveya demokrasiyê de werin nirxandin(28) ”.

Demokrasî xwe dipêre van her du bingehan. A yekem, demokrasî rastiya xwerêveberiya wan civakên ku dewlet û desthilatdariyê nas nakin e. Ji ber ku awayê hebûnê yê mirov jî demokrasî ye. Ango civak, encam demokrasiya komînal e.

Xala duyemîn jî, pênaseya demokrasiya bi dewlet û desthilatariyê re têkildar e. Demokrasî bi desthilatdarî û dewletê re nabe, her du diyarde wekî avanî û ferast berevajî hev in. Ji ber vê sedemê, vezelandina dewletê, nermkirina wê û rewakirina wê, nabe hedefa dawî ya demokrasiyê. Di civaka dewletdar de, dibe ku şansê pêkhatina 'dewlet + demokrasî' pêk were.

Ji ber vê yekê, divê em karibin bi liberçavgirtina diyalektîka civaka dewletdar a ku wê demek dirêj bajo, têgînên navberê pêş bixin. Di van şert û mercan de, demokrasiyek pak û paqij ne mumkin e. Wekî pêwîstiyek a formûlasyona dewlet + demokrasî, divê em bêyî redkirina pênaseyên demokrasiyê yên heyî, zanibin di çarçoveyek giştî de bigirin dest.

Çar prensîbên esasî yên feraseta demokrasiya derveyî dewletê hene. Ew jî ev in:

1- Demokrasiya Radîkal

Demokrasiya radîkal rêxistinbûnek ji derveyî dewletê ye. Wekî espriya kêm dewlet pir demokrasî, ev demokrasiya ku gel di xwerêvebirinê û bihêzbûnê de serdest e, demokrasiya bihêzbûn û xwerêveberiya gel pêk tîne, amûr, şêwaz û tedbîqkirina xwerêveberiyê pêş dixe ye. Bi gotinek din, demokrasiya ku siyaseta girêdayî dewletê vediguherîne siyaseta civakê ye.

Demokrasiya radîkal, paqijkirina demokrasiyê ji nêzîkatiyên çînî ye. Di demokrasiya radîkal de, nêzîkatiya çînî ya teng, mêtingerî, zext û zorî tine ye. Xwe dispêre hemû beşên civakî yên alîgirên ji nû ve avakirina civakê. Ji jêr ve rêxistinbûnê esas digire. Ji komînê heta meclisê, avakirina pergaleke ku di her qadê de civak bi xwe jiyana xwe ya civakî bi rêkûpêk bike, dike hedef. Ev jî şêwazê jiyana demokratîk ê hebûna civakê û ji nû ve zindîkirina van nirxan e.

2- Demokrasiya Kûr

Ev wekî şêwazê jiyanê, ecibandina demokrasiyê ye, di her qadê de pêkanîna jiyana demokratîk e .

Bi awayekî giştî xwe ji zihniyeta dewlet û desthilatdariyê paqijkirin e. Ji şaristaniya navendî, qûtbûneke ji kokê ve ya şoreşgerî pêk tîne û li gorî Şaristaniya Demokratîk jiyankirin e.

Faktora herî giring a demokrasiyê kûr dike, pêşxistin, berbelavkirin û hewandina azadiya jinê ye.

Destgirtina ruh û hestên ciwanan wek yek ji hest û hişmendiyên bingehîn ên demokrasiyê. Bi ruh û hestên xwe yên nehatîn lewitandin, tebeqeya civakî ya herî meyldarê demokrasiyê ciwan in. Jiyana ku bi berjewendiyan nehatî pelixandin û têk neçûyî, jiyana herî guncaw a li gorî ruhê ciwanan e.

Rêzgirtin û qebûlkirina çandên cuda û fêrbûna jiyanê ya bi van çandan re ye. Faktorek din ê ku demokrasiyê herî zêde kûr dike jî; hişmendiya ekolojîk e. Jiyana komînal demokratîk a ku şêwazê hebûna mirovahiyê ye, beriya her tiştî avabûna têkiliyek yekparebûyî ya bi xwezayê re ye.

Heta ku hişê ekolojîk pêş nekeve, çand û hişmendiya demokratîk kûr nabe. Vegera li cewherê xwe û hevdîtina bi nirxên demokrasiya komînal re ye. Bêyî hezkirina xwezayê û bêyî hezkirina mirov ê ku xwezaya dihizire ye, demokrasî ava nabe.

3- Demokrasiya Rasterast

Demokrasiya rasterast, ji rêveberiya ku tê de dadwerî, rêveberî û amûrên din tineyî û gel rasterast beşdarî gotûbêj û biryargirtinê dibe re tê gotin.

Demokrasiya rasterast, awayek ê jiyana demokratîk e ku di hemû qadên çandî, aborî û civakî yên jiyanê de bi giştî gel bi bandor e yan jî van qadên jiyanê bi tevahî li ser esasê îradeya xwe ji nû ve bi rêxistin dike ye. Di vî şêwazê jiyanê de, têkiliya yê bi rê ve dibe û yê tê birêvebirin tine ye. Mirov bi xwe jiyana xwe bi rêxistin dikin. Temsîlkirin û dewrkirina îradeyê tine ye. Di demokrasiya temsîlî de gel tine ye.

4- Demokrasiya Komînal

Demokrasiya komînal, demokrasiya xwe dispêre komînan e. Tişta komînal demokratîk e ya demokratîk jî komînal e. Ne ferdên wê, grûb û komên wê esas in. Yê/a ferdperest, xweperest be, nabe komînal. Di vê rewşê de nikare demokratîk jî bibe. Demokrasiya komînal di civaka xwezayî de pêk hatiye. Bi awayek rasterast beşdarbûna her kesî ya nava jiyana polîtîk giring e.

Piştî dana xuyakirina nêzîkatiya Paradîgmaya Şaristaniya Demokratîk a Rêber APO, em dikarin wekî mijara dawî hin pênaseyên li ser demokrasiyê bandor kirîn, bînin ziman.

A- Demokrasiya Temsîlî: Serweriya ayîdî gel bi xwe ya ku bi navbeynkariya nûner-temsîlkaran pêk tê ye. Di vî cûrê demokrasiyê de, herçend e ku pêwendiya dengdêr û nûneran ji hilbijartinê heta hilbijartinê jî be, bi rê û rêbazên wekî daxwaznameyan hewl tê dayîn beşdariya welatiyan di tercîhên siyasî de zêde bibe.

B- Demokrasiya Nîvrasterast: Feraseta demokrasiya ku tê de şêwazê rasterast û temsîlî heyî ye. Pergal bi rêya hilbijartinê û demokrasiya temsîlî, ango bi nûner-temsîlkaran pêş dikeve. Di mijarên ku nûner-temsîlkar têrê nekin û giştî eleqedar dikin de, bi rêbazên demokrasiya rasterast ên wekî referandûmê û hwd. serî li hilbijartina gel didin.

C- Demokrasiya Klasîk: Tê wateya demokrasiya piraniyê ya li dijî hindikahiyê hatî pêşxistin. Kîjan partî zêdetir dengan bistîne ew dibe rêveberî.

D- Demokrasiya Mûtleq: Di vî şêweyê demokrasiyê de, pêvajoya nîqaş û biryarê ne di destê gel de ye, girêdayî feraseta ku selahiyeta her tiştî di destekî yan jî di navendekê de kombûyî ye.

E- Demokrasiya Lîberal: Têgihiştineke ku ne civakê, ferd esas digire, li dijî hemû mafên xwezaya civakî hatiye pêşxistin, ferdîtiyê di serê her tiştî de dibîne, dîrokê, maddeyê û civakê bi ferd pênase dike.

F- Demokrasiya Marksîzmê: Ev cûrê demokrasiyê xwe dispêre desthilatdariya karkeran. Di vî aliyê xwe de, feraseteke ku civakê li ser bingehê çîna karker homojen dike. Ev

awayê demokrasiyê piranîparêziyê û goftûgoyê esas nagire. Di vî cûrê demokrasiyê de muxalefet tine ye.

G- Demokrasiya Ast Nizm: Têgînek Awrûpî ye. Welatên Sêyemîn ên Cîhanê ango welatên hejar dihewîne nava xwe. Ev feraseteke ku siyaseta welatên Awrûpî li ser wan welatan serdest dike û ew welat jî xwe dispêrên vê ferasetê.

H- Demokrasiya Lihevkirinê: Lihevkirinê esas digire û alîgirê yasayê ye. Karker, patron hwd. lihevkirinê esas digire.

İ-Demokrasiya Muzakereyê: Li welatên wekî Belçîka û li cihên ku hikûmet tam lê nehatî avakirin, ev pêvajoyên hikûmetê yên ku bi tevahî dewlet û sazî tê de tên ba hev, lêkolîn û nîqaş dikin û li ser konsensûsekî hevpar ava dibin re têkildar e. Ev rêbaz li cihên ku demokrasiya lîberal têrê nake û di nav tengezariya rewatiyê de mayî, tê bikaranîn.

J-Demokrasiya Sîber: Ev bi teknîkê re pêş dikeve. Di pêvajoya Bihara Ereban de teknolojî û medyaya dijîtal pêşeng bû. Ev pêvajoya tevlîkirin û rêvebirina tevahî gel a bi rêya înternetê û medyaya dijîtal e.

## 10- Aborî-Ekonomî

Wateya peyva ekonomiyê ya Yûnanî; peyva "oikos" ya bi Yûnanî tê wateya rêveberiya malê, ji peyva "nomos" ya tê wateya zagonê hatiye hilberandin. Ango tê wateya "zagona malbatê", "zagona malê", "qayîdeyên xwedîderketina li debara malê". Wekî peyv jî peyvek a serdema civaka qedîm a Grek-

Helenî ye. Mirov dikare bibêje eko-nomos, zagona malê, karên ku jinê kirine, karên malê, tê wateya karên ayidî jinê .

Her çi qas ekonomî di warê etîmolojîk de têgînek Yûnanî jî be, qada wê ya sereke civaka xwezayî ye. Ew di nav civaka xwezayî de fealiyeta civakî ya esasî vedibêje.

Rêber APO aboriyê wekî maddeya pêkanîna peresînê terîf dike. Xwarin, zêdebûn û parastin, sê dewrên jiyanê yên esasî yên giyandar û civakan in.

Aborî, her tiştê ku civak di warê maddî de, ji bo domandina jiyana xwe û nifşê xwe û peydakirina hewcedariyên xwe yên bingehîn ên jiyanî û xwexwedîkirinê dikin, ên wekî; xwarin, vexwarin, stargeh û parastin e. Aborî sedema bingehîn a hebûn û xwedana jiyankirinê ya giyandaran e. Ji ber ku pêwîstiya jiyanê û zindîmanê bi xwarinê heye.

Divê giyandar objeyên cihêreng ên di xwezayê de heyîn peyda bike û bi rêya metabolîzmaya xwe, di xwe de veguherîne jiyanê. Ev pîvanka bingehîn a zindîbûnê ye. Vê ji çalakiya giyandarê destpêkê heta mirovê ku bi awayê civakî bi rêxistin dibe, dewam kiriye.

Mirov dikare di wateyek giştî de aboriyê wekî çalakiya mecbûrî ya peydakirina hewcedariyên maddî yên civakê binasîne. Her wiha vegotin û îzaha vê di warê sazî û pîvandariyê de jî, bi wateyek hê tengtir, mirov dikare wekî pevguhestina hewcedariyên maddî yên li derdora bazarê-sûkê pênase bike.

Heke pênaseya aboriyê di kapîtalîzmê yan jî di şaristaniya dewletdar de qezenca herî zêde, berjewendîperestî û berhevkirina sermayeyê be, di civakan de çerxa hewcedarî û domandina jiyana xwe ye.

Çalakiya aboriyê ya ku di civaka xwezayî de wekî hewcedariya komê tê hesibandin û bi berçavgirtina parastina hesasiyetên xweza û giyandaran pêk tê, di şaristaniya dewletdar û kapîtalîzmê de, di asta ku xwezayê û giyandaran tine bihesibînin û bikin malê xwe de, pêk tê.

Rêber APO, aboriyê wekî çalakiya demokratîk a civakê pênase dike. Lewra mirov dikare bibêjê, aborî çalakiya yekemîn a demokratîk a civakê ye. Dema civak pêwîstiyên xwe yên xurekê-xwexwedîkirinê ji xwezayê peyda dikin, li gorî vê karbeşiyê çêdikin û berhemên ku bi dest dixin, di çarçoveya plansaziyek diyarkirî de, li hev parve dikin, divê mirov hemû vê pêvajoya birêxistinkirin û organîzekirinê wekî çalakiya demokratîk bi nav bike.

Di van pêvajoyan hemûyan de jin pêşeng e. Ya ku van pêvajoyan bi rêxistin dike, hewcehiyên malbatê û komê dide xuyakirin, plansaziyê pêk tîne û di astekî wekhev de parve dike, jin e. Lewra qada civakîbûnê ya destpêkê û ya herî giring qada aboriyê ye, ayîdî civakê ye û xwerêveberiya wê jî jin e !

A duyem jî, qada aboriyê xwedî karektereke demokratîk e. Ekolojî û cûrên giyandaran wekî subje û parçeyek ji jiyanê tên destgirtin. Dema ku qada aboriyê tê destgirtin, hinek hesasiyetên giring ên ku divê wekî esas bên girtin hene. Ji vana ya destpêkê demokratîkbûn û ekolojîbûn e, ya dudiyê jî divê tenê

hewcedariyên xwe yên esasî bistîne, dema vê dike jî divê bi plan û baldar be.

Civaka xwezayî, qada bingehîn a çalakiyên aboriya komînal e û bi vê ve giredayî xwedî fonksiyonek xwezayî ye .

Bi derbasbûna civakan a ber bi jiyana cihwarbûnê ve, faktorên wekî berhemdariya zêde ya axê, çêbûna hewzeya pir av û bi xêr û bêr û bi bereket a Dîcle û Firatê, kedîkirina sewalan û xwexwedîkirina ji çavkaniya sewalvaniyê, hûner, teknîk û berhemadariya çar demsalan, dikarin wekî qadên maddî û manewî yên civakan werin hesibandin. Di qadek wisa pir berhemdar û bi xêr û bêr de, sazûmaniya aboriyê komînal û demokratîk e. Herçend e ku ev qas cûrbicûrî û bereketa wiha bibe sedema hewcedariyên cuda jî, cewhera wê; demokratîk, azadîxwazî, çandî û ekolojîk e. Jixwe heke demokratîk û komînal nebûya, cudahî û yekîtî jî pêk nedihat.

Di Incîl û Tewratê de, ji vê qada bi bereket a di navbera Dîcle û Firatê û jiyana li ser vê qadê re, têgîna ‘buhişt’ hatiye bikaranîn. Dema Hz Omer Kurdistanê dagir dike, di nameyên ku ji Hz Elî û ji yên din re nivîsî de, behsa cihê lê dimîne dike û dibêje ‘Ez li wî cihê Hz Muhemed jê re digot buhişt im’. Nexwe têgîna Buhiştê ji tinebûnê çênebûye, hebû lê çîroka wê bi awayek din cuda nivîsîbûn.

Zanista dîrokê jî êdî ev rastî di lêkolînên xwe yên dawiyê de qebûl kiriye. Lewma Mezopotamyaya Jor wekî dergûşa mirovahiyê û cihê ku hemû geşedanên maddî û manewî lê çêbûyîn, lê pêş ketîn û lê ava bûyîn tê destgirtin.

Ji ber vê yekê, civaka komînal ku çerxa jiyana civakî ye, şaneya kok a civakê ye û pirsgirêkên bi girêk ên wiha tê de tine ne. Berevajî vê, civakan bi rengekî wekhev û azad hebûna xwe bi awayekî domdar pêş xistine. Civakan xwe çawa bi rê ve birine, aborî û awayên karkirinê yên qadên din ên xwezayî, divê bi vê kokê ve girêdayî werin lêkolînkirin û divê bibe modêl û bingeh ji jiyana civakî re .

Di civaka xwezayî de hişmediya bazara civakî jî pêş ketibû. Bazar, wekî cihên hevpar ên pîroz, cejinpîroziyê, li ser bingehê çanda pevguhertinê û diyariyan û danûstandina hewcedariyên cûrbicûr pêş ketibû. Dîsan divê feraseta bazarên civakî wekî mekan û cihên civakî yên ku zanîn, çand, êş, kêfxweşî lê tên parvekirin jî werin destgirtin.

Gelek gund û bajarên ku nifûsa wan zêde nebûyî û bi taybetî jî Girê Mirazan (Xirabê Reş-Gobelî tepe) yek ji herêmên ku pêwîst e di vê mijarê de were lêkolînkirin e. Mumkin e ku mirov Girê Mirazan wekî cihê ku bawerî û beşên cûrbicûr ên civakî yên kar ên li derdora perestgehê pêş ketîn bigire dest. Mirov dikare pêşbînî bike ku karbeşiya di civaka xwezayî de pêk hatî û li derdora perestgehê pêş ketî, bi parvekirina encamên hilberîna mîmartî, hûnerê û li ser bingehê yekkirina bi kalîteyê re, ber bi jiyanek berhemdar ve veciniqînek çêkiriye. Jixwe Girê Mirazan, wekî derbirîna nasnameya vegûherînê ji klanê ber bi qebîleyê ve pêş ketiye.

Girê Mirazan ji aliyê gelek zanyaran ve hatiye lêkolînkirin û wekî navenda baweriyê, cihê perestgehê, ekonomiyê, çandê û wekî qada demokratîk a bazara (sûk) civakî hatiye pênasekirin. Dîsan her di vê derbarê de gelek qad, bi taybet jî Girê Mirazan di

bin sernavê aboriya civakî ya demokratîk de hatine lêkolînkirin ku hê jî lêkolînên li ser wan berdewam dikin.

Ji vana ya yekem, sewalkarî, ya duyem çandinî, ya sêyem pîşekarî û ya çarem jî hilberînerên li gorî hewcedariyê-ne berjewendîperest û li gorî pêwîstiyê li ser bingehê çanda pevguhertinê ye-ku mirov dikare bibêje bazirgan jî. Cewhera van fealiyetên civakî yên ku hatibûn pêşxistin, xwe dispart civakê û grûban. Wek tê zanîn, di civaka xwezayî de çanda diyarî û pevguhertinê hebû. Nirxê bikaranînê li ser bingeha çanda diyariyê û pevguherînê bû. Wekî nimûne, maddeyekî ku li herêmekê tineyî, bi maddeyekî ku li herêmeke din heyî re dihat pevguhertin û pevguhertin jî li gorî hewcedariyê çêdibû. Her wiha ji bilî vê jî, tê gotin ku pêvajoya seridîn û amadekirina genim ê ji bo çandiniyê jî, li Girê Mirazan hatiye destpêkirin. Gava şoreşa çandiniyê û gelek îcadên din B.Z. ber bi salên 6000'an ve pêş dikevin, ev ne hema wilo jiberxwede ji tinebûnê pêk hatin. Di wê serdemê de, bêyî ku ferq bikî, îcada herî biçûk bi sedê salan dem dajot. Aha nexwe beriya niha jî hebû, lê serdema ku tê de bi şekl û xuya bûyî, qonaxên dirêj ên piştî wê ne. Her bi mijarê ve girêdayî, divê were zanîn ku modêla bajar a li derdora zîgûratên li welatê Sûmeran pêş ketî jî, ji tinebûnê çênebûye.

Lewra pîvan û prensîba ku aborî bibe aboriyek civakî, bibe aboriyek sosyalîst û demokratîk, divê çavkaniya xwe ji bingehê civaka xwezayî bigire. Ji bo ku mirov zanibe ka aboriyek civakî yan ne civakî ye, hinek pîvankên diyar hene. Ji ber vê yekê, pêşketina aboriya civakî, komî û ferdî ya bi hinek însiyatîfan, xwedî hinek krîterên diyar e.

Ji bo vê jî:

1. Demokrasî.

2. Grûb û Kom.

3. Meclis.

4. Ekolojî.

5. Azadî û Pêşengiya Jinê.

6. Bazirganiya li ser bingehê berjewendîperestî û qezenca zêde red dike, xwe dispêre pevguhertin, diyarî û nirxê bikaranînê yê li gorî hewcedariyê .

7. Bazara civakê ye. Krîter û pîvanên cewherî yên aboriya civakî ne.

8. Ji bilî vê jî, meclisa ku lingê jiyanî yê aboriya civakî bi rêxistin dike, koperatîf jî lingê wê yê pratîkî ne û akademiyên pêşengtiya vê dikin jî, perspektîfa wê, fikrê wê, çareseriya wê, siyaseta wê û bingehê aboriya wê ya komînal pêk tînin.

Heke civakek demokratîk were avakirin û pêş bikeve, divê van binyatan ji xwe re esas bigire. Ji bo civakek hewcedariyên xwe diyar bike, ji bo şêwazê xwe yê jiyanê bi rê ve bibe, rêya pêkanîna çalakî û tevgerên wê yên ji bo civakê, di van pêvajoyan hemûyan de, bi beşdarbûna civakê di hemû guftûgo û biryargirtinên van pêvajoyan de, girêdayî xwedîbûna wê ya di makanîzmayên diyar de ye.

Lewma, heke bixwaze di siyasetê de, di leşkeriyê de û di dîplomasiyê de bibe xwedî îrade, pêwîst e di derheqê aboriya civakî de bibe xwedî gotin û hêza biryargirtinê. Ji bo vê jî, xwe birêxistinkirin û bi rêxistinbûn şert e.

Heke ev pêk were, li qadên din jî wê hê baştir tevgerîn çêbibe û çerxa mêtingeriyê jî wê hê zûtir bişkê. Modêla aboriya civakî û xebitîna wê, dikare li ser vî bingehî pêş bikeve. Bingehê vê xebitînê ew 8 maddeyên ku me li jor dayîn diyarkirin in.

Di nirxandinên li vê derê de, hate diyarkirin ku aborî çalakiyek civakî ye, ji bo ku mirov û civak hebûna xwe bidomînin, timî pêwîstî bi çalakî û xebateke aborî hatiye dîtin.

Ji ber vê yekê, hat xuyakirin ku aborî aktîvîteyek a bi civakan hatî îfadekirin e. Dema ku mirov li ser modêlên vê yên destpêkê klan, qebîle, êl û eşîran dihizire, pê dihese ku mirovan di asteke civakî de xwe bi rêxistin kirine û her birêxistinbûnekê jî rasterast têkiliya xwe bi aboriyê ve heye, heta mirov dikare bibêje wekî yekeyeke ekonomîk di nav liv û tegerê de ne.

Mumkin e ku mirov birêxistinbûna klanan bi vî şêwazî binirxîne. Ji bo ku klan jiyana xwe bidomîne, mecbûre hilberînê pêk bîne. Ji ber wê yekê, birêxistinbûna civakî û ekonomîkî bi klanê dest pê kiriye. Ji ber ku civakîbûna klanê di asta pêkanîna hilberîna wê de ye, lewma hilberîn û civakîbûn di nav hev de û bi awayekî ku qet ji hev nayên qutkirin pêş dikevin. Ev xalek giring e.

Wekî Marks gotî, aborî bi awayê avaniya jor û avaniya jêr nayê destgirtin. Heke wisa were destgirtin, wê aborî ji hilberîna civakî qut bibe û wê rê ji parçebûnê re veke. Halbûkî aborî, hilberîn û civakîbûn, pevrebûnek hevgirtî ne. Aborî di esasê xwe de hemû fealiyetên di jiyana civakî de hewcehiya mirov pê heyî û timî jiyana civakî ber bi pêş ve dibin, digire nava xwe.

Di vir de xala bingehîn a ku neyê qebûlkirin çi ye? Pêşketinên aborî yên derdikevin holê di astekî zêde de veguherandina milkiyetê, ango sermaye veguherandina milkiyetê û sermaye veguherandina yekdestdariyê ye .

Di vî warî de, pêwîst e mirov li dijî şêwazê ku aborî bibe sermaye û milkiyeta zêde ya yekdestdariya desthilatdariyê bisekine û çi dibe bila be qebûl neke. Nexwe wekî din, em ne li dijî bazarê, hilberîna zêde, qezenca bi bazirganiyê û însiyatîfên ferdî ne. Em ne li dijî xebateke aborî ya ku timî civakê û pêkhateyên civakê pêş dixe ne. Li gorî ku em ne li dijî vê ne, dibe ku danûstandineke aboriyê ya rasterast girêdana wê bi hilberînê re hebe, bi rêya pevguherînê, girêdana bi bazarê re, tevna têkiliyên bazirganiyê û parastina qezencê di çarçoveya sînor û pîvanên hatîn diyarkirin de, çêbibe.

Lê heke ev rewş bibe sedema berhevkirina sermayeyek zêde, divê were redkirin. Di vî warî de mekanîzmayên civakî yên çandî û biryarê pir pir giring in. Heke em li ser van bingehan lê binêrin, xala me ya ji hev cudabûnê jî xuya dibe.

Berhemdariya zêde ya sermayeyê ya bi şaristaniya bi çîn û paşê di nava civakê de derketî holê, di encama tevna bazirganiyê, zor û zextê, li ser bingehê hiyerarşiya klan, qebîle û eşîrê heta tu bibêjî zêde bûye. Û wiha her ku çû, karekterê yekdest ê sermayeyê bi desthilatdariya yekdestdar û karekterê wê dewletê, di aboriyê de têkçûn derxist holê. Em nikarin çalakiyek bi vî awayî wekî çalakiyeke aboriyê bidin xuyakirin. Ji vê û pê de, jixwe ne aborî ye. Yên bi vî awayî çawa dibin bila bibin, encex mirov dikare jê re bibêje yekdestdariya çeteyan a ku li ser aboriyê hatî birêxistinkirin e.

Ji ber vê yekê, em nikarin wekî qadeke aboriyê li desthilatdariyê û yekdestdariya dewletê mêze bikin. Jixwe xeletiya herî mezin a Marks li vir derdikeve holê. Girêdana xwe bi hilberînê re, bi têkiliyên rasterast ên civakî pêk nayîne û aboriyê wekî esasê xwedanajiyankirina rêxistinî ya civakî nagire dest. Nedîtina van xalên giring û nirxandina aboriyê, bêhtirî xwe bi hêza desthilatdariyê ya li ser pêkhateyên civakan û şaristaniya çînî derketî holê, wekî şaşiyekê pêş ketiye.

Ji ber ku ti têkiliya yekdestdariya ku bi hiyerarşiya çînî xwe li ser aboriyê organîze kirî, bi aboriyê re nîne. Berevajî vê, pergala ku yekdestdariya sermayeya aboriyê timî di destê xwe de digire, timî li ser wê yekdestdariyê ava dike û nirxê zêde yê li wê derê mehû dike, ne aborî ye.

Ango aborî tê wateya xebata ku rasterast bi hilberînê ve girêdayî. Her wiha, têkiliya xwe bi bazar-sûka ku girêdana xwe bi çalakiyên hilberîna civakî ve heyî red nake, dîsan hilberîna zêde, pevguhertinê, bazirganiyê, pêşketina qeznecê ya bi bazirganiyê ve girêdayî, bi tevayî red nake. Evana, heta ku di asta karektera barhilgiriya xizmeta pêşketina civakê de bin, wê karibin di aboriyê de erkeke rewa û civakî pêk bînin.

Kengî li hember derketin çêdibe? Dema ku hilberîna kelûpelên di civakê de veguherî qezenca herî zêde, dema ku qezenca zêde veguherî sermayeyê û kêliya ku sermaye jî veguherî yekdestdariyê, divê li hember derketin çêdibe. Xala ji hev cudahiyê ev der e. Em li dijî berhevkariya sermayeya ku yekdestdariyê pêk tîne ne. Heke bi awayekî ûtopîk em bibêjin, mirov çi biçîne wê diçine û çi biçine wê dixwe, ev nabe rewşeke civakî. Ji ber ku timî û di her qadê de pêwîstiya civakê bi

xwepêşxistinê heye. Kes nikare civakekê di nav heman standartan de bifikire. (Civakek xwe neguhere û pêş nekeve nabe.) Wê demê heke civak nekare di nav heman standartan bimîne, mezinbûna berdewam a civakê wê çawa be, bi çi pêkan e?

Divê timî mezinbûn, mezinbûna hilberînê çêbibe, mezinbûn û geşedanên di hilberînê de çêdibin jî, divê dubare wekî hêza barhilgiriyê di warê maddî û manewî de li civakê werin vegerandin û li ser vî bingehî were destgirtin. Li vir a giring, diyardeya aboriyê bi hilberînê destpê dike û dewlemendiyê jî di warê maddî û manewî de li civakê vedigerîne û civakê mezin û bi hêz dike.

Hêza maddî tê çi wateyê? Tê wateya pêşxisitin û bilindkirina standartên jiyana civakê. Li vir tişta ku xuya dibe, di civakê de afirandina manewiyetê ya çandê ye. Mirov çawa dikare manewiyatê, çalakiyê, şêwazê jiyanê û şêwazê têkiliyan biafirîne? Eşkerekirina dewlemendiyan, danaxuyakirina dewlemendiya cuda cuda, ango derxistina holê ya dînamîzm û vejandina di civakê de, esasê manewiyata civakê ye.

Divê ev şêwazê xebatên aboriyê yên civakparêz werin pêşxistin û bibin modêl. Ji ber ku heqîqeta civakan jî vê dixwaze. Heke cudatî û pirrengî li derdora mekanîzmayeke hevpar a demokratîk werin yekkirin, hişmendî û çanda xwerêveberiyê derkeve holê, wê hevgirtina civakî û xebata hilberîna vê jî derkeve holê.

Wekî prensîbê bingehîn, nêzîkatiya me ya ji bo aboriyê û pêşniyazên pratîkî li ser vî esasî ne. Modêla aboriyê li ser esasê xwespratina civakek wekhev, azadîxwaz û hevgirtî ye, çareserî jî ji wê derê dest pê dike û rêxistinbûnê wekî qada herî esasî ya xebata civakê dibîne. Û li ser vî esasî zemînekê ji civakan re peyda dike ku karibin şêwazê jiyana xwe biguherînin.

Mîna ku hatî gotin, qada aboriyê qada xebatek civakî ye. Tevî ku heqîqet ev qasî fêmbar û vekiriye jî, çima heta niha zanyarek sosyalîst daneketiye nava vê rastiyê û destê xwe nedaye vê heqîqetê. Ev jî yek ji mijara herî  bingehîn a ku divê were nîqaşkirin e.

Di hemû nîqaşên zanistên civakî yên pêk hatîn de, di her şaxekî de bi dehan xebatên tez û nîqaşan çêbûne. Di van tez û nîqaşan de, di derbarê aboriyê de timî pênaseyên nû derketin pêş û di bin navê alternatîfan de, her ku çû yan qada aboriyê hat tengkirin an jî hat şêlokirin an jî hat berevajîkirin û bû çavkaniya pirsgirêkê. Lê di ti nîqaş û tezê de, çalakî û xebata civakê bi xwe, qada wê, di derbarê awayê çalakî û xwerêxistinkirina hewcedariyên wê û di derbarê azadiya wê de, behs nehat kirin û nebû mijara axaftinê jî.

Lewma, çawa dibe îradeyeke civakî, qada aboriyê ku ruhê civakê ye, çalakiya destpêkê ya ji aliyê civakê ve hatî birêxistinkirin û hişmendiya civakî pêş xistî, civak jê bê mehrûmkirin û bi navê rêxistina aboriyê bi êrişeke dijberê civakê, civakê biçewisîne û tepeser bike?

Çawa dibe ku civak timî ji derveyî pêvajoya aboriyê tên hiştin û pêşengê sazûmaniya aboriyê ji vê pêvajoyê tên derxistin û rastî çewisandin, derew û zordariya çerxa mêtingeriyê tên?

Heke têgîna aboriyê qanûna malê û hilberîna nava xaniyê malê be, çawa dibe ku yekeyên ku ew pêk anîn malbat, jin û ednamên din ji derveyî nîqaşên aboriyê tên hiştin? Wê demê ev pêvajo çawa pêş dikeve?

Nêrîna hevpar bi pêşketina berhemê zêde re, di wê qenaetê de bû ku çîna serdest bi desteserkirina berhemê zêde re ev pêvajo pêş xisitye. Her çi qasî ev nêrînên hevpar nebes jî bin, rastiyeke wan hebû. Lê ji bo pirsa ku jin çawa ji qada aboriyê ku qadeke civakî ye hate vederkirin û dûrxistin, ne bersiveke têrker e.

Nabe ku were gotin qismê hilberîna zêde ya ku ji mezaxtinê zêde mayî, bi tena serê xwe ji bo pêşketinek wiha têrê dike. Peyva berhemê zêde tê wateya nirxê zêde yê maddî û manewî yê ku ji aliyê civakê ve hatî hilberandin, mijarek nakok û bi gengeşe ye. Ji ber ku berhem û hilberîna zêde, di asteke hê jortir de xwe ji nû ve hilberandin û nûbûna civakê pêk tîne. Û hêza civaka neolîtîkê jî ji vê re guncaw bû. Ji ber vê yekê 'zêdahî' û 'dewlemendî' bi tena serê xwe nikarin bibin faktorên jihevparçekirina civakê. Ew dewlemendî dikare bê parvekirin, hêz, dînamîzm û mekanîzmayên civaka xwezayî dikarin bên birêxistinkirin û vî berhemî û hilberînê di hundir de çareser bikin.

Ev jî dide xuyakirin ku di civaka xwezayî de hilberîn hemû dihat mezaxtin. Ji ber ku dema hewcedariyên xwe pêk dianîn, xweza û pergala jîndariyê esas digirtin. Dibe ku ji bo rojên dijwar, zor û zehmet ji mezaxtinê zêdetir hilberîn hatiba stokkirin. Ev jî prensîbek ê jiyanê ye. Lê beşa din a zêde, bi rêya çanda diyarî û pevguherînê dihat belavkirin û mezaxtin. Ev yekane prensîb bû ku demek dirêj rê li cudakariya di nava civakê de girt. Jixwe

exlaqê civakî û hêza xwerêveberiyê ti carî rê nedaye ku di hundir de yekdestdarî û çînayetî pêş bikeve.

Wê demê pirsgirêka bingehîn çi ye? Heke civaka neolîtîkê rê nedabe ku di hundirê civakê de çîn çêbibin, heke hilberîn hatibe parvekirin û stokkirin, hewcedariyên bingehîn ên din bi rêya çanda diyarî û pevguherînê hatibin pêşwazîkirin, eger civaka neolîtîkê xwedî wê îrade û mekanîzmayê ye ku berhemê zêde di hundir de çareser bike, ma pirsgirêk çi bû û pirsgirêk wê ji ber çi çêbiba?

Vê pêkhateya civakî ya wekhevîxwaz û azadîxwaz karî demek dirêj hebûn, bihevrebûn û xwerêveberiya xwe bidomîne. Lê di encama tifaqa “zilamê bi hêz û fêlbaz” ê ku di çanda nêçîrvaniyê de bûbû xwedî tecrûbe û bi hevkariya beşekî kurtêlxwerên di nava civakê de, destpêkê bi lîstikên fen û fît, bi qurnazî û fêlbaziyan, li dijî xwerêveberiya jinê tevdigerin û berê xwe dan xwerêveberiya civakê. Ji ber ku bêyî şkandina xwerêveberiya jinê, hema hema ne mumkin bû ku têketibana nava civakê û dest deynin ser danehevên civaka neolîtîkê. Ji ber vê yekê Rêber APO dibêje: “Neteweya cara yekê hatî çewisandin û rastî kedxwariyê hatî jin e”.

Bi vê yekê jî girtina dest a rastiya nakokiya destpêkê ya bi çînan û bajaran hatî destpêkirin, hat perdepoşkirin. Lewma ji bo çareseriyê, divê sedema bingehîn a xwenixumandina di nav şaristaniyê de ya bajar û çînan, wekî nakokiya destpêkê were dîtin û famkirin. Parçebûn û hêmanên din paşê pêş dikevin.

Rakêşiya esasî bi serdestiya malbata baviksalariyê tê destpêkirin. Zemînê feraseta ku zilamê qurnaz û bi hêz xwe spartiyê, bi pêşxistina hiyerarşiya di nava malbata baviksalariyê

û çanda xanedaniyê de tê danîn. Li ser van diyardeyên nû bajar; di derketina dewlet û şaristaniyê de wekî yekeyeke bingehîn a xwecihî rol dilîze. Ji ber ku danehevên li bajêr, rê ji derketina holê ya çînan re vekir. Lê beriya derketina çînan, pirsgirêka bingehîn di navbera pergala dayîkê û pergala baviksalariyê de bû.

Ev nakokî jî esasê bingehîn ê serdema nû pêk tîne. Palpişta esasî ya şaristaniyê, pêşxistina pergala baviksalariyê beramber pergala xwerêveberiya dayîkê ya ku temsîla neolîtîkê dike ye. Vê jî paşê binyata esasî ya şaristaniyê pêk anî.

Hemû pêkhateyên pergala baviksalariyê çavkaniya xwe ya bingehîn ji vir digirin. Bingeh û xwepêgira dîrokî ya hemû çîn, mêtingerî, zext, hegemonya, desthilatdarî, dewletê û hwd. têgînan, li vir e. Û bi pêkanînên mêran ên li ser jinan derketiye holê. Beriya derketina şaristaniyê, hevkarên ku ji derve û hundirê pergala neolîtîkê derketin holê, ji vê re zemîn danîbûn, nêzîkatiya hegemonya û serdestiya baviksalariyê ya li ser jinê, paşê bû bingeheke dîrokî ji derketina çînan û pêşxistina koletiyê û hegemonyayê re.

Nakokiya yekemîn li vir derdikeve holê. Hebûna bingehîn a şaristaniyê li ser vî esasî pêk hatiye. Ev jî B.Z. piştî salên 6000'an, di serdema El Ubeyd de pêş dikeve û berfireh dibe. Ji Sûmeran dest pê dike heta B.Z. salên 2000'an di şeklê pevçûneke bêeman de didome .

Bi vê ve girêdayî, di civakê de çîn derdikevin holê. Vegotina çînan tenê li gorî rastiya berhemê zêde anîna ziman, herçend e di wateyekê de rast jî be, ne bes e. Desteserkirina berhemê zêde yê ji aliyê civakê ve hatî hilberandin, bingehê maddî yê hebûna çînan e. Lê beriya vê, di heqîqeta xwe de, divê hegemonyaya

baviksalariyê ya li ser serweriya jinê, bi vê re were destgirtin. Heke bi vê re neyê destgirtin û bi tena serê xwe bi çîn û berhemê zêde were îfadekirin, wê dogmatîk bimîne û feraseta dîroka çîna navendî jî wê ji ber vê yekê pêş bikeve.

Pêwîst ê qelişîna esasî ya bi baviksalariyê re li ser bingeha ji hev dabeşbûna jin û mêr derketî holê were destgirtin. Li ser vî esasî, wê dabeşbûna destpêkê ya çînî, ya di qonaxa dawî ya neolîtîkê ya li ser esasê zayendî derkeve holê. Piştî malbata baviksalarî û xanedaniyê, çîn pêş dikevin. Û wekî berdewamiya çandekê, çîn jî êdî li ser bingehê berhemê zêde tê birêxistinkirin û vediguherin desthilatdarî û hegemonyayê. Jê pêde jî êdî serdestî û hukumdariya çîna baviksalariyê li ser çînan xuya dibe.

Wekî ku xuya jî dibe, bêyî pêvajoya yekdestdariya desthilatdariyê ya ku bi tifaqa zilamê fêlbaz, rahîb û rêveber hatî avakirin, îradeya civakê û aboriyê nayê şkandin. Ji ber vê yekê berde pêşxistina aboriyê (sermayeyê), desthilatdarî hewldanek li dijî aboriya civakê ye.

Heke “zilamê fêlbaz” ango mêr di bajar û hawîrdora bajar de serî li fêlbazî, desthilatdarî û derewan nedaba, avaniya komînal, zihniyeta wê û hebûna wê ya maddî wê karîba di nava civakê de parvekirinek wekhev pêş xistiba. Bêkarî û hejarî jî nedibûn mijara axaftinê. Lewma bêyî ku civak ji hev parçe bûba, wê li ser esasê hilberînek hevpar û parvekirinek hevpar a di asta herî bilind û berdewam de, hilberîn pêk anîba.

Ji ber vê yekê, divê têkiliya sermayeyê ya bi hilberînê û aboriyê re di vê wateyê de wekî bextreşiyek mezin were dîtin. Sermaye ne têgînek ekonomîk e. Pêşketinek antîekonomîk e. Geşedana vê pêvajoyê ji aborîbûnê zêdetir, bi awayek yekpare

têkiliya sermayeyê ya ku di şeklê desthilatdariyê de ye, bi dewletê, artêşê û bi şaristaniya çînî re di asteke mezin de îfade dike.

Marks, sermayeyê wekî pêkhateyeke aboriyê pênase dike. Lê di rastiya xwe de sermaye ew sazûmaniya ku desthilatdariyê bi xwînê, bi hilweşandinê, bi diziyê, bi zordariyê, bi şûr û bi xapandinê bi dest xwe ve anî û desteser kiriye ye. Piştî wê jî, şer û pevçûnên mîna desteserkirina nirxên maddî û manewî yên civakê pêş dikevin. Tişta ku pirsgirêk derdixist, ne tenê berhemê zêde bû, feraseta desthilatdariyê, derfet û zêdahiya hûtane (mezaxtin, xwarin û vexwarina bêhed û bêhesab) bû. Bêguman, bi pêvajoya desteserkirina beşê hilberînê yê nehatî mezaxtin re, tê dîtin ku hêdî hêdî di civakê de têkçûn destpê dike.

Pêvajoyên destpêkê yên dewletbajarên Sûmeran û çîrokên Gilgamêş û Enkî yên di warê mîtolojîkî de û berxwedana Înanna ya li hemberî vê, nimûneyên herî giring ên dana diyarkirinê yên vê pêvajoyê ne. Ji ber vê yekê, mirov dikare “zilamê bi hêz û fêlbaz” ê ku destdanîna ser daneheva jinê mîna marîfet dîtî, wekî sermayedarê yekem ê dîrokê bi nav bike. Ew van geşedanan hemûyan jî bi sêtika extiyar, rahîb û şefê eskerî pêk tîne .

Ev pêvajoya ku zilamê qurnaz bi desteserkirin, fêlbazî û hîlekariyê pêş xistî, bi berbelavbûna pevguherîna berheman re jî gihişt asta herî jor. Pevguhertin, di demên berê de rêbazek pevguherînê bû ku ji aliyê hilberînkaran ve rû bi rû li ser esasê hewcedariyan pêk dihat. Ev jî li ser bingehê hewcedariyê, di bin kontrola xwerêveberiya exlaqî de pêk dihat.

Paşê, dema ku vê pêvajoyê bi navbeynkaran dest pê kir, rewş bi tevayî hat guhertin. Ji ber ku navbeynkar bazirganek bû

ku bi ti hilberînê ve mijûl nedibû, li derveyî hilberînê bû û pêvajoya pevguhertinê veguherand qadeke qezenca spekulatîf a di berjewendiyê xwe de. Bazirganên destpêkê yên di dîrokê de ev bûn. Sûkên xwezayî yên ku bi pevguhertinê çêbibûn, bi vê ve girêdayî, bi demê re guherîn. Ev jî gavên destpêkê yên ji rêderketina aboriyê bûn.

Pevçûnên bi hêrs û dijwar ên di mîtolojiyê de derbas bûyîn jî, didin xuyakirin ku ev pêvajo bi şer pêş ketiye. Ji ber vê yekê lingek ê rêxistina ant-ekonomîk, tundî û zordarî ye. Zordarî, rêka herî kurt û herî hesan a destdanîna ser berhemê zêde ye. Tê dîtin ku, bi giştî zordariya bi awayê dewletê hatî organîzekirin, bi yekdestdariya sermayeyê re mil bi mil mezin bûye. Yekane hedefa vê sîstema ku bi lingên xwe yên hundirîn li ser bingehê rahîb-fermandar, esker û rêveber an jî bi tifaqa hevkar û patexweran hatî birêxistinkirin, hê bêhtir berhevkirina zêde bû. 'Berhevkirin û hê bêhtir berhevkirin' yekane armanca zilamê fêlbaz û qurnaz bû.

Lewma, eşkere bû ku ji bo berhevkirinek hê zêdetir, pêwîstî bi hêza hê zêdetir a mirov û bi maddeya xav a hê zêdetir hebû. Di dîrokê de yekem meylên kolonyalîst û emperyalîstan, bi vî awayî derketin holê. Axên mezin û berfireh hatin dagirkirin, mirovên ku di şeran de dîl dihatin girtin kirin kole. Cihê kolonyalîzmê yê di çanda El Ubeyd de, di vê wateyê de pir balkêş e. Çanda baviksalariyê di vê pêvajoyê de pir xwe dide hîskirin. Û bi pêkanînên ku pêş xistibûn, destpêkê li Mezopotamyaya Jorîn bi bazirganiyê, bi darê zorê û bi desteserkirina keda domdar a koleyan, hem dest danîn ser gelek çandingeh, pîşe, sewalkarî, cotgehan û biçûk û mezin dest danîn ser hemû berhevkariyan û tesfiye kirin û hem jî yekdestdar kirin .

Destana Gilgamêş, di derheqê dîroka van kiryaran de, daneyên giring radixe ber çavan. Di destanê de ji şerê “zilamê bi hêz û fêlbaz” ê li dijî jinê dimeşîne bigire, heta şerê hovane yê mêrê nîvxweda yê li dijî civaka xwezayî û wekhev, gelek bûyerên bi hev ve girêdayî tên vegotin.

Jixwe serdema Ûrûkê ku yekemîn bajardewlet bû li Mezopotamyaya Jêrîn, hemû şopên vê çîrokê dide xuyakirin. Wê demê navenda bazirganiyê ya yekdestdariyê bû, hema hema hemû rê di Ûrûkê re derbas dibûn. Ev pêvajo qat bi qat berbelav û kûr dibe heta tê pêvajoya kapîtalîzmê. Jixwe hemû danehev û dînamîkên civakî yên li Rojihilat, keşfên Ewrûpa û Amerîkayê û kelûpel û danehevên ku bi darê zorê li vê derê bi destxistibûn, tên tesfiyekirin.

Ji ber vê yekê danehev hatibûn berhevkirin, fetih bi dawî bûbûn û di astek pir zêde de madenên bi nirx û giranbiha herikîbûn Ewrûpa. Ev daneheva ku bi darê zorê û tundiyê hatî bidestxistin, ji bo hilberîna pîşesaziyê vediguhere veberhênanê. Aha li vir, em bi pêşketinek wisa re rûbirû dibin ku rastiyê bi belgeyan îspat dike ku ka çawa 'sermaye' di serdema kapîtalîzmê de bi xwînê û diziyê hatiye yekdestdarkirin. Çawa ku Sûmerî li ser bingeha daneheva Mezopotamyaya Jorîn yekdestdariyek a zordarî û sermayeyê bûn, serdema Ewrûpayê jî li ser danehevên bi darê zorê û diziyê, li Rohilata Dûr, Rojhilata Navîn û cîhanê, serdema rêxistinkirina sermaye û yekdestdariya desthilatdariyê ye.

Wekî ku tê dîtin jî, kapîtalîzm li vê derê ne wekî şêwazeke nû yê hilberînê, wek şêwazek nû yê mêtingerî û danehevê derdikeve holê. Ji bo Marks kêmasî û nebesiyek pir mezin bû ku

Marks pêşketinên serdemê yên zanistî-teknîkî ku amrazeke yekdestdariyê bûn û di warê siyasî, hiqûqî û leşkerî de xwe pir bi rêxistin kiribûn, wekî şêwazek ê hilberînê destnîşan kir. Tiştê ku kapîtalîzmê kiribû, ew bû ku awayên berhevkirinê yên berî xwe hê bêhtir bi pergal û bi rêxistin kir. Di vê çarçoveyê de, kapîtalîzmê cuda ji pergalên serdest ên beriya xwe, hemû têkiliyên civakî veguherandin û li gorî berjewendiyên sermayeyê sererast kirin .

Di encama vê de, yekeyên aborî yên li hemû parzemînan, ji gundiyan bigire heta pîşekaran û yekeyên herî biçûk ên li ser rûyê erdê jî, bi tinebûnê re rû bi rû bûn. Hûnandinên exlaqî yên ku civakîbûnê pêk tînin, hatin hilweşandin û belawelakirin, li şûna wan kodên hiqûqî û qanûnî yên dewletperest hatin bicihkirin.

Mirov bi awayekî girseyî ji cih û warên xwe hatin qutkirin, bi milyonan mirov birçî û bêkar hatin hiştin. Di pêkhateya demografîk de guhertinên mezin çêbûn. Qirkirin pêk hatin. Û desthilatdariya kapîtalîst xwe bera heta nava şaneya herî biçûk a civakan jî da û hewl da her tiştî bi navê civakê heyî ji holê rake û tesfiye bike.

Ji ber vê yekê, beramberî hewldana ravekirina pergaleke ev qasî pir alî û bi awayekî wisa berfireh hatî meşandin, ketî nava heta rehikê kok ê civakê û ji çaryeka dawîn a sedsala 19’yan û vir ve bi polîtîkaya emperyalîzmê hemû dinya xistî nava pencê desthilatdariya xwe de, wekî teoriya KED, NIRX û META girtina dest û ne nirxandina aliyên din ên pergalê ku pêşketina şaristaniyê û esasên wê ne, teorîka Marksîst kêm maye.

Civaka dewletdar, bi taybetî jî pergala kapîtalîst, li ser esasê dijberiya aboriyê pêşketine. Di vî warî de bêsiûdiyeke ku

Marksîzmê, kapîtalîzm û sermaye wekî yekeyeke aborî girtiye dest.

## 11- Asîmîlasyon

Asîmîlasyon têgîneke Latînî ye. Tê wateya hevşibandin, helandin û bişaftinê. Asîmîlasyon rêbazek ê berevajîkirina mirovan e. Rêber APO li ser asîmîlasyonê wiha dibêje: "Asîmîlasyon, rêbazek ê serîlêdana têkilî û çalakiyê ye ku desthilatdarî ji bo civakan bi xwe re entegre bike, bi kar tîne." Wek tê zanîn asîmîlasyon bi desthilatdariyê ve girêdayî ye, lewma desthilatdarî jî bi hemû qadên jiyanê re têkildar e. Ji ber ku desthilatdarî hewl dide belavî nava hemû çavikên jiyanê bibe. Û di astek pir mezin de vê pêk jî tîne. Dema carekê derdikeve holê, di hemû qadên jiyanê de xwe dide jiyankirin. Wê demê, mirov dikare bibêje asîmîlasyon jî di hemû qadên jiyanê de heye. Divê mirov tenê asîmîlasyonê bi ziman ve sînordar neke. Asîmîlasyona ziman jî heye û di serî de ye, lê tenê bi ziman ve girêdana wê, kêm dimîne. Asîmîlasyon ji ruh, hest, raman, tevger, exlaq û polîtîkayê bigire heta li ser her tiştî pêk tê. Asîmîlasyon, li ser hemû qadên jiyanê yên maddî û manewî di şeklê zordariyê de, di şeklê birçîkirinê de yan jî di şeklê bêkariyê de tê pêkanîn.

Asîmîlasyona herî xeter û metirsîdar, asîmîlasyona zihniyetê ye. Rêber APO pêvajoya asîmîlasyonê wekî: "Qirkirina zihniyetê" pênase dike. Di Manîfestoya Yekemîn a PKK'ê ya bi navê "Rêya Şoreşa Kurdistanê" de, wekî şeklê herî metirsîdar ê "hizrî yê mêtingeriyê" tê pênasekirin. Tê gotin "ji bo civakekê bobelata herî mezin ew e ku nekaribe siberojekê ji xwe re pêşbînî

bike û plansaziya wê pêk bîne.” Lê di manîfestoya “Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Demokratîk” de, ev wekî “qirkirina zihniyetê” hatiye pênasekirin. Rêber APO qirkirina herî metirsîdar wekî qirkirina zihniyetê nirxand. Ango bi gotinek din, ketina rewşek wisa ku mirov nikaribe ji bo xwe bifire, nikaribe siberoja xwe pêşbînî bike û nikaribe plansaziyekê ji bo siberoja xwe çêbike. Êrê, nikare ji bo xwe bike, lê ji bo yên din, ji bo serdestan vê dike. Bi vî awayî entegrasyona pergala desthilatdariyê pêk tê û asîmîlasyona herî xeternak jî, dibe asîmîlasyona qirkirina zihniyetê. Ev jî dibe mêtingeriya fikrî yan jî zihnî. Ji bilî vê jî, li her qadê asîmîlasyon heye.

Asîmîlasyon awayek ê qirkirinê ye. Rêber APO wekî “tesfiyekirina fîzîkî yan jî çandî” pênase dike. Yanî qirkirin tê wateya tinekirina civakekê, komekê, gelekî, eşîretekê û neteweyekê. Du rêyên vê hene, di warê fîzîkî û di warê çandî de tinekirin e. Tesfiyekirina çandî jî asîmîlasyon e. Ji ber vê yekê, asîmîlasyon awayek ê qirkirinê ye.

Tesfiyekirina fîzîkî bi çend awayan pêk tê. Yek komkujî, dido sirgûn û koçberî, sisê guhertina demografyayê, xistina di rewşekî kemîne de û parçekirina tevna civakî. Ev jî bi awayê anîna çanda  civak û neteweyek din û bicihkirina wan li herêmeke dagirkirî, pêk tê. Niha li Efrînê koçberî pêk anîn. Demografiyê diguherin, civakên din tînin bi cih dikin.

Lewra asîmîlasyon, têkilî û çalakiya yekalî ya ku yekdestdariya desthilatdarî û sermayedariyê di civakên şaristanî de li ser komên civakî yên xistîn rewşa koledariyê dide meşandin û xistina wan koman a rewşa pêvekên xwe yên taybet, îfade dike.

Asîmîlasyon, ew kiryara ku hêzên desthilatdar ji bo çêkirina koleyan, serî lê didin e. Ji bo mirovan ji xwe re bikin pêvek, xulam û xizmetkar, rêbaza asîmîlasyonê bi kar tînin. Armanc jê ew e ku mirovan di nava xwe de bihelînin û bikin wekî xwe. Ji vê re "Qirkirina Spî" jî tê gotin.

Têgîna devşîrme rêbazek qedîm ê ku herî zêde ji aliyê desthilatdaran ve pêk tê û yek ji stûnên herî giring a polîtîkayên asîmîlasyonê ye. Ev têgîna devşîrme di koka xwe de Kurdî ye. Hinek pêkanînên beramber zaroka ku ji şîr hatî girtin pênase dike.

Tê maneya birin û li gorî xwe xwedîkirina wan zarokên ku bi taybet malbat û gelê wan ji aliyê dewlet û desthilatdariyê ve hatîn qetilkirin, hemû pergalên dibistanan ên van dused salên dawiyê, ji vê armancê re xizmetê dikin. Di kapîtalîzmê de, mekanîzmaya asîmîlasyonê ne tenê li ser civak û gelên etnîkî yên bindest tê meşandin, grûb û etnîkên ji neteweya cuda yên girêdayî elîta serdest jî para xwe ji asîmîlasyonê digirin; bi windakirina zaravayên xwe yên etnîkî û nirxên xwe yên çandî yên azad mayî re, rû bi rû dimînin.

Di vê derbarê de, Amîn Maûof dibêje: "Çand û zimanê gelekî, di asîmîlasyonê re derbaskirin, tevkujiya herî mezin e." Ev têgîn di pêvajoya netewedewletê de pêş dikeve, beriya wê geşedanek bi vî awayî tinebû. Netewedewlet mekanîzmaya herifandinê ye.

Gotina Aristide Pereira ya ku dibêje: "Me azadiya xwe bi dest xist û me bera mêtingeran da. Niha jî divê em hişê xwe ji

mêtingerî û mêtingehiyê rizgar bikin”, di rastiya xwe de behsa giringiya ji hiş rakirin û avêtina zordarî, pêkutî û gilokbûnê dike .

Frantz Fanon di berhema xwe ya bi navê “Çermê Reş Maskeya Spî” de, mêtingeriyê wekî rewşa “Razîbûna hilgirtina serê kesên din li ser milên xwe” pênase dike. Û ji bo derbaskirina vê jî dibêje: “Rewşa mêtingeriyê nayê derbaskirin, wekî berstûyek hesin e, lê tê şkandin”.

Li Kurdistanê, polîtîkaya asîmîlasyonê çawa pêş ket? Bêguman destpêkê divê em zanibin ku polîtîkaya asîmîlasyonê bi pêvajoya netewedewletê re pêş ket. Feraseta Îttihad Terakkî çi ye? İTC komîteyek têkel e û rêxistinbûna damezrêner a netewe dewleta Alman a bi patent e.

Nîhal Atsız di pêvajoya avakirina dewleta Tirk de, Kurdan û Ermeniyan wekî dijminên herî mezin dibîne. Ji bo vê jî, destpêkê tezên wî yên qirkirina Ermeniyan, qirkirin û di asîmîlasyonê re derbaskirina Kurdan hebû.

Ziya Gokalp Kurd bû, lê şexsekî wisa bû ku serkêşiya şovenîzmê û neteweperestiya Tirk dikir. Neteweperestiya ku li Fransayê pêş ketî û tevgerên nîjadperestiyê yên li Almanyayê pêş diketin, rê ji pêkanîna pêvajoya nasnameya serdest re vedikin. Nêrînên wê yên li nav Komara Tirkiyê jî li ser vî esasî pêk hatin.

Nimûneya din jî Abdurehîm Arvesî ye. Bi eslê xwe Azerî ye, di warê bîrdozî de tevgera neteweperestiyê pêş xistiye û di afirandina nasnameya tirk de jî pêşengtî kiriye. Nasnameya Tirk qels e. Di serdema Osmaniyan de, zimanê Tirkî kêm û biçûk dihat dîtin. Di avakirina pêvajoya netewe dewelta Tirk de, gava yekem

bi pesindan û avakirina zimanê Tirkî hat destpêkirin. Gotina ‘Tirkek bedelê hemû dinyayê ye’ û ‘Çi bextewariye ku mirov bibêje ez Tirk im’, gavên destpêkê yên bi qedir û qîmetkirina zimanê Tirkî ne .

Piştî salên 1925’an, hebûna Tirkan bi tinebûna Kurdan ve hat girêdan. Piştî wê jî, Teoriya Zimanê Rojê tê pêşxistin. Bi avakirina Saziya Zimanê Tirkî re, zimanekî Tirkî ku ji gelek zimanan hatî dizîn û wergirtin hat afirandin. Û her wiha dîroka Tirkiyê bi Sûmeriyan ve hate girêdan, tezên ku dîrok û civak ji Tirkan hatiye destpêkirin, hatin pêşxistin. Di sala 1925’an de, bi plana Şerq Îslahetê, mîna roja me ya îro, plana pêvajoya qirkirina fîzîkî û çandî dan destpêkirin. Plana Şerq Îslahetê ya ku di 24’ê îlona 1925’an de hatî qebûlkirin, planeke gelek berfireh a qirkirinê bû ku piştî têkbirina Serhildana Şêx Seîd, ev plana qirkirinê bi awayek sîstematîk li dijî Kurdistanê û gelê Kurd hate pêşxistin. Di heman salê de, Qanûna Îzale-Şekavetê (Qanûna ji Holê Rakirina Eşqiyatiyê) û Qanûna Teqrîr-î Sukun (Qanûna bêdengkirinê) jî hatin derxistin.

Ji ber vê yekê, Plana Şerq Îslahetê herî zêde li ser tesfiyekirina zimanê Kurdan sekiniye. Berê tîrên xwe dane qedexekirin û asîmîlasyona zimanê Kurdî. Û di vê çarçoveyê de, gelek bi hesasî li ser qedexekirina nirxên çandî yên Kurdan û derxistina Kurdan ji welatê wan sekinîne. Bi rakirin û qedexekirina navên resen ên Kurdî û guhertina wan bi Tirkî, berê xwe dan çêkirina hafizeyeke nû ya civakî. Bi kurtî, Plana Şerqê ya Islahetê, planeke li ser asîmîlasyonê (helandin) û qirkirin-jenosîd (tinekirin) ê ya li li dijî gelê Kurd bû û planeke ku heta roja me ya îro jî li dijî gelê Kurd tê meşandin e. Li gorî belgeyên derketîn

holê, Plana Şerq Îslahetê ya di 24’ê îlona 1925’an de hatî qebûlkirin, bi giştî ji 27 xalan pêk tê:

“Madde 1: Li îdareya irfî ya Kurdistanê rewşa awarte were ragihandin.

Madde 2: Kurdistan li ser 5 mintiqeyên mifetiştiya umûmî were vesazkirin an jî dabeşkirin.

Madde 3: Li Mehkemeya Nîzamiyê û Dîwana Herbî û irfî, ango divê di dadgehên sivîl û leşkerî de dadgerên sivîl tine bin.

Madde 5 jî: “Li xeta xerbê-rojava ya di navbera şehrê Wanê û Midyadê de ya ku Ermeniyan terikandîn, wê Muhacirên Tirk lê bên bicihkirin. Ji ber vê sedemê, mal û milkên Ermeniyan ên di nava wîlayeta îdarî ya mihelî de, ji aliyê maliyeyê ve nayê firotin û heta bi kirê jî ji Kurdan re nayê dayîn. Tirk û Arnavûtên ku ji Yoguslavyayê tên û her wiha koçberên ji Îran û Kafkasyayê, di serî de wê li Elezîz, Erxenî, Diyarbekir, Palû, Kixê, Geliyê Mûradê yê di navbera Palû û Mûşê de, li rojhilat û başûrê çiyayê Çewlikê, Geliyê Xinis, Mûradê, Deşta Mûşê, derdora Gola Wanê, Diyarî Bekir, Xerzan û li ser xeta Bedlîsê bi cih bibin. Ji xeynî van deveran jî, bi destûr û rizamendiya xelkên ku li wîlayeta Rîzeyê, Trabzonê û navçeyên bakurê rojhilatê wîlayeta Erziromê dijîn û bi sûdwergirtina ji şert û mercên guncaw ên ji bo bicihkirina muhaciran, wê derbasî derdora Çemê Xinisê û Geliyê Mûradê û şîmalê mintiqeya Gola Wanê bibin.

Muhacir û Tirkên xwecihî yên ku wê li Rohilatê bi cih bibin, divê bi derfetên hukûmetê ber bi herêmên ku lê bi cih bibin bên veguhestin û di dema veguhestinê de jî debara jiyana wan û

avakirina mal û xaniyên wan ji hêla dewletê ve were dabînkirin. Her wiha divê debara wan a salekê û dîsan di warê pêşxistina çandiniyê û sewaldariyê de salekê were pêşwazîkirin.

Kurdên ku mal û milk, cih û warên Ermeniyên ku koçberên Tirk lê werin bicihkirin dagir kiribin, sedem çi dibe bila bibe, bêyî ku karibin belgeyekê nîşan bidin, divê jê bên derxistin û li cihên xwe yên berê werin vegerandin an jî bên şandina rojavayê Tirkiyê û li cihê wan koçberên Tirk bi cih bibin. Û ji bo parastina Tirkan ji êrişên Kurdan, divê tedbîrên taybet ên dewletê bên girtin.

Bi berçavgirtina ku herî zêde 50 hezar nifûs wê di sala 1341'ê de li van herêmên amaje pê bûyî werin veguhestin û bicihkirin: Bi hesabê ku ji her kesekî re 20 lîra bên dayîn, wê milyonek (1.000.0000) lêçûn  ji bo veguhestinê, çûnûhatinê, otomobîlan, debara jiyanê û hwd. çêbibe. Ango mesrefa kesên ku li van deran bên bicihkirin wê were dabînkirin.

Bi heman mijarê ve girêdayî, ji bo ku di nava 10 salan de ji Yûgoslavya, Bûlgaristan, Kafkasya û Azerbaycanê 500 hezar nifûs li herêmên ku hatîn amajekirin bi cih bibin, ji bo pêkanîna vê armancê, divê ji sala 1343'yan û pêde her sal 55 milyon lîre ji bûdçeya wê re were veqetandin.

Maddeya 6 û 7: Li ser hejmartina mal û milk û sermayeya Kurdan û Ermeniyan in.

Maddeya 8: Hemû lêçûnên di pêvajoya îsyanê de çêbûyîn, wê ji aliyê îsyankaran û kesên ku hewl dayîn îsyanê bikin ve bên dabînkirin.

Madde 9: "Yên ku teşwîq û pêşengiya serhildanê kirin, xizm û kes û karên wan, yên ku hikûmet guncaw nebîne ku li Rojhilat

bimînin, wê ji bo cihên ku ji hêla hikûmetê ve werin destnîşankirin bên veguhestina Rojavayê Tirkiyê. Mal û zeviyen ku ew wê biterikînin, wê ji aliyê hikûmetê ve werin kirîn û bihayê wan bi pere were dayîn an jî mal û zeviyên bi heman bihayî wê li cihên ku ew lê bên bicihkirin, ji wan re were dayîn".

Yanî yên li ber xwe dayîn, wê werin sirgunkirin û koçî cihên ku dewletê destnîşankirin bibin.

"Veguhestina kesên ku di dema serhildanê de ji hikûmetê re xizmet dikirin û dilsoz bûn û yên ku li dijî serhildanê tevdigeriyan, wê were paşxistin".

Ango sirgunkirina kesên alîgirên dewletê, hevkar û yên ku li dijî gelê xwe hatîn bikaranîn, wê ji bo demekê were paşxistin.

Madde 10: Di derbarê hilweşandina eşîretan de ye. Lê ji bo ku ev pêk were, pêwîstî bi gelek karmendan hebû. pêwîstî bi serjimêrî û tesbîtkirinê hebû. Yên ku vê bikin jî teqez divê ne Kurd bin.

Karmendên ku ji wê derê re bên şandin, wê mûçeyê wan ji %75 were zêdekirin. Yên ku 3 salan li wê derê bimînin, wê payeya wan were bilindkirin û li her cihê Tirkiyê yê ku bixwazin, wê vesaziya wan here wir û li wir biminin. Wê ji malbatên leşkeran re 1,5 qat zêde erzaq were dayîn.

Madde 11: Li bajarên ser sînor ên wekî Colemêrg û Wanê, hejmara leşkeran wê were zêdekirin. Tabûr û togayên zêde yên leşkerî wê werin pêkanîn.

Madde 12: "Çek û sîleh wê bên komkirin û hilgirtina çekan wê were qedexekirin, tenê bi wesîqeyê wê destûra hilgirtina

çekê were dayîn. Çekên bê wesîqe yên di malan de wê bên desteserkirin û xwediyên wan jî wê radestî Dadgeha Dîwana Leşkerî bibin”.

Ango çek wê werin qedexekirin û kesên ku çekên bê wesîqe hebin jî wê sewqî Dîwana Herbî ya Rewşa Awarte bibin.

Madde 13: Yên ku bi eslê xwe tirk bûn û beramberî Kurdîtiyê ber bi qelsbûn û têçûnê ve çûyîn, yên li Wîlayetên Meletî, Elezîz, Diyarbekir, Bedlîs, Wan, Mûş, Ruha, Erxenî, Hozat, Ercîş, Adilcewaz, Exlat, Palû, Çarsancak, Çemişkezek, Ovacık, Xisnimansûr, Behisni, Arga, Hekîmhan, Bîrecîk, Çermîk û yên li dezgehên dewletê, şaredarî, sazî û teşkîlatên din û yên li dibistan û bazaran ji xeynî zimanê Tirkî zimanek din bi kar bînin, wê bi tawanê dijberiyê û li hember hikûmetê rabûnê werin cezakirin.

Ango yên ku her diçe Tirkîtiya wan beramberî Kurdîtiyê têk diçe, di rewşên ku Kurdî biaxivin de, bi dana pereyan wê bên cezakirin .

Madde 14: “Li deverên ku bi eslê xwe Tirk û ber bi Kurdîtiyê ve diçin û li cihên din ên wekî Sêrtê, Mêrdînê, Stewrê, cih û deverên din ên wekî vana yên ku bi Erebî diaxivin, divê Ocaxên Tirkan û dibistan lê bên vekirin û bi taybet jî bi hemû awayên fedekariyê, divê dibistanên bêkêmasî û pir baş ên keçan lê bên vekirin. Bi taybet divê di zûtirîn demê de, li Dêrsimê dibistanên seretayî bên vekirin û ji tevlîheviya Kurdîtiyê rizgar bibin”.

Ango li cihên ku bi eslê xwe Tirk in, lê berê xwe dane Kurdîtiyê û ber bi Kurdayetiyê ve dişemitin, û li cihên ku bi Erebî diaxivin, vekirina ocax, dibistan û bi taybetî jî vekirina dibistanên keçan teşwîq dike. Bi taybetî ji bo kesên Tirk ên li Dêrsimê yên ku

ber bi Kurdayetiyê ve diçin, ev rewş divê bi lez û bez were pêkanîn.

Madde 15: Kesên ku dixwazin ji Dêrsimê derkevin, ji bo çûna wan a cihê ku dewlet destnîşan bike, divê pêdiviyên pêwîst bên dabînkirin.

Madde 16: "Kurdên li hin wîlayetên me yên li xerbê Firatê ku bi awayek belawela bi cih bûne, divê bi awayekî lez axaftina wan a bi Kurdî bê qedexekirin û divê giringî bi dibistanên keçan bê dayîn, ji bo jin karibin bi Tirkî biaxivin pêwîst e ev pêk were".

Kurdên li rojavayê Firatê belawela bi cih bûyîn, divê pêşî li axaftina wan a bi Kurdî bê girtin , giringî bi dibistanên keçan bê dayîn, ji bo ku axaftina wan a bi Tirkî misoger bibe.

Madde 17: “Divê bi lez û bez avahiyên hikûmetê, qereqolên cendirmeyan, qereqolên leşkerî û sînorî bên avakirin”.

Madde 18: “Ji bo ku rejîm karibe xwe bigihîne cihên stratejîk ên hatîn destnîşankirin, divê li gorî ku tê xwestin rê bên çêkirin”.

Madde 19: "Pêwîst e hewl bê dayîn ku rêyên hesinî yên Rojhilat di demeke herî kin de bên çêkirin, ji bo xwegihandina Erzingan, Sêwas, Elezîz-Diyarbekir, Elezîz-Çapakçûr-Mûş û Gola Wanê ".

Ango divê hewl bê dayîn ku bi lez rêyên hesinî bigihînin parêzgehên ku li jor hatine destnîşankirin.

Madde 20: “Divê hemû qereqolên ku li van deran bên avakirin, ji bergirî û parastinê re munasib bin û divê li vê mintiqeyê çend îstasyonên telefon û bêtêlan hebin”.

Madde 21: “Komîserên sînor ji bo mijarên wekî qaçaxçîtî, îstîxbaratê, sîxurî û xalên din ên ewlehiyê, ji rêveberiya giştî ya şer (mufetîşiya giştî) destûrê distînin".

Madde 22: “Ji bo pêşîgirtina li qaçaxiya li sînoran, kirîna çend wesayîtên zirxî”.

Madde 23: “Zêdekirina mûçeyê kesên ku di van qadan de kar dikin.

Madde 24: “Bêyî destûra hikûmetê, kes û saziyên biyanî nikarin têkevin vê herêmê”.

Madde 25: “Li cihên ku serjimariya nifûsê lê tê kirin, divê bi lez û bez şaxên eskeriyê li wan cihan bên vekirin. Mirovên vê derê divê li derveyî vê herêmê eskeriya xwe bikin”.

Madde 26: Li vê herêmê divê hikûmet bi xwe hemû karên xelkê bimeşîne, navbeynkaran bi tûndî qedexe û red bike”.

Madde 27: Heta ku rewşa awarte ya giştî berdewam be, divê xusûsiyetên wekî rêkûpêkiya bajaran bên paşxistin”.

Bingehê feraseta netewe-dewletê, li ser desthilatdariya qewmekî ya li ser qewmekî din hatiye avakirin. Ev mercê destpêkê yê netewe-dewletbûnê ye. Piştî wê jî, ew yekdestdariya siyasî, eskerî û aborî di destekî de kom dike û etnîsîte û kêmneteweyên din red û tine dike. Ev jî qanûna netewe dewletê ye. Netewe dewleta Tirk ji ber vê yekê wekî pêwîstiyek a netewe dewletê, polîtîkaya qirkirina Kurdan da destpêkirin.

Cara yekem dema destpêkê netewe dewlet derdikevin holê, bi krîz û kaosê dest pê dikin. Ji ber ku bingehekî wan ê dîrokî û civakî tine ye. Lewra netewe dewlet, di yek potayê de xwe

dispêre firka helandin û perçiqandinê. Jixwe piştî destpêka derketina netewe dewletan û vir ve, zêdebûna domdar a nakokî, zordarî û çewisandinê jî, ji ber vê yekê ye.

Bi dawîbûna Şerê Cîhanî yê Yekem re, vê modêla netewe dewletê derbasî Rojhilata Navîn dikin. Ya destpêkê ev modêl dewr girtî TC (Cumhuriyeta Tirkiyê) bû, piştî wê jî 28 netewe dewletên Ereb hatin avakirin. Berê senceq (sanjak) û rêveberiyên herêmî hebûn. Civakan bi zimanê xwe, bi çanda xwe û bi kevneşopiyên xwe, xwe bi rê ve dibirin. Her çiqasî pirsgirêkên dîrokî hebûn jî, lê ne wekî serdema netewe dewletê bûn. Dewletek bi navê Iraqê tine bû, Kurd, Ereb, Asûrî û Sûryanî hebûn. Grûbeke etnîkî ya bi navê Tirk hebû, lê dihatin biçûkxistin. Li ser wê cografyayê Laz, Kurd, Rûm, Ermenî, Yahûdî û baweriyên din ên cuda hebûn. Dewletek bi navê Sûriye tine bû. Sûriye, peyveke ji Suryanîtiyê hatî girtin e. Ango destpêkê li vê cografyayê, Suryanî û etnîsîteyên din dijiyan. Lê niha welatek bi navê dewleta Ereb a Sûriyê derketiye pêş .

Ev çand û ziman berhemên civaka dîrokî ne. Bi hezarê salan li ser vê erdnîgariyê hebûna xwe domandine û jiyan e. Sînorên qewman û etnîsîteyan tine bûn, ev rastiyên sosyolojîk û dîrokî ne. Ê baş e, heke pirsgirêk ne ev bûn, çi bûn? Pirsgirêka bingehîn, rastiya netewe dewleta ku bi darê zorê, bi redkirina hemû çand û baweriyan, li ser mêtingerî û înkarê hatî avakirin û pêşxistin e.

Sedema sereke ya pevçûnên ku di vê sedsala dawiyê de li Fransa, Spanya, Komara Tirkiyeyê û gelek deverên din dewam dike, polîtîkaya îmhayê ya bi pêvajoya netewe dewletê re hatî destpkêkirin û li dijî komên civakî tê meşandin e. Ji ber ku şert û mercên bingehîn ên netewe dewletan, ji holêrakirin û tinekirina

cudahiyan e. Di bingeha polîtîkayên asîmîlasyon û qirkirinê de ev heye. Cîhana salên 1900'î, cîhana netewe dewletan e. Çi pirsgirêka kê hebûya, bi hiqûqa dewletê dihat çareserkirin. Ji ber vê sedemê, qeder û aqûbeta netewe û civakên li derveyî dewletê, di berjewendiyê netewe dewleta serdest de bû.

Piştî têkçûn û hilweşandina Împeratoriya Osmaniyan, hevpeymanên navneteweyî hatin çêkirin. Ji vana ya herî giring hevpeymana Sewrê ye. Di maddeya 3'yan a hevpeymana Sewrê ya ku di bin çavdêriya Neteweyên Yekbûyî (UN-Cemiyeta Miletan) de hatî îmzekirin, behsa xweserî-otonomiya Kurdistanê tê kirin.

Ji ber vê sedemê, şandeya Neteweyên Yekbûyî li Kurdistanê dest bi ger û lêkolînê dike û encamê pêşkêşî dîwana NY'ê dike. Ev şandeya navborî ya NY'ê, li Kurdistanê lêkolînê pêk tîne. Gelê Kurd nekarî di çarçoveya van biryaran de îradeya xwe bide xuyakirin. Ji ber ku bê pêşeng, bê rewşenbîr û bê serkêş bû. Ew jî bûbûn beşek di bin pergala rejîma Tirk de. Wekî encam, beşekî ku dewletê bixwaze dernakeve pêş. Ji ber ku TC li vir bi bandor bûbû û gelek serokên eşîran bi xwe ve dabû girêdan.

Pirsyara şandeya Neteweyên Yekbûyî tenê ev bû: 'Hûn dewleta Kurdistanê dixwazin an jî otonomiya Kurdistanê ?' Pirsyara wan ev bû. Bersivên ku şandeyê wergirtin,'em naxwazin, em xelîfe dixwazin, kafir ji xelîfeyê li Stenbolê hez nakin û bila kafir û gawir axa me biterikînin herin.' Wê demê xelîfeyê li Stenbolê, li Kurdistan û Anatolyayê propagandayek dabû destpêkirin,'Welat û ol jî wê ji destê me diçe, kafir dixwazin ometa me parçe bikin', gel di bin bandora vê propagandayê de mabû. Ataturk, berê di çarçoveya polîtîkaya xwe ya hundirîn de,

propagandaya dabû destpêkirin û gotibû ‘em xelîfetiyê dixwazin’ û propagandaya vê dikir.

Di pêvajoyên destpêkê de, qet behsa komarê nedikir. Heta di vê derbarê de daxuyanî û belavokên wî jî hene. Di van belavokan de digot: ‘Ey misilmanino, xelîfetî di xeteriyê de ye’ û şêx, mîr, beg û rewşenbîrên Kurdan bi cil û bergên wan ên neteweyî ve vedixwendin mecilsê. Armanca wî valaderxistin û pûçkirina peymana Sewrê bû. Û wiha şêx û mîrên Kurdan birin meclisê jî, lê piştî ku xeterî namîne, bi tawanê parçekirina dewletê hinek ji wan darve jî kirin.

Wekî encam, heyeta Neteweyên Yekbûyî raporeke nivîskî ya ku tê de hatî nivîsîn, ‘Kurd dewletê naxwazin’ pêşkêşî meclisa Neteweyên Yekbûyî (NY)ê dike. Û pêvajoya ku Kurdan dixe nav pencên dewleta Tirk bi vî awayî dest pê dike.

Neteweyên Yekbûyî, dubare vê carê Kurdan li Lozanê tîne rojevê. Ataturk wekî taktîk ji Kurdên ku vexwendibûn meclisê îmzeyan kom dike. Van îmzeyan dide Ismet Înonû û wî bi navê Kurd û Tirkan wekî nûner dişîne Lozanê. Dema Ismet Înonî diçe Lozanê, dibêje: ‘Ez bi navê gelê Tirk û gelê Kurd li vir im, dewleta Tirk dewleta Kurdan e jî.’  Ev firsend jî bi vî awayî nayê nirxandin.

Heke wê demê me karibûya em bûban dewlet, belku Kurd bi polîtîkayeke wiha tund a asîmîlasyon û qirkirinê re rû bi rû nebûna. Û pirsgirêka netewebûna Kurdan jî îro nedihat nîqaşkirin. Dibe ku îro me nîqaşa gelo em ê çawa derbasî demokrasiyê bibin û pergalek çawa ya îdarî ava bikin, me nîqaş kiriba. Lê niha em herduyan bi hev re nîqaş dikin. Em pirsgirêka neteweyî û demokrasiyê herduyan bi hev re guftûgo dikin. Sed sal derbas bûn û hat famkirin ku netewe dewlet ne çareserî ye. Ji

be ku netewe dewlet, difetisîne, dihelîne û timî kaos û krîzê hildiberîne.

Şerê sedsalan ê li Ewrûpayê, şerê wan ê 30 salan, şerê wan ê Yekem û Duyem ê Cîhanê, hemû şerê netewe dewletê bû. Niha Yekîtiya Ewrûpayê sînorên navbera xwe rakirine, derbasî demokrasiyê dibe û neteweperestiyê nerm dike. Derbasî dewleta bexteweriyê (refahiyetê) bûn. Baş e, bi ser ketin? Na. Ji ber ku hê jî netewe dewlet bi hêz e û sermaye heye. Ji ber ku sermaye bi awayek hevpar nayê parvekirin û ne girêdayî hevgirtin û hevbeşiyê ye. Pirsgirêk sermaye ye, sermaye, beramber pergalek adil û parvekirinek wekhev asteng e.

## 12 .Qirkirin

Derketina vê têgînê û cihgirtina wê ya di metnên zagonî yên navneteweyî de, bi saya dadnas-dozger Rafael Lemkînê Polonî pêk hatiye ku bi eslê xwe ew Yahûdî bû û tevahiya malbata xwe di qirkirinê de winda kiribû. Lemkîn, di pirtûka xwe ya di sala 1944’an hatî çapkirin de, cara pêşî têgîna qirkirinê (genocide) bi kar aniye. Têgîna genocide (jenosîd) ku ji Yûnana kevn aniye, ji pevgihandina peyvên genos (binemal, qewm) û cidus (kujer)ê pêk hatiye. Yahûdiyan navê “Pogrom”, Yûnaniyan navê “Holokost”, Ermenan navê “Karesata Mezin” lê kirine.

Qirkirina ku wek berdewamiya diyardeya bişaftinê tê naskirin, gel û pêkhate û hemû komên nijadî û mezhebên ji olên cuda yên ku bi rêbazên bişaftinê nikarin bên helandin, bi temamî tesfiye û tinekirina wan dike armanc. Li gorî rewşê, ji van her du rêbazan yek tê tercîhkirin.

Rêbazê qirkirina fîzîkî, piranî li hember komên çandî yên li hember çanda elît a serdest ango li hember çanda netewe-dewletê xurt in, pêk tê. Mînakên vê yên xuyayî, qirkirinên li hember Yahûdî, Ermen û gel û çandên din pêk hatîn in. Qirkirina çandî, zêdetir li ser gel û komên etnîk û komên baweriyan ên ku li gor çanda elît a serdest û çanda netewe-dewletê pêş neketine û qels in pêk tê. Armanca bingehîn ew e ku nasnameya tê hedefkirin, di nav çand û zimanê netewe-dewletê de bi tevahî ji holê bê rakirin û tinekirin.

Koka qirkirinê digihêje qelişîna hiyerarşîk a mirovahiyê ya serdema civaka xwezayî û di pey wê re avabûna pergala serdest a dewletdar. Qirkirin tê wateya êrişa li hemberî civaka xwezayî û li hemberî giyan û helwesta hevgirtin û statuya jinê. Her cûrê êrişê yê li hemberî civaka xwezayî, wekî pêkanîneke qirkirinê dikare bê pênasekirin. Kok û dîroka qirkirinê ew qas digihêje serdemên berê, lê belê qirkirina bi destê kapîtalîzmê pêk hatî, ji qralên herî xedar ên serdemên berê jî wêdetir e. Qirkirin di ti serdeman de bi qasî qirkirinên kapîtalîzmê berfireh û mezin pêk nehatine. Di esasê haveynê mantiqê avabûna netewe-dewletê de qirkirin heye.

Bingeha kapîtalîzmê herçendî bigihêje dewletên destpêka dîrokê jî, serdestbûna wê di sedsala 16'an de li parzemîna Ewrûpayê pêk hatiye. Di destpêkê de herçende ku bi piranî li ser bazirganiyê pêş ketibe jî, ji ber ku pergala destdanîna li ser nirxên civakê ye, li kû derê dewlemendiyek heba, çavê xwe berdaye wê derê. Seferên Xaçperestan mînakên wê yên herî bibandor ên dîrokî ne. Qorsaniya deryayê ya Ingilizan, mînak in ku sermaye çawa bi dizî û şelandinê hatiye komkirin. Şerên bêdawî yên bi navên çîn, ol û neteweyê hatine ferzkirin, didin xuyakirin ku

kapîtalîzm pergaleke çi qas wêranker û xirabker e. Lê kapîtalîzmê, serdestiya serdema xwe herî zêde jî bi qirkirinan bi pêş xistiye. Jixwe ji çavsoriya qezenca herî zêde, ji pergala netewe-dewletê û ji pergala ku bi çeka endustriyalîzmê hatî avakirin, ji bilî pêşxistina qirkirina li ser xwezayê û mirovan tiştekî din nayê hêvîkirin.

Hêmaneke din ku bingeh ji serdestiya kapîtalîzmê re ava kirî “Serdema keşfkirina Erdnîgariyan” e ku ev ji serî heta binî serdema qirkirinan e.

Bi piranî tê gotin ku çend sed çekdarên Awrûpî karîne bi hezaran niştecihên Amerîkayî tine bikin û sira vê yekê jî çekên bi barût ên di destê wan de ne. Lê belê hêmaneke ji vê girîngtir jî heye ku ev xisleta rastî ya kapîtalîzmê dide der. Ev jî pergala îstîsmarê ye ku ti sînorekî exlaqî nas nake. Dema Kristof Kolomb gihişt parzemîna Amerîkayê, nîşeyekê ji qralîçeya Spanyayê re dişîne, ew vê bêexlaqiyê bi awayekî zelal dide nîşandan:

“Ez dikarim li hember cenabê we sond bixwim ku li ser rûyê dinyayê neteweyek ji van qenctir peyda nabe. Qet nizanin xirabî çi ye, diziyê nakin, kesî nakujin. Bi qasî xwe ji cîranên xwe hez dikin, pir zêde xwîngerm û kubar in, dema diaxivin tim rûken in. Em dikarin bi pêncî şervanî tevahiya vî gelî jêrdest bikin û tişta em dixwazin bi wan bidin kirin”.

Rastiya Kolomb anî ziman ew e ku ev civaka xwezayî, civakeke exlaqî ye û ji ber ku dûrî qirkirinan e, li hemberî wê ti bergiriyên wan ên parastinê tine ne. Ev rewş nedihat maneya ku niştecih paşketî ne, berevajî vê, bi qasî ku ew Awrûpiyan matmayî bikin jêhatî bûn, ji ber vê yekê ew rastî qirkirina fîzîkî hatibûn. Dagirkirina parzemîna Amerîkayê û hovîtiya qirkirinê

dibû bangewaziya pergala talankeriyê ya li ser hîmê bêexlaqiyê. Pêvajoya ku pêşî bi armanca talankeriyê dest pê kiribû, di demeke kin de veguheriye qirkirineke etnîk a ku armanca wê bidestxistina tevahiya axa wan bû. Ev çîroka trajîk a ku hovîtiya li ser gelan vedibêje, mînaka herî berbiçav a kapîtalîzmê ye ku di dîroka rûreşiya dinyayê de cihê xwe girtiye.

Ji bo gelên niştecih ên li parzemîna Awustralyayê û yên ku li giravên derdora wê nêzî 50 hezar salan dijîn, di wateya "ên ji binyadê" yan jî "ên ji destpêkê" Aborjin (bi latînî, Aborigine) tê gotin. Wekî hemû civakên xwezayî, dîroka Aborjin ên ku di hembêza xwezayê de bêyî mêtingerî û pevçûnan jiyayîn û giyanên xwe bi stranan parastîn; bi mêtingeriyan re veguheriye dîroka felaketan. Bi pêkanînên mêtinger û nijadperest, Aborjin ne tenê rûbirûyê qirkirinên fîzîkî mane, di heman demê de çanda wan a ku çavkaniya xwe ji qada wan a jiyanê werdigirt jî ketiye bin xeteriyê. Herî zêde jî zarok li hemberî qirkirina çandî rastî şkandinê hatine. Li çewlikên ku ji bo zarokên Aborjin ên ji malbatên wan hatine qutkirin, bernameyên bişaftinê hatine pêkanîn.

Tabloya bi xwînê xêzkirî ya wan kesên ku ji keşfên erdnîgariyê û hewlên qirkirinê sûd girtîn, îbretî ye. Zêr û zîvên ku bi qirkirinan hatîn bidestxistin, ji hêla hikumdarên Spanyayî ve di nava sed salan de hatine xerckirin. Ji bo xatirê kêfdariya sed salan, çandên deh hezaran sal hatine tinekirin, bi milyonan mirov hatine qirkirin. Zihniyeta qirker a kapîtalîst, ew qas bê karekter e ku dikare ji bo zewqa xwe ya rojekê ev qas bê exlaqiyê bike.

Qirker, tevî ku li hemberî mezinahiya bi bandora a çandên ku wan bi destên xwe tine kirîn heyîrî mabin jî, timî wekî hovên ku divê bên tinekirin dane diyarkirin.

Gelên çermsor ên li deverên din ên parzemînê belav bûbûn jî, di salên piştî wê de xistine nav kategoriya hovên ku divê bên tinekirin. Ji ber ku desthilatdarên Awrûpî yên ku nekarîn têra xwe dewlemendî bi Seferên Xaçperest bi dest bixin, xwestine warekî din ji xwe re bikin welat û jê bixwin. Ji ber vê yekê, Seferên Xaçperestan ên duyemîn li hemberî xwediyên esîl ên Amerîkayê, gelên Çermsor pêk hatiye .

Li hemberî qirkirinan, gelên cîhanê yek dil in. Li hemberî desthilatdarên ji xwînxwariyê têr nabin, bi qasî ku gel ji hev fam bikin, empatiya hev bikin û yekîtiya xwe saz bikin, sedemên têr û tije hene. ji bo ku hemû nirxên di qirkirinan de winda bûyî careke din bên bidestxistin û ji bo ku qirkirinên nû bên astengkirin, divê ji bêexlaqiya kapîtalîzma ku li ser xwîn û can û kedxwariyê mezin dibe re bibêje êdî bes e!

Li vir, rastiya qirkirinê ya ku me hewl da bi çend nimûneyan pênase bikin, wekî rêbaza sereke ya sazkirina desthilatdariyê, bûye navekî din ê şaristaniya dewletdar. Kiryarên qirkirinê yên ku li dijî gelê Cezayîrê, Lîbyayê, Hindistanê, Vîetnamê, Ruandayê, Bosnayê û li gelek welatên din pêk hatîn, nehatine jibîrkirin û di bîrdanka xweragir a mirovahiyê de bi cih bûne. Bûyerên li Iraq, Afxanîstan û Filistînê rû didin, rastiya qirkirinê ya ku sedema wan hegemonyaya kapîtalîst e û rojane pêk tên, radixe ber çavan. Gelê Kurd jî ji ber qirkirinên ku li hemberî wî pêk hatîn, ji xwe biyanî bûye, lê bi saya berxwedana Tevgera Azadiyê, bi heqîqeta xwe re rû bi rû bûye û careke din vejîna xwe pêk aniye. Tevî ku

hê jî qêrîna sed hezaran mirovên ku li Dêrsim, Agirî û Zîlanê hatîn qirkirin, di perika guhan de olan dide, qirkirin hîn jî tê ferzkirin. Lê belê êdî gelê Kurd li hember qirkirinê bi rêk û pêk bûye û ketiye pêvajoyek wisa ku vê dorpêça qirkirinê bi tevahî parçe û pûç bike.

Bi pêşketina kapîtalîzmê re ku keşfkirinên erdnîgariyan, pêdiviyên bazarê, şerên hegemonyayê zêde dibin û di pêvajoya avabûna netewe-dewletan de, gelek qirkirin pêk hatine. Çi bi şer çi jî di serdemên "aştî"yê de, pêkanînên qirkirinê bi awayekî sîstematîk hatine kirin. Divê hemû ev pêkanîn û pêvajo wekî qirkirinê bên pênasekirin. Dibe ku gelek qirkirin bi awayekî fermî hêj nehatibin pênasekirin. Bi taybetî di genetîka avabûna netewe-dewletan de, ji sedî sed qirkirin hene, çi bi qirkirinên çandî çi jî bi yên fîzîkî, netewe-dewletên ku bi mekanîzmaya yekkirinê saz dibin, rastiya qirkirinê bi xwe ne. Lê belê gelek pêkanînên qirkirinê yên netewe-dewleta ku mekanîzmaya tinekirinê ye, di serdema avabûna xwe û keşfkirina erdnîgariyan de, wekî qirkirin nehatine pênasekirin. Têgîna qirkirinê bi Lemkîn re hatiye rojevê û paşê di zagonên navneteweyî de hatiye pênasekirin.

Lemkîn hêj dema li Almanyayê, perwerdehiya hiqûqê didît, di bin bandora qirkirina li ser Ermenan de dimîne, li ser vê mijarê lêkolîn kirine û bi vesazkirinên hiqûqî yên navneteweyî, pêşniyazên sûc-cezayê bi pêş xistine. Di sala 1933'yan de, bi gotareke bi sernavê "Sûcên Barbarîzm û Vandalîzmê" bêyî ku têgîna qirkirinê bi kar bîne, qirkirinê pênase dike ku divê li gor hiqûqa navneteweyî bê cezakirin. Di Cotmeha 1933'yan de, wekî sekreterê Komîsyona Hevkariya Hiqûqî ya Navneteweyî ya Polonyayê beşdarî 5'emîn Konferansa Pevgihana Hiqûqa Cezayê

(Madrîd) dibe û hin beşên gotara xwe li vê derê pêşkêş dike. Ji ber ku dewlet di mijarên sûcan de havkar in û zehmet e di vî warî de biryaran bigirin, pêşniyazên Lemkîn ji hêla Pevgihana Konferansê ve nayên pejirandin.

Rastiya ku Lemkîn pê xemgîn bûye ku di salên Qirkirina Yahûdiyan de dihat kirin û dixwest ev bûyerên wisa wek qirkirinê bên pênasekirin; Qirkirina Ermenan bû. Ji ber vê yekê jî bi encam û kiryarên xwe, afirînerê esasî yê têgîna Qirkirinê, Partiya Îttîhat Terakkiyê û kevneşopiya Dewleta Tirk e ku mîmarê Qirkirina Ermenan bûn. Rafael Lemkîn bi tenê berdevkê vê rastiyê ye.

Rêbazên qirkirinê ku Lemkîn pênase dike, di 8 sernavan de hatine berhevkirin:

1- Qirkirina Siyasî: Li herêmê pêkanîna polîtîkayên guhertina navên kolanan, rêyan, cihên niştecihbûnê, heta navçe û bajaran diçe.

2- Qirkirina Civakî: Bi taybetî rewşenbîr û entellektuelên grûbên tên hedefkirin: Ji ber ku ew wek rêberên grûbên rêxistinkerên fikrî yên berxwedanê tên dîtin.

3- Qirkirina Çandî: Axaftina zimanê gelê li herêmê, li dibistanan tê qedexekirin û weşangeriya wan a bi zimanê wan tê qedexekirin.

4- Qirkirina Aborî: Dema hêza aborî ji destê komê bê standin, hedefa wan ew e ku tenê karibin li jiyanê bimînin-bijîn, bi vî awayî pêşketina çandî ya grûba neteweyî tê astengkirin, asta fikirîna wê tê xistin û mijûlbûna wê ya bi pirsgirêkên neteweyî re tê astengkirin.

5- Qirkirina Biyolojîk: Armanc jê, kêmkirina nifûsa grûbê û astengkirina jidayîkbûnan-welidînê ye; ji hêla din ve zordariya li ser malbatan ku nikaribin bixwin û vexwin, bêqût bên hiştin, hem rê li ber kêmbûna welidînê vedike û hem jî şansê mayîna zarokên biçûk ên malbatên bêqût, li jiyanê pir kêm dike.

6- Qirkirina Fîzîkî: Ji bo ku rê li ber bêhêzbûna fîzîkî veke, heta ji bo ku kom bi tevahî ji holê bê rakirin, hemû rêbazên cihê bêyî dudilî dixin dewrê.

7- Qirkirina Olî: Ji ber ku di nav civakê de bi bandor in, qedexekirina ol, tehrîbata sîstematîk a li kilîseyan û meqamên din ên baweriyan pêş dixin.

8- Qirkirina Exlaqî: Li şûna ku endamên komê li pey projeyên neteweyî bikevin, berê wan dide qadên hêsan, bo mînak pasîfîzekirina bi alkolîzmê û tiştên din ên wekî vana(29) .

Neteweyên Yekbûyî ku li navenda vê pergala cîhanê ye, ji xebatên Lemkîn sûd wergirtiye û di 12’ê Rêbendana 1951’ê de biryara sûcê qirkirinê derxistiye. Li gorî vê biryarê:

“Li gorî vê peymanê, bi armanca ku komeke neteweyî, etnîk an jî olî qismî an jî bi tevahî ji holê were rakirin, kiryarên li jêr hatine destnîşankirin, wekî sûcê qirkirinê tên dîtin:

a) Kuştina endamên girêdayî grûbê-komê

b) Xisardayîna ciddî ya bedenî û zihnî ya li ser endamên komê

c) Bi armanca ku kom bi awayekî fîzîkî, qismî an jî tevahî ji holê bê rakirin, bi qest guhertina şert û mercên jiyana wan.

d) Girtina tedbîrên pêwîst ji bo astengkirina welidandinên di hundirê komê de.

e) Zarokên endamên komê, bi zorê neqlî komeke din bên kirin. (30(

Li gor çarçoveya komên ku sûcên qirkirinê li ser wan tên kirin; komên neteweyî, etnîk, olî, nijadî û komên sabît û bi îstiqrar, komên aborî û civakî, komên zimanî, komên zayendî, pîr û kal, astengdarên bedenî yan jî zihnî, wek kategorî dikare werin destnîşankirin.

Wekî encam, tê dîtin ku Rêber Apo têgînên "mêtingerî" û "emperyalîzm" ên ku berî niha pir bi kar anîne, di parêznameyên xwe yên dawiyê de, zêde bi kar neanîne. Tevî ku meqbûlîbûna van têgînan hêj jî heye, têgînên wekî "Hegemon" û "Qirkirin"ê zêdetir tên bikaranîn. Sedema wê jî ew e ku têgîna mêtingeriyê, rastiya Kurdistanê bi awayekî berfireh nikare îzah bike. Ji ber vê yekê jî Rêber APO dibêje ku; ji bo desthilardariya hegemonîk a navendî "teoriya sereke ku gelekî tîne ber delavê qirkirinê, rave û ronî bike ev e (31)".

Nexwe divê bê diyarkirin ku teoriya bingehîn a ku pirsgirêka Kurdan bi me dide famkirin û ronîkirin; qirkirin û desthilatdariya hegemonîk a navendî ye. Ji ber vê yekê jî rewşa li Kurdistanê naşibe ti pergalên mêtingeriyê yên din. Di demên berê de, ev mijar di bin sernavên têgînên wek "neteweya bindest, îlhaq, mêtingerî" û hwd de hat nîqaşkirin. Ji ber vê yekê jî divê rewşa Kurdistanê bi welatên wekî Afrîqa û Latîn Amerîkayê re neyê muqayesekirin. Lewma, li şûna têgîna "mêtingerî"yê, divê em têgîna "qirkirin"ê bigirin dest ku rastiya desthilatdarî-

dewleta ku xwe li ser rastiya welatê me ferz dike, radixe ber çavan.

# BEŞA DUYEM ÇARÇOVEYA TEORÎKÎ

## A- Li Ser Têgîna Teoriyê

Theoria, îdeolojî, bi Yûnanî tê wateya ‘zanista zanînê-Ilmê zanînê.’ Dikare wekî nêrîna îllahî, nêrîna tevahî jî bê nirxandin. Nezeriye, bi Erebî tê wateya nêrîna bihêz, bi bandor û tevahî. Bîrdozî wateya wê ya bi Kurdî ye. Lêgerîn kûrahiya zanistî ya zihniyetekê tîne ziman. Dozvan tê maneya lêgerînê. Doz tê maneya daxwazî, armanc û têkoşîna bawerî pê heyî. Bîrdoziyê jî mirov dikare wekî tîrbûna hişmendî û ramana têkildarî armanca dozekê bigire dest û şîrove bike.

Teorî, komek ramanên sîstematîk ên têkildarî hev, hevgirtî û disîplînîzebûyî ye. Teorî xwe dispêre rêgezên diyar. Teorî, gelek bûyerên bi awayekî rêk û pêk hatîn sazkirin û yekbûna rêgezan e ku xwe li ser zanistekê ava dike. Teorî, birêkûpêkkirina pênaseyên di asta têgînî de îfade dike. Teorî, ku di heman demê de wekî şêwazek ê ramanê yê sîstematîk jî tê dîtin, bi qasî hêza têgihiştina mirovî, yekparebûna hebûn, bûyer û rastiyan ji perspektîfek berfireh girêdana wan bi hev re, rave dike .

Raman, çi li ser bingehekî maddî, çi jî li ser bingehekî manewî be, asta şîrovekirin û îzahkirina raman, têkildarî têrbûna teoriyê ye.

Heke mirov ji têgînê re bêje stûna avahiyê, teorî jî modêla avahiyê ye. Ji vî alî ve teorî hişmendiya dîrokî ya nêrîna li hemberî gerdûn, xweza û mirovan e.

Teorî, pênaseyeke nêzîkî têgîna paradîgmayê ye, lê ew ne paradîgma ye.

Paradîgma rêzbendiya nirxan e, ji bo pirsgirêkên zanistî yan jî civakî, modêlên çareseriyê pêşkêş dike. Ji bo ku em bigihêjin armancên xwe yên civakî, rê û rêbaz û amûrên ku bên bikaranîn; pênase û diyar dike.

Ji ber vê yekê, teorî ne paradîgma ye. Ji bo ku bibe paradîgma, divê nû û resen be û ev nûbûn divê ji bo xebatên siberojê karibe bibe çavkanî. Di encama vê de, serdema paradîgmaya neasayî tê. Paradîgma, hemû pêkhateyên ku ji pêvajoyên krîzan derketîn holê, careke din digire dest. Dema çareseriyan derdixe holê, bi yên berê re muqayese dike û di encamê de pergaleke resen derdikeve holê.

Derbarê pênaseyên li ser teoriyan tên pêşxistin, ev pêşketin di pratîkê de çawa rû didin û di derbarê cudahiyên heyî de, mirov dikare van tiştan bibêje.

Ji dîroka fermî ya şaristaniyê ta roja me ya îro, di bingeha têgîn û piraniya teoriyên cihêreng ên siyasî û civakî yên bi etîmolojiyê re ava bûyîn de, îllahîbûn heye.

Dema desthilatdaran saziyên dewletê pêş dixistin, hêmanên civakî înkar dikirin û hêmanên bi destê xwe ava kirîn jî, miqedes kirine. Û wekî encam, di bingeha têgîna siyasî ya hatî avakirin û pêşxistin de, têgînên di asta “Zanista îllahîbûnê” de hatine pêşxistin. Teoriyên xwe jî bi van têgînan sîstematîze kirine. Şaristanî û olên destpêkê, lîteratura xwe ya civakî di armanca vê hevsengiyê de saz kirine .

Têgînên bi serdema kapîtalîzmê re hatîn pêşxistin, di bin navê “zagonên zanistî” de hatine pîrozkirin. Felsefeya rojava, li

ser rasyonalîzmê pêş ketiye. Zanîna ku di ceribandinan re derbas nebûbe û nehatibe îspatkirin, wekî zanîna rasyonel qebûl nake.

Aha rojava, tertîba xwe ya têgînan li gorî vê realîteyê ava dike. Teorî û paradîgmaya xwe li gor têgînên hatî îspatkirin saz dike. Fîlazofên serdema Ronakbûn û Ronesansê, lîteraturên xwe yên felsefî û siyasî di armanca vê hevsengiyê de saz kirine.

Di encamê de, bi vê lîteraturê, pîrozî û berzî dîsan xirabî û barbar-paşverû hatin pênasekirin. Kapîtalîzmê “ferd” wekî pîrozî da diyarkirin. Got ku heke ferd wekî pîrozî neyê dîtin, pergal nameşe. Lewma Kapîtalîzmê mîrateya xwe ji çanda Greko-Romenê wergirt. Şaristanî ji Ewrûpayê dan destpêkirin. Yên derveyî vê wekî barbar, hov, paşketî û nezan hatin dîtin û înkarkirin.

Marksîzm, sosyolojiya ku xwe dispêre felsefeya Alman; ekonomî-polîtîkaya Ingilîz, ronakbûn û rasyonalîzma Fransayê jî, ji xwe re wekî mîrateyê qebûl dike. Tegîn û teoriyên xwe li gorî vê pêş xistine. Marksîzm çîna kole, karker, bindest û gundî wekî pîrozî dibîne. Her tiştî bi mercên maddî re têkildar dike. Çînan jî wekî dehfînerê mercên maddî dibîne. Di nav çînan de jî çîna proleteryayê derdixe asta xwedatiyê. Bêyî berz û pîrozkirina “çîn”ê, pêşketina pergala sosyalîzmê mumkin nabîne. Ji ber vê yekê jî lîteratureke têgînî ku civaka dîrokî nabîne û ji mîrateya Şaristaniya Demokratîk bêpar, pêş xistiye.

Di olan de “Xweda” hat miqedesekirin. Gotin, bêyî “Xweda” ev pergal ava nabe û nayê meşandin. Pêvajoya berî olên semawî wekî kaosê hat pênasekirin û gotin; “Dîrok bi Îbraniyan dest pê dike.” Ev mîrateya wan e. Di dawiyê de, lîteratura xwe ya

têgînî ya bi navê ‘hemû ol’ pêş xistin û teoriya xwe spartin van têgînan.

Di encamê de, herçend e ku teorî û têgînên cuda jî bin, li heman dergehî sekinîn. Lewma her çi qasî bê gotin bi nêrîn û ramanên cuda, armancên cihê hedef kiribin jî, di heman xalê de gihiştin hev. Ji ber ku di warê watedanê de, ti cudahiyek wan di warê têgînî de tine bû.

Xalên hevpar ên van dîtin û nêrînan hema hema bibêje wekhev bûn. Teoriyên cuda yên ku di encamê de civak ji cewhera wan dûr dixistin û ew di bin pencên desthilatdariyê de dihiştin, heman paradîgmayên têkçûyî yên ku heqîqetê parçeparçe dikin, dewlet, desthilatdarî û serdestiyê miqedes dikin û hemû xirabiyan derveyî dewletê didîtin, bûn.

Mîrateya şaristaniya demokratîk jî, heqîqetê bi awayekî giştî digire dest. Di serî de anîmîzm, mîtolojî, felsefe, ol, zanist û hûner hemû şêweyên zanînê, wekî aqlê hevpar ê mirovahiyê digire dest. Xwe dispêre nirxên civaka xwezayî ya komînal ên ku derveyî şaristaniya hegemonîk in ku heta roja me ya îro hatine. Hemû hêmanên civakî yên ji derveyî pergala dewletperest mayîn, ji xwe re kirine palpişt û mîras.

Di serî de ruh, zihn û îradeya xwezaya civakî baş analîz dike. Bi vî ruhî re, destpêkê civaka xwezayî, tevgerên çandî, etnîsîteyan, tevgerên ol û baweriyan, komên eşîret û qebîleyan, tevgerên jinên azadîxwaz, tevgerên hawîrdorparêz û ekolojiyê, tevgerên sosyalîst û demokratîk, tevgerên anarşîst, tevgerên exlaqî û felsefî, tevgerên çîn û neteweya demokratîk, hemû avanî û ramanên ku hebûna civakî dihewînin, ji xwe re wekî mîras esas digire. Lewma bi nûbûna sosyolojiya hatî pêşxistin re, ew

rêxistinkirina yekeyên nerêxistinkirî yên belawela û yên derveyî pergalê mane û tevlîkirina wan a nava sazûmaniya xwe, esas digire. Di çarçoveya vê pergalê de, pêşxistina têgîn-teoriyan ji xwe re dike armanc.

Di bingeha ku timî Rêber APO behsa têgîn û teoriyê dike de, ev rastî heye. Ji ber vê yekê jî Rêber APO paradîgmayek cuda, ji berê qutbûyî pêş xist û paradîgmaya xwe teorîze kir. Sedema bingehîn a ku ev qasî li ser têgîn û teoriyan radiweste jî ji ber vê yekê ye.

# B-Nêzîkatiyên Teorîkî Yên Paradîgmaya Şaristaniya Demokratîk

## 1- Desthilatdariya Hegemonîk A Navendî

Koka peyva têgîna hegemon, ji hukm, hakim û desthilatdariyê tê ku serdestî û tehekumê îfade dike. Hegemonya yekxwedatî ye. Di nav olan de pirxwedatî hebû ku ev veguherî yekxwedatiyê. Hegemoniya tek jî, ji yekdestdariya piralî derbasbûna yekdestdariya tekane, pêş ketiye. Ango hegemonya; têkiliyên hiyerarşîk ên pergalên desthilatdar û dewletdar îfade dike.

Hegemonya pergaleke desthilatdar e ku di têkiliyên navneteweyî de di asta leşkerî, îdeolojîk û aborî de serdestiyê di destê xwe de digire. Pergaleke hiyerarşîk a xwedî erk û hakimiyet e ku vê yekê wekî hêzeke sereke pêk tîne.

Di hegemonyayê de, pergaleke hiyerarşîk a berevajî wekheviyê, ji yekem û duyeman pêkhatî heye. Lewma di nav desthilatdariyan de, hegemonya desthilatdarê sereke ye. Hêzeke wisa ye ku xwe dike navenda desthilatdariyê, xwe li desthilatdarên din dide qebûlkirin û rizamendiya desthilatdarên din distîne. Ji ber vê yekê, her desthilatdar dixwaze bibe hegemonîk.

Vê nêrînê xwe gihand hemû zanistan. Erêkirina îdeolojîk û felsefîk a van nîqaşan jî heye. Koka hemû nêrînan spartin zanista pozîtîvîst û dewletdariyê. Bi vê şêwaza nêrînê, analîz û

dahûrandineke rast û têkûz derneket holê. Civaknasên mîna Gunter Frank, Antoni Giddens nêrîn û şîroveyeke nû li dîrokê zêde kirin. Tevî ku kapîtalîzm baş nirxandin û di heman demê de nirxandinên xurt ên dirokî jî kirin, lê wan an kapîtalîzm bi qasî 500 salan girtin dest an jî ew bi rabirdûyê ve aliqî man.

Wallerstein û Gunter Frank, dîrok ji têkiliya zeman û mekan qutbûyî girtin dest. Xwendineke wan a dîroka civakî ya bi hev ve girêdayî tine bû. Bo nimûne: Wallersteinî 500 salên kapîtalîzmê bi awayekî kûr dahûrandiye, lê dahûrandina mekan û zemanê borî îhmal kiriye. Gunter Frank di dahûrandina zeman û mekanê borî de kûr û xurt e, lê ji ber 500 salên dawiyê jê kêm e, derketiye holê ku teza wî ya dibêje 'hêza navendî ya dawiyê ya hegemonîk wê bişemtie navendên din' wekî tezeke şaş derketiye holê.

Bi awayekî giştî, bi nêrîna nevendî ya Awrûpî analîzên li ser dîrok û civakê, zeman û mekanên serdemên Sûmer, Babîl, Asûr, Fenîke, Atîna û Romayê, bi awayekî ji hev qutbûyî girtine dest. Dema Sûmerî rûxiyan, Asûr, Babîl û Fenîkeyî rûxiyan. Rûxandina wan bi wan mekanan re hate sînordarkirin. Baş e, mîrate û çanda wan şaristaniyan bi kû ve çû? Veguherîn çi? Ev analîz nekirin. Ji ber vê yekê jî şaristaniya Ewrûpayê ji van qutbûyî girtin dest. Bi qasî 500 salan bi sînor kirin. Pênaseyên wan ên hegemonyayê yên li ser kapîtalîzmê gelek xurt in, lê zincîra dîrokî ya bi hev ve girêdana zeman û mekan a hegemonyayê analîz nekirine, ji ber vê yekê karektera desthilatdariya hegemonîk nedîtin.

Rêber APO, ji hemû nêrîn û ramanên erênî sûd wergirt û di têgihiştina xwe ya dîrokê de ber bi  sererastkirinek nû  ve çû. Lewra Rêber APO pergala 500 salî wekî 5000 salî berfirehtir û

kûrtir kir. Şaristaniya navendî wekî xelekên zincîrekê girt dest û nirxand.

Bi kurtasî, danehevên civakî yên li Toros û Zagrosan teşe girtîn, vediguherin çanda Til Xelef, ji wir jî bi çanda El Ubeyd a ku dikeve Mezopotamyaya jêrîn re dibe yek. Tevna çanda El Ubeyd, ji cewhera xwe taybetmendiyan zêde dike û dikeve dirûvê xisleta şaristaniya navendî.

Şaristaniyê ji B.Z 4000 salan ta roja me ya îro, her tim navenda xwe guhert û li derdora her navendê ji xwe re qad çêkirin (lê belê cewhera wê qet neguherî) û wekî pergaleke cîhanî teşe girt.

Desthilatdariya hegemonîk a navendî, di serdema Sûmeriyan de pêş ket û berfireh bû. Mijara me ne kapîtalîzm e, lê haveyn û maka destpêkê ya kapîtalîzmê, mekanê desthilatdariya dewleta Sûmeriyan e. Rêber APO haveynê kapîtalîzmê wekî 'şebekeyeke di derzên civakê yên exlaqî, olî û mîtolojiyê de veşartî û timî li pey keysbaziyê, lê keysê nabîne' pênase dike.

Hin taybetmendiyên hegemonyaya navendî hene. Ji ber vê sedemê jî her hêz nikare bibe hegemonya navendî.

1. Taybetmendiya herî girîng a şaristaniya navendî, afirêneriyeke îdeolojîk e. Bêyî îdeolojiyê, hegemonya çênabe.

2. Hemû danehevên ekonomîk û maddî di bin yekdestdariya wê de ne. Ango xwediyê navenda aborî û desthilatdariyê ye.

3. Hêza wê ya leşkerî heye. Divê hêzên wê yên leşkerî pir bi hêz bin.

Taybetmendiyên herî bingehîn ên hegemonyaya navendî ev xalên li jor in. Lewra desthilatdarî dixwaze bibe hegemonya, lê her desthilatdarî ne hêzeke hegemonîk e. Taybetmendiyên herî sereke yên hêza hegemonîk jî ev in:

1 .Desthilatdariya hegemonîk a navendî wekî pergaleke cîhanî xwe dide avakirin.

2 .Desthilatdariya hegemonîk a navendî, bi navenda aboriyê re dibe yek.

3 .Pergaleke ku xwe dispêre pêkanîna derdoreke navendî.

4 .Temenê her pergaleke hegemonîk heye, pergaleke ezel-ebed nîn e.

5 .Pergal di dawiya temenê xwe de qeyranan dijî.

6 .Di encama kaos û tengezariyê de, desthilatdariya hegemonîk a navendî cih diguhere. Ji hêzên hawîrdorê yek derdikeve pêş, dibe navenda nû ya hegemonyayê. Çendîn navend hatibin guhertin jî, xisleta pergalê nayê guhertin.

7 .Desthilatdariya hegemonîk a navendî di warê zeman û mekan de, wekî xelekên zincîrekê bi hev ve hatine girêdan.

8 .Pergal di zeman û mekan de valahiyê qebûl nakin.

9 .Xwe dispêrin daneheva mêtingerî û sermayeyê.

10 .Wekî çemekî sereke herikiye heta roja me ya îro. Pergala desthilatdariya hegemonîk a navendî, ne 500 xwediyê dîrokek 5000 hezar salî ye.

11 .Çawa ku hinek bask hene tevlî herikîna robarê sereke yê desthilatdariya hegemonîk a navendî dibin, robar, gol û hwd li derdora wê jî peyda dibin; wekî şaristaniyên Çîn, Rûs û Germenan. Lê ev rewş nikare pergalê ji yekparebûnê yan jî ji rewşa wê ya ku bûyî pergeleke cîhanî derxîne.

12 .Desthilatdariya hegemonîk a navendî, xwe bi îdeolojiya hegemonyayê zexm û bi gewde dike. Olperestî yan jî netewperestî, şêweyên sereke yên vê hegemonyaya îdeolojîk in. Di çanda rojhilatê de, bihevrebûna text-perestgehê, wekî taybetmendiyeke qedîm hebûna xwe parastiye.

Lewra di vî warî de, navenda destpêkê ya hêza hegemonîk Sûmerî ne. Û wekî navenda pêkhatina hemû hegemoniyan tê hesibandin. Navenda bazirganî û yekdestdariyên destpêkê, Ûrûk e. Hemû rê û pêşketin di Ûrûkê re derbas dibin. Di derbarê navenda hêza hegemonîk û guherîna navendên hêzê yên têkildarî derdorê, mirov dikare van tiştan bide xuyakirin.

Ûrûk bajarê yekem ê Sûmeriyan bû. Wekî asta temsîliyeta destpêka şaristaniyê ye ku temsîla serdemeke nêzî hezar salan dike. Temsîlkarê yekem ê şaristaniyê ye û dema ku derketî hola dîrokê, li ti deverên cîhanê ne bajarek, ne jî şaristaniyek tinebû. Piştre li gelek cihan rewşên bi vî rengî derdikevin holê.

Piştî ku Ûrûk hezar salan bû navenda şaristaniyê, li derdora wê ji ber pêşketinên di hundirê wê de, bi dehan bajar derdikevin holê. Ji ber ku piştî şaristaniyê xwe li deverekê ava dike, hebûna

xwe li ser bingehê bidestxistina desthilatdarî û berhemê zêde didomîne. Heke daneheva desthilatdariyê ya şaristaniyê pêş nekeve, têkeve rewşek wisa ku nekaribe hilberîna berhemê zêde pêk bîne, krîz û tengezarî dest pê dike. Li cihên ku krîz û tengezarî dest pê bikin jî, yan şaristanî wê bi lêgerîneke nû xwe îfade bike yan jî wê têk biçe û hilweşe. Ev jî pêvajoya emperyalîzmê ya dagirkirina cih û mekanên derdorê derdixe holê.

Di nava mudetê 500 salan de, bi desthilatdariyê û daneheva berhemê zêde, taybetiya xwe ya hêza temsîlkariyê ya tekane parastiye. Di asta herêmî de, desthilatdariya bajarekî bi tenê ye, lê çanda xwe ber bi Misir, Mezopotamyaya Jêrîn, Hindistan û heta Îranê berfireh û gerdûnî kiriye. Piştî 500 salan, Ûrûk hem ji hêla temsîlkariya desthilatdarî ve û hem jî ji hêla rêjeya bidestxistina qezencê ve, dikeve pêvajoyeke paşketinê û krîz dest pê dike.

Ji ber vê yekê, çavkaniya bingehîn û navenda hêzê B.Z 4000 salan li Ûrûkê derketiye holê. Çavkaniya destpêkê û bingehîn ew der e, bingeha wê çîn e, bajar e û dewlet e. Temsîla wê ya şaristaniyê, bi van sê têgînan tê destnîşankirin. Piştî hezar salan li hawîrdora xwe bajardewletan pêk tîne, çawa ku çavkaniya bingehîn ew e, bûye sedem ku li wê derê cihwarbûn jî çêbibe. Li ser hîmê sêgoşeya çîn, bajar û dewletê, gelek bajardewlet hatin avakirin. Piştî vê pêvajoya hezar salên ku bajardewlet jiyayîn, B.Z di salên 2000’an de, Asûriyan tevî Babîliyan temsîlkariya şaristaniyê bi dest xistin.

Ji ber vê sedemê, rewşa gerdûnîbûnê yan jî rewşa herikînê ya robarê sereke, ne rewşa pêkhatina çend diyardeyên ji hev qut e. Rewşa gerdûnîbûnê, rewşa mezinbûn û pêşketina bi hev ve

girêdayî ya organîk e. Çawa ku wekî bajarekî tenê serdemeke civakî pêş xistiye, divê were dîtin ku piştî vê gelek bajardewlet derketine holê.

Rêber APO, çawa ku pêşketina dîroka şaristaniya hegemonîk a navendî bi awayekî gerdûnî girtiye dest, di heman demê de materyalên ku xelekên vê pêvajoyê şênber dikin destnîşan kirine. Lewma jî herikîna çemê serekê yê şaristaniyê, li ser vê çavkaniyê, şeklekî ku valahiyekê çêneke, hatiye pêşxistin.

Navenda yekemîn, dewleta Sûmerî ya Ûrûkê ye.

Navenda duyemîn, hemû bajardewletên ku bi Sûmeriyan re ava bûyîn.

Navenda sêyemîn, Babîl e.

Navenda çaremîn, Asûr e.

Navenda pêncemîn, Pers in,

Navenda şeşemîn, Grek û Romayî ne.

Navenda heftemîn, olên yek xwedayî yên hatîn serdestkirin in.

Navenda heştemîn, Ewrûpa ye.

Dema ku her navend herikîna çemê xwe dewr digire, bi xweseriyên xwe yên ku bi ser wî çemî zêde kirîn, di cîhanê de dibe pergalek.

Sûmerî, dema di dewleta Ûrûkê de derketîn holê, dewleta Ûrûkê hêzeke tekane bû. Bi çîn, dewlet û amûrên zordariyê yên dewletê ve, hêza temsîlê bû. Bi dagirkerî û çandê berbelav dibû

û mohra xwe li pergala cîhanê dixist, her ku diçû zêdetir dewlemend dibû û temsîla pergalê dikir.

Lê bi derketina Sargon ê bi eslê xwe Akadî yê di qesrên xwe de gihayî û mezinbûyî re, pergalên bajaran ketibûn astek wisa ku êdî nedikarîn temsîla şaristaniyê bikin, Sargon hemû bajaran di nav pergala împaratoriyê de li hev dihewîne û rengekî nû dide şaristaniyê. Rengê ku Sargon dabûyê, di serdema wî de dihat wateya pergaleke nû ya cîhanî.

Piştre, kevneşopiya ku Împaratoriya Sargon afirandî, di serdema Babîl û Hemmosrabiyan de xisletekî pir pêşketîtir wergirtiye. Piştî ku şaristanî derbasî Asûriyan dibe, bi bazirganiyê dewlemendtir dibe û wekî pergeleke cîhanî xwe dide der.

Med û Pers, vê şaristaniya bi hezarê salan jiyayî dewr digirin û li herêmên ku şaristaniya kevnar lê hebû, serdestiya xwe derdixin asteke hê bilindtir. Bi vî awayî, şaristaniyê dibin heta Anatolyayê, Iyonyayê, Grekê û Makedonayê û pergala cîhanê berfireh dikin.

Şaristaniyê wekî herikîna çeman tim navend guhertine, lê her navendekê cewhera xwe tevlî kiriye û bi dewlemendkirin û gerdûnîkirinê, şaristanî veguherandine pergaleke cîhanî.

Em têgîna “navend” û “hawîrdor”ê ji ber vê xisleta şaristaniyê digirin dest û dinirxînin. Di pêşketina dîroka gerdûnî de, pêkhateyên hawîrdorî yên ku li gorî navendê teşe girtîn hene. Têkiliyên navend û hawîrdorê, di nav pergala herikîna robarê şaristaniya navendî de pêk tê. Pergala herikîna robar, rê li ber guherîna navendan vekiriye, her navendekê ji xwe re hawîrdorek çêkiriye û xwe gerdûnî kiriye. Ji ber vê yekê, têkiliya navend û

hawîrdorê xisleteke gerdûnî ye, ne tenê taybetmendiyeke girêdayî sazûmaniya şaristaniyê ye.

Lewma, têkiliya navend û hawîrdorê, di dîroka gerdûnî de pîvanek e. Ev diyarde navendekê nîşan dide, her navendek bi girêdana xwe ya hawîrdorê re heye. Li vir navendek heye, ji bo ku ev bibe navend, divê hawîrdora wê hebe. Heke ev navend bi bandorbûna derdora xwe bikare hawîrdorekê çêbike, dibe navend û hemû gerdûnîbûn bi têkiliya navend-hawîrdorê derdikevin holê, bêyî têkiliya navend û hawîrdorê jixwe gerdûnîbûn çênabe.

Dema li cihekî diyardeyek derkeve holê, derdora xwe bandor bike û bi vê re hawîrdorekê ava bike, ev hawîrdor jî ji nişka ve li pey xwe hawîrdoreke din ava bike û xelek bi xelek mezin bibe, tê wê wateyê ku bi têkiliya navend û hawîrdorê, gerdûnîbûnek derketiye holê .

Têkiliya navend-hawîrdorê û xisletên pêşketinê yên desthilatdariya hegemonîk a navendî, di du qadên bingehîn ên xebatê de pêş dikevin. A yekemîn, pevçûnên bi bajardewletên piştî Ûrûkê çêbûyî, ya duyemîn jî pevçûnên bi etnîsîteyên ku bi dînamîzma xwezayî çêbûyî ye. Û ev pevçûn jî bêrawestan bi awayekî domdar pêk hatine.

Me krîterên hegemonyayê li jor destnîşan kiribûn. Bo nimûne, bajardewletê Ûrûkê mîna yekdestdariyê pêş ketiye û navenda her tiştî ye. Ji bo ku ev navenda hêzê bibe hegemonya, divê derdora xwe yan bi zorê yan jî bi rizamendiya wan, bi xwe ve girê bide. Ji ber vê yekê jî hegemonyaya desthilatdariyê mecbûr e têkilî û nakokiya xwe ya navend û hawîrdorê pêş bixe.

Her wiha taybetmendiya desthilatdariya hegemonîk a ku modêlên xwe li derdora xwe belav dike jî heye. Rêbaza vê, li ser bingehê “Xweserdestkirinê” ye, ku ev jî yan bi îqnakirinê yan jî bi îstîla û dagirkeriyê pêk tê. Dema vê pêş dixe, sedemên maqûl diafirîne. Çîroka Enkîdo û Gilgamêş mîna çîroka têkiliya navend û hawîrdorê ya hemû hegemonyayan e. Îro DYA (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê) ya ku serkêşiya hegemonyayê dike, têkiliya hawîrdorê li ser navê “şaristanîbûnê”, demokrasiyê û azadiyê pêk tîne. Têkiliya YA’yê (Yekîtiya Ewrûpayê) û hawîrdorê jî li ser vî bingehî ye.

Şaristaniya navendî çima krîzan dijî û krîzan çawa çareser dike?

1-Bi sazkirina navend-hawîrdorê û pêşxistina qadên hegemonyayê

2 -Bi pêşxistina teknîk û rêbazên hilberînê

Hemû hêzên şaristaniyan hem ji bo ku xwe berfirehtir bikin hem jî ji bo krîzên xwe çareser bikin serî li van her du rêbazan didin .

Dîsan jî hemû pêvajoyên şaristaniyan nekarîne xwe ji krîz û kaosan rizgar bikin. Lewra şaristaniyên desthilatdar bi xwe, ji ber taybetmendiyên xwe sedemên krîzan in.

Navenda desthilatdariya hegemonîk, bingeh e. Li cihên din jî navendên desthilatdariyê hene, lê navenda hêza bingehîn hegemoniya ye. Ji bo ku hêza hegemonîk li ser pêyan bimîne divê dest biguhere. Hêza hegemonîk a navendî dema nikaribe pirsgirêkên navxweyî çareser bike, ji ber ku dizane wê di bin de bimîne, ji bo pergal jê zirarê nebîne, hêzên hegemonîk ên

navendî yên din, hêzê vediguhêzin hawîrdorê û wisa dikin ku hegemonya dest biguhere. Hegemonya ji bo xwe berdewamiyeke zincîrî dixwaze û valahiyê qebûl nake.

Hêza hegemonîk a navendî, heke israrê di dest neguhertinê de bike, Ji ber ku dizane di encama nerazîbûnên navxweyî û êrişên derve yên hêzên etnîsîteyî û hêzên demokratîk de, wê hegemonya wê têk biçe û ev hêz wê werin ser desthilatdariyê, dest guhertina hegemonyayê wekî taybetiyek a qanûna desthilatdariyê dibînin.

Mijareke din jî heye ku ew jî rakêşiya berjewendîparêziyê ya di navbera hegemonyaya navendî û desthilatdarên hawîrdorê de ye. Polîtîkaya berbelavbûnê ya pergala hegemonyaya navendî, dibe sedema pirsgirêkên berjewendîparêz. Wekî pêwîstiyek a xwezaya şaristaniya navendî berjewendiyên wan timî diguherin. Ev jî ji bo navendên desthilatdariya derdorê, dibe sedema nakokî û pevçûnan. Ev nakokî û pevçûn di zanista siyasetê de mijarek giring a nîqaş û guftûgoyê ne.

Berjewendiyên sereke diguherin, hegemonyaya navendî nikare ji pêdiviyan re bibe bersiv, têra hemû mihraqên desthilatdariyê nake, êriş lê tên kirin, şer derdikeve û hegemonya di dawiyê de dest diguhere.

Ev jî şerek ê desthilatdarî û hegemonyayê ye. Ne şerekî ji ber nakokiyeke îdeolojîk e. Ji ber berjewendiyan e. Fikr û îdeolojiya wan heman e. Îro li Rojavayê Kurdistanê nakokî û têkiliya DYA’yê û Rûsyayê ev tişt e. Dema bi vî awayî li desthilatdarî û hegemonyayê were nêrîn, xapandin jî çênabe.

Mirov dikare şopên desthilatdariya hegemonîk ên li dîrokê hiştî, bişopîne û fam bike. Hegemonyaya navendî, qenala sereke ye. Robarên din di asta xwedîkirina vê qenalê de ne. Xeta hegemonyayê ya ji navenda Sûmeriyan hatî, di rewşa qenala sereke de ye.

Di herikîna robarê serekê yê di serdema Sûmeriyan de dest pê kirî de, hin şaxên girêdayî vî robarê sereke çêbûne. Di vê hêlê de, hêza erdnîgarî û leşkerî ya Misirê hebû. Ev hêz gihişt asteke berbelavbûnê jî. Lê, hem ji ber pêşneketina şert û mercên çêbûna hêzeke hegemonîk, hem jî ji ber yekbûna erdnîgariyên ku lê berbelav bûyî, nehişt ku xisletên hegemonîk ên navendî werbigire û di dawiyê de jî bû şaxek ku qenala sereke xwedî bike.

Desthilatdariya hegemonîk a navendî, destpêkê li Sûmer, Babîl, Asûr, Fenîke, Atîna, Roma û li nav şaristaniya Îslamî ya li rojhilat geş bû, piştre Ewrûpa û Amerîkayê dewr girt.

Ewrûpa 500 salan bû hêza hegemonîk. Nekarî zêdetir wê bimeşîne û DYA'yê hegemonya dewr girt. Hêj tê nîqaşkirin ka çima Ewrûpa hegemonya ji dest daye. Sedemên herî sereke jî wek parçeperestî, têrnekirina ji hêla aborî, siyasî û leşkerî ve tên diyarkirin.

Ingilistan li ser bingeha mêtingeriyê li gelek cihan berbelav bû. Ji hegemonyaya Ingilistanê re; “Împaratoriya ku roja wê naçe ava” dihat gotin. Lê belê di dawiya Şerê Duyemîn ê Cîhanê de mecbûr ma ku desthilatdariya xwe ya hegemonîk dewrî DYA’yê bike.

DYA'yê pêşenga şaristaniya navendî ye. Di şerên Yekemîn û Duyemîn ên Cîhanê de, gelek dewlet ji hev ketin û bê hêz bûn.

DYA'yê, xwe li derveyî her du şerên cîhanî hişt lê destek kir. Ji ber vê yekê, hêza xwe ya leşkerî, siyasî, aborî û îdeolojîk xurt kir. Lê belê wê rasttir be ku desthilatdariya hegemonîk a DYA’yê li gel YA’yê bê nirxandin. Ingilistan, hêlên îdeolojîk û aqil ên hegemonyayê; YA, hêla aborî; DYA'yê hêlên leşkerî û siyasî temsîl dike. Lewma divê mirov hegemonyaya dawî, bi awayekî tevahî bigire dest.

Yek ji taybetmendiya hegemonyaya navendî jî ew e ku valahiyê qebûl nake. Her tim ji hêla îdeolojîk, siyasî, aborî û leşkerî ve di êrişê de ye. Xisleta herî bingehîn a hegemonyayê, timî berhevkirina qezenc û sermayê ye. Ji ber vê yekê timî di pozîsyona êrişê de ye. Çinkû valahiyekê bihêle, wê hilweşe. Vê yekê dizanin û ji ber vê yekê jî bi derxistina krîz û kaosan temenê xwe dirêj dikin.

Herçend e ku krîz û kaos zagonek a ku hêza hegemonîk ew pêş xistibin jî, rêbazeke bivê nevê ya hemû cûrên desthilatdariyan e ku serî lê didin. Rêya tenduristbûna dewletekê ew e ku bikaribe nexweşiyên xwe çareser bike. Lewma tişta jê re dibêjin nexweşî, tê wateya krîz û kaosê. Desthilatdarî her tim krîz û kaosan derdixin.

Tişta ku jê re dibêjin nexweşî, diyardeyên wekî tengezariya aboriyê, qeyran, raperînên gelan, metirsiya gefên navxweyî û derve û hwd diyardeyên krîzê yên desthilatdaran in. Her çi qasî karibin van diyardeyan biçewisînin û têk bibin; ew desthilatdarî ew qasî bi tendurist, saxlem û bi hêztir dibe. Wekî nimûne, mirov dikare dewleta Tirk destnîşan bike. Ji ber ku dikare krîz û kaosan derbas bike, bi hêz e. Ji derbeya herî dawî re (15 Tîrmeh) gotibûn;

“Dana Xwedê”. Gelek derdor diyar dikin ku ev derbe plana Erdogan e.

Rêber APO tim behsa “zanîna dîrokê” dike. Di vê babetê de ew dibêje: “Heke dîrokê bizanîn, heke zanîna te ya dîrokê bi hêz be, heke te encamên xurt jê derxistibin û beramberî vê heke hêza te ya çalakbûn, civakîbûn û rêxistinbûnê hebe, hem tu yê karibî baş bibînî hem jî tu yê karibî pûç û vala derxînî”.

Wekî encam; heke mirov bi perspektîfeke yekalî û teng li dîrokê binêre, mirov wê nikaribe herikîna sereke ya çemê hegemonyayê û li hemberî wê jî wê nikaribe pêşketina şaristaniya demokratîk bibîne. Lewra, heke em karibin bi piralî li civaka dîrokî û li navenda şaristaniya hegemonîk binêrin, em ê bikarin şêweyê pêşketina hêzên pêşberî wan jî bibînin.

Heke rastiyek wisa ya dîroka gerdûnî li holê be, wê çaxê em ê nikaribin bi nêrîneke yekalî rastiya cîhan û dîrokê têbigihêjin. Wê çaxê ji bo mirov karibe bibe xwedî nêrîna dîroka gerdûnî û ji bo karibe rastiyê peyda bike, tişta pêwîst zanîna dîrokê ye. Heke hemû ev diyarde tine bên hesibandin an jî navenda Sûmeriyan tine bê hesibandin, dîroka Rojhilata Navîn û Kurdistanê nayê vegotin û nayê famkirin.

Divê mirov bibe xwedî nêrîna dîroka gerdûnî û divê mirov karibe ferasetên dîrokî yên yekalî jî di nav vê nêrîna dîroka gerdûnî de bigire dest. Bi tenê ji dîroka Kurdistanê û dîroka şaristaniya demokratîk em ê nikaribin rastiya cîhanê fam bikin. Lê digel nêrîna gerdûnî em ê bikarin şaristaniya demokratîk û Kurdistanê fam bikin. Ev nêrîna me divê ne di yekalîbûnê de, di gerdûnîbûnê de derkeve holê.

## 2- Desthilatdarî û Rêveberiya Demokratîk

Ji pêvajoya dîroka civakê ta roja me ya îroyîn û ji felsefevanên exlaq em bigirin heta felsefevanên siyasetê, ji sosyolog û fîlozofan em bigirin ta alimên ol û mîtolojiyê, di derbarê têgîna pergala rêveberî û demokrasiyê de nîqaşên wan çêbûne. “Pergaleke rêveberiyê ya çawa?” mijara sereke ya hatî nîqaşkirin e. Ji ber ku serkeftina vê qadê di pozîsyona velivîna destpêkê ya avakirin û birêvebirina pergala civakî de ye. Tevî ku ev, sedemên şer û pevçûnan e jî, lê armanca aqilê siyasî û felsefîk ê li paş vê, dana rewakirina vê ye.

Di derheqê van têgînan de, bi sernavên taybet nirxadinên dûvdirêj hatine kirin. Heke em bi dubarekirinek kurt bidin xuyakirin:

Di bingeha hemû pirsgirêkên civakî de, diyardeya dewlet û desthilardariyê heye. Heta diyardeya desthilatdariyê ya ku xwezaya civakî texrîb dike û wekî nexweşiyekê êrişî wê dike neyê dahûrandin û cudahiya di navbera wê û rêvebirinê de neyê famkirin, avakirineke rast a civakî jî pêk nayê.

Rêveberiya demokratîk heta xwe ji feraseta desthilatdariyê qut neke, wê wekî guloka berfê pirsgirêkan li xwe zêde bike. Formûla çareseriya heqîqî ya pirsgirêkan, qutbûn û rizgarbûna ji rêveberiyên desthilatdar e. Ji ber ku desthilatdarî xwe li ser nebûna xwerêveberiyê ava dike. Heta ku xwerêveberî neyên tinekirin, şansê serkeftina desthilatdariyê nîne.

Civakîbûnê bi têgîna xwerêvebirinê re, ji xwe re qada hebûnê peyda kiriye, hatiye parastin û kariye pêvajoyên herî

dijwar derbas bike. Ji ber vê yekê, heta ku mudaxeleyên dewletperest-desthilatparêz ên derveyî li ser civakan nebin, civak dikarin xwe bi rê ve bibin û xwe bi rêxistin bikin. Serdemên ku ji hêla desthilatdaran ve wekî ‘kaos-anarşî’yê tên binavkirin, her çi qasî bi qelsbûna otorîteya dewletê ve têkildar bin jî, ya rast di bingeh de, pêvajoyên ku desthilatdariyê bi xwe rê li ber vekirine. Desthilatdarî û dewlet bi vî rêbazî, tinebûna xwe wekî ‘alozî’yê pêşan dide, da ku hebûna xwe rewa bike. Halbûkî aloziya civakî ji ber xislet û hebûna rêveberiya dewletperest-desthilatparêz pêş ketiye. Rêveberiya desthilatdar rê li ber gelek pratîkên kirêt vekiriye ku mirov dikare hinek ji wan wisa destnîşan bike: Hemû şerê li ser rûyê erdê çêbûyî; îqtidarparêzî, şêweyên serdestiyê, pêkanînên qirkirinê, koletî, mêtingerî, talankarî, cînayet, alkolîzm, bikaranîna tiryakê, xesp, dînîtî, trawma, destdirêjî, têrnebûna bêpîvan û hwd, pirsgirêkên ku pratîka desthilatdariyê rê li ber vekirîne. Di rastiya xwe de, civakên ku desthilatdarî neketiyê, pirsgirêkên bi vî rengî pir kêm lê peyda dibin. Lewra, her du diyarde li ba hev nabin. Ji vî alî ve, divê em têgîna rêveberiya desthilatdariyê û têgîna xwerêveberî û rêxistina civakî ji hev cihê bikin. Ji ber ku heta ev têgîn baş neyên famkirin, şêwe û cewherê şaristaniyê nayê famkirin.

Şerên rêveberî û desthilatdariyan heta roja me berdewam in. Gelek vegotinên mîtolojîk, qala şerê desthilatdarî û xwerêvebirinan dikin. Rêveberiya desthilatdar; bi zilamê qurnaz, şefê eskerî û tifaqa rahîban li hember nirxên Mezopotamyaya Jêrîn heta Mezopotamyaya Jorîn –ku di serê van nirxan de xwerêveberî heye- her tim êriş pêk anîne. Ev tifaqa sêalî di destpêkê de li ser kesayetiya jinê, hemû dînamîkên cewherî yên

civakî, bi hedefa tinekirinê, êrişên îdeolojîk, siyasî û leşkerî birine serî.

Mînaka vê ya mîtolojîk, di Sûmeriyan de têkoşîna di navbera Enkî û Înannayê de ye. Mînaka duyemîn jî di Babîlan de, têkoşîna di navbera Mardûk û Tîamat de ye.

Şerê Mardûk û Tîamat ê di Destana Vejînê ya Babîlan de cih digire, di esasê xwe de qala têkoşîna di navbera xwerêveberî û desthilatdariyê de dike. Tîamat xwedawenda rûyê erdê ye. Ji ber vê yekê jî temsîla xwerêveberiya di civakê de dike. Di destanê de, xwedayên ciwan bi teqereqê, Absû û Tîamatê aciz dikin. Absû û kurê xwe dixwazin van xwedayên ciwan tine bikin. Ea û Tîamat jî li hemberî vê yekê derdikevin. Xwedayên ciwan vê plana tinekirinê dibihîzin ku muhtemel e Ea'yî ev ji wan re gotiye, ji ber ku Ea rêya çareseriyê nîşanî xwedayên ciwan daye. Ea, bavê xwe Absû bi dermanan ditevizîne û taca li serê wî digire û datîne ser serê xwe. Pişre jî bavê xwe dikuje. Mûmmû jî wî ji pozê wî ve zincîr dike. Pêvajoya rû dayî, pêvajoyeke guhertina desthilatdariyê ya ku bi Ea hatî destpêkirin e. Di vê qonaxê de, Tîamat û Kîngû li hemberî Ea'yî îsyanê derdixin. Ti kes nikare xwe li hemberî Tîamat bigire. Ea dîsa dikeve dewrê û kurê xwe Mardûk derdixe ser dikê. Mardûk bi şertê ku hemû Xweda wî wekî xwedayê tikîtenê û yê herî xurt bibînin, qebûl dike ku li hemberî Tîamat şer bike. Xweda vê teklîfa Mardûk qebûl dikin. Û di vî şerê li ser vê yekê rû dayî de, Tîamat têk diçe û Mardûk wekî ku xwedayan soz dabûnê, pergala desthilatdariya Babîl ava dike. Ev pergala ku hatiye avakirin, desthilatdariyeke hegemonîk a navendî ye ku Mardûk serkêşiya wê dike. Lewra modêla desthilata hegemonîk, li hemberî pergala xwerêveberiya jinê bi ser dikeve û dibe desthilat.

Ev rewş, di kesayetiya jinê de derbeya duyemîn e ya ku li hemberî xwerêveberiyê pêk hatiye. Heke desthilatdarî xwerêveberiyan tine nekin û vê pêvajoyê pêş nexin, nikarin hebûna xwe bidomînin.

Di mîtolojiyê de, derbarê van mijaran de gelek vegotin hene. Em ji tabletê wê serdemê fêr dibin ku desthilatdariyê li hemberî xwerêveberiyê, bi awayekî domdar û sîstematîk êrişan pêk tîne.

Di esasê xwe de, derketina Sargon a ser dikê jî girêdayî nebûna xwerêveberiyan bû. Di çîroka mîtolojîk de tê gotin ku Sargon di ava Feratê de berdidin. Di tabletên piştî wê de, di kesayeta dayîka Sargon de, têgîna "xayîn"ê tê bikaranîn. Heta wê serdemê ji bo jinê rêzgirtin û nirxdayîn hebû, ji ber ku jinê temsîla xwerêveberiyê bû. Çêbûna hêrsek tund a Sargon a li hemberî jinê, têkoşîna desthilatdarî û xwerêveberiyê vedibêje.

Xwerêveberî bi demokrasiyê hene û hebûna xwe bi demokrasiyê pêk tînin. Heke xwerêveberî bi cihêrengî û cûrbicûriyê hebe, ev bi çalakbûna demokrasiyê ve girêdayî ye. Hemû heyîn di civaka xwezayî de xweser in. Heke her hebûn bikare xwezatiya xwe bijî, ew xweser e. Heke nebe xweser, cihêrengî û cûrbicûrî dernakevin holê. Di gerdûnê de jî heke hebûn hebe, bi rêxistinbûna xwe heye. Lewma em ji xwerêvebirina kom û grûbên cûrbicûr ên ew xwe bi xwe bi demokrasiyê xwe bi rê ve dibin re, dibêjin xwerêveberî.

Dewletan di gelek zivrînekên dîrokê de êriş birine ser klan, eşîret û qebîleyan. Tevî ku qebîleyan dizanîn ku ew ê li hemberî êrişên dewletên mezin bi ser nekevin jî, ew teslîm nebûne. Ji ber ku eşîret û qebîleyan dizanîn ku heke xwerêvebirina wan têk

biçe; pê re jî wê azadî, demokrasî û bi hev re jiyana wan jî ji dest wan here. Lewma ew teslîm nebûne. Di van berxwedanan de, prensîba “Yek ji bo hemûyan, hemû ji bo yekî” esas hatiye girtin. Rêveberiya demokratîk cewhera civakê ye, lewma eşîretan berxwedana man û nemanê kirine.

Em mînaka vê rojê ya dîrokî dijîn. Rêber APO xwe wekî ‘Klana Apo’ pênase kir. Ev, prensîba “Yek ji bo hemûyan, hemû ji bo yekî” ye. Ji ber ku zirareke herî biçûk li Klanê bê kirin, tenê ne li hember kesekî/ê, wekî li hember hemû klanê pêk hatibe tê hesibandin. Lewma, komploya li hemberî Rêber APO pêk hatî, wekî li hemberî hemû civakê û siberoja wê hatibe, hat hesibandin. Li hemberî vê komployê, bi dirûşma “Bê Serok Jiyan Nabe!” û lehengiya bi hest û hizrên vê dirûşmê pêş ketî; di dîrokê de mînakên pir kêm peyda ne.

Ji ber ku siberoja gelê Kurd, rûmet û jiyana wî ya azad, girêdayî Rêber APO ye. Ev hestek e, hesta azadî û hebûn-nebûnê ye, ji ber vê yekê gelê Kurd berxwedana man û nemanê bi rê ve dibe. Ev şerê berxwedanê yê xwerêvebirinê û yê li hemberî desthilatdariyê ye. Şerê azadî û demokrasiyê yê gelekî ye ku dev ji daxwaza xwerêvebirinê bernade. Heta ku zanyarên civakî yên heqîqî vê heqîqetê nebînin, nenivîsin, wê nikaribin hebûna civakê bi xwe bibînin û wê nikaribin bizanin ka ev hebûn çawa bûye arîşe û pirsgirêk û wê nikaribin bersivê jê re peyda bikin.

Reel sosyalîzm çima hilweşiya? Hêj tê nîqaşkirin. Li gorî nêrîna modernîteya demokratîk, rêveberiya sosyalîst ji desthilatdariyê qut nebûbû. Heke li cihekî desthilatdarî hebe, li wir an xwerêvebirin tine ye yan jî pir kêm e. Wateya rêveberiya demokratîk, qutbûn û xweşûştina ji desthilatdariyê ye.

Serpêhatiya reel sosyalîzmê, ji ber nebûna demokrasî û nebûna xwerêveberiyê têk çû.

Şoreşa Çînê jî şoreşeke xwedî van îddîayan bû. Di demek kin de bûn desthilatdar û jê qut nebûn. Bertek û dahûrandinên Mao derbarê vê mijarê de hene. Heta ji endamên komîteya xwe ya navendî re gotiye: “Heke hûn xwe rast nekin, ez ê rahêjim çenteyê xwe û li cihê min bi dijmin re şer kirî, ez ê bi we re şer bikim.” Wî dîtiye ku hin tişt şaş bi rê ve diçin. Hatiye dîtin ku wî materyalên wek muzîk û pirtûkan ên pabendî Ewrûpayê jî şewitandine. Li hemberî vê, şoreşa xwe ya çandî wekî çareseriyê pêş xistiye. Herçendî ji bo rêkûpêkbûna karûbaran hin sûd çêbûbin jî; hem pirsgirêkên esasî hem jî yên ferasetî çareser nebûne. Pirsgirêk desthilatdarî bû û feraseteke dest ji desthilatdariyê bernedan hebû. Ya ku xirab dikir û xelas dikir, desthilatdarî bi xwe bû. Stratejiya şoreşa sosyalîst a Çînê jî dewlet û desthilatdarî bû. Armanceke wan a têkbirina desthilatdariyê û qutbûna ji wê tine bû.

Wekî encam, berxwedanên etnîsîteyî û yên gel ên komînal, destpêkê Sûmer, Babîl, Akad, Asûr, Roma û piştre jî qraliyet û monarşiyên Ewrûpayê hilweşandin. Pêkhateyên demokratîk ên ne di bin serdestiya desthilatdaran de, pergalên desthilatparêz rûxandin, lê nekarîn rêveberiyên gel ava bikin. Ev şer û têkoşîn heta roja me ya îro jî hat.

Di roja me ya îro de jî, desthilatdarî xwe li ser dewletên biçûkkirî dimeşîne. Dewlet hatine sînordarkirin û sistkirin. Lê belê desthilatdarî daketiye her derê û ew der hemû dagir kirine. Bi rêbazeke hesas; xwe li kesan, saziyan, civaka sivîl, bi kurtasî xwe

li her derê reşandiye. Hatiye astek welê ku takekes û civakê bi awayekî dilxwazî bi rê ve bibe.

Teoriya modernîteya demokratîk, li hemberî feraseta rêveberiya desthilatdar, perspektîfên xwe yên xwerêveberiyê pêş dixe, vê jî ji jêr ber bi jor ve bi hedefgirtina mekanîzmayên demokratîk ên gel, bi xwespartina rêveberiya demokratîk û sosyolîst û bi pêşxistina pergala Şarisaniya Demokratîk, modêleke alternatîf pêşkêşî gel dike .

## 3- Neteweya Demokratîk

Yekeya exlaqî û polîtîk a civakî, pênaseyeke sosyolojîk e. Bi teoriyên zanistên civakî yên teolojîk û yên di bin navê zanistiyê de hatîn pêşxistin, xwezaya civakî û civaka dîrokî bi aweyekî giştî nayê têgihiştin. Yekeyên zanistên civakî yên mewcûd, nikarin herikîna xwezayî ya pêşketina zimanê çawanî û çendîtiyê (nitel û nicel) yê xwezaya civakî vekolin. Mînak, ji hêla yekeya civaka endustriyel ve, civaka gund û çandiniyê, ji hêla yekeya dewleta neteweyî û lîberal ve jî, bêdewletbûna civakan û dîroka çandê ku xwezaya civakê ne; nayê destgirtin, nayê pênasekirin û nayê dîtin!

Bi nêrîna felsefîk û sosyolojîk a Marksîzmê, şaristaniya navendî ya hegemonîk ya pênc hezar salî û pêvajoya dîrokî ya ku ji %98 ê wê ji serdemên bêdewletbûnê pêk tê, nikare were vekolînkirin. Bi nêrîna xwedayî ya yekeya teolojîk, mirov nikare bersiva pirsa “mirov çawa bûye mirov?” bibîne. Û dîrokiya vê pêvajoyê bi vî rengî nayê lêkolînkirin. Lê ji aliyê yekeya civaka

exlaqî û polîtîk ve, mirov dikare xwezaya civaka dîrokî û pêşketina seridîn û çêbûna wê ya navxweyî fam bike û hel bike.

Di vê derheqê de, Rêber APO wiha dibêje: “Dema em dîroka civakê bi mirovbûnê re, dîroka mirovahiyê bi civakîbûnê re bidin destpêkirin, wê heqîqeta gerdûnê û jiyaneke pir cuda derkeve pêşiya me.” Ji ber ku dema dîroka civakê bi mirovbûnê re, dîroka mirovahiyê jî bi civakîbûnê re mirov bide destpêkirin; mirov dikare her qonaxa vê dîrokê wekî; maweya dirêj, maweya navîn û maweya kurt derxe holê û mirov ê karibe bi awayekî giştî seridîn (peresîn) û guherîna wê ya civakî û xisletên wê yên dualî yên diyalektîk bi awayekî pir tendurist fam bike û xwe bigihîne heqîqeta wê. Di lêkolînkirin û destgirtina civaka dîrokî de, teqez rêbazên taybet ên van nêrîn û hişmendiyan hene. Encama bingehîn a şêwazê van yekeyên sosyolojiyê, rastiya desthilatdariyê ya şer û qirkirina 5 hezar salî ya li ser gelan tê ferzkirin derdixe holê.

Ji ber vê yekê, heke em di yekeya civaka exlaqî û polîtîk de lê binêrin, em ê karibin fêr bibin û bizanin ka ji kîjan perspektîfê û bi çi awayî nirxandina têgîna neteweyê bikin. Pîvana me ya esasî û yekeya me ya zanista civakî, yekeya “Civaka Exlaqî û polîtîk” e.

Rêber APO têgîna neteweyê bi nêrîna; “cîhana çand û zihniyeta hevpar” pênase dike. Pêvajoya civakan a xwe wekî klan, qebîle, eşîret, milet, qewm û netewe ava dikin û pêş ve dibin heye. Ji ber ku pêvajoya pêşketina civakî û pêvajoya wergirtina nasnameyê, bi seridîneke navxweyî û di nav herikîneke xwezayî de teşe digire. Lewma civak bi mudaxeleyên derveyî û bi xweferzkirinan ava nabin.

Heke ev pêvajoya xwezayî nehatiba astengkirin û nehatiba berevajîkirin, wê herikîna xwe û pêvajoya xwe di nav ahenga xwe de temam kiriba. Ev pêvajo hêj berdewam e; bi qasî berevajîkirin-êrişkirina hegemonîk, berxwedana berz a civakan jî berdewam e.

Ji vî alî ve, netewe têgîneke sosyolojîk e. Navê nasnameyeke civakê ye ku di nav pêşketina dîrok û jiyana civakî de, bi awayekî xwezayî civakê kariye xwe pê îfade bike, xwe pê bi nav bike û pê bide jiyîn. Lewma netewe; piştî şêweyên komî yên mîna klan, qebîle, xizim, gel û miletbûnê tê. Şêweyê nasnameyeke civakî ye ku herî zêde bi nêzîkbûna ziman û çandê xwe diyar dike .

Rêber APO pêvajoyên qewm û neteweyan bi berfirehî nirxandine. Heke em kurteya nirxandinên wî yên roniyê didin dîrokê yên têkildarî vê babetê bigirin dest;

Piştî klan, qebîle û eşîretan, divê mirov têgînên qewm û neteweyê di nav wan bi xwe de, bi awayekî cuda bigire dest û binirxîne. Ji ber ku ev her du têgîn bi şaristaniyê re derketine holê. Di vir de, divê em kevaneke berfireh vekin û derbarê têgînên qewm û neteweyê de nirxandinan bikin.

Vê kevneşopiya ku di civaka neolîtîkê de xwe wekî nasnameyên pêşketina civakî yên mîna klan, qebîle û eşîret bi rêxistin kirî, li hemberî rewşên zehmet ên di civakên bi çîn de, bi awayekî xwezayî mecbûr dimînin ku xwe nûjen bikin û pêş bixînin. Ji ber vê yekê, wekî berdewamiya kevneşopiyên qewm, netewe, klan, qebîle û eşîret pêş ketin, ango mirov dikare qewm û neteweyê, wekî berdewamiya kevneşopiya klan, qebîle û eşîretê ya bi civaka xwezayî re bi pêş ketî, binirxîne.

Bi taybetî em dikarin qewmiyetê, wekî bicihûwarbûna eşîretan a di jiyana niştecihbûnê de bibînin ku derketiye asteke zêdetir û bi vê yekê mezintir bûye. Eşîretên di serdema civaka neolîtîkê de, li gor rewşa nû mezin û mayînde bûn û derbasî jiyana niştecihbûnê bûn. Em ji vê formûlekirin û nasnameya nû hatî wergirtin re, dibêjin qewm.

Heke em hinekî din vekin; ziman an jî bi taybetî wekî sîmgeyî, zimanê îşaretan di civakên klan de derketiye û bi pêş ketiye. Di civakên xwezayî de, di nav malbat, klan, qebîle û eşîretan de, bi şêweyê zimanê devkî, bingeha hevgirtina ziman û çandekê ava dibe. Lê dema em tên serdema qewmiyetê, di asteke gelek bilindtir de hevgirtina ziman û çandê teşe girtiye û bi cih bûye.

Netewe jî, li ser rastiya vê qewmiyetê teşe girtiye û derketiye holê. Netewe di vî warî de, xwedî bergeheke berfirehtir e û formeke civakî ye ku xwe dispêre têkiliyên nermtir û nasnamebûna xwe bi vî rengî çêkiriye.

Lê di seranserî dîrokê de şêweyên bikaranîna van bi awayekî pir cuda pêk hatiye. Qewm xetek a pêşketinê ya ku piştî neolîtîkê di rêzbendiya olan de derketî holê, ji Sûmeran hatî destpêkirin, bi olan berdewam bûyî û di Çaxa Navîn de bi nasname bûyî ye .

Ango piştî ku mirovahî derbasî jiyana niştecihî bû û di pey hevgirtina ziman û çandê re ol jî têkelî wê bûye, bi vî awayî pêşketina qewmiyetan bi leztir dibe. Bandora olan di vê pêşketinê de xwedî rolek girîng e.

Lewma yên li dora heman baweriyan û yên di nava heman ziman û çandê de pêş ketîn; xwe di nava gerdûnîbûna wê baweriyê de bi rêxistin kirin.

Em vê di hemû olan de dibînin. Di olên yek xwedayî de, bi taybetî di Mûsewîtiyê, Xiristyaniyê û Misilmaniyê de ev pir xuyayî ye. Misilmantî, hişmendî û berzbûna Erebîtiyê ye. Qewmê Îbranî bi Yahûdîtiyê re yeksan e. Xiristyanî jî ji bo Ermen, Asûrî û Grekan qonaxeke girîng a qewmbûnê ye.

Xala ku ji bo mijara me divê binê wê bê xêzkirin jî ew e ku qewmbûn çawa di du baskan de ji hev qetiyeye. Ji bo ku têgîna neteweya demokratîk rast bê famkirin, divê ev pêvajoya jihevveqetînê baş were famkirin. Di vî warî de, qewmbûna Serdema Navîn, şert û mercên derbasbûnê yên dewleta neteweyê dikemilîne. Di Ewrûpaya Serdema Navîn de, berbelavbûna Xiristyaniyê, bi rêjeyeke bilind di nava pêşketina qewmbûnê de çêbûye. Çawa ku Tirk û Ereb bi Îslamiyetê gihiştine hişmendiya qewmbûnê û bi vê nasnameyeke bihêz a qewmiyetê ava kiribin; li Ewrûpayê jî Alman û Frans û Ingilîzan pêşketineke ku xwe dispêre Xiristiyaniyê bi dest xisitine.

Hemû jî di rêgehên cihê de xwedî oleke hevpar in. Tê dîtin ku ol; bi qasî ku bi awayekî gerdûnîbûnê, yekbûnê îfade dike; bingeha qewmbûnê jî ava dike. Dema ku pêşketina qewmî bi yekîtiya ol, ziman û çandê tê îfadekirin, paşê vediguhere rastiya netewebûnek a hîn zêdetir pêşketî.

Serdestan, pêşketina qewm û neteweyan bi awayekî pir xirab ji xwe re bi kar anîne. Hiyerarşiya ku ev şêweya rêxistinbûnê bi awayekî ne li rê bi kar anîn, di nav pergala hiyerarşîk de hêmanên bi navê desthilatdarî û dewletê derxistin holê. Lewma

di nav rastiya neteweyê de, hiyerarşiya qewmî, feraseta neteweyê ya serdest digire dest xwe û dibe yekdestdar.

Diyardeyên dewlet û desthilatdariyê, şêweyên rêxistinê yên bi navê qewm û netewebûnê bi awayekî pir xirab ji xwe re bi kar anîn. Di nav van her du hêmanên hebûna civakî de, bi awayekî xedar serdestî û hegemonyaya xwe saz kirin. Bi vî rengî, li ser civakê bi erkekî yekdestdar rola xwe lîstin.

Ji ber vê yekê, hemû şêweyên desthilatdariyê ku di nav hiyerarşiya "bavîtiyê"ya qewman an jî ji nav kevneşopiya pêxemberiyê derketî, di nav vê rastiya qewmbûnê de derketine holê.

Di nav neteweyan de jî pêşketinên bi vî şêweyî pêk hatine. Têgînên bi navên "bavê neteweyê" û "afirînerê neteweyê" pir hatin bikaranîn û berzkirin. Wekî mînak; Bîsmark, Mustafa Kemal Ataturk hwd. qehremaniya ku bi sîfetê afirînerê her neteweyekê derketî holê, hêdî hêdî bi desthilat bû û di şexsê wî de bû dewlet.

Desthilatdariyê nasnameya ku ji vir derxistiye holê, kiriye malê hemû civakê. Bi vî awayî şeklek dayek civakê, rastî berevajî kiriye û nasnameyeke qewmî li neteweyê ferz kiriye.

Ji hêla din ve, dema em li pêşketina qewmî û neteweyê dinêrin, teqez tê dîtin ku di nav dînamîkên pêşketinê yên rêxistinbûna civakî de, neteweyên ku xwe bi rêxistin dikin jî hene, yan jî ev pêvajo piştre bi serdestiya qewmekî tên astengkirin.

Heke em pîvanên exlaqî û polîtîk esas bigirin û dema em vê rastiyê bibînin û bi van pîvanan em lê binêrin, divê em vê rewşa heyî ferq bikin û wê qebûl bikin. Lewma divê em bi teza ku dibêje; 'netewe bi du şêweyan pêk hatine' meseleyê bigirin dest.

Di vir de ya yekemîn, pergala neteweya dewletê ya ku tê de serdest serkêşiyê dikin ku em vê yekê red dikin.

A duyemîn jî modêla neteweya demokratîk e ku di nav herka pêşketina şaristaniya demokratîk de derketiye holê û xwe dispêre pêkhateyên neteweya azad.

Çawa klan, qebîle û eşîret di nav pergala exlaqî û polîtîk de asta herikîn û pêşketina civakê îfade dikin; divê netewe jî di nav hawîrdoreke wisa azad de, xwe biafirînin. Ji ber ku hemû derdor, bi taybet qewm, bawerî, çand û çîn dikarin di nav neteweya demokratîk xwe azad bikin.

Cudahiyên pir mezin di navbera pêvajoyên avakirinê yên hêza serdest a hukumdar û neteweya şaristaniya demokratîk de hene. Dema hêza serdest a zihniyeta hukumdar neteweyê çêdike, ew zêdetir wê bi şêweyê netewe-dewletê pêk tîne. Yanî neteweyê wekî diyardeyeke serbixwe nagire dest. Ew neteweyê wekî îbadeta netewe-dewletê digirin dest. Netewe kirina wek civaka dewletê, hiştiye ku dewlet bibe amûreke serdestiyê li ser hemû civakê, vê jî rê li ber vekiriye ku civakek homojen a dewletê ya ku îtaetê ji dewletê re bike, çêbibe.

Ji ber vê yekê, ew cihêrengî û dewlemendiyên ku hebûna neteweyekê pêk tînin, vediguherîne serdestiya qewm û etnîsîteyê. Diyardeya jê re neteweya hov-hovane tê gotin ev e. Gelek ziman, çand û pêkhateyên cihêreng ên civakê yên di nav qewm û neteweyekê de, di nav modêla netewe dewletê de tên tinekirin. Bi vî rengî, bi ziman û çanda etnîsîteyekê tenê teşe digire û di dawiyê de rê li ber qirkirina ziman û çandên din vedibe.

Lê belê neteweyên ku di nav pêşketina pergala şaristaniya demokratîk de derketine holê, ne bi vî rengî ne. Netewe zêdetir xwe dispêrin têkiliyên nerm û li ser hevgirtina cihêrengî û dewlemendiyan, xwe bi rêxistin dikin. Hemû cihêrengî bi awayekî azad xwe îfade dikin. Tişta ku bi cihêrengiyê tê qestkirin; hemû cudahî û cihêrengiyên baweriyan, îdeolojiyan û civakan di nav vê çavçoveyê de cihê xwe digirin. Di vî warî de, neteweya demokratîk di nav xwe de destûrê nade hegemonyayê.

Her cûrê dewlemendiyê, neteweyê xurt dike. Hebûna neteweyê tê wateya xurtbûna van çandan. Lewma famkirina ku qewm bi du awayan dibe netewe, ji bo derxistina holê û zelalkirina cudahiya xeta neteweya demokratîk ku hêmanek ji hêmanên şaristaniya demokratîk e, giring e.

Ji ber ku her çi qas qewman di Serdema Navîn de pêşketinek di warê zanîn û têgihiştinê de afirandibin jî, lê ketine bin xizmeta olan. Bi neteweyan re jî meyla ketina bin xizmeta modernîteya kapîtalîst çêbûye. Qet nebe, ev mijar hêjayî nîqaşê ye. Ev şêweyê xeta meyl û pêşveçûnê, encex di nav kategoriya hêmanên şaristaniya kapîtalîst û çînî de were nirxandin. Ne mumkin e ku xalên veqetînê pir cuda bin, di nav hev de man û bi hev ve girêdan esas e, lê divê wekî xalên nîqaş li ser wan hene, bên destgirtin.

Wekî ku ji vê pênasekirinê jî tê famkirin, civak ji xuliqîna xwe ve wekî nasnameyên qewm û netewe dernakevin holê. Di nav herikîna dîroka civakî de, di Serdema Nêzîk de bêhtir nêzîkî nasnameya netewebûnê bûye.

Em dikarin forma qewmî wekî awayek ê nasnameyê, nasnameya-forma neteweyê binirxînin. Forma qewmiyetê bêhtir

form û nasnameyeke civakî ya li Rojhilata Navîn pêş ketiye. Bi awayekî giştî mekaneke hevpar ji bo xwe dikin war û welat. Li Ewrûpa û Rojhilata Navîn gelek nasnameyên qewman îro wekî hişmendiya neteweya serdest pêşengiya netewe dewletê dikin. Rêber APO di hemû cildên parêznameyên xwe de cih dide dîroka Yahûdiyan. Ji ber ku ev zihniyet û têgihiştina dîrokê, ji bo ciyawazî û herikîna xwezayî ya civaka dîrokî dibe ronahî. Ji ber vê yekê, divê dîroka Yahûdiyan baş were famkirin, ji ber ku ew materyalek ciddî ya dîrokî ye ku roniyê dide pêşketina têgînên neteweya dewletdar û neteweya demokratîk.

Mirov nikare hemû feraseta pêşketina dîrokê bike malê dîroka Yahûdiyan û tenê bi wê ve girê bide, lê ev dikare serbendika lehiya dîrokî bide me. Tê îddîakirin ku projeya netewe-dewletê wekî projeyeke siyasî ya qewmê Yahûdî, li Ewrûpayê wekî modêlekê hatiye pêşxistin û ferzkirin .

Ji ber vê yekê, şebekeya diz, selefxwer, hevkar û serdestên çînên jor ên ku ji nasnameya xwe ya exlaqî û polîtîk dûr ketîn û di nav xirbeyan de xwe veşartîn, her ku fersend ketî destê wan derdikevin ser rûyê erdê û dixwazin ku her tim amûrên desthilatdariyê di destê wan de bin. Ji dîrokê û heya niha, ji ber berjewendiyên xwe yên çînayetî, pêdiviya wan her tim bi amûrên desthilatdariyê hebûye. Ji ber vê jî, pêwîstiya gelek bajaran bi amûrên desthilatdariyê çêbû û bû sedema xirabûna behejmar gund û gundewaran. Exalqê civakî li erdnîgariya rojhilat, destûr nedaye vê .

Lê zemîna Ewrûpayê, ji bo van çîn û derdoran zemîn û firsend pêşkêş kirine. Rê li ber vekiriye ku wekî hêzeke xwedî tecrube, rêxistinkirî ya ku sermayeyê di destê xwe de digire,

derkeve holê, her wiha forma netewe dewletê ku amûra herî mezin a desthilatdariyê ye, wekî projeyeke hevpar pêş xistiye.

Teza ku dibêje, 'qewmiyet li Ewrûpayê ji du aliyan ve bûne netewe' divê wekî bingeha vê nêrînê bê dîtin. Lewma yek ji van aliyan "neteweya dewletê" ye ku taybetmendî û nirxên qewmiyetê yên şaristaniya fermî wek netewperestiyê veguherandiye û digel vê jî modêla dewlet, bûrjûwazî û civaka nû ya bajêr ava kiriye .

Aliyê duyemîn jî, modêla neteweya demokratîk dikare bê pênasekirin ku civakên derveyî çîn, dewlet û şaristaniya hegemonîk mane, bi rêya demokrasiya komînal israra jiyana bêdewlet dikin.

Tevgerên neteweya demokratîk ên ku li Ewrûpaya Rojava pêş ketine, di hemû pêvajoyên têkoşîna bajar û gundewaran de û di serdemên têkoşînên hevpar ên li hember qraliyetan de, di Ronesansê de û di serdemên şoreşên gel ên pêşî de, bi daxwazên wek azadî, wekhevî û edaletê xwe dane der û di pratîkê de jî reng û sekna xwe dane pêşandan. Lê di dawiyê de, çîna bûrjûwaya kapîtalîst a pêşenga meyla netewe dewletperest, ev pêvajo veguherand berjewendiyên xwe. Û hêzên neteweya demokratîk tevî taybetmendiyên xwe yên neteweyî, nekarîn destkeftiyên xwe yên bi berxwedana civakî bi dest xistîn, biparêzin, veneguherandin pergaleke alternatîf û bi pêvajoya netew dewleta homojen, di qonaxên dawî yên têkoşînê de ev mohra xwe neqedandin.

Têgînên neteweya dewletdar a homojen, di qonaxa kapîtalîzmê ya pergala şaristaniyê de ketiye rojeva civakê û wekî nasname û forma netewe-dewletê ku yek ji sêtikên (kapîtalîzm, netewe-dewlet û endustriyalîzm) modernîteya kapîtalîst e, hatiye avakirin.

Netewe-dewlet, şêweyê netewebûnê bi yek-tîpî pêş dixe ku jê re dibêjin “netewebûna hovane”. Komeke etnîk a serdest wekî sîsika sereke dike navend û nasnameya pabendî vê etnîsîteyê, li ser hemû qewm, etnîsîte, çand û neteweyan tê ferzkirin. Heta nasnameyên pir cihêreng ên qebîle, eşîret, qewm û neteweyan di nav ziman û çanda vê etnîsîteyê de tên tinekirin.

Di sedsala 14 û 15’an a Ewrûpayê de, ji aliyekî ve şerên ku rû dane, ji aliyekî ve asta pêkutî û mêtingeriya rêveberî û kilîseyê, bûye sedem ku kaosa îdeolojîk û polîtîk rû bide ku civakê jî bertekeke ciddî beramberî vê derxistiye holê. Di vê pêvajoyê de, bi berdêlên giran ên civakî, Ronesansa ku xwe dispêre humanîzm, azadî, wekhevî û demokrasiyê û pêvajoya reforman, dest pê kiriye. Rêxistinkar û hêza motorê ya vê pêvajoya ku ji hemû pêkhateyên civakê pêk dihat, hêza gel bû. Lê bûrjûwaziya xwedî sermaye û birêxistinkirî ku hêza wê di bin ya gel re bû, dikare di vê pêvajoya kaotîk de xwe wekî vebijêrka îdeolojîk û polîtîk pêşkêş bike û bi vî rengî pêşengiyê bi dest dixe.

Rêber APO, vê derketina bûrjûwayê wiha vedibêje: "Ev derketin, hema bibêje dişibe cinawirê di şeklê mirovê ku bi hezaran sal ji hêla hêzên şaristaniyê yên dewletdar û bêdewlet ve timî di qefesekê de hatî ragirtin û ji zincîra xwe rizgar bûyî û hegemoniyaya kabûsê li ser tevahî mirovahiyê saz kirî, temsîl dike(32) ".

Bûrjûwaziya ku bi pêş ketiye, ji bo ku bihêztir bibe û pergala nû ya cîhanê saz bike, berî her tiştî ji bo karibe xwe biparêze, pêdiviyê bi saziyeke bilind dibîne. Her wisa pêdiviyê bi sînorên netewetî û sazûmaniya civakî ya li gor vê armancê hatî dîzaynkirin dibîne. Her wiha dîsan pêdiviyê bi rêgez, qayîde û pîvanên ku jê re dibêjin hiqûq û qanûnan dibîne.

Hêzên sermayayê yên ku yekdestdariya desthilatdariyê jî bi dest xistîn, çi qas karibin bi asoyî û stûnî berfireh bibin, wê karibin li ser esasê hêz û qezencê hevdu ew qas xwedî bikin û ew qas mezin û bihêz bibin. Aha ji ber vê armancê, yekdestdariyên sermayeyê, yekdestdariya desthilatdariyê jî bi dest dixin û qonaxa kapîtalîst a şaristaniyê wekî netewe-dewletê ava dikin. Netewe-dewlet, wekî xwedayê şaristaniya kapîtalîst; netewperestî jî wekî ola wê rol digire ser xwe. Û wiha gav bi gav di encamê de civaka homojen ango neteweya dewletê/neteweya dewletdar tê avakirin.

Ev feraseta neteweyê ya li dijî xwezaya civakê, xwe dispêre parçekirina civaka exlaqî û polîtîk .

Dema exlaqê ku qada pîvan, qayîde û prensîbên rêkûpêkkirina jiyana civakî, cihê xwe ji hiqûqa neteweyî re dihêle, li şûna tevna polîtîk a ku ferd û civakê dike xwedî îrade û bi vî rengî jiyana civakî bi rêk û pêk dike û xwerêveberiyê pêk tîne, li ser bingehê ferzkirina serweriya dewletê, rêveberiya hişk a bûrokratîk a bûrjûwaziyê, tevna civakî bi parçeparçekirinê hidilweşîne û civakek evd û kerî di xizmeta qezenca xwe ya herî zêde de, dide avakirin.

Ji hêla din ve, bêşansiya herî mezin a neteweyê ew e ku di sedsala 13. de, têgîna ‘netewe’yê li Ewrûpayê bû xwedî

nasname, ji ber ku piştî wê kapîtalîzmê ev têgîna 'netewe'yê bi xwe re wekhev kiriye.

Helbet pêvajoya neteweya dewletê ji nişka ve pêk nehat. Ev şebekeya keysbaz a di nav qelş û derzên pêşketinên dîrokî de xwe veşartî, li Ewrûpaya Rojava ji xwe re bingeh peyda kiriye. Vê şebekeyê di her qonaxa pêşketina civakî û feraseta têkoşînê de, bi berçavgirtina firsendan, dest daniye ser derfetên hatîn bidestxisitin û kariye pêvajoyê ber bi hewaya berjewendiyên xwe ve kaş bike. Ev zimreya serdestiyê, di 1648'an de li qada Ewrûpayê, bi pêşengiya Fransa, di pêvajoya Peymana Westphaliayê de, xwe wekî pergalekê bi rêxistin kir û lihevkirina peymana netewe dewletê pêk anî. Ji vê re modêla Westphalia tê gotin. Û paşê ev modêl dikeve çarçoveya armancên stratejîk ên gelek etnîsîte, çîn, qewm û tevgerên civakî.

Piştre ew biryara ku wek Prensîba Wîlson tê zanîn a bi navê "Mafê her neteweyê heye ku qedera xwe tayîn bike", ji hêla bindestan ve jî tê qebûlkirin. Stalîn bi awayekî xurt xwedî li vê biryarê derdikeve. Wîlson ev sîfet wekî mafê çîna serdest, bûrjûwa û dewletê pêş xistiye, lê Stalîn ji bo netewe-dewleta bi pêşengiya kedkar û karkeran ev sîfet bi kar aniye.

Di vê derheqê de Rêber APO dibêje: "Her civak biryara qedera xwe dide, lê ne bi awayê dewletê".

Wekî ku ji vegotinan jî diyar dibe, di têkilî û pevvegirêdana civak û qewman de, bingeha dîrokî ya netewe dewletê nîn e. Lê zemîneke dîrokî yê ku dewlet û desthilatdariyê xwe spartiyê heye. Dîroka desthilatdariyan bi berhevkirina berhemê zêde (destdanîna ser berhemê zêde) derketiye holê, dewlet jî di her

çax û her demê de bûne yek ji formên herî giring ên ku ji aliyê desthilatdaryan ve hatîn birêxistinkirin.

Lê ti dewlet bi qasî netewe dewletê negihiştiye wê asta form û rêxistina dewletî ku li ser nirxên maddî û manewî yên civakê, hemû şaneyên wê îstîsmar bike .

Di asta desthilatdarî û dewletê de, bingeheke wisa dîrokî yê netewe dewletê heye. Lê ti bingeh ji helandina civakan a di yek potayê û pêşxistina serweriya wan a li ser neteweya ku dewletê ew kiriye yek, nîn e. ji ber vê jî, civakên ku xwe dispêrin cihêrengiyan, di ti zeman û mekanan de, nebûne xwedî lêvegerek yekgirtî.

Ji ber wê yekê, dema neteweya dewletdar ava dibe, bi pêşketina krîz û kaosê tê avakirin. Sedemên ku dihêle neteweya dewletdar bi krîz û kaos be, nebûna cihêrengiya xwezaya civakî, cûrbicûrî, xweserbûn û nermî ku ev jî sedemên giring in. Xwe dispêre ferzkirinên jiderve û bi zorê dana qebûlkirina tiştekî di xwezayê de tine yî, ne xwezayî. Lewma neteweya dewletdar, bi awayekî sûnî û xav hatiye înşakirin. Ji ber vê yekê, neteweya dewletê ne sosyolojîk e, projeyeke siyasî û leşkerî ya zordariyê ye û bi darê zorê xwe li ser xwezaya civakan ferz dike.

Dema em li avabûna neteweya dewletê ya bi krîz û kaos dinêrin, Bêguman wê bi sûd be ku em li hin sedemên din jî bigerin. Di vî warî de, em dikarin bibêjin neteweya dewletdar, bi taybet qewmê Yahûdî projeyeke siyasî ya hevpar a şebekeyên sûcdar ên selefxwer, bazirgan û keysbaz ên ku xwe di qelş û derzan de veşartî ya li ser bingeheke Awarûpî xwe dayî der e.

Tevî ku neteweya dewletdar derveyî xwezaya civakê ye jî; lê di wateya civakî de, wekî projeyek siyasî ya navxweyî dibe ku beramberiyek wê hebe, wek mînak gelê Yahûdî. Ji ber ku neteweya Yahûdî, xwe dispêre yekîtiya qewm û ol, dendik e. Her zarokekî Yahûdî dema tê dinyayê, dibe xwedî vê zanînê-bi vê zanînê tê dinyayê.

Lê belê projeya neteweya dewletdar ji bo çîn û etnîsîteyên piralî yên din, kirasekî dînîtiyê yê li wan hatî kirin e. Sedema şerên Ewrûpayê yên 130 salan domiyan û Şerên Cîhanê yên Yekemîn û Duyemîn, ev kirasên dînîtiyê yên hatîn lixwekirin e. Di vî warî de, timî Ewrûpa bi maskeya demokrasiyê tevdigere, bi pêvajoya Yekîtiya Ewrûpayê re jî dixwaze rengê vî kirasê dînîtiyê biguhere.

Dema xwestîn vî kirasê projeya siyasî ya neteweya dewletê li civakên Rojhilata Navîn jî bikin; veguheriye facîayeke ciddî û pêvajoyeke ku kes nizane wê li kû derê bi dawî bibe, bi xwe re aniye.

A rast, di nav felsefevanên Alman de, di serî de derbarê neteweya Alman de, bi giştî derbarê civaka Ewrûpayê de, nîqaşên navxweyî pir zêde ne. Wekî mînak, di navbera Hegel û Hergel de, nîqaş û polemîkên xurt çêbûne. Hegel ji bo Alman bibin neteweyek xurt, dewleta neteweyî ya navendî pêşniyaz kiriye. Hergel jî ji bo neteweya Alman xurt bibe, pêşniyaza xweseriya çandî pêş xistiye. Lê belê felsefeya ku bi serketiye, ya Hegel e. Ev ji bo civakan dibe xala şkestinê û ji bo desthilatdaran dibe pêvajoyeke nû ya restorasyonê.

Lewma bi dek û dolaban û bi tundî, zordarî, qirkirin û bişaftinê û bi pêşengiya rahibên hemdem, di encamê de bi

şarezatiya tifaqa sêgoşe ya damezrînerê hiyerarşiyê, li ser axa Ewrûpayê neteweya dewletê hatiye afirandin.

Ev kirasê dînîtiyê li civakê kirine. Di ti qonaxên dîroka civakan de; bi awayek ev qasî zelal yek ziman, yek welat û civaka homojen li ser gelan nehatiye ferzkirin.

Ji serdema şaristaniya dewletdar a ku meyla şaristaniya demokratîk asteng û tepeser kirî, heta şaristaniya kapîtalîst a ku sazûmaniya netewe-dewletê esas digire, bi zelalî tê dîtin ti sazûmaniyên dewletê xwe nespartine civakeke homojen û civakek homojen ferz nekirine.

Ti qraliyet, siltan, tîran û împaratoriyan ji wan nehatiye ku li ser navê yek qewm û yek neteweyê, endezyariya civakeke homojen bikin. Di pêvajoya şaristaniya 5000 salan de, civak bi nasnameyên xwe yên resen û bi nirxên xwe hebûn û bi rêjeyeke bilind wan xwe bi rê ve dibirin.

Çîna serdest a ku ji qata jor a civakê ya pir teng pêk tê û temsîla şaristaniya çînî-dewletê dike. Avahiya civakî ya berfireh a li derveyî vê qata jor a teng û ji civakê veqetiyayî jî, temsîla şaristaniya demokratîk dike, ev her du avanî di nav hev de wekî çemekî bi têkoşîna li dijî hev herikîne û hatine .

Lewma di dîrokê de, feraseteke homojen a civakî pêk nehatiye. Ji ber vê sedemê homojenbûn, projeyeke çêkirî, sazkirî ye û tê xwestin ku bi darê zorê li civakê bê kirin.

Pirtûkeke Enderson a bi navê “Cemaetên Xeyalî” heye. Enderson hizirvanekî ku lêkolînê li ser têgînên çêkirî û sunnî dike. Ew dibêje, gelek têgînên ji hêla dewletan ve hatine pêşxistin, xeyalî ne, bingeha wan a civakî nîne. Dibêje; “Nasnameya jor,

xeyalî ye û tiştekî çêkirî ye.”  (Üst kimlik, hayalidir oluşturulmuş bir şeydir) Enderson diyar dike ku gelek têgîn çandî ne. Lê gelek têgînên wek nasnameya jor, ala, sirûd, sîmge û hwd çêkirî ne û bi rêya medya û perwerdehiyê li civakê tên sepandin.

Li Îtalyayê, nirxandinên keşîşên dêran derbarê neteweya dewletê de hene. Nirxandinên kardînalan ên wekî; “Me dewleta Îtalyayê damezrand, niha jî divê em neteweya Îtalî çêkin.” hene. Ev gotin ji bo çi girîng in? Di vê gotinê de netewebûn ji bo siberoja wê civakê nayê pêşxistin. Ev gotin wekî mikurhatinekê ye ku netewe ji bo berjewendiyên desthilatdarî û çînên serdest hatiye înşakirin. Divê bi vî rengî em vê gotinê bigirin dest.

Me di serê mijara xwe de dabû diyarkirin ku forma netewebûnê wekî teşebûneke civakê ya ku piştî pêkhateyên wekî klan, qebîle, eşîret, qewm, gel û milet derketiye û herî zêde xwe bi yekbûn û nêzîkbûna çandê karekterîze dike. Ji ber vê yekê, girîng e ku were zanîn, civakên neteweyî ji formên civakî yên berê berfirehtir û mezintir in, bi cih û formên civakî re yên ku pê ve girêdayî ne têkildar in, û ne li gorî civakek homojen a yekperest in û li ser yekîtiyên demokratîk ên girseyên cuda hatine damezrandin. Hişmendiya neteweya demokratîk, aha xwe dispêre ahenga herikîna vê civaka xwezayî û wê berfirehtir dike.

Neteweya demokratîk; digel ku ji ciyewaziyên çîn, zayend, reng û etnîsîteyên pirreng pêk tê, di heman demê de form û nasnameyeke civakî ya xwe dispêre cîhana çand û zihniyeteke hevpar e. Hişmendî û bingeheke hevpar a ku pêkhateyên cuda yên civakî (klan, qebîle, eşîr, qewm û heta netewe) bi hev re, bi awayekî wekhev, azad û demokratîk bijîn e.

Ji ber ku hemû cihêrengiyên civakî, xwezayî û di heman demê wekî dewlemendiyekê dibîne, ferasetên yek ziman, yek al, yek milet, yek welat, yek dewlet û yek navend ên ku ji aliyê zihniyeta netewedewletê ve hatîn pêşxistîn, wekî amûrek a mêtingeriyê û argûmanek a jehrkirina civakê digire dest.

Netewe-dewlet a ku pergaleke navendî û homojen e, xwedî ferasetek burokratîk-navendî-otorîter a wisa ye ku ferd û civakê bê îrade û pûç dike. Berevajî vê, neteweya demokratîk zemîna xwecihî û herêmî û qadên demokratîk û xweser esas digire.

Neteweya demokratîk; encex bi naskirina azad a nasnameya qada xwecihî, herêmî û takekesî pêk were. Binyatên civakî çi qasî xwedî qadên xweser bin û qadên xwepêkanînê çi qasî vekirî bin, wê ew qasî azad û ji cihêrengiyan re vekirîbin. Wekî pêwîstiyekê, xwezaya civakan li ser van bingehan ava dibe. Ji klanê heta serdema neteweyê, bi vê taybetmendiya xwe ya vehewîneriyê, veguherîne û hatine. Ji ber vê yekê, neteweyên xwedî nasnameyên cihê û pirreng, bi qasî demokratîkbûnê, ew qasî meyldarên aştîxwazî û dewlemendiyê ne jî.

Neteweya demokratîk; di parçeyekî de, li ser axekê û di zemîneke civakî de ava dibe, lê ne herêmî ye. Rêber APO ji neteweya demokratîk re dibêje: “Zihniyeta neteweyê”. Bi nijadekî, zimanekî û nifûsekê û her wiha bi parçeyekî axê ve sînordar nabe. Lewma neteweya demokratîk gerdûnî ye û herikîna civakî ya ku berê wê li gerdûnîbûnê ye.

Neteweya demokratîk, sazûmaniya cihêrengiyên xweser e ku xwe dispêre yekîtiyên konfederal. Di vî alî de, ji qismî (tîkelê) ber bi gerdûnîbûnê ve, xwedî hêza diyarker e. Mijar hêjayî

dubarekirinê ye. Dema têgîn û teorî tên pêşxistin, divê em bersivên pirsên; “bingeha civakî û dîrokî çi ye, têgîna ku tê pêşvebirin îspata wê ya dîrokî çi ye, ya rast çi ye û em dijberî çi ne?” bên dayîn. Ji ber ku her teza tê pêşvebirin, divê bê îspatkirin. Em dibêjin ku paşxaneyek dîrokî ya berê ya dewlet û desthilatdariyan heye, lê bingeheke dîrokî û civakî yê neteweya dewletê-neteweya dewletdar tine ye.

Pêşiya her tiştî, divê were zanîn ku têgîna neteweya demokratîk û bingeha wê ya felsefîk û zanistî xwe dispêre felsefeya kûantûmê. Beramberiya qada sosyolojîk a felsefeya kûantûmê, konfederalîzma demokratîk e ku beden û hişmendiya neteweya demokratîk e. Di pêvajoya dîroka civakî de jî, pirçandiyek bi vî awayî heye. Lewma di bingeha civakî ya neteweya demokratîk de, çanda hevpar û hişmendiya hevpar heye. Dema em dibêjin hişmendiya hevpar, di jiyana hevpar a civakî de, bi awayê civaka resen, hemû reng û ciyawazî tê de cih digirin. Têkiliya sîmbiyotîk a hemû reng û ciyawaziyan tê de heye. Çand, bawerî û nasnameya her rengekî tê de heye. Ji be vê yekê, di nav çanda hevgirtin û hevpariyê ya van reng û nasnameyan de, parvekirinek xurt heye. Lê tiştekî bi navê neteweya dewletê tine ye.

Pirsyara “çima em têgîna ‘demokratîk’ dixin pêşiya her gotinê”, pirseke girîng e. Ji ber ku neteweyek bi demokrasiyê dibe xwedî hebûn. Di karekterê ontolojîk ê civakê de pirbûn heye. Lewma  bingehê jiyana civakî-dîrokî xwe dispêre cihêrengî û cûrbicûriyan. Ji ber ku di navbera wan de têkiliyeke sîmbiyotîk heye, em demokrasiyê dixin pêşiya her bilêvkirinekê. Heke cihêrengî û cûrbicûrî hebe, wê demokrasî hebe. Ji ber ku her hebûn dikare bi awayekî azad bizava xwe ya navxweyî pêk bîne,

demokrasî heye. Lewma demokrasî şêweyekî jiyanê ye. Têgîna herî bi bandor a pêşvebirin, hevparî û parastina cihêrengiya van çand û baweriyan, bi demokrasiyê tê îfadekirin.

Demokrasî, bes bi tenê xîtabî nasnameyekê nake, aliyekî nagire; jiyana hevpar a hemû aliyan e. Jixwe mumkine ku neteweya demokratîk wekî çandê jî were pênasekirin. Lewma, dema mirov têgîn û teoriyên ku bingehên paradîgmayê ne digire dest, divê mirov di ser bêdewletbûnê lê binêre û nîqaş bike. Divê em têgîna neteweya demokratîk jî li ser vî bingehî bigirin dest û zelal bikin. Lewma, heke armanc û zihniyet vekirî û zelal bin, wê têgîn û rêbazên ku vê pêk bînin, li cihê xwe rûnin.

Ji ber vê yekê, mirov dikare qala du rehendên neteweya demokratîk bike. Neteweya demokratîk, koma mirovan a ku heman zihniyetê parve dikin e. Pênaseya hevgirtî; zihniyet, hişmendî û bawerî ye. Em dikarin bibêjin ku zihniyeta neteweya demokratîk, têgihiştina azadî û hevgirtinê ye. Bedena wê jî xwerêveberiya ku xwe dispêre konfederalîzma demokratîk e.

1. Rehenda Zihniyetê

Rehenda wê ya zihniyetê, dinyaya fikir, xeyal û hestên ferd û civakên ku dixwazin bibin netewe, îfade dike. Hebûna wan kesên xwedî zihniyeteke hevpar, ên ku bêyî îhmalkirina ziman, çand, dîrok, aborî û zêdebûna nifûsa xwe, rewşên xwe yên hişmendiyê û van qadên bingehîn, bi hestekî hevpar ê hevgirtinê dikin yek e.

Hebûna wan kesên xwedî zihniyeteke hevpar, ên bêyî ku zimanê xwe, çanda xwe, dîroka xwe, aboriya xwe û zêdebûna

nifûsa xwe îhmal bikin, rewşên xwe yên hişmendiyê û van qadên bingehîn, bi hestekî hevpar ê hevgirtinê dikin yek ,

Neteweya demokratîk, bi fikra cîhanek wekhev û azad xwe dispêre cihêrengiyan û projeya xwe bi awayekî zihnî parve dike. Ev cîhana zihniyetê, cîhana komînal a ferdên azad e. Zihniyeta ku cihêrengiyan red nake û di qada giştî ya cîhana exlaqî û polîtîk a civakê de, bi berdewamî hişmendiya wekhevî û azadiyê dide jiyankirin e.

2. Rehenda Bedenî (Gewdeyî)

Rêkûpêkkirina hebûna di warê gewde-bedenê de ye. Di bingehê rehenda bedenî de, Xweseriya Demokratîk heye. Xweseriya Demokratîk, rehenda siyasî ya Konfederalîzma Demokratîk îfade dike. Tê wateya Otorîteya Demokratîk an jî Rêveberiya Demokratîk.

Şert û mercê herî kêm ê bi hev re jiyana di bin banekî siyasî yê hevpar de yê bi netewe dewletên etnîsîteyên cuda re, Xweseriya Demokratîk e ango bi hemû rehendan ve bûna xwedî hêz û îradeya xwerêveberiyê ye.

Xweseriya Demokratîk rewşa diyarkirina têkiliyên dewlet û demokrasiyê û dana diyarkirina têkilî û nakokiyên navbera Konfederalîzma Demokratîk û dewletê û bi prensîban girêdana wan e .

Wekî encam, rehenda zihniyetê ya neteweya demokratîk, ew civaka ku zihniyeteke hevpar parve dike û bi awayekî şênber beşdarî xweseriya demokratîk dibe û dijî ye. Lewra di rehenda bedenî ya neteweya demokratîk de, ji wê neteweya ku grûbên cihêreng ên wekî etnîsîte, çand, reng, bawerî, çîn û hwd. çand û zihniyeteke hevbeş parve dike û hemû endamên xwe di saziyên xweseriya demokratîk de digihîne hev û bi rê ve dibe, tê gotin. Ew koma civaka ku ferdên azad bi îradeya xwe ya xweser beşdar dibin e. Xweseriya demokratîk, wekî rewşa bedenî ya zihniyeta neteweya demokratîk şênber dibe.

Ji ber vê yekê jî, neteweya demokratîk bi tenê bi hevpariya zihniyet û çandê namîne, hemû endamên xwe li saziyên xweser ên demokratîk li hev dihewîne û wan bi rê ve dibe.

Şertê bingehîn ê neteweya demokratîk, şêwazê rêveberiya xweseriya demokratîk e. Di vî aliyê xwe de, netewe alternatîfa dewletê ye.

Modernîteya alternatîf a neteweya demokratîk, modernîteya demokratîk e. Bingehên bisaziyê yên modernîteya demokratîk an jî neteweya demokratîk ev in; rizgarbûna ji yekdestdariyê, aboriyek bi hawîrdorê re hevaheng û teknolojiyek dost bi ekolojiyê, xwezayê û mirovan re.

## 4-Sosyalîzm û Kapîtalîzm

Kapîtalîzm, wekî têgîn tê maneya sermayedarî, maldariyê û bingehê îdeolojiya bûrjûwaziyê ye. Qezenca herî zêde û komkirina sermayeyê ji xwe re dike hedef. Li dijî civakê ye, ferdperestiya lîberal ji xwe re esas digire.

Têgîna sosyalîzmê jî, tê wateya civakîbûnê, hedefa wê rizgariya civakî ye. Înşakirina pergaleke bêyî çîn û bêyî mêtingerî ji xwe re dike armanc. Xwe dispêre nirxên mîna wekhevî, azadî, edalet, hevgirtinê û hwd.

Kapîtalîzm û modernîteya kapîtalîst, temsîla xeta şaristaniya dewletdar a roja me ya îroyîn dike. Sosyalîzm jî, temsîla xeta şaristaniya demokratîk dike û pêşketina wê ya dîrokî îfade dike. Û di roja me de jî xwe dispêre hêmanên modernîteya demokratîk.

Kapîtalîzm ne beriya sosyalîzmê, ya piştî wê hatiye. Sosyalîzmê bi civakîbûnê re dest pê kiriye. Kapîtalîzm jî bes a çend sed salên dawiyê ye. Divê mirov van cudahiyan deyne holê.

Têgîna sosyalîzmê bi Marks re hatiye wekhevkirin. Bêguman wî ji hêla paradîgmayî ve sosyalîzm gihandiye qonaxeke din, ji hêla teorîkî û pratîkî ve modêl pêş xistine û wî pêşengiya pêşveçûnên ku em dikarin di nav mîrateya pergala modernîteya demokratîk de bi cih bikin, kiriye.

Lê belê yên ku wekî têgîn sosyalîzm pêş xistîn, sosyalîstên ûtopîk in. Têgîna sosyalîzmê cara pêşî li parzemîna Ewrûpayê, ji hêla komên ûtopîk ên wê çaxê pir berbelav bûyî ve, hatiye bikaranîn. Owenîstên ji salên 1872’yan û pê de li Ingilistanê pêş

ketîn, têgîna sosyalîzmê di wateya hevpariya di pîşesaziyê de û di wateya mulkiyeta kooperatîfê de bi kar anîne.

Heman pênase di sala 1832’yan û pê de, li Fransayê ji hêla Saint Simoniyan, di pîşesaziyê de ji bo pênasekirina sazûmaniya kolektîf hatiye bikaranîn. Sîmonparêz (Henri de Saint Simon) bi daxwaza pîşesaziya li welêt bi awayekî kolektîf saz bikin, têkoşînê dikin û vê têkoşîna xwe bi navê sosyalîzmê bi nav dikin. Di pirtûka bi navê “Ûtopya” ya Thomas More ya ku di sala 1516’an de derketî û di pirtûka “Welatê Rojê” ya Campanella ku di sala 1643’yan derketî de, wan bi heman naverokê têgîna sosyalîzmê girtine dest.

Bizavên ûtopîk ên li gelek welatên Ewrûpayê pêş ketîn, bandor li cîhana fikrî kirine. Lê belê qada esasî ya lêhûrbûna wan Fransa ye. Gelek bizavên ûtopîk li Fransayê pêş ketine û hewl dane armancên xwe li vê derê pêk bînin. Di serê ûtopîkên Fransayê de Saint Sîmon tê. Sîmon senteza ûtopîkên berî xwe ye û rênîşandêrê ûtopîkên di pey xwe re ye. Di heman demê de S. Sîmon bi ramanên xwe bingeha civakbûnê daniye.

Yê ku peyva sosyalîzmê wek wateya wê ya îro daye rûniştandin, bîrmendê Fransî Loiu Reybanud e. Li gorî nêrîna Reybanud, hemû bizavên sosyalîst ên ji rabirdûyê ta îro teşe girtîn û yên ku wê teşe bigirin, ûtopîk in. Ev ramyar, sosyalîzmê bi xwe wekî ûtopyayê pênase dike. Sosyalîzm, navê lêgerîna mirovahiyê ya domdar a bêsînor a azadî, wekhevî û dadmendiyê ye. Wekî peyv, wateya peyva ûtopyayê jî ya ku pêk nehatiye, ya ku pêk nayê û ya xeyalî ye. Lêgerînek bê qisûr a mirovahiyê ya li civak û jiyaneke îdeal e .

Eklektîzma teorîk-sazîtiyê û xitimandinên ku tevgerên ûtopîk di nava xwe de hilgirtibûn, di derketina lêgerînên nû, zayîna Marksîzmê û teşedana sosyalîzma zanistî de roleke girîng lîstine. Marks û Engels jî hemû bizavên sosyalîst ên beriya xwe, wek bizavên ûtopîk nirxandine.

Ji bo ku mirov karibin di dinyayê de wekî mirov bijîn, sosyalîstên ûtopîk parastina jiyanek bê çîn û bê îstîsmar kirine. Wan îddia dikir ku bertekên li hemberî zext, îstîsmar û neheqiya di civakê de, wê rê li ber avabûna sosyalîzmê veke û ji bo avabûna wê, ev tenê bes didîtin. Ji ber vê yekê, şêweyê têkoşîna wan, bi xîtabkirina niyeta mirovan ve sînordar maye.

Gava yekem a teoriyên sosyalîst ên Marks û Engels, sosyalîstên ûtopîk û ronakbîrên Fransî bûn ku wan tevî rexneyên xwe ew mîras girtibûn. Teoriya sosyalîst spartin vê derê. Halbûkî dîroka sosyalîzmê, bi qasî dîroka mirovahiyê xwedî feraset, fonksiyon û cewher e. Heke mirov sosyalîzmê bi tenê wekî ya li qada Ewrûpayê be bigire dest û binirxîne û derketina wê bispêre vê derê tenê, wê bibe sedema seqetbûna cewhera wê.

Bêguman sedemên maqûl hene ku sosyalîzm bi Marksîzmê re hemwate tê dîtin. Lê ne di cih de ye ku mirov cewhera sosyalîzmê bi sînodarkirina Marksîzmê re bigire dest. Dibe ku Marks sosyalîzm anîbe asta paradîgmayî û ev yek sebebeke berketî be. Lê heke mirov sosyalîzmê ji zeman û mekan qut bigire dest, wê sosyalîzm pir teng were destgirtin.

Marks, piştî ku sosyalîstên ûtopîk rexne kirin û pê de, dibêje; sosyalîzm ne xeyal e û pêkane ku pêk were. Piştî ku wî lingên teorîk-pratîk ên sosyalîzmê pêş xistin, “zanistîbûn” li sosyalîzmê zêde kiriye û têgîna “Sosyalîzma Zanistî” pêş xistiye.

Lê gava mirov li dîroka pêşketin û pêkhatina Marksîzmê dinêre, ev pênase û ev bingeh têrê nake. Sosyalîzm di cewhera xwe ya heqîqî de, nirxên wekhevî, azadî û edaletê îfade dike û yekîtiya demokratîk a civakê esas digire. Di seranserî dîrokê de, mirovahî li van nirxan geriyaye û hewl daye van nirxan biafirîne û bide jiyankirin. Hewldana ji bo bidestxistina van, di her serdema dîrokê de, lêgerîn û daxwaza hevpar a mirovahiyê pêk aniye.

Dîroka navendî û dewletdar a şaristaniyê, di heman demê de dîrokçeya van lêgerînên mirovahiyê ye. Bi vê naveroka xwe ve, dîrokçeya sosyalîzmê, hemtayê lêgerîna jiyana azad û wekhev a mirovahiyê ye. Heke mirov li hemtabûnekê bigere; jixwe rewşa xwezayîbûna civakan, sosyalîstî ye û heta ku xwezaya civakî hebe, lêgerînên sosyalîst û têkoşîn jî wê her hebin. Heke em di sosyalîzmê de li wekheviyekê bigerin, ew jî wê xwezaya civakî be. Lewra, divê digel şaristaniya navendî û hemû têkoşînên civakî yên li hemberî vê şaristaniyê pêş ketîn, di nav kategoriya sosyalîst de bên destgirtin.

Lêgerînên mirovahiyê yên azadî û wekheviyê yên di seranserî dîrokê de, her timî cewhereke sosyalîst di nav xwe de hewandine. Berxwedanên qebîle û eşîretan, tevgerên bawerî û etnîsîteyan, tevgerên çandî û exlaqî, tevgerên jinan û ekolojiyê, hevpariya di serdema Kînîkiyan de, lêgerîn û ceribandina Hermes, azweriya Îsa ya di nav Hawariyan de û tevgerên komunî yên hevpar ên li Îtalya û hin bajarên din ên berxwedanê û lêgerîna wekheviyê ya komên olî yên wek Karmatî û bi sedan komên din ên olî, wek têgîn dibe ku wekî sosyalîzm neyên pênasekirin, lê hemûyan jî cewhera sosyalîzmê bi xwe re hildigirtin û hem stûnên sosyalîzmê, hem jî mîrateya wê ne. Ev

tevgerên xwedî ramanên azadiyê û daneheva ku têkoşîn afirandiye, di heman demê de ji sosyalîzma ûtopîk re bûne çavkanî. Ev cewhera sosyalîst a di hemû zeman û mekan de serî hildayî û derketî holê, Marksîzmê ji ber agahiyên kêm nekariye wê bibîne; di dawiyê de jî teoriyeke sosyalîst a bi Ewrûpayê sînordar bi pêş xistiye.

Ji ber vê yekê, bizava fikrî ya wekî sosyalîzm hatî pêşxistin, teoriyeke sîstematîk a ku xîtabî 200 salan dike ye. Ji ber ku derfet, şert û merc, zanîn û ezmûn bi qasî roja me ya îro tinebûn, Marks teoriya xwe li ser bingeha rexneya sosyalîstên ûtopîk, aboriya siyasî ya Ingilîzan û felsefeya Almanan ava kir.

Ji bilî ûtopîkên Fransî, ekonomiya polîtîk a Ingilîzan jî bûye yek ji çavkaniyên bingehîn ê Marksîzmê pêk tîne. Marks dema kapîtalîzmê vedikole, di rêjeyeke zêde de sûd ji polîtîkvanên aboriyê yên Ingilîz werdigire. Di serî de, D. Ricardo û A. Smith, gelek rexneyên giran li aborînasan dike. Wî ne wekî îqtisadvanên Ingilîz kapîtalîzm mîna sazûmaniyek xwezayî girtiye dest, wekî kategoriyeke dîrokî girtiye dest. Û kapîtalîzm wekî pergaleke xwedî nakokiyên bêçareserî bi nav kiriye.

Dîsan her di derqehê mijara navborî de dibêje, 'kêşmekêşî-anarşiya di şêwazê hilberînê de, reqabeta texrîbkar a di bazarê de, nakokî û bêhevsengiya di navbera pêşkêşî û daxwazê (arz-talep) de ya di gerana metayê de, wisa kiriye ku kapîtalîzm bibe guloka pirsgirêkan.' Di nav pergala kapîtalîzmê de, mirov nikare qala hevsengiyeke di nav piyaseyan de bike. Îddîa dike ku reqabeta di bazarê de domdar bûyî, aloziya anarşîk a di pêvajoya hilberînê de, nakokiyên bi çîn ên kûr bûyîn û krîzên dewr û dayîmî

yên di kezeba pergalê de, rê nadin ku pergala kapîtalîzmê domdar bibe û wê dawiya wê bînin.

Marks, ji aborînasên Ingilîz cudatir, dahûrandina kapîtalîzmê ji metayê daye destpêkirin. Bi dahûrandina pêvajoya çêbûn û gerandinê ya metayê, çelexwarî, bêdomdariya di nav pergala kapîtalîst û awayê mêtingeriya wê daye diyarkirin. Xwestiye ku bi teoriyên ked-nirx û nirxê zêde, bi awayekî zelal destnîşan bike ku di nav pergala kapîtalîst de kedkar çawa tên îstîsmarkirin.

Şaxê sêyemîn ê dahûrandina teorîk-felsefîk a Marks jî, li ser rexnekirina bizava felsefeya Hegel ava dibe ku ev felsefe wekî îdealîzma Almanî tê zanîn. Taybetmendiya herî girîng a Hegel ew e ku xwedî ferasetek dîrokê ya îdealîst e. Marks feraseta dîrokê ya maddeyî, wekî xala destpêkê ya Materyalîzma Diyalektîk digire dest. Bingehên felsefîk ên teoriya xwe, dispêre Materyalîzma Diyalektîk.

Di çarçoveya rêbaza diyalektîkî ya ku esas digire de, diyar dike ku diyarde timî di nav rewşeke çêbûn, pêşketin û veguherînê de ne. Marks, Materyalîzma Diyalektîk bi adaptekirina veguherîna di xwezayê de, bi zanistên xwezayî şîrove dike.

Marks, bi van her sê palpiştan û bi pêşxistina rexneyan, di wateya paradîgmayî de bingeha sosyalîzmê pêk aniye. Cudahiyên paradîgmaya Marksîst bi vî awayî ne:

1. Tişta ku raman, nêrîn û têgihiştana mirov ango hişmendiya mirovan diyar dike, jiyana maddî ye.

2. Dîroka civakan, dîroka têkoşîna çînan e. Hişmendiya civakî jî vê dide der.

3. Ramanên serdest ên her serdemê, ramanên çînên wê serdemê ne.

4. Binesazî, seresaziyê diyar dike.

5. Tişta ji bo civakê diyarker, şêweyê hilberînê ye.

6. Nakokiyên di navbera çînan de antagonîst in. (Lihevnekirin)

7. Şîdet wekî amûrek a careserî û şoreşê, mecbûrî ye.

8. Diyalektîk şêwaz berfireh dike û adapteyî Materyalîzma dîrokî dike.

9. Dema geşedanên civakî-dîrokî dinirxîne, nêzîkatiya rast a pêşverûtiyê esas digire.

Marks-Engels ji dorhêla nîqaşeke teorîk, hewl didin nexşerêyeke teorîk-pratîk derxînin. Vê jî ne bi tespîteke teorîk û pratîk a ji nişka ve, bi hewldaneke salan a fikrî vê pêk tînin.

Xwe ji têgîn û kategoriyên kevin rizgarkirin û avakirina yên nû pêvajoyek zor û zehmet e. Prensîbên bingehîn ên Marksîzmê, bi navê bindestan destpêkek îfade dikirin. Têgihiştinek pir mezin dixwaze ku mirov karibe di çaxa xwe de, zanîn û danehevên ku dîrokê derxistîn holê di parzûnkirina van prensîbên bingehîn re derbas bike û bigihîne astek paradîgmayî. Zanîn û agahiyên wê serdemê, ji zanînên serdema Atîna, Roma û piştre jî ji yên Rojhilata Navîn hatibûn wergirtin. Zanîn û agahdariyên wekî yên îro nebûn ku dîrokê ronak bikin. Lewma dema em Marksîzmê bigirin dest, divê em ji vê heqîqetê bi awayekî qutbûyî negirin dest. Engels bi lêkolînên xwe yên piştre, gihiştiye hin vedîtinên

nû û hin nûjenî lê zêde kirine. Bi taybetî, dema di lêkolînên li ser civaka demokratîk de rehendên sosyolojîk û civakî yên gelên xwecihî vekolayî, ji hinek kêmasiyan haydar dibe. Ji vê jî xuya dibe ku li hemberî zanînên bi demê re derdikevin holê, ji wan zanînên nûjen ên nû derketîn holê re, teoriyek pêwîst e. Rêber APO li ser van agahî û zanyariyên îro dema ber bi paradîgmayeke nû ve diçe, di esasê xwe de di nav nêzîkahiya berfirehkirina Marksîzmê de ye, tevkariya wê dike û nûjeniyan li teoriya Marksîst zêde dike. Lewma dema em Marksîzm û paradîgmaya Modernîteya Demokratîk wekî muqayeseyî bigirin dest, wê gelek girîng be em ronîdar bikin ka rexne û nûjenî di kîjan xalan de pêk hatine.

Heke em çend girift û girêkan diyar bikin

Em dikarin rexne û lêzêdekirinên Rêber APO bi çend xalan rêz bikin

1. Ji ber ku Marksîzmê di jiyana civakî de roleke sereke daye pêşketina jiyana maddî û giringî daye pêşketina hêzên hilberîner, zihniyet û hêmanên din ên bi vê re pêşketîn ên wekî ol, exlaq, felsefe, hûner, îdeolojî û hwd ên mîna vana, wekî avaniya jor nedîtine, bi taybetî nedîtina zihniyetê ku şertê diyarker ê dîrokê ye û girîngîpênedana zihniyetê, mijarek rexneyê ye. Rêber APO, mirov wekî hebûneke madeya bi ruh û bê ruh a bi awayekî bêkêmasî hatî ristin dibîne û wî wekî awayê ristina “madeya ku difikire” teorîze dike. Lewma, dema di hebûnekê de avaniya giyandar û ne giyandar analîz dike, pê re behsa pêşketina hişmendiyê jî dike.

2. Marks diyar dike ku ji bo çîna karker bi pêş bikeve, divê şert û mercên kapîtalîzmê pêk bên, ji bo vê jî divê kapîtalîzm bi pêş bikeve. Ew wisa bawer dike ku kapîtalîzm encex piştî ku çîna kedkar pêş bikeve û bi rêxistin bibe, were rûxandin û hilweşe. Ji ber vê jî hêza pêşeng a şoreşê proleterya ye, pêşketina proleteryayê jî di şert û mercên kapîtalîzmê de mumkin e. Ji bo pêşketina kapîtalîzmê jî, divê rêveberiyên xwecihî û parçeyî bên derbaskirin û navendîbûna wan bê temamkirin.

Marks ji ber van sedeman, pêşketina kapîtalîzmê wekî pêwîstî û pêşverûtî dîtiye, ew bi netewe dewleta navendî re erê kiriye. Wek mînak, piştgirî daye netewe dewleta Almanyayê. Ji bo taybetmendiyên bi hezaran sal ên xwecihî ji holê bên rakirin, pêşketina dewleta navendî erê dike. Wekî ku ji van nirxandinan jî em fam dikin, feraseta Marks a di vir de, xwe dispêre vê mentiqê: “Dema kapîtalîzm pêş dikeve, bi xwe re kolînerê qebira xwe jî diafirîne.” Dema vê nêrînê bi pêş dixe, kapîtalîzmê jî wekî rewşeke mêtinger a wehşî û ya herî xedar pênase dike. Cihên ku wê dagir kirine û şêweyên îstîsmara wê jî teqez red dike û li hember disekine. Lewma li gel van hêlên ku ew wan red dike; pîşesazî, kargeh, şêweyên hilberînê yên ku di encama vê pêvajoyê de çîna karker a dijberî xwe çêdike jî, erênî dibîne. Mebesta bingehîn a Marks, hilhatina (zayîn) çîneke şoreşger a ku wê çêbibe bû. Û di wê baweriyê de ye ku ev wê bi kapîtalîzmê pêş bikeve û pêk were.

3. Marksîzm, hêza motorê ya dîrokê di ‘şerê çînan’ de dibîne. Marks, bi baldarî diyar dike ku tewişîneke bingehîn wê di navbera çînan de ango di navbera mêtingeran û yên tên mêtin de pêk were, ev tewişîn jî xwedî karekterek di asta antagonîst de ye. Pêkhatina çîna karker û bûrjûwaziyê ya di mercên kapîtalîst

de, digihîne kûrahiya dîrokê. Ango Marksîzm xala herî pêşketî ya diyardeyan esas digire û li paşiyê dinêre. Bi nêrîna kapîtalîzmê, feodalîzmê pênase dike, bi nêrîna şêweyê têkiliyên feodalîzmê, koledariyê dinirxîne, di ser têkiliyên koledariyê re, civaka komînal pênase dike. Ji ber vê yekê, dema têgihiştina diyalektîk a Marksîzmê dîrokî dike, pêşveçûna dîrokî li ser 'du' çînan, li ser nakokiya Materyalîzma Diyalektîk ava dike û tê heya digihêje qonaxa kapîtalîzmê.

Ya rast, Marks bi vê nêrîna xwe rê li ber vekiriye ku şebekeya bûrjûwa ya keysbaz a xwe di qelşên dîroka civakî de veşartîn, selefxwer, bazirgan û keysbaz wekî çîneke civakî ya rewa were hesibandin ku di hemû serdemên civakan de ji ber lanetî û xirabiyên xwe yên di jiyanê de, hatine dûrxistin û vederkirin.

Ji ber vê yekê, pênaseya di nav şaristaniyek tenê de, awayê pevçûnê yê du çînan, bûye sedem ku şaristaniya kapîtalîst bi tena serê xwe wekî heqîqetekê were rewakirin û rê ji rewabûna wê re vekiriye.

Halbûkî hêza motorê ya civaka dîrokî û nakokiya wê ya bingehîn, bi tenê ne pevçûnên di navbera çînan de bû, çîn bi tenê beşek ji pêkhateyên civakê ne. Nikare bê gotin ku nakokiya bingehîn a dîrokê  tenê nakokiya di navbera civaka demokratîk komînal û şaristaniya hegemonîk a navendî de ye û tiştek wisa bi tenê nehatiye dîtin jî.

Nakokiya bingehîn, ew nakokiya di kesayeta jinê de destdanîna li ser nirxên komînal ên xwezayî ye ku di encama hevkariya sêtika 'zilamê qurnaz, şefê leşkerî û rahîb' de pêş ketî .

Ji ber vê heqîqetê û li gor zanînên îroyîn dema mirov binirxîne, wê ne rast be ku mirov bibêje hêza bingehîn a guherînê ya dîrokî, pevçûnên di navbera çînan de ye. Di wateya civakî de çîn hene, lê diyardeya çînî ne nakokiya bingehîn e; mirov dikare wê wekî nakokiyeke talî ango nakokiya li pey wê bibîne. Nakokiya bingehîn di navbera Şaristaniya Dewletdar û Şaristaniya Demokratîk de ye. Hemû nakokiyên din ên civakî, piştî vê nakokiyê tên û li ser vî bigehî, bi vê ve girêdayî mirov dikare berê xwe bide çareseriyê.

4. Tevî ku pênase yan jî rexneyên Marks ên di derbarê şaristanî û modernîzmê de xurt in jî, wî pergal derbas nekiriye û ev jî bûye mijara rexneyê. Wekî gelek bîrmendên ronakbûnê, Marks jî modernîzm ji şoreşa Ingilîzan 1642-1649’an û bi Peymana Westphaliayê ya 1648’an daye destpêkirin. Her wiha parvekirina erkên qraliyetê, damezrandina parlamentoyê û demezrandina pergala navneteweyî ya netewe-dewletê esas digire. Ev jî destpêka serdema modernîteyê tên hesibandin. Di nav vê herikandinê de, avakirina binesaziya sosyalîzm û komunîzm a ku paşê derkeve holê, tê hesibandin.

Rexneyeke din jî ew e ku Marksîzmê, modernîteya kapîtalîst ne wek konjonkturel, di esas de wekî avaniyek pêşverû dîtiye. Ev pênaseya Marksîzmê jî, bi kêrî rewabûna modernîzmê hatiye. Li gorî mentiqê pêşdeçûnê ku ji vê pênase û avaniya wê ya îdeolojîk jî xuya dibe, nekariye modernîteyê derbas bike.

Lewma Marksîzmê dewleta navendî ya neteweyî ya ku sê çekên êrişkar ên modernîteya kapîtalîst in, erê kiriye û pêşketina endustriyalîst jî wekî pêşketineke erênî ya dîroka mirovahiyê pêşwazî kiriye. Ji ber vê sedema têkiliya têkoşînê ya xwezayî ya

di navbera kargeh û karkeran de, nekariye li hemberî endustriyalîzmê helwestekê pêşan bide, berevajî vê, risteke pêşverû li endustriyalîzmê hatiye barkirin û bi vê şaşiyek xeternak çêbûye. Ji ber vê nêrînê, wekî ku endustriyalîzm îddîa dike, civak “kevin-derçaxî”, “hovane” û “barbar” tê hesibandin û endustriyalîzm jî ji vê nêrînê sûdmend dibe. Bi vê yekê re, di serî de civakên ku bi taybetmendiyên xwe yên kevneşop û exlaqî dijiyan, gundî, cotkar, eşîret, qebîle û komên baweriyan ên wekhevîxwaz, wekî kevneperest û paşverû hatine hesibandin.

Ji ber vê yekê, wî pêşketin û navendîbûna netewe-dewletê û endusriyalîzmê, di destekî de berhevkirin û pêşketina pîşesaziyê û berhevkirina sermayeyê, wekî zemînê zêdebûn û belavbûna çîna karker dihesiband. Marks, berhevkirina sermayeyê wekî pêşketinek a zêdebûna proletaryayê girtiye dest. Bi vê nêrînê, wî dagirkirina Brîtanyayê ya li Hindistanê ji ber 'tesfiyekirina têkiliyên hilberînê yên kevneşop û paşvemayî ' ên Hindistanê erênî dîtiye, ji hêla din ve jî ji ber ku wî ew wekî mêtinger û zordar dîtine, li hember sekiniye.

Rêber APO, nesîhet kiriye ku bi dahûrandina sê lingên kapîtalîzmê, modernîte bê derbaskirin û wekî alternatîf hewl daye bi Neteweya Demokratîk, Civaka Eko-endustriyel û bi Aboriya Komînal a Hevgirtî, modernîteya xwe ava bike. Her wiha daye xuyakirin ku kapîtalîzm ne aborî ye û bi dijberiya aboriyê pêş ketiye. Lewma Marksîzmê, asoya modernîteyê û çavkaniyên bingehîn ên ku pergal xwe dispêriyê, derbas nekirine.

Di seranserê sed û pêncî salan de, Marksîzma ku li hemberî pergalên serdest bûyî rêber ji mirovên berxwedêr re, di nava sînorên modernîteya kapîtalîst de maye. Dema ev sedemên vê di

nav de mayînê yên felsefîk, îdeolojîk û polîtîk di warê zeman-mekan de bên destgirtin, wê destpêkê şêweyê jiyan û hizirînê yê felsefeya ronakbûnê ya Ewrûpayê derkeve pêşberî me.

5. Marksîzmê, ji ber nêzîkahiya xwe ya nû pêşxistî; lêgerînên niyazçak û têkoşînên azadîxwazî û edaletê yên di dîrokê de rû dayîn, wekî yên wextê wan nehatî dîtine. Fikrên Marks ên derbarê sosyalîstên ûtopîk de, li ser vî bingehî ne. Li gorî feraseta rastteqîn û pêşketinxwaziyê ya dîrokê, tişta ku hatina demê diyar bike, ew bû ku kapîtalîzm bibe awayê hilberînê yê serdest. Ji ber vê yekê, rêya gihiştina sosyalîzmê, bi awayekî mecbûrî di kapîtalîzmê re derbas dibe. Û wiha wê kapîtalîzm digel bûrjûwaziyê, proleteryaya ku çîna herî şoreşger û xwedî dirûşmeya “Ji bilî windakirina qeyd û bendan, tiştek din ê me tine ye ku em winda bikin!” derxistiba ser dika têkoşînê û wê dawî li xwe anîba. Ji ber ku nakokiya herî dijwar, nakokiya di navbera du çînên dijber de bû û nakokiya van her du çînan di nav pergala kapîtalîst de pêk dihat. Lewma di bin banê pergala kapîtalîst de, wê nakokî pir zêdetir bibûna û têkoşîn wê di navbera her du çînên sereke, proleterya û bûrjûwayê de dijwar bibûya. Di dawiyê de wê proleteryayê zora bûrjûwayê bibira û azadî û wekheviya civakî wê saz bikira.

Li gorî vê hişmendiyê, wekî şêweyê hilberînê, Kapîtalîzm heta serdest nebûya, wê mercên azadiya civakî pêk nehatiban. Vê yekê di heman demê de sedemên serneketina têkoşîna azadîxwazan jî “rave” dikir ku ev têkoşîn ji parçebûn û çînbûyîna civakan a ji destpêka şaristaniyê ve heye. Temambûn, berfirehbûn û berbelavbûna têkiliyên hilberînê yên kapîtalîzmê, qanûna herî bingehîn a Marksîzmê bû.

Ji ber vê yekê, gelek tevgerên neteweyî û azadiyê yan wekî “bêwext” an jî ji ber ku xisletên wan ên çînî negihayî ne, ew wek paşverû dîtine. Destek nedan gelek tevgerên ku pêşengiya azadî û wekheviyê dikirin, mînakên wekî Şêx Bedredîn hwd hene. Li gorî teoriya Marksîzmê, şoreşa 17’ê Cotmehê ya li Rûsyaya Çarîtiyê jî ne gengaz bû.

Paradîgmaya me ya berê, li ser bingehê teoriya Marksîst bû. Li gorî vê teoriyê, berbelavbûna îslamê ya bi şûr a li hember civakan, ji ber taybetmendiya xwe ya dagirkerî û mêtingeriyê dihat redkirin, lê ji ber anîna têkiliyên hilberînê yên nû ku bi xwe re çînên cihê afirandine, dihat erênîkirin.

Lenîn, teoriya Marksîst bi pênaseya xwe ya “tehlîla şênber bi şert û mercên şênber” veziland û qonax lê da qezenckirin. Teoriya nû ya şoreşgerî ya Lenîn, pêşbîniya pêşketinê li ser ‘xeleka herî qels a emperyalîzmê’ dikir .

Lê berbelavbûna şoreşa ku li Rûsyayê pêk hatî û ber bi welatên din ve çûyî, bi şertê ku ya şoreşa çîna karker e, piştgirî digirt. Yên ji bilî vê nedihatin destekkirin, berevajî wê dijberî li wan dikirin. Feraseta reel sosyalîst, serhildanên Kurdan wekî paşverûtiyê dîtin û helwesta têkilîdanîna digel dewleta netewe ya Tirk pêş xist. Heta gotin “Civaka Tirk, civakeke karker e” û hevkariya damezrandina netewe dewleta Tirk jî kirin.

6. Xalek din a girêk û mijara rexneyê, mirov dikare di determînîzma Marksîzmê de di “zagona guncandina mecbûrî” de, bi awayek şênber bibîne. Li gorî vê, civak ji merheleyan pêk tê (hovîtiya koledar, feodal, kapîtalîst, û sosyalîst) ku li gorî vê, her qonax encama ya berî xwe ye û sedema ya piştî xwe ye. Li gorî zagona civakî, dana jiyankirina her qonaxekê neçariye. Her

qonax bêyî ku sedemên pêwîst pêk werin, nikare were damezrandin û tine nabe. Hêza motorî ya vê pêşketinê çêdike jî, pevçûna çînan e. Her civak bi vî awayî derbasî qonaxeke pêşketîtir dibe. Li gorî vê, civak her tim di nav pêşketinekê de ye û kapîtalîzm encama vê pêşketinê ye.

Ji ber vê yekê, determînîzma di navbera diyarde û bûyeran de, têkiliyek sedemî datîne (redûseker-mutleq), îddia dike ku rûdana bûyereke nû, ji ber bûyera beriya xwe ye yanî girêdana her bûyerekê, bi bûyera beriya wê re heye. Bûyereke ku niha rû bide, wê bibe sedema rûdana bûyerek din. Û li gorî vê dîtinê, wiha bûyer xwe dispêrin hevdu û zagoneke "mecbûrî" (bivê nevê) pêk tînin. Bûyerek nikare derkeve derveyî vê mecbûrbûnê; her tişt wekî bûyîna xwe ya ku divê bibûya, pêk tê. Marksîzmê, qanûnên fizîkê û teoriya "seleksiyona xwezayî" ya Darwîn, bi awayekî sabit adapteyî xwezaya civakî ya nerm kiriye û civak bi qanûnên xwezayî girtiye dest.

Dibêje, nêrîna materyalîst a diyalektîk û dîrokî, ya bi feraseta xeta dûz a îdealîst re, pevçûna du maddeyan e. Di pevçûna van her du madeyan de, ya mafdar ger ku rêxistinkirî be, wê jiyana xwe berdewam bike ku ev jî mutleq tê dîtin. Di dawiyê de karker dikevin şûna madeya mafdar, patron û bûrjûwazî jî dikevin şûna madeya bêmaf. Ji vî alî ve, nakokiyên herduyan, tevgerîna civakîbûna nû diafirîne. Hê zêdetir, giştîkirina nêrîna materyalîzma diyalektîkî û rikîbandina bi dîrokê re redûse dike. Li ser vî bingehî, digihêje wê encamê ku bûyerên di vê serdemê de pêk tên, di serdemên berê de jî bi heman awayî pêk hatine.

Li gorî vê teoriyê, di her serdemê de çînên hatîn dabeşkirin ên di rewşa têkoşînê de hene. Dîrok ji pevçûn û tevgerîna wan

dixuliqe. Lewma di vê wateyê de, ji şopandina bizava maddeya dîrokê re, materyalîzma dîrokî hatiye gotin. Madeya di dîrokê de tevdigere çi ye? Çîn in. Di serdema koledariyê de kole û efendî, di civaka feodal de serf û senyor (derebegî) hene. Di civaka kapîtalîst de jî proleter û bûrjûwa hene. Dîrok jî ji pevçûna van xuliqî ye .

Marks, di dawiyê de vê şemaya bi komunîzmê bi encam bûyî, dispêre ruknên teoriya Darwîn, determînîzm û pozîtîvîzmê. Ev nêrîn; îhtimalan, rasthatinan û di navberê de derketina kaosan, gengaz nabîne. Pêşveçûna xwezayî dispêre sedem û qanûnan, sedema wê jî wekî kirde teqez bi çînekê ve girê dide.

Dîrokê pêşan da ku ev ne wisa ye. Her wiha, şaş e ku mirov qanûnên xwezayî bi hişmendiya teng a çînî bispêre xwezaya civakî û mirov van qanûnan wekî herikîna navxweyî ya civakî pênase bike. Ji ber ku wî pêşveçûna xwezayî spartiye zanînên kêm, nebes û zanînên pozîtîf; wî nekariye wê bi awayekî têr û tije dahûrîne.

Di vê mijarê de, dîrok dide xuyakirin ku Marksîzmê pêşveçûna civaka dîrokî, bi nêzîkahiya pêşverû û realîst dahûrandiye û nekariye xwe ji bandora nêrîna determînîst a pozîtîvîzmê rizgar bike.

Rêber APO diyar dike ku li şûna pêşdeçûna xeta dûz û rast, destpêkê û berî her tiştî, xwezaya civakî, civaka çandî û xwezaya duyemîn e, lewra xwedî tevneke nerm e, ji ber vê sedemê fonksiyon û girêdana  civakî her tim ber bi pêş ve pêşnakevin, lê belê xwedî xusûsiyetên taybet e, carnan zîkzak e, carnan girover e, carnan herremekî (ketober) û carnan jî xwe dispêre heyamên bi ihtimal û kaotîk. Û qala pêşketinên helezonîk dike.

Li vir nêzîkatiyek a dîrok û civakê ya dewrdar, pêşverû û xwe dispêre navberên kaotîk heye. Li gor vê nêrînê, dîrok ne bi rêkûpêk (dûz) bi pêş ve diçe, ne jî tim di cihê xwe de dimîne. Pêşketinek dewrdar a guherbar a ku her du nêrînan jî dihewîne heye, lê ji her duyan jî cuda ye. Ji vê re jî "Pêşketina Helezonîk" tê gotin.

Rêber APO, pêşveçûn û dewrdariya xêzikî û dûz a navheviyê jî têr nabîne. Rêbazeke diyalektîkî ya ku xwe dispêre yekîtiya zekaya analîtîk esas digire. Ji ber ku fonksiyona navxweyîbûna wê ya civakî û heqîqeta wê heye. Dirûvekî wê yê carinan guherbar lê carinan jî mayînde û pir hêdî dimeşe heye. Ji hêla felsefîk ve, li gorî agahiyên heta îro derketine holê; her du nêrîn jî di heqîqeta civakê de cihê wan heye û têgînên wisa ne ku îrade û dînamîkên wan ên navxweyî hene.

Di rasteka gerdûnî de, zagonên derbasdar ên zanista determînîst û pozîtîf û hêlên wan ên îspatkirî hene û tên bikaranîn. Lê xebitîna diyalektîka madde û enerjiyê, ya di bin cîhana atoma mekanîka Kûantûmê de jî rast e. Derketiye holê ku mirov her tiştî bi determînîzm û kûantûmê rave bike, tiştekî ne rast e. Lewma heke mirov bi hev re bigire dest û binirxîne, wê pênaseyên bi tenduristtir derkevin holê û wê mirov zêdetir ber bi heqîqetê ve bibe.

Rêber APO, ji pêşveçûna çemberî re got 'kevneşopî'. Ev tê wê wateyê ku di hin hêlên kevneşopiyê de guherîn çênabin. Lê di cîhana kûantûma bingeha atomê de, rastiyeke din heye ku her kêlî û saniye, guherînên bi lez û bez çêdibin.

7. Mijareke din a rexneyê ew e ku Marksîzm îddîa dike pevçûna çînan antagonîst (lihevneker) e û pêşveçûn bi hev tinekirina nakokiyan pêk tên.

Nêzîkahiya diyalektîk a Rêber APO pêşxistî, avaker û pêşdebir e. Rêber APO dibêje: “Di vir de xaleke girîng a em bala xwe bidinê, têgihiştina me ya diyalektîkî ye ku li gor wê tez û antîtez ne bi awayê hev tinekirinê, bi karektera ‘serkutkirin û paşvexistinê’ ber bi pêş ve diçe.” (33) “Hemû pergalên civakî dema ku dibin tez û antîtez, wekî xwezayê hevdu hildigirin. Têkoşîna di navbera wan de Bêguman rê ji geşedanên girîng re vedike. Ti caran tez bi halê xwe yê berê namîne, lê antîtez wekî teqeziyekê, pêşegniya xwe tine nake. Bi wê, xwe xwedî dike û encex bi wê pêş bikeve”.

Ji ber vê yekê, Rêber APO civakan wek Civaka Komînal a Xwezayî, Civaka Dewletperest a Hiyerarşîk û Civaka Şaristaniya Demokratîk bi nav dike.

8. Teoriya Marksîst, bêhtir li ser kategoriyên wekî aborî, lêçûn, nirx-biha, qezenc, sermaye û pere (dirav) lêhûrbûn pêk aniye û paradîgmaya xwe pêş xistiye. Rêber APO van kategoriyan red dike û paradîgmaya xwe bêhtir li ser civak, dewlet, dîrok, exlaq, polîtîka, demokrasî û dînamîkên berxwedanên etnîsîteyan bi pêş dixe.

9. Marksîzm, li ser teoriya meta û nirxan, kapîtalîzmê û dîrokê dinirxîne. Rêber APO hişmendiya dîrokê ji klan, hiyerarşî û îstîsmara zayendî dest pê dike û ji wir bi pêş dixe.

10. Marksîzm îro ronî dike û raboriyê ji zanînên objektîf dûr dixe. Rêber APO di civaka dîrokî de kûr dibe û tê roja me ya îro, rewşa wê ya îro wekî berdewamiya yên berî wê dibîne.

11. Marksîzm, dewlet û desthilatdariyê wekî encama mecbûriyetan dibîne. Rêber APO jî wan wekî xirabiya mutleq dibîne.

12. Marksîzm, tundiyê wekî çirûska civakên nû dibîne. Rêber APO tundiyê li ser bingeha parastina rewa digire dest.

Wekî encam, dema Şaristaniya Demokratîk li ser diyalektîka raman û bi gewdebûnê kûr dibe, pê re girêkên epîstemolojiya Marksîst jî di ber çavan re derbas dike û piştguh nake. Di bin roniya paradîgmaya Rêber APO pêşxistî de, em dikarin rexne û nûjeniyên li Marksîzmê hatîn kirin, bi vî awayê berwawirdkariyê bi kinahî rave bikin.

Teoriya modernîteya demokratîk, tevî ku rexneyên xurt li Marksîzmê û hişmendiya sosyalîst a demokratîk dike jî, di heman demê de di zêdekirina nûjeniyê de jî sûdek mezin bi wan dide bexşandin. Lewra paradîgmaya nû, xwedî hişmendiyek wisa ye ku feraseta dewlet û desthilatdariyê çareser dike, sosyalîzmê bi dewletê ve girê nade, sosyalîzmê wekî rewşa krîstalîzekirina civakên derveyî dewletê digire dest û dihesibîne.

## 5. Hevjiyana Azad

Rêber APO dibêje: “Heta ku têkiliyên di navbera jin û mêr de neyên famkirin, ti pirsgirêka civakî nikare were famkirin û çareserkirin. Di bingeha pirsgirêkên civakî de, pirsgirêkên têkiliyên jin û mêr hene.(34) Her wiha dibêje: “Rêbazeke lêkolînê ya ji rastiya jinê bêpar, têkoşîneke azadî û wekheviyê ya jinê nake navenda xwe, nagihêje heqîqetê û nikare azadî û wekheviyê pêk bîne(35) ”.

Bingeha jiyaneke azad û wekhev, bi çareserkirina vê pirsgirêkê dikare bê avakirin. Ji ber vê rastiyê, hemû bizavên ku dixwazin li hember şaristaniya yekdestdar bibin alternatîf, berî hemû nakokiyan, divê vê nakokiya zayendî bigirin dest. Ango ji bo ku şaristaniya yekdestdar bê avêtina derveyî dîrokê, azadiya jinê, civakîbûna ku xwe dispêre jinê û ji nû ve avakirina têkiliyên zayendî ya li ser bingeha dîrokî û civakî, mijarên sereke û bingehîn in.

Ev rastî, seranserî 5 hezar salan ji bo tevger û bizavên li hemberî şaristaniya yekdestdar têkoşînê dikin, bûye girêkek sereke. Van bizavan her çi qasî li hemberî şaristaniya yekdestdar şer kiribin jî, ji ber ku ev nakokî ji xwe re esas negirtine, wan nekarîne şaristaniya yekdestdar derbas bikin. Esas negirtina nakokiya zayendî û civakbûyîna jinê, ew dîsa derxistine dergehê dewlet û desthilatdariyê. Heke li cihekî civakîbûneke xwe dispêre jinê hebe, li wir ji bo dewlet û desthilatdariyê cih nîn e.

Teoriya hevjiyana azad, paradîgmayeke nû ye ku yekbûna hemû têgîn û teoriyan e. Ji ber ku bingeh û cewhera pergala

şaristaniya demokratîk, civakîbûna xwe dispêre jinê ye, li wê derê cihê dewlet û desthilatdariyê tine ye .

Dîrokê, ne bi nakokî û têkiliyên çînan; ne jî bi yên neteweyan teşe girtiye. Nakokiya bingehîn a dîrokê pê teşe girtî û pê derbasî nav bizavê bûyî, nakokiya jinê ye. Ango wekî diyardeyeke sosyolojîk, têkilî û nakokiya ku di navbera jin û mêran de diherike, hêza avaker a sereke ya jiyanê ye.

Ev rewş, hem ji hêla naverokê ve hem jî ji hêla zemanî ve wisa ye. Ji vî alî ve, nakokiya yekemîn a di dîroka civakîbûnê de, di navbera civaka neolîtîkê ya xwe dispêre civakîbûna jinê û pergala dewletperest a hiyerarşîk a xwe dispêre civakîbûna mêr de, qewimiye. Pergala dewletperest a hiyerarşîk a xwe dispêre civakîbûna mêr, pêşî jin xistiye bin desthilatdariya xwe û paşê bi vî awayî pergala xwe ava kiriye. Nakokiyên çînî û hemû nakokiyên din ên civakî piştî vê nakokiyê serî hildane û ketine rojavê.

Şaristaniya yekdestdar xwe li ser koledariya civakîbûna jinê, îstîsmarkirina wê û kontrolkirina wê ava dike. Şaristaniya yekdestdar, pergala desthilatdariya xwe bi qutkirina jinê ya ji zemîna civakî ava dike ku wê dixe rewşeke biyolojîk. Ev pergala ku piştî serdema neolîtîkê avabûyî, xwe di şert û mercên kapîtalîzmê de hê bi bandortir kiriye.

Pergaleke koledariyê ya 5 hezar salan, mijara li ser sekinandinê ye. Bi vê qonaxa ku hatî heta roja me ya îro, jin ji civakê daye qutkirin, mehkûmî malê hatiye kirin û ketiye bin hukmê mêr, wekî objeyeke cinsî xistine nav bazarê û ew kirine metaya tecawuza mêrê desthilatdar. Di bingehê vê rastiyê de jî parçekirina yekîtiya azad, wekhev û demokratîk a di navbera jin û mêr de pêk hatiye; biyanîkirina van her du zayendan a ji

civakîbûna wan û bi vê ji hev biyanîkirinê, dijminahî di navbera wan de çêkirine.

Rêber APO bi paradîgmaya xwe ya Şaristaniya Demokratîk ev rastî derxistiye holê û civakîbûna ku xwe dispêre jinê, xistiye navenda teorî û pratîka xwe. Li hemberî şaristaniya yekdestdar, demokrasiya rasteqîn û têkoşîna azadiyê encex bi vî awayî bê meşandin.

Di vê çarçoveyê de, bi teoriya xwe ya bi navê Paradîgmaya Şaristaniya Demokratîk, nasnameya jin û mêr li ser bingeha dîrokî û civakî pênase kiriye û rêkûpêkiya têkiliya pêwîst a di navbera jin û mêr de aniye ziman. Rêkûpêkiya ji nû ve ya jin û mêr, bi qasî ku li hemberî şaristaniyên yekdestdar, dewlet û desthilatdariyê jehrkuj e, di heman demê de ji bo misogeriya şaristaniya demokratîk û xwerêveberiya demokratîk jî ew çend pêwîst e. Di vê çarçoveyê de, avakirina hevjiyana azad û civakîkirina wê, têkoşîna herî sereke û bi wate ya li hember şaristaniya yekdestdar e.

Ji ber vê yekê jî, jiyana civakî, bi navendbûna jinê ya li civakê guncaw dibe û bi yekîtiyeke watedar a bi têkiliyên jin û mêr re dikare pêk were. Ji xwe jiyana civakî encama vê yekîtiyê ye. Di vî warî de, veguherîna jiyana civakî ya wekhev û azad, girêdayî vê heqîqetê ye. Divê jiyana civakî, malbata demokratîk a di nav civakê de, jiyana demokratîk û ferdên azad, li ser bingehê van prensîban veguhere û pêk were.

Lewma divê em hevjiyana azad wekî muqadesiyeke li jiyana civakî hatî zêdekirin, fam bikin. Helbet divê em hevjiyana azad wekî sînordarkirina têkiliya di navbera du kesan de fam nekin. Mijara gotinê ya ku pêwîst e li ser sekinandin çêbibe, ew

e ku civak hebûna xwe çêbike, xwe pêk bîne û xwe bi rê ve bibe. Bêguman pevrebûn û têkiliyên hevjiyana azad, tenê rehendek ê jiyana civakî ye. Di rastiya xwe de, hevjiyana azad tê wateya bi îradebûn û avabûna civakek azad.

Di civaka şaristanî de, mal (xanî) prototîpa girtîgehê ye. Di vî alî de, girtina yekemîn ew e ku jin li vê girtîgehê hatiye hiştin. Di qonaxa şaristaniya kapîtalîst de, derxistina jinê ji malê divê me nede xapandin. Ji ber ku cîhan bi kapîtalîzmê re veguheriye girtîgehek kûrewî. Hê kone û hê bi fikartir bûye. Baş e, bi kesekî li girtîgehê re mirov dikare têkiliyeke azad pêş bixe? Berevajî vê, gelo gardiyanekî li devê girtîgehê dikare bi girtiyekî re têkiliyeke azad bimeşîne? Di şert û mercên civakên şaristanî de, têkiliya di navbera jin û mêr de dişibe têkiliya di navbera gardiyan û girtiyekî de. Ji bo ku civakeke azad û kesayeteke demokratîk çêbibe, di serî de divê jin ji vê girtîgehê derkeve û mêr jî dest ji rola xwe ya gardiyaniyê berde. Jina ku ji girtîgehê derkeve û mêrê ku dest ji gardiyaniyê berde, tê wateya serbestbûn û azadbûna wan. Koleya/ê ku ji zincîra xwe rizgar bûyî, nayê wateya serbestbûn û azadbûna wê/wî. Divê hişmendî û exlaqê azadbûnê bikeve kirasê jiyanê û divê ji bo xatirê wê têkoşîn bê meşandin. Ancex gavek pêşketî jî bi vî wayî çêbibe. Ji ber ku jin fêrî koledariya li ser xwe bûye û bawerî bi serdestbûna mêr aniye. Ji hêla din ve jî, mêr di heman rewşê de ye. Mêr jî xwe wekî serdest û jin jî wekî kole qebûl kiriye.

Di avakirina modernîteya demokratîk de, hevjiyana azad li ser vî bingehê şaş ava nabe. Ji bo hevjiyana azad pêş bikeve, divê ji nakokiya yekem ango ji nakokiya jinê, her wiha divê ji newekhevî û feraseta serdestiyê ya di navbera jin û mêr de,

mirov xwe rizgar bike. Bêyî pêşxistina hişmendiya jinê û azadiya jinê, avakirina civakî pêş nakeve.

Ji ber vê yekê, hevjiyana azad destpêkirina jiyaneke demokratîk e û qada feraseta civakî lê şênber dibe ye. Ji bo jiyaneke demokratîk û azad, beriya her tiştî divê dest ji serdestiya mêr û koledariya jinê bê berdan. Ev yek rêgeza bingehîn a azadiyê ye. Heta ku takekesbûna şaristaniya yekdestdar a xwe dispêre cudaxwaziyê û heta mêrê zayendparêz û jina zayendparêz neyên redkirin, heta ku têkiliya bi zayendan hatiye tijîkirin neyê derbaskirin, hevjiyana azad pêş nakeve.

Rêber Apo, ji ber vê sedemê qala Prometheus, Aphrodite û Îştar dike. Çawa ku Prometheus ê mêr ê di mîtolojiyê de derbas dibe, "tevî ku hêza wî ya bûna xwedatiyê hebû jî, lê li hemberî desthilatdariya şênber a xwedayên serdemê li ber xwe daye û teslîm nebûye, divê mêrên di roja me de jî, jiyana bi jinê re wekî 'rizgariya ji desthilatdariyê' bibînin ".

Jin jî, divê ji bandora zihniyeta bi zayendan hatî tijikîrin, ji fêrbûnên xwe yên koledariyê û ji rol û tevgerên jintiyê yên heyî xwe rizgar bike. Di vî warî de, divê jin zekaya hestyarî ya mêr û estetîzmê ji nû ve bigihîne hev, divê nasnameya azad a jinê, şexsiyeta wê, cîhana wê ya saf û xweşik, niwaze û çavhebîn saz bike û bibe wekî Aphorodite û Îştara ku xwe radestî paşverûtiya mêr nekirîn.

Ji bo avakirina Şaristaniya Demokratîk, esasên bingehîn ew in ku jin xwe bigihînin çavkaniyên xwe yên civakî û jiyana civakî saz bikin û mêr jî di nav avakirina vê jiyanê de sekneke xwe dispêre yekîtiya ligel jinê, pêk bîne. Sûdmendiya herî mezin a azadiyê, ji bo mirovahiyê û ji bo dîroka têkoşînên civakî, di vê

mijarê de ye. Bêguman gelek têkoşînên azadiyê ev mijar xistine rojeva xwe, lê ti têkoşînê di maneya paradîgmayî de li vê mijarê nenêriye.

Di vî warî de, gelek bizavan, teoriyên rizgariyê wekî têkoşînên azadiyê yên civakî pêş xistine. Ji têkoşînên pêk hatîn, gotina 'heta ferd azad nebe civak azad nabe, heta civak azad nebe ferd azad nabe' derketiye holê. Lê gotina 'Jin azad nebe, civak azad nabe" nehatiye esasgirtin. Bêguman gelek têkoşînan, îdealên wekhevî û azadiyê dane pêş û di derbarê azadiya jinê de jî hêviyên xurt bi xwe re hilgirtine.

Lê têkoşînên ku di wateya paradîgmayî de jinê didin pêş û yên ku azadiya jinê dikin bingeha lêgerînên azadî û wekheviyê û yên ku nakokiya bingehîn girêdayî nasnameya jinê pênase dikin, zêde çênebûne. Halbûkî, di bingeha pirsgirêkên civakî de, newekheviya zayendan heye. Pirsgirêk ji vir dest pê dike. Divê were dîtin ku çavkaniya destpêkê ya ketina desthilatdariyê ya nav civakê, zayendparêzî ye, lewra divê li vir li pirsgirêkê bê gerîn û li vir dest bi çareseriya pirsgirêkê were kirin. Ji ber ku şêweyê îstîsmarê yê yekemîn û yê herî kevnar zayendparêzî ye.

Digel vê jî, dema desthilatdarî bandora xwe li qadên din ferz dikin, hîn bêhtir tên dîtin û berbiçav dibin. Lê newekhevî û desthilatdariya di navbera têkiliya jin û mêran de, ne xuya û rûpoş kiriye. Şkestina yekemîn, xistina yekemîn û dijşoreşa yekemîn, tevî ku li hember jine ye jî, hema hema bibêje ev nehatiye dîtin. Ji ber ku desthilatdariyê kariye vê bi hezar û yek rû û fen û fûtan binixumîne û veşêre.

Ev rû veşartî ye. Dîtina vî rûyî zehmet e. Bê ferq û cudahî, hemû dijşoreşên desthilatperest, rewabûna xwe di çêkirina

zihniyetê de, bi vê têkiliyê pêk anîne. Piştî zihniyeta zayendparêziyê hatiye ristin a wekî mêrê serdest û jina kole hatî sazkirin, hemû fêrbûn û libatên mirovan li gor vê hatine kodkirin û pêşxistin. Xwe dana der a van têkiliyan jî, bi hêmanên desthilatdariyê yên hatîn avakirin û bi dewletê bi xwe, pêk hatiye. Şaneya bingehîn a newekheviya civakê ya ku cudahiyê dixe navbera serdest-bindest, stûxwar-stemkar, kirde-bireser, di esasê xwe de newekheviya di navbera zayendan de, serdestiya mêr û koletiya jin a xistîn nav her du zayendan de ye, lewra divê em li vir pir zelal bin. Piştî ku avakirina zihniyeta koletiyê li zayendan didin xwarin, awayên vê yên ku di civakan de xwe dayîn der, dualîteyên çêkirî yên ku di dîrokê de nehatin helandin û çareserkirin, di nava pergalê de man. Desthilatdarî di nav pergala şaristaniya navendî de van dualîteyên çêkirî dihêle, wekî mînak di têkiliya serdest û bindest de li ser vê nakokiyê wan dike rikberî hev, di bin kontrolê de digire û bera hev dide. Di pêşketinên dîrokî de, bizavên ku li hemberî vê dualîteya ku serdestan dayî avakirin, derketîn, xwe spartine bindestan ku bindest yek ji dualîteyan bûn. A rast ev kemînek bû. Gelek komên berxwedanê bûne aletên kemînên desthilatdaran. Ji ber ku desthilatdarî û dewlet tam ji holê ranebûne û nehatine dahûrandin, di nav pergalê de bi hêsanî heliyane yan jî bûne mezhebên pergalê. Lewma, yek ji kemînên bingehîn ên desthilatdaran, serhildanên berxwedêran ên ku xwe dispêrin derdorên bindest ên di nav pergalê de ye, ev jî yek ji xwe dana der a şêweyên îstismarkirinê yên li ser bingehên zayendparêziyê ye. Halbûkî, nakokiyên di nav pergalê de yên tên dîtin, xwe dana der a bi sînor a newekheviya di navbera zayendan de ye. Ji ber ku pevrebûna jintiya kole û mêrtiya serdest a di civakê de, bûye bihevrebûna yê diçewisîne û ya tê çewisandin (bi hevrebûna

serdest û bindestan). Cihê ku xuya nake û hatî nixumandin, sedem û nakokiya bingehîn a ku rê li ber vê vekirî tam ev e.

Hemû bizav û tevgerên serîhildanê, di vî warî de wekî destpêk, beriya ku vê newekheviya jin û mêran a nexuyayî û rewabûyî çareser bikin, dest bi kar dikin. Di encamê de wekî rêgezeke bingehîn, divê em vê bidin xuyakirin ku azadiya ferdî di azadiya jinê re derbas dibe. Çareseriya pirsgirêkên civak û kesayetan, di rêkûpêkkirina vê têkiliyê re derbas dibe. Lewra, avakirina yekemîn a civakîbûnê, li derdora jinê hatiye hûnandin. Ji ber vê yekê, xwespartina yek ji van dualîteyên xwe dayîn der; ketina di nav kemîna desthilatdariyê de ye. Divê em nakokiya di nav vê dualîteyê de bibînin ku di nav pergalê de bi fêlbazî hatiye bicihkirin. Li ser sedemên ku zanistên civakî heqîqetên civakî di wateya dîrokî û ontolojîk de nabînin, mirov dikare gelek tiştan bibêje, lê pênaseya herî balkêş divê di çarçoveya wê rastiyê de pêk were ku zanistên herî pêşketî yên civakî çawa bûne amûrek desthilatdariyê. Di dema pêşxistina zanista jineolojiyê de, di warê pênase û îfadekirinê de, keda Rêber Apo ya sûdbexş a di zanistên civakî û rastiya danasîna yekpare ya civaka dîrokî de, pir giring e.

Di çarçoveya vê mijarê de, divê em girîngiyeke taybet bidin ravekirina mijarek pewîst. Girîng e ku pêşketina asta azadiyê û pêşketina civaka nû, wekî encama yekîtiyeke lihevhatî ya prensîbên jin û mêr were dîtin û pênasekirin. Ji ber ku jin tenê-bi tena serê xwe civakîbûnê pêk nayîne. Lê tewere (eksen) û diyarker ew e. Feqet di heman demê de xebateke mêr jî di nav civakîbûnê de heye. Lê belê, mêr di vir de, di civakîbûna bi pêşengiya jinê pêş dikeve de, girêdayî yekparebûnê rola xwe dilîze. Wekî din jî keda civakî ya li derdora jina dayîk hatî hûnandin, di xebatên avakirina roja me ya îroyîn de tewereyeke

nû ye. Heke mirov bala xwe bidiyê, mirov ê bibîne ku îdeolojî û teoriyên ku xwe bi azadiyê xemilandîn jî, ti caran ev keda civakî nedîtine. Hê jî vebûn û nûbûneke teorîk a bi vî şêweyî nehatiye kirin .

Di vî warê xebatên avakirinê de, mihwera sereke jin e. Dîsan, di xebatên avakirina civakîbûnê de, ji ber ku hin kes dixwazin û hin kes naxwazin jinê dernaxin pêş, ev heqîqetek e. Çîrokeke sosyolojîk a di xwezaya civaka dîrokî de ye. Ji ber vê yekê, sazbûna civakî heke sazkirineke li derdora mihwera jinê be û civakîbûna hatî pêşxistin heke li derdora têkiliya civakî ya jin û mêr hatibe hûnandin; di pêvajoyên înşakirina demokratîk de jî qadên civakî yên sereke û rehendên civakî yên wekî zanist, sosyolojî, hûner, edebiyat, estetîk, helbest, muzîk, resim, exlaq û etîk jî divê li derdora jinê bên avakirin. Ji ber vê yekê, rastiya jinê derveyî zayendê, xwedî rehendên wekî aborî, civakî, polîtîk û çandî ye. Jixwe zanista jineolojiyê jî ji bo ku vê rastiyê derxe holê hatiye pêşxistin. Ji ber van sedeman hemûyan, Rêber APO nasnameya civakî ya jinê û taybetmendiyên hebûnî yên jinê pênase kirine. Ji bo ku binesaziya van a civakî, felsefîk, zihnî û zanistî çêbibe, nîqaşa avakirina Jineolojiyê ku zanista hebûna jinê ye, xist rojevê.

Mijareke din a girîng jî, pirsa 'jiyana azad wê çawa li gorî armanca xwe were jiyîn?' e. Divê were zanîn ku bi jiyana azad û jina azad, armanca esasî ya têkiliyên jin û mêran ne zêdebûn û zêde welidandin e. Ji ber vê yekê, mebesta bingehîn a têkiliyên jin û mêr, wekî pozîsyona navendî nabe zêdebûn û zêde welidandin be, û divê bi wê yekê ve neyê spartin. Heke wisa be, wê ti cudahiya wê ji giyandarên din tine be. Heke wisa be, wê ti tiştek wekî afirandina ji nû ve ya jiyana azad, xweşik û bi edalet

çênebe. Asta jiyana ku giyandarên din a bi refleks û ajo tevgerînê çi be, wê çaxê asta jiyana di jin û mêr de hatî avakirin jî encex ew qas be. Berdewamiya dûndeyê rastiyek e. Lê ev rastî çi qasî li gor armanca jiyana bi wate, azad û bedew a ku mirov bi aqilê xwe ava dike, pêk tê û çi qas li gor wê pêk nayê?

Rêber APO dibêje, 'Peresîna di herikîna dîrokê de çêbûyî, bi tenê ber bi zêdebûnê ve nebiriye, ber bi cudahî û cihêrengiyan ve jî biriye.' Li ser vî esasî, pêvajoya seridînê-peresîna mirovahiyê dinirxîne. Dema ku hewl dide pêşan bide ku zêdebûn û zêde welidandin nabin wateya rastî ya jiyana heqîqî, wekî gava ewilî, destpêkê serî li seridînê-peresînê dide.

Peresîna di herikîna dîrokê de pêş dikeve, bi tenê ne li ser zêdebûnê bû. Di civakên destpêkê de, zêdebûn li ser bingehê xweparastinê digirtin dest. Lê ev tenê bi zêdebûnê ve bi sînor nema. Peresîn an jî seridîn, ne ji 1'ê bûna 10 e. Wekî din jî cudabûn, cûrbicûrbûn û guherîn hene. Lewma jiyana jin û mêr a tenê esasê zêdebûn û welidînê, bi peresîna dîrokî re ne lihev e. Ev yek dibe sedem ku peresîn bi yek rehendê û bi awayekî teng bê destgirtin. Jiyana li gel jinê, tenê bi zêdebûn û welidandinê re bê esas girtin, tê maneya korbûna jiyanê, korbûna jiyanê îfade dike. Civakan, ji aliyekî ve ji bo domandina dûndeya xwe, ji aliyekî din ve jî ji bo hizra nemirinê-kornebûnê, li zêdebûn û welidînê nêrîne. Heke wekî domandina dûndeyê li jiyanê bê mêzekirin, aliyek wê ya rast heye, lê heke bi awayê diyalektîka jiyanê û armanca bingehîn a jiyanê lê bê nêrîn, ti cudahî ji giyandarên din cuda di dest de namîne. Heke wisa be, wekî cûrek cuda yê zindiyan, danasîna mirovan wê ne pêkan be û cihêrengiyek bi wate wê çênebe. Ji ber vê yekê, heke em nemirinê-kornebûnê di zêdebûn û welidînê de bibînin, wê ne heqîqî û rasteqînî be. Ev

nabe armanc, dibe ku bibe navgîn. Di vê derbarê de Rêber APO dibêje: “Jiyaneke qedir bilind û bi wate, bi welidînek pir kêm, ji xeynî vê jî heke pêwîstiya nifûsê nebe, bi jina ku qet newelide mumkin e” (36)  Ji ber vê yekê, di encama cûrbicûrbûn û cihêrengbûnê de, civakîbûn hatiye afirandin. Lewma civak û ferd hema wisa jixweber di encama peresînê de pêk nehatine; di encama mudaxeleyeke fambar û bi îrade de pêk hatine. Tê zanîn ku afirandin karê Xwedê ye, lewma kesên ku civak afirandine, bûne Xweda. Ji ber ku jinê civakîbûn afirandiye û pêş xistiye jî, ew bûye Xwedawend. Heke jinê civak neafirandiba, tenê bi hebûna xwe ya fizîkî, bi domandina dundeyê maba, gelo wê bikarîba bibûya Xwedawend? Pîvana Xwedawendan, bi qasî çêkirina mirovan ango bi qasî çêkirina civakê bi xwe ye.

Lewma avakirina yekem a civakîbûnê, li ser wekhevî û hevgirtina azad a jin û mêr pêk hatiye. Li hemberî pirsa ‘Divê pêvajoya avakirina modernîteya demokratîk ji kû derê dest pê bike?’ bersiva ku bê dayîn divê ev be: ‘Ji têkiliya hevjiyana azad dest pê dike.’ Ji ber ku modernîteya demokratîk li ser bingehê azadiya jinê hatiye avakirin. Lewra bi bilindkirina jinê re, civakîbûna nû jî tê avakirin. Ji ber ku ji hevsengiya di navbera van her du diyardeyan de civak afirî ye. Civaka azad û wekhev, encama van her du diyardeyan e. Civakên azad û yên di mecraya xwe de bi awayekî xwezayî diherikin, di encama têkiliyên azad û wekhev ên jin û mêran de çêdibin. Ji ber vê yekê, ji hevsengiya têkiliyên di navbera jin û mêr de, civaka xwezayî derketiye hola dîrokê. Bi yekîtiya zekaya analîtîk û zekaya hestyarî ya civaka neolîtîk, ev derketiye asta herî jor. Divê zanistên civakî heqê vê mijarê bidinê û wê bikin navenda xwe. Karekterê ontolojîk ê civaka veguherîner, li ser vê veguherînê berdewam dike û piştre

ji rê dikeve û çeperê dibe. Ji ber vê yekê, ji bo zayîna civaka nû, divê çareserkirina pirsgirêka newekhevî û azadiyê ya di navbera zayendan de pêk were û her wiha ji bo ji nû ve têkilî bên rêkûpêkkirin, ev mijara sereke ye. Têgîna bingehîn a vê jî, avakirina feraseta civakîbûna nû ya bi wate ya di navbera jin û mêr de ye ku ev jî hevjiyana azad e.

# Gotina Dawî:

Ev nirxandinên ku bi sernavên çarçoveya têgînî û çarçoveya teorîkî ên me pêşkêş kirin, xwedî wê armancê ne ku sûdmendiyê li pêvajoya nîqaşên li ser Zanistên Civakî bikin, ku ev nîqaş girêdayî parêznameya Rêber APO ya ew wekî Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk pênase dike ne. Beriya ku şîrove û nirxandinên li ser zanistên civakî bên kirin, wekî mecbûriyetekê pêwîstî pê heye ku nêzîkahiyên têgînî û teorîk ên Ekola Zanista Civakî bên nirxandin. Ji ber ku pîvana têgînî û teorîkî, roniya nîşan û nêrdevana çûyîna ber bi rêya zanistên civakî ya ku Rêber APO pênaseya wan dike ye. Bêyî nêrdevanê mirov nikare hilkişe, bêyî ronahiyê mirov nikare rê bibîne. Di vî alî de, mirov nikare bigihêje wateya Zanistên Civakî yên ku Rêber APO wan tîne ziman. Wateyeke rast, wê bi xwendina rast a Çarçoveya Têgînî û Teorîkî û derxistina wê ya ber bi hişmendiyê ve mumkin be.

Di xala dawiyê de, pêvajoya em tê de, serdemeke wisa ye ku zanistên civakî ji nû ve tên nîqaşkirin û tê xwestin ku rastî derkevin holê. Di vê serdemê de, pergala hegemonîk a kapîtalîst ketiye pêvajoya Şerê Cîhanê yê Sêyemîn û xwe ji nû ve bi dîzaynkirina di warê îdeolojîk, polîtîk, leşkerî û rêxistinî de vediguherîne û di encama vê pêvajoya veguherînê de, dixwaze pergaleke hegemonîk a nû saz bike. Bi vî awayî hegemonyaya yekdestdar a 5 hezar sal in wekî ewrekî tarî xwe li ser mirovahiyê vedayî, bi dirêjkirina temenê xwe dixwaze qirkirin, komkujî, qetlîama jinan, talankirina xwezayê û hemû cûr û awayên nû li mêtingeriyê zêde bike û rêya xwe bidomîne.

Baş e, em ango mirovahiya ku li hemberî van pêkanînên hovane yên hegemonyaya yekdastdar rû bi rû bûyî; em ê çi bikin û em ê bertekek çawa bidin vê pergalê? Gelo di serdema me de, wê hegemonyaya yekdestdar xwe ji nû ve restore bike û rêya xwe bidomîne, yan jî di vê serdemê de wê hêvî û bendewariyên bêrîkirinê yên mirovahiyê yên wekî demokrasî, wekhevî, edalet û azadiyê şîn bibin? Cîhan cîhana me ye. Av a me ye, ax a me ye, hewa ya me ye, xweza ya me ye, jiyan ya me ye. Lewma em ê teqez destûrê nedin ku li ser vê cîhana me komeke biçûk, şebekeya desthilatdarî û sermayeyê, serdestiya xwe ava bikin û mêtingeriya xwe li ser me bidin meşandin û me qir bikin. Ji bo vê jî, li hemberî şaristaniya yekdestdar a 5 hezar salan û pergala desthilatdarî û dewletê ya jê zayî, çi tişta ji destê me bê, teqez em ê bikin û em ê berxwedaneke xwe dispêre demarên me yên kokê, em ê bidin meşandin.

Di vê têkoşînê de, tişta tekane ya ji mirovahiyê re pêwîst, zihniyeteke rast û rêxistinbûneke ku vê zihniyetê derbasî qada jiyanê bike ye. Aha di vê xalê de, Paradîgmaya Şaristaniya Demokratîk a ku Rêberê Azadiya Gelan Abdullah-Rêber APO di şert û mercên dijwar ên dîlîtiyê yên li Îmraliyê de teorîze kirî, wekî Manîfestoya Azadiya mirovahiyê derdikeve holê. Zihniyet û rêxistinbûyîna rast, wekî cewhera vê paradîgmayê ji mirovahiyê re hatiye pêşkêşkirin. Di vê nuqtê de, tişta ku bê kirin, rast famkirina feraseta zanistên civakî ye, ku cewhera vê paradîgmayê ne. Û ji bo dana xuyakirina vê zanabûnê, divê em dest bi têkoşîna avakirinê bikin. Helbet ev pêvajo di nav xwe de pêvajoyeke nîqaşê dihewîne. Me jî bi vê xebatê xwest em beşdarî vê pêvajoya nîqaşê bibin û vê pêvajoyê pêş bixin. Nêzîkatiya me

ya bingehîn ew e ku di pêşerojê de bi lêkolînên xwe yên li ser Zanistên Civakî, vê pêvajoyê bileztir û kûrtir bikin.

Divê bi vê gotina giranbiha ya Rêber APO, dirûşmeya bingehîn a vê pêvajoyê bi wate bibe:

“SAZÛMANIYA XWE DISPÊRE DEREW Û ZORDESTIYÊ, WÊ WINDA BIKE!

Û

SAZÛMANIYA KU XWE DISPÊRE AZADÎ Û EDALETÊ, WÊ BI SER BIKEVE(37) ”!

# ÇAVKANÎ

1- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 19, Abdullah RÊBER APO

2- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 19, 202, Abdullah RÊBER APO

3- Vikipedi, bkz, Gilles Deleuze

4- Parastina Gelekî, Rûpel: 304, Abdullah RÊBER APO

5- Şaristanî, Rûpel: 33, Abdullah RÊBER APO

6- Parastina Gelekî, Rûpel: 20, Abdullah RÊBER APO

7- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 19, Abdullah RÊBER APO

8- Vikipedi, bkz. Antonio Gramsci

9- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 20, Abdullah RÊBER APO

10- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 21, Abdullah RÊBER APO

11- Zanistên Çandî û Felsefeya Çandî, Doğan Özlem, Rûpel: 142, inkılap Kitabevi.

12- Şaristanî, Rûpel: 159, Abdullah RÊBER APO

13- Samuel Huntington, Rûpel: 33, Heke Ne Pevçûna Medeniyetan be, Çi ye?

14- Jaccjues Delors (Serokê Komîsyona Ewropî)

15- F. Fukuyama/Siberoja Şeran, Rojnivîska Tirkiyeyê, Rûpel: 54, Werger, Qadir Koç Demîr

16- Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk, Rûpel: 228, Abdullah RÊBER APO

17- Şaristanî, Rûpel: 61, Abdullah RÊBER APO

18- ) Tractatus Logico Philosophicus, L. Wittgenstein, Oruç Aruoba, Weşanên Yapı Kredî.

19- Nameya li ser Hûmanîzmê, Rûpel: 213 Martin Heidegger

20- Sosyolojiya Azadiyê, Rûpel: 210, Abdullah RÊBER APO

21- Sosyolojiya Azadiyê, Rûpel: 160, Abdullah RÊBER APO

22- Sosyolojiya Azadiyê, Rûpel: 210, Abdullah RÊBER APO

23- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 23, Abdullah RÊBER APO

24- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 37, Abdullah RÊBER APO

25- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 26, Abdullah RÊBER APO

26- Sosyolojiya Azadiyê, Rûpel: 340, Abdullah RÊBER APO

27- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 28, Abdullah RÊBER APO

28- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 28, Abdullah RÊBER APO

29- Kovara Komûnar, Rastiya Qirkirinê ya Şaristaniya Dewletperest, Hejmara Kanûn-Çile-Sibat Rûpel: 2012, Weşanên Akademiya Zanistên Civakî Abdullah RÊBER APO

30- Peymana Neteweyên Yekbûyî ya li ser Pêşîlêgirtin û Cezakirina Sûcê Jenosîdê

31- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 34, Abdullah RÊBER APO

32- Krîza Şaristaniya Rojhilata Navîn û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk, Rûpel: 127, Abdullah RÊBER APO

33- Parastina Gel, Rûpel: 124, Abdullah RÊBER APO

34- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 51, Abdullah RÊBER APO

35- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 52, Abdullah RÊBER APO

36- Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Parastina Kurdên di nav Pencên Qirkirina Çandî de, Rûpel: 44, Abdullah RÊBER APO

37- )Ji Dewleta Rahîbên Sûmeran Ber bi Komara Demokratîk ve cild 2, Abdullah RÊBER APO(

Ji xeynî çavkaniyên ku li jor hatine rêzkirin, hinek çavkaniyên din jî hebûn ku me ji ramanên wan sûd wergirtiye. Wekî minetdarî em ê li vir navên wan jî bi bîr bînin. Di vê çarçoveyê de, çavkaniyên ku em ji ramanên wan sûdmend bûne ev in:

1- Dîroka Gerdûnî û Rojhilata Navîn, Riza ALTÛN

2- Kurd û Şaristanî, M. Seîd Yildirim

3- Modernîteya Demokratîk, Duran KALKAN